

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Melik TAŞ

ÇALDIRAN SÖZLÜ KÜLTÜRÜ ÜZERİNE BİR İNCELEME

YÜKSEK LİSANS TEZİ

MUŞ-2018

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Melik TAŞ

ÇALDIRAN SÖZLÜ KÜLTÜRÜ ÜZERİNE BİR İNCELEME

YÜKSEK LİSANS TEZİ

TEZ YÖNETİCİSİ

Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ

MUŞ-2018

K.T.
ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN
ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Melik TAŞ

LÊKOLÎNEK LI SER ÇANDA DEVKÎ YA ÇALDIRANÊ

TEZA MASTİRÊ

RÊVEBIRÊ TEZÊ

Alk. Doç. Dr. Canser KARDAŞ

MÛŞ-2018

SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim Yönetmenliğine göre hazırlamış olduğum “Çaldıran Sözlü Kültürü Üzerine Bir İnceleme” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezimin sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin 3... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, dönem projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

23.01.2018

Melik TAŞ

TEZ KABUL TUTANAĞI

SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ danışmanlığında, Melik TAŞ tarafından hazırlanan bu çalışma 16/01/2018 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan : Prof. Dr. Abdullah KIRAN

İmza : 

Jüri Üyesi : Doç. Dr. Zahir ERTEKİN

İmza : 

Jüri Üyesi : Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ

İmza : 

NAVEROK

NAVEROK.....	I
ÖZET	III
KURTE	IV
ABSTRACT	V
PÊŞGOTIN	VII
KURTEBÊJE	VIII
DESPÊK	1

BEŞA YEKEM

DÎ DERHEQÊ XEBATÊ DE AGAHÎYÊN GELEMPERÎ

1.1. DÎ DERHEQÊ XEBATÊ DE AGAHÎYÊN GELEMPERÎ	5
1.1.1. Mijar.....	5
1.1.2. Armanç.....	5
1.1.3. Sînor.....	5
1.1.4. Metod.....	6

BEŞA DUYEM

BERHEMÊN ÇANDA DEVKÎ YÊN NAVÇEYA ÇALDIRANÊ

2.1. BERHEMÊN ÇANDA DEVKÎ YÊN NAVÇEYA ÇALDIRANÊ	7
2.1.1. Gotinên Pêşîyan	7
2.1.2. Biwêj.....	45
2.1.3. Leqep / Navûnûçik / Navlêk	49
2.1.4. Di'a.....	53
2.1.5. Nifir.....	54
2.1.6. Çîrokên Gelêrî.....	87
2.1.7. Mamik/Tiştanok (Bîlmece)	182

2.1.8. Zûgotinok / Çîvanok (Tekerleme)	184
2.1.9. Metelok.....	185
2.1.10. Heyranok.....	191
ENCAM.....	196
ÇAVKANÎ.....	198
FERHENGOKA NAVÇEYA ÇALDIRANÊ.....	206
KURTEJÎYAN	229
ÖZGEÇMİŞ.....	230
PÊVEK.....	231

ÖZET

YÜKSEK LİSANS TEZİ

ÇALDIRAN SÖZLÜ KÜLTÜRÜ ÜZERİNE BİR İNCELEME

Melik TAŞ

Tez Danışmanı: Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ

2018, 241 sayfa

Bu çalışmada Çaldıran yöresinin sözlü kültür ürünleri üzerinde durulmuştur. Sözlü kültür ürünlerini şu şekilde sıralayabiliriz: Halk hikâyesi, fıkra, tekerleme, bilmece, mani, dini efsaneler, atasözleri, deyim, lakap, beddua, dua, yemin ve v.b.

Bu çalışma iki bölümden oluşmaktadır. Birinci bölümde bu çalışma; konu, amaç, kapsam ve çalışmada kullanılan yöntemler dâhilinde tanıtılmaya çalışılmıştır.

İkinci bölümde ise Çaldıran'ın sözlü kültürü ele alınmıştır. Bu bölüm tezimizin ana ayağını oluşturmaktadır. Bu bölümde, çalışma sahasında elde edilen ürünler teorik olarak açıklanmış, daha sonrasında ise sahadan elde edilen eserler alfabetik olarak sıralanmıştır.

Çalışmamızın sonuna da elde edilen sözlü eserlerin daha iyi anlaşılabilmesi için sözlükçe eklenmiştir.

Anahtar Kelimeler: Van, Çaldıran, Çaldıran Sözlü Kültür Öğeleri, Sözlü Kültür, Kürt Folkloru

KURTE
TEZA MASTIRÊ
LÊKOLÎNEK LI SER ÇANDA DEVKÎ YA ÇALDIRANÊ

TAŞ, Melik

Şêwirmend: Alk. Doç. Dr. Canser KARDAŞ

2018, 241 Rûpel

Em ê di vê xebatê de li ser berhemên çanda devkî yê navçeya Çaldiranê bisekinin. Mirov dikare berhemên çanda devkî wiha rêz bike: Çîrokên gelêrî, pêkenok, zûgotinok, mamik, qewlêrk, efsaneyên dînî, gotinên pêşîyan, biwêj, bernavk, nifir, di‘a, sondxwarin û hwd.

Ev xebat ji du beşan pêk tê. Di beşa yekem de me lêkolîna xwe ji aliyê mijar, armanc, sînor û metodê ve terîf kirîye.

Di beşa duyem de jî em derbazê berhemên çanda devkî ya Çaldiranê bûne. Ev beş, beşa bingehîn a teza me ye. Di vê beşê de me derheqê wan berheman de agahî daye û wan berheman ji aliyê teorîyan ve rave kirîye. Piştî jî me berhemên ku ji qada xebatê berhevkarine tesnîf kir.

Di davîyê de jî me ji bo ku berhemên herêma Çaldiranê çêtir bêne fêhm kirin Ferhengokek amade kir.

Peyvên Sereke: Wan, Çaldiran, Berhemên Çanda Devkî ya Çaldiranê, Çanda Devkî, Folklorê Kurdî

ABSTRACT
MASTER’S THESIS
A SURVEY ON THE ORAL CULTURE OF ÇALDIRAN

Melik TAŞ

Advisor: Asst. Prof. Canser KARDAŞ

2018, Page: 241

In this study, verbal cultural products of Çaldıran district are investigated. We can list them in such an order: Folk tales, jokes, nursery rhymes, tongue twisters, riddles, short poems called “mani”, religious myths, proverbs, idioms, nicknames, expressions of malediction, prayers, oaths, etc.

This study consists of two sections. The first section includes introduction of the theme, aim, content, and the methods applied during the survey.

In the second section, verbal cultural products are emphasized in detail. This section constitutes the basis for the thesis. In this section, elements of cultural products, which have been obtained during the field study, are explained theoretically and they are arranged in an alphabetical order.

A glossary is also added at the end of the study to assure understanding verbal cultural products better.

Key Words: Van, Çaldıran, Elements of Çaldıran’s Oral Products, Oral culture, Kurdish Folklore

PÊŞGOTIN

Çand, serpehatîya civakê ye û fikr û ramana civakê ya hezar salî nîşan dide û vê serpehatîyê digihîne nifşên nû. Çand, nemaze çanda devkî tecrube, zanîn, ked, hilberîn û nexşên dîroka gel e. Bi vî awayî di navbera pêşeroj û paşerojê de dibe pireyeke bêhempa û danûstendinek daîmî pêk tîne. Çanda gel, bi rastî neynika gel e. Eger em bixwazin civakek nas bikin divê ku em berîya her tiştî li çanda wê civakê binêrin. Lewra me li jorê jî got çand wek neynik û nasnameya gel e. Wekî edebîyatên gelên din, di edebîyata Kurdan de jî çand, bi taybetî jî çanda devkî cihekî girîng digire û Kurdan dide nasîn.

Berhemên çanda gel, nemaze berhemên çanda devkî, yekûna gencîneyên gel e. Ew gencîneyên gelan taybetîyên çanda neteweyî, bawerîyên civakî, tevgerên civakî dihewîne. Ew gencîne, qismekî wê di çanda nivîskî de qismekî wê jî di çanda devkî de jîyana xwe didomîne. Ew gencîneyên devkî û nivîskî ji bo hebûna civakan û pêşveçûyîna civakan rolekî bêhempa dileyîze.

Di edebîyata Kurdî de nemaze edebîyata gelêrî de çanda devkî li gor çanda nivîskî ji ber hin sedeman, zêdetir di rewacê de bûye û pêşve çûye. Gel, bi hezar salan li gorî bawerî û terza jîyana xwe edebîyateke devkî afirandîye û di nav hemû sazîyên civakî de ew nimûneyên folklorîk bi kar anîne. Lê em dibînin ku di serdema me de bi pêşveçûnên teknolojîyê ve gelên ku xwedîyê çand û edebîyateke resen in wan taybetîyên xwe winda dikin û ji bingeha xwe dûr dikevin û dikevin bin bandora çandên bîyanî. Ev jî dibe sedema jibîrkirina nimûneyên folklorîk û bi vî awayî gel ji bingeha xwe dûr dikeve. Ji ber vê yekê me xwest ku em li ser berhemên çanda devkî yê navçeya Çaldiranê rawestin û wan heyînen folklorîk berhev bikin û wan derbasê qada edebîyata nivîskî bikin ku ew berhem neyên jibîrkirin.

Ji bo ku çanda devkî di zimanê Kurdî de cihekî muhim digire û gelek dewlemend e me berê xwe da vî warî û em li ser çanda devkî ya Çaldiranê xebitîn. Nemaze me xwest ku em berhemên çanda devkî ya Çaldiranê ji çavkanîyên devkî rasterast derbasê qeydê bikin. Dema ku me dest bi xebatê kir, em ewil di sînorên qada lêkolînê de li dû peydakirana çavkanîyên devkî çûn û heta ji me hat me ji bo xebatê ji çavkanîyên hoste îstifade kir. Piştî hilibijartina çavkanîyên devkî yê hoste me bi riya hevpeyvînan dest bi karê berhevkirinê kir. Dema ku me berhem derbasî nivîsê kirin, me dest neda zimanê berheman. Bi vî awayî gotin û peyvên berhemê hatin parastin. Me peyv û gotinê navçeya

Çaldiranê rasterast nivîsîn. Wekî mînak; peyvên pirjimar yên “baskên”, “hespan”, “malan” û hwd. Ji ber ku “n” ya davîyê li gorî navçeya Çaldiranê dikeve, me ew wekî “baskê”, “hespa”, “mala” nivîsî. Pey wî me dêna xwe dayê mijara dengsazîya Çaldiranê ku di daçekan de jî derdikeve pêşîya me. Gelê Çaldiranê taybetîyên devoka xwe di daçekan de jî nîşan dide. Wekî mînak; “de” û “re”. Me ev daçekan jî bi gotina navçeyî wekî “da” û “ra” nivîsî. Gelê navçeya Çaldiranê bi piranî pêşdaçekên “li”, “di”, “bi”, “ji” yê jî bi kar naynin. Wekî mînak: “li ser”, “di rûn de”, “bi hev re”, “ji bo” hwd. Lê gelê Çaldiranê dibêjin: “ser”, “rûn da”, “hev ra”, “bo” “mira” û hwd. Çaldiranî car caran jî daçekan digîhînin hev, mînak, “ti jî”, “ça jî” û hwd. Van peyvan jî me wek, “tij”, “çaj” nivîsî. Di navçeya Çaldiranê de pevdeng jî nayêne bikaranîn. Wekî mînak “Xwedê”, “xwe”, “xwesî” hwd. Me jî ev peyv wekî “Xudê”, “xu”, “xasî” nivîsîn.

Me di xebata xwe de guherandina tîpan û kurtkirina peyvan jî li gorî navçeya Çaldiranê nîşan da. Wekî mînak: “dîya min”, “alîyê min”, “bawer kir”, “winda bû” û “cih” wekî “cîya min”, “yalê min”, “bahar kir”, “inda bû” û “cîk” hatine nivîsîn. Li navçeya Çaldiranê tîpa “b”yê jî wekî “v”yê diguhere û me di xebata xwe de peyvên wek “xebat”, “cewab”, “derbas” bi şiklê “xevat”, “cav/cab” û “dervas” nivîsî. Dîsa di gelek cihan de me dengê “x” yê ku derbasî zimanê Kurdî bûye bi îşareta “ ” nîşan kir. Mînak: “ ‘Elo”, “ ‘di ‘a”, “ ‘esil” û hwd. Me tîpa “î” ya li pêşîya “y”yê wekî ‘eslê wê nivîsî. Yanê me “î” ya pêşîya “y” yê wekî “i” neguherand.

Ji bo vê xebata xwe ez di serî de ji malbata xwe re nemaze ji bavê xwe Halis TAŞ dîya xwe Necibe TAŞ birayê xwe Fîrat TAŞ û xwişkên xwe Ceylan û Handan TAŞ re spas dikim ku wan ji hêla moral û motîvasiyonê ve gelek alîkarîya min kirin. Ji gelê devera Çaldiranê re jî spasdar im ku wan heta îro vê gencîneya çanda devkî parastine û gihandine nîfşên nû. Di dawîyê de jî ji şewirmendê xwe mamoste Canser KARDAŞ re spasî û minetên xwe peşkeş dikim.

KURTEBÊJE

AMD.	:	Amedekar
BÇ	:	Biwêjên Çaldiranê
BNR	:	Binêrin
ÇÇ	:	Çîrokên gelêrî yên Çaldiranê
ÇEV.	:	Çeviren
DÇ	:	Di'ayên Çaldiranê
GPÇ	:	Gotinên pêşîyan ên Çaldiranê
HB	:	Heman berhem
HÇ	:	Heyranokên Çaldiranê
HZL.	:	Hazırlayan
HEJ.	:	Hejmar
HWD.	:	Her wekî din
J	:	Jêder
MÇ	:	Mamikên Çaldiranê
MTC	:	Metelokên Çaldiranê
NVÇ	:	Navûnûçikên Çaldiranê
NÇ	:	Nifirên Çaldiranê
R.	:	Rûpel
S.	:	Sayfa
S.	:	Sayı
VS.	:	Vesaire

WEŞ. : Weşexane
YAY. : Yayinevi
ZÇ : Zûgotinokên Çaldiranê

DESTPÊK

Çand û hêmanên çandê di nav jîyana neteweyan de cihekî mezin digire. Ji ber vê yekê çand di pêşketina civakê de roleke mezin dileyîze û cudatîyên civakê derdixe pêş. Di mijara terîfa çandê de nêrîneke hevpar tune ye. Her civakekî li gorî xwe te'rifêke çandê kirîye. Sedema vê jî ev e ku bûyerek ji bo civakekê gelek girîng tê lê ji bo civakeke din jî qet girîngîya wê tune.

Li gorî Remezen Alan, Kurd peyva “çandê” ji “ekîn”a Tirkan zêdetir di nav zimanê xwe de dane qebûlkerin û dibêje îro ev peyv hema bêje bi rehetî şûna “kulturê” digire. Dîsa dibêje ku ez ji peyva “çandî” ew qas ne bawer im.¹

Dursun Yıldırım jî ji bo terîfa çandê wiha dibêje: Li ser rûyê erdê çî qas civak hebe ew qas jî terîfên çandê hene². Yıldırım pişt vê terîfê dîsa li ser çandê terîfeke dinê jî dike. Li gorî Yıldırım çand: Di sedsala XIXan de tekûzî, civak û mirovîhatîya pêşveçûyîna ye³.

Li gorî Assman, çand, ezmûn û bîranînên girîng dixwe asoya zemanê îroyîn; ev alîyê çandê yê ku pala xwe dide vegotinên dîrokî û efsanewî, hem duh û îro nêzîkî hev dike û hem jî wan tiştên ku mirov naxwaze bide jibîrkerin zindî dihêlê⁴. Ji terîfa Assman jî tê zanîn ku çand dibe bîra neteweyan û hem jî dibe pira navbera duh û îroyîn neteweyan.

Özkul Çobanoğlu jî di derheqê çandê de dibêje ku mirovahî ji demen berê heta îro bi xwezayê re di nav mucadeleyek de ye. Ew hemû tiştên maddî û menewî yên bi destê mirovahîyê ve li xwezayan hatine zêde kirin çandê ava dikan. Çand ji alîyê meneyê ve têgeheke berfireh e. Xem û xwezîyên civakê, jîyana hissî û fikrî ya civakê, hewcedarî, meyl û nixêna civakê heta teknolojî û huner civakê di bin sîwana têgeha çandê de cihê xwe digirin.

Çand ne irsî ye. Ferd endamê kîjan civakê be çanda wê civakê hîn dibe û çanda wê civakê dipêjirîne⁵.

¹ Remezen Alan, **Folklor û Roman**, Stenbol, Weşenxaneyê Peywend, 2013, r.23

² Dursun Yıldırım, **Türk Bitiği Araştırma / İnceleme Yazıları**, Ankara, Akçağ Yayınları, 1998, s. 37

³ Yıldırım, **h.b.**, s.38

⁴ Jan Assman, **Kültürel Bellek**, çev. Ayşe Tekin, İstanbul, Ayrıntı Yayınları, 2001, r.21

⁵ Özkul Çobanoğlu, **Halk Edebiyatına Giriş – I**, Eskişehir, Anadolu Üniversitesi Yayınları, 2012, s. 3

Em di van terîfan de jî dîbînînin ku çand dibe ruhê neteweyan. Em bi saya çandê, curetîyên neteweyan jî dîbînînin. Li gorê çandê di her neteweyek de ‘urf û ‘edet, fikr û raman, jîyana rojane, edebîyat, ziman, dîrok, muzîk, xwarin û wexwarin, cil û berg diguhere. Ev guherîn jî çandê cuda cuda derdixe pêşîya me. Ji ber vê yekê her çandek di nav xwe de cudatîyekî dihewîne û nişkekî digîhêje nişê din.

Mirov di nav civakê de bi hev re jîyana xwe berdevam dikin. Ji ber vê yekê hewcehîya ragihandina navxweyî çêdibe. Ragihandin her çi qas bi wasita temasê, dîtînê, bênkirinê û bi hereketên destan çêbe jî, W. Ong dibêje ku bi rastî di ragihandinê de ziman û deng wekî hêmanên pêşeng in⁶. Tê vê meneyî jî, ji bo çanda devkî deng muhim e.

Li gorî Abdurahman Adak, edebîyata devkî (çanda devkî), edebîyata herî kevn a gelekî/miletekî ye. Edebîyata devkî, berî ku edebîyata nivîskî dest pê bike heye û piştî ku edebîyata nivîskî dest pê dike jî li kêleka wê hebûna xwe berdevam dike. Adak, dîsa berdevam dike û dibêje ku nexwe meriv dikare wan form û cureyên edebî yên ku ji demen herî kevn ve bi riya gotinê tên veguhestin wekî “edebîyata devkî” binav bike. Kilam, destan, şerên ku dengbêj dibêjin, gotinên pêşîyan, lawij, mamik, biwêj, lorîk û hwd. dikevin nava van cureyên edebîyata devkî. Mehsûlên edebîyata devkî ne malê nivîskarek e, malê tamamê gel e⁷.

Özkul Çobanoğlu dibêje mekanê çanda devkî li ser têkilîyên rû bi rû û li ser gotinê ava dibe. Di mekanê çanda devki de cihê teknolojîyê tune ye. Nivîs, metbe‘e, amûrên teknolojîk di vê mekanê de cih digirin⁸.

Jîyana gele Kurd xwedî zargotîneke wêjeya devkî ye û dewlemendîya stran û kilamên dengbêjan li gor rastîya jîyana gelê me derxistîye holê⁹.

Berhema nivîskî naye guherîn, lê ya devkî dikare gelek caran were guherîn. Ji vî alîyî ve berhemên devkî serbixwe ne. Berhemên devkî bê çarçove ne. Lê yên nivîskî sînorên wan dîyar in¹⁰.

⁶ Walter J.Ong, **Sözlü ve Yazılı Kültür**, İstanbul, Metis Yayınları, 2010, s. 19

⁷ Abdurahman Adak, **Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk**, İstanbul, Nûbihar, 2013, r. 25

⁸ Özkul Çobanoğlu, **Türk Dünyası Epik Destan Geleneği**, Ankara, Akçağ Yayınları, 2003, s. 56

⁹ Hayrettin Ekinci, **Dengbêjî**, İstanbul, J&J, 2013, r.145

¹⁰ Tekin Çifçi, **Klam û Jin**, İstanbul, Nûbihar, 2014, r. 25

Dursun Yıldırım dibêje ku di jîyana neteweyan de urf û ‘edetên mirovan ên devkî an nivîskî tên qebûl kirin bi van hemûyan re tevahî çanda devkî tê gotin¹¹.

Walter Ong jî dibêje ku çanda devkî, di nav civakan de malê muşterek e û bi qalibên hazir jî di nav civakan de çêdibin. Ji ber ku çanda devkî ji nivîsê mehrûm e, civak berhemên çanda devkî di hişê xwe de bi cih dike û sed salan dihewîne¹².

Li gorî Barry Sanders li ser rûyê îro ji sê hezaran zêdetir ziman dijîn, lê ji wan zimanan tenê bi heft û heşt zimanan edebîyat tê kirin. Ji wan heft û heşt zimanan jî tene pênc an şeş ziman bi awayekî navneteweyî têne bikaranîn¹³.

Barry Sanders, ew çîrok an meseleyên di çanda devkî de ji alîyên çavkanîyên devkî ve tên îcra kirin ele texmîn nayên bijartin. Vebêjer li gorî daxwaz û hêvîyên civakê yên populer dibijêre û wan îcra dike. Bi riya wan çîrok û meseleyên civakê bîra xwe ya hevpar her tim zindî dihele. Ew yek jî di nav endamên civakê de yekîtiyek, têkilîyeke hîssî peyda dike¹⁴.

Di çanda devkî de her tişt yek û yek nayê bîra mirovan. Ji ber vê di çanda devkî de hafîza, ne embar e ku gava tu çî bixwazî jê derxî, ne mohreke destan e, ne jî qaxizeke wek parşîmen e ku peyv li ser hatibe nivîsandin¹⁵.

Walter Ong, çandên civakan li gorî du têgehên tesnîf dike. Nivîs û metbee. Ew, çandên ku nivîsê tecrube nekiribin wekî çandên seretayî, primîtif bi nav dike. Di van çandan de ragihandin tenê bi riya zimanê axaftinê pêş dikeve¹⁶.

Tecrübeya bi rêya neqilkirinê ji alîyê civakê hatîye afirandin çavkanîya hemû çîrokbêjan e¹⁷.

¹¹ Yıldırım, **h.b.**, r.38

¹² J.Ong, **h.b.**, r. 50-52

¹³ Barry Sanders, **Öküz’ün A’sı, Elektronik Çağda Yazılı Kültürün Çöküşü ve Şiddetin Yükselişi**, çev. Şehnaz Tahir, İstanbul, Ayrıntı, 2010, s. 13-14

¹⁴ Sanders, **h. b.**, r. 15

¹⁵ Sanders, **h. b.**, r. 16

¹⁶ J.Ong, **h.b.**, r. 49-50

¹⁷ Walter Benjamin, **Son Bakışta Aşk**, sun. ve haz. Nurdan Gürbilek, İstanbul, Metis Yayınları, 2008, s.

Çanda hevpar, mît, efsane, yan jî destanê dikevin nav kevanê temayeke îdeolojîk, ji bo axaftineke li ser kokan ango ji bo geşkirina ruhekî kolektîf dibin mijarên ji rêzê. Vê yeke, elbet di serdema neteweyî de qutsîkirina berhemên çanda devkî bi xwe re anîye¹⁸.

Bi saya deng û hafîzayê, berhemên çandê û nemaze çanda devkî winda nabin. Berhemên ku bi saya deng û hafîzeyan hatine jiberkirin ji nîfşên berê ve wan hildidin tînin digîhînin nîfşên nû.

¹⁸ Alan, **h.b.** , r. 37

BEŞA YEKEM

DÎ DERHEQÊ XEBATÊ DE AGAHÎYÊN GELEMPERÎ

1.1. DÎ DERHEQÊ XEBATÊ DE AGAHÎYÊN GELEMPERÎ

1.1.1. Mijar

Çand an kultur, tecrube û hafîzaya civakê ye. Loma avaker an afirînerê çandê jî dîsa civak e. Ew di hundirê xwe de hemû nirxên maddî û menewî dihewîne. Çanda civakê nasnameya wê civakê ava dike û wê civakê ji civakên din vediqetîne. Endameke civakê çanda gelê xwe bi riya “zimanê gelê xwe” yanî bi riya neqlkirinê hîn dibe, bi îredeya xwe an bêhemdê xwe wê çandê dipejirîne û qebûl dike. Mirov dikare çandê, wekî çanda devkî û çanda nivîskî bisenifîne. Jixwe mijara vê xebatê jî çanda devkî ye. Çanda nivîskî (bi îcada nivîsê re) piştî çanda devkî ava bûye.

Mijara vê xebatê berhemên çanda devkî yên navçeya Çaldiranê ye ku ev navçe ji tarîxê heta îro jî gelek miletan re, ji çandan re bûye war û îro jî ev navçe vê fonksiyona xwe didomîne.

Ger ku bi riya vê xebatê ve em tenê yek berhemeke devkî jî ji ber mirinê xelas bikin wê gavê em ê bigihîjîn armanca xwe. Em hêvî dikin metnên di encama vê xebatê de hatine holê ji bo lêkolîneran bibe çavkanîyeke bi feyde.

1.1.2. Armanca

Armanca bingehîn a vê xebatê di navçeya Çaldiranê de berhevkirina çanda devkî ye. Lewra roj bir roj hejmara çavkanîyên devkî yên hoste kêmbin û bi vî awayî nîfşên nû ji wê mîratê mehrûm dimînin. Ji ber vê yeke qeydkirina wan berhemên çanda devkî tişteki mecbûrî ye. Bi vî awayî dê berhemên çanda devkî ji ber mirinê xelas bibin. Wekî din ew berhemên ku me derbasî nivîsê kirîye dê ji bo lêkolîneran li ser çanda devkî bibe çavkanî.

1.1.3. Sînor

Sînorên xebata me navenda Çaldiranê û gundên derdora wê ne. Di navçeya Çaldiranê de şaredariyek û şeş mehelleyên navendê hene. Ji xeynê wan mehelleyên navendê heftê gund û sî û pênc mezra girêdayê Çaldiranê ne. Lê sînorên xebata me ji panzdeh gundan û şeş mehelleyên navendê pek tê.

Mehelleyên navendê ev in: Recep Tayyip Erdoğan, Yavuz Sultan Selim, Fatih Sultan Mehmed, Cumhuriyet, Beyazıt û Kışla.

Gundên Çaldiranê ev in: Arîkele, Avtine, Avesor, Bizirxane, Bêşî, Bişaraxa, Cemaldîna, Cîliya Jêrê, Cîliya Jorê, Çaçur, Çayîr, Çubuxlî, Davan, Dewtirş, Dêro, Dasina, Dîreklî, Emek, Êgekumeyt, Gomakulo, Gomik, Giresor, Gundêqaçaxa, Golesor, Gol, Gundik, Hevêda, Hespê Reş, Hecî Zîyaret, Îsmâilbaba, Kelereş, Kurtkê jêrê, Kurtkê jorê, Kelê, Kerra, Kêça, Kanî Kewan, Kulîzer, Kevrê Şamya, Kolkolka, Mêtqulî, Nanparêz, Nezrava Jêrê, Nezrava Jorê, Nêçîrwan, Navrî, Noşara Jorê, Osmaliya, Pira ‘Erdê, Qaşim, Qordolan, Qeymez, Qubika, Sarîca Jêrê, Sarîca Jorê, Seregola Jêrê, Seregola Jorê, Sere Kanî, Sêgira, Selexane, Selik, Sityaqut, Sind, Şerexanê Jêrê, Şerexanê Jorê, Şexsica, Şorik, Şêxheyder, Şikeftka, Şerebegîya, Şalya, Şêxromî, Şeytanavê, Tepelî, Tîkmê Jêrê, Tîkmê Jorê, Tirşikê Mihêbaba, Tirşikê Xaça, Teqiz, Xaça, Xecî Xatun, Xan, Xûnê, Yekmale.

1.1.4. Metod

Karê berhevkarîyê karekî hêsan û ji rêzê nîne. Berevajî karekî dijwar e. Divê berhevkar berîya karê berhevkarîyê hin pirsan ji xwe bipirse. Ji wan pirsan yek jî ev e: Ez dê li gorî çî, çawa berhev bikim? Berhevkar zêdetir di karê berhevkarîyê de metodên mînanî çavnêrî, hevpeyvîn û anketê bi kar tînin. Me di merheleya berhevkarîyê de ji metoda çavnêrî (çavnêrîya ne beşdarî) û hevpeyvînê îstîfade kir.

Me di vê xebata xwe de navê Çaldiranê bikaranî. Lê di nav gel de ji bo Çaldiranê navên wek Bazîdaxa, Ebexê û Çildêran jî têne bikaranîn.

BEŞA DUYEM

BERHEMÊN ÇANDA DEVKÎ YÊN NAVÇEYA ÇALDIRANÊ

2.1. BERHEMÊN ÇANDA DEVKÎ YÊN NAVÇEYA ÇALDIRANÊ

2.1.1. Gotinên Pêşîyan

Wekî tê zanîn gotinên pêşîyan cureyek zargotinê ye. Di vê mijarê de Mustafa Borak wiha dibêje:

Hemû beşên zargotinê girîng in lê wan beşên herî derketine pêş gotinên pêşîyan in. Gotinên pêşîyan kurtencama jîyan, serpêhatî û tecrubeyên gel in. Ew di encama berhevkirin, dîtîn, tecrube û zanîna hezar salan de derdikeve holê. Ev gotin tenê edet, tore, hişmendî, hûner, raman, dad, dîrok, wêje, ziman felsefe û têkiliyên gel naynin ziman, di heman de di encamê de wan zanînan de şîret û pendan dikin û rê nîşanê mirov didin. Loma wan gotinan heya roja îroyîn hatine û jibîrkirinê xelas bûne. Dema ku mirov bixwaze gelekî nas bike, mirov divê bala xwe bide çand û zimanê wî gelî. Nemaze gotinên pêşîyan di vî warî de pir girîng in. Wekî din jî xweşî û dewlemendiya zimanekî ne tenê bi gotin û rêzimana wî, bi biwêj û gotinên pêşîyan jî diyar dibe.¹⁹

Abdulkadir Bingöl jî di derheqe gotinên pêşîyan de wiha dibêje: Gotinên pêşîyan, peyvên kurt û wecîz in ku ji alîyê wate/mene û naverokê de gelemperîyê dikin (ango îddîayekê tînin zimên) ji nava gel derketine, ji ber ku dem di ser de derbas bûye jêderka wan hatîye jibîr kirin û bûne malê gel. Kêmezêde ji alîyê herkesî ve têne zanîn û di zimanê rojane de têne bikaranîn.²⁰

Gotinên pêşîyan ji dewrên herî qedîm ên dîroka însanîyetê vir ve amûra herî girîng e ku di mucadeleya benîbeşer a li hemberî tebîe'tê de, di şikl girtina wî ya sosyo-kulturî de, di neqîlkirina tecrube û sermayeya wî ya ilmî ya ji bo nesla nû de, rê nîşan dide, çand û şaristanîyê pêk tîne.²¹

Taybetiyên Gotinên Pêşîyan

- Gotinên pêşîyan anonim in û melzemeyên gel in.

¹⁹ Mustafa Borak, *Zargotin û Rewşa Pirtûkên Gotinên Pêşîyan*, Kovara Zend, Stenbol, 2010, Hej.12, r.3-15

²⁰ Abdulkadir Bingöl, *Gotinên Pêşîyan û Biwêj*, , weş. Na, İzmir, 2014, r. 5

²¹ Özkul Çobanoğlu, *Türk Dünyası Ortak Atasözleri*, Atatürk Kültür Merkezi Bakanlığı Yayınları, Ankara, 2004, s.2

- Gotinên Pêşyan neteweyî ne.
- Ew heyîn in ku ew ji ceribandinên sed salan pêk ten.
- Bi gelemperî mecazî ne.
- Bi gelemperî pendî ne. Şîret dihundirîne.
- Hevokên bi qalib in.
- Darazî ne. Hikm dihundirîne.
- Ji hevokên kurt pêk tên û maneyên wan kûr in. ²²
- Hin Xisûsiyetên Gotinên Pêşyan ên Kurdan²³

1. Di hinek gotinên pêşyan ên kurdan de bêhna mêranî û merxasiya kurdan heye.

- Çav tirsonek e dest mêrxas e.
- Di navbera mêranî û qelsmêriyê de mûyek heye.
- Ga dimire çerm jê dimîne, mêr dimire nav jê dimîne.
- Heft bavê mêranîyê hene, yek jê rev e.
- Kihêl di bin mêrxasan de dibezin.
- Mala mêran kaniya zêran.
- Mêr xulamê mala xwe, mêrxas xulamê ala xwe ye.
- Mêrê qels du cara şer dixwaze.
- Yê ku bêje û bike mêr e, yê ku nebêje û bike şêr e, yê ku bêje û neke kerê nêr

e.

2. Di hinek gotinên pêşyan de mirov rastê mijarên wekî civaknasî û hişmendiya Kurdan tê.

- Aqil taca zêrîn e li serê her kesî de nîne
- Avabûna mala di destên jina de ye.
- Berê gotina xwe bipêje, dû re birêje.
- Bettalî û xizanî mirova dixê her halî.
- Bira bira ye, bazar cuda ye.

²² Ji bo agahîyên berfirehtir ên li ser mijarê, bnr: Çiya Mazî, **Ferhanga Gotinên Pêşyan**, weş. Elma, İstanbul, 2005, r.11-13.

²³ Ji bo agahîyên berfirehtir ên li ser mijarê, bnr: Mustafa Borak, **Zargotin û Rewşa Pirtûkên Gotinên Pêşyan**, Kovara Zend, Stenbol, 2010, Hej.12, r. 3-15.

- Bi werîsên xelqê danekeve bîrê.
- Bi pirsê mirov diçe mala Xwedê.
- Dara xweziya hêşîn nabe.

3. Gotinên li ser jiyana rojane.

- Adar wekî jina bî ye, geh dikene geh digirî.
- Av hemû tiştî dişo, lê eybê naşo.
- Bertîl kevîran jî nerm dike.
- Bêrxê xelkê di koza mirov de mezin nabe.
- Bîst û yekê Adarê, berfê avêt guliyê darê, nema danê êvarê.
- Dinya bihara lawan e, xwelî li serê kalan e.
- Feqîr û jar, wekî par û pêrar.
- Toraqa îro ji rûnê sibê çêtir e.

Di encama vekolîna me ya li Çaldiranê de bi tevahî me çarsed û heştê û heft gotinên pêşîyan peyda kir. Ev gotinên ku di netîceya tecrubeya jîyana xelqê Çaldiranê de derketine holê û hatine bikaranîn, hinek xasê navçeya Çaldiranê ne û bi tenê ji aliyê Çaldiranîyan ve hatine bikarannîn. Ev gotinên pêşîyan ku bi tenê ji aliyê Çaldiranîyan ve hatine bikaranîn hem bi giştî di derbarê ‘adetên Kurdan de agahî didin hem jî di çarçoveya taybet de di derbarê teferuatên jîyan û çanda vê navçeyê de agahî didin. Navçeya Çaldiranê ji hin alîyan ve xwedîyê taybetîyên xwemalî ne lê di netîceyê de ev navçe jî girêdayê çanda giştî ya Kurdan e. Ji ber vê hin gotinên pêşîyan ku me berhev kirine jî hem li navçeya Çaldiranê hem jî li herêmên din ên Kurdan têne bikaranîn.

Gotinên pêşîyan yên me ji navçeya Çaldiranê tespît kirine:

-A-

GPÇ-1

Adar ne bahare, xox ne dare, qîz ne war e. (J7, J12, J16, J18)

GPÇ-2

Aha lê dixim bav dimire, waha lê dixim dê dimire. (J6, J45, J85)

GPÇ-3

Aqil tacê zêrîne ne serê herkesîye. (J2, J8, J118, J125, J127)

GPÇ-4

Aqlê Kurda yê pêşyê serê kêre min, aqlê Kurda yê paşê sere mîrê min. (J2, J5, J9, J45)

GPÇ-5

Aqlê sivik barê giran. (J6, J30, J45, J42, J51, J56, J68)

GPÇ-6

Aqlê wî çoka dane. (J45, J74, J93, J101)

GPÇ-7

Aş bê aşvan, mal bê zar, axa bê xulam nabe. (J40, J50, J79, J88, J95, J101, J108)

GPÇ-8

Aş berdaye pey çeçeqê ketîye. (J1, J7, J11, J25, J55, J65, J89, J101)

GPÇ-9

Aş xiyarekî, aşvan xiyarekî ye. (J22, J33, J44, J62, J71, J84, J92, J107, J116)

GPÇ-10

Aşê dîna Xudê digerîne. (J1, J3, J5, J10)

GPÇ-11

Aşê dînan bê av digere. (J8, J11, J22, J33, J44, J55, J66)

GPÇ-12

Aşê nezanan Xudê digerîne. (J2, J14, J23, J46, J56, J67)

GPÇ-13

Av çiqas golê da bimîne ew qas genî dibe. (J4, J10, J12, J21, J31, J47, J65)

GPÇ-14

Ava xastî naçe hestî. (J70, J81, J92, J100, J111, J122)

GPÇ-15

Axa bi xulam, xulam bi olam. (J72, J83, J94, J103, J118, 127)

GPÇ-16

Axa mêt û jinê jî yek e. (J3, J71, J80, J91, J101, J117, J127)

GPÇ-17

Axê me Hom²⁴ be, xulî serê me kom be. (J4, J9, J73, J82)

-B-

GPÇ-18

Bar min naêşîne, ser bar min diêşîne. (J13, J24, J32, J43, J57, J69, J75)

GPÇ-19

Barê tu nikarî rakî nakeve bin. (J15, J29, J34, J48, J52, J126)

GPÇ-20

Bavê te peya kûştin an sîyar kûştin? (J96, J102, J119, J123)

GPÇ-21

Baxê bê gul, gula bê bilbil, wek kirasê bê mil. (J63, J86, J99, J104, J123)

GPÇ-22

Bê te loşî can be. (J49, J52, J64, J75, J87)

GPÇ-23

Behr bi devê kûçikê heram nabe. (J17, J26, J35, J53, J61)

GPÇ-24

Bêna kêz tê mala diz. (J76, J90, J97, J105, J112)

GPÇ-25

Berde bin te ‘erde. (J27, J36, J41, J58, J61)

GPÇ-26

Berf dihele çîya dimîne. (J37, J59, J61)

GPÇ-27

Berf spîye lê se jî li ser dimîze. (J19, J38, J60, J77)

GPÇ-28

Bertîl kevira nerm dike.(J98, J106, J110, J120, J124)

GPÇ-29

Bexa çê kozê de kifşe. (J4, J13, J112)

GPÇ-30

Bexa çê ber kozê da çê ye. (J13, J28, J39, J121)

²⁴ Nezan.

GPÇ-31

Bexa nêr ji bo kêr. (J20, J114, J123)

GPÇ-32

Bi malo bi xalo, bê malo bê xatiro. (J14, J21, J113)

GPÇ-33

Bi pirsê meriv diçe qursê. (J19, J67, J78, J120)

GPÇ-34

Bi xebera xaş, ji qulê derdixê me'rê reş. (J16, J23, J40, J100)

GPÇ-35

Bidê malê xu, berde canê xu. (J20, J93, J102, J126)

GPÇ-36

Bike mînanê şêran buxe mînanê mêran. (J18, J81, J96, J125)

GPÇ-37

Bipirse, netirse. (J15, J97, J112)

GPÇ-38

Bira dilê meriv bi dilbe turê parsê milê merivabe. (J17, J24, J31, J50, J52)

GPÇ-39

Bira hetanê navê meriva derdikeve navka meriva derkeve. (J25, J40, J54, J79)

GPÇ-40

Bira mêtê meriva mêt be, bira meriv ber sêrk²⁵ pêra be. (J30, J41, J60, J62, J77)

GPÇ-41

Bira mêtê meriva mêt be, bira turê parsê mile meriva be. (J27, J32, J42, J57, J70)

GPÇ-42

Bira meriv xulamê zaneyan be, axayê nezanan nebe. (J95, J102, J113, J126)

GPÇ-43

Bira mezinê meriva hebe bira mêtêk be, bi li duwar be. (J54, J70, J85, J100, J109)

GPÇ-44

Bira qîz be bira pîr be, bira rê be bira dur be. (J72, J90, J98, J105, J117, J126)

GPÇ-45

Bira rê be bira dur be, bira bîr be bira kûr be, bira qîz be bira pîr be. (J26, J34, J48)

²⁵ Stêr

GPÇ-46

Bira şîn bikeve mala meriva kîn nekeve mala meriva. (J28, J36, J43, J58, J64)

GPÇ-47

Biratî gotî, kurê kerêfî ne tê da tî. (J73, J89, J104, J120)

GPÇ-48

Birê birê ne, kurê Mistefê ne. (J82, J108, J125, J121)

GPÇ-49

Bire mîlyaket ortêda yek ket. (J84, J106, J114, J126)

GPÇ-50

Bismillah bêje serîda, bila kes ney derîda. (J86, J109, J111, J122)

GPÇ-51

Bistek bavîjine ber lingê Melik. (J43, J88, J123, J125)

GPÇ-52

Bizin çîqa kerr here tekêda jî yê eşkere bizê. (J74, J124)

GPÇ-53

Bizina reş e, hero nexaş e. (J76, J77)

GPÇ-54

Bona nefîsê dikeve hepsê. (J46, J78)

GPÇ-55

Bûka apê kete kapê. (J59, J119)

GPÇ-56

Bûka malê xaş xebitî, ker gireda de'ş filitî. (J53, J63, J66, J68, J75)

GPÇ-57

Bûka metê, bê qîmetê. (J1, J12, J23, J34, J45)

GPÇ-58

Bûka xalê delalîya malê. (J10, J19, J28, J37, J46)

GPÇ-59

Bûka xatîyê sêva qutîyê ye.(J9, J18, J27, J36, J44)

GPÇ-60

Bûkê bêzarê bêzimanê, xasiyê ne dînê ne îmanê. (J2, J13, J24, J35, J47)

GPÇ-61

Bûkek hanî lez û bez, şivika malê dîsa bû ez. (J8, J17, J26, J33, J43)

GPÇ-62

Buxe dew bikeve xew. (J3, J14, J25, J32, J48)

-C-

GPÇ-63

Can çêkerê bêkefenê. (J55, J63, J76, J81, J99)

GPÇ-64

Çavê deriya xulî li seriya. (J51, J69, J72, J85, J92)

GPÇ-65

Çavê li deriyan, xulî li serîyan. (J51, J69, J72, J85, J92)

GPÇ-66

Çêlekeke qûn birêx, navê gundeki xirab dike. (J52, J66, J73, J89, J96)

GPÇ-67

Çi bêjî bejna sîyarê min tê. (J60, J64, J78, J83, J97)

GPÇ-68

Çil bavê çê dajo ser şîrê dê. (J101, J114, J126)

GPÇ-69

Çiqas dûrbî ewqas nûr î. (J109, J116, J121)

GPÇ-70

Cîya meriv hero ranazê kura nayne. (JJ104, J112, J124)

GPÇ-71

Çîyayê bilind bê mij nabe. (J4, J11, J29, J31, J42, J65, J94)

GPÇ-72

Çîyayê bilind bê rê, newalên kûr bê av nabin. (J7, J15, J21, J40)

GPÇ-73

Coto cot bikira yê bavora şow bikira. (J5, J16, J22, J38)

GPÇ-74

Çû seferê hat eynî kerê berê. (J6, J20, J30, J39)

GPÇ-75

Çûme cîkî nenas, min weznê xu da bi xaz bi xaz, xazila li min derketa yekî nas.

(J85)

GPÇ-76

Çûme diziya Asiya, kula min yek bû, bû sisiyan. (J49, J50)

-D-

GPÇ-77

Dayîn goştê canê însîne. (J53, J70, J75, J88, J93, J102, J117, J125)

GPÇ-78

Dengê tulê sa, zikê wî da tê. (J57, J68, J80, J90)

GPÇ-79

Derd derd e, kerê boz e. (J54, J61, J74, J82, J91, J103, J119, J127)

GPÇ-80

Derd derd e, kerê mal e. (J56, J62, J77, J84)

GPÇ-81

Derdê xu bêjî yekî, yê bibe hezarekî. (J79, J89, J98, J105, J111)

GPÇ-82

Destê hêsay ser zikê birçî ye. Merivek nexevite, zikê wî birçî ye. (J86, J100, J106)

GPÇ-83

Destê nanê digîhîje Wanê. (J107, J115, J127)

GPÇ-84

Destê pîs devê xayî ye. (J110, J118, J122)

GPÇ-85

Destê qelişî li ser zikê têr e. (J108, J113, J123)

GPÇ-86

Destê xu ye, rista xu ye. (J110, J120)

GPÇ-87

Dev lê didirîne. (J51, J70, J74, J89, J91, J107, J112)

GPÇ-88

Devê dîza me veneke, serê nan kerneke, têr bûxe şem neke. (J59, J61, J76, J84, J97)

GPÇ-89

Devê hîmê vira be, qûna hîmê tira be, ra lê nabe. (J52, J64, J79, J87, J94, J109)

GPÇ-90

Devê hirçê negîhiştîye şîlanê, gotye çika tirşe. (J60, J62, J78, J95)

GPÇ-91

Devek genî fisek seda. (J58, J63, J80, J85, J92, J110)

GPÇ-92

Dewê ceribandî yê neceribandî çêtir e. (J53, J69, J71, J90, J98)

GPÇ-93

Dewsa şêra ruştiye qundê qira. (J58, J65, J72, J88, J93, J101)

GPÇ-94

Deyndaran xu avîtine pişt xundara. (J1, J11, J30, J32, J49)

GPÇ-95

Di hev serî, nav dîzekê da nakele. (J9, J19, J21, J39, J48, J57)

GPÇ-96

Digo: Çîya, gote wan çîya (J2, J12, J25, J38, J41)

Go: Ka merivê serê wan çîya?

Go: Koçer bûn, hemû dagerîyan²⁶.

GPÇ-97

Dijminê bavê kurêran nabe dost. (J10, J13, J29, J36, J45, J54, J66, J73)

GPÇ-98

Dijminê zane ji dostê nezan çêtir e. (J3, J14, J22, J37, J43, J57, J69)

GPÇ-99

Dîk nebe, sibe nabe? (J8, J15, J23, J128)

GPÇ-100

Dil fireh be, cih teng nabe. (J4, J16, J27, J102, J113, J121)

GPÇ-101

Dilê bitirse singê spî nabîne. (J7, J18, J114, J122)

GPÇ-102

Dîna ne bigîn ne jî berdine ser xu. (J5, J18, J23, J83, J96, J103, J115)

GPÇ-103

Dinê dor bi dor e ne bi zor e. (J17, J24, J49, J55, J67, J98, J104)

GPÇ-104

Dinê milkê bavê ti kesî nîn e. (J28, J34, J44, J68, J77, J81, J100)

GPÇ-105

Diza ji diza dizî, erd û 'esman hev ra lerizî. (J46, J56, J75, J82, J104)

²⁶ Çûn.

GPÇ-106

Diz ji malêbe, ga ji kulekê derdixe. (J73, J86, J105, J116, J123)

GPÇ-107

Dîzê got ez zêrim, hesikê got hero ez nav teda me. (J111, J123, J127)

GPÇ-108

Du sere çê, naçe ser belgîkekê. (J115, J117, J123, J126)

-E-

GPÇ-109

Eger hebû her du destan, eger tinebû berokê bestan. (J118, J120, J125)

GPÇ-110

Ev mesele, bin kumê min de rûnenişt. (J119, J124, J125)

GPÇ-111

Ew meriva, şeytan hewa da n'el dike. (J101, J112, J123)

GPÇ-112

Ez çûme Êgekumetê²⁷ Gûlê! Her sê gira, ewk li min derket mitanê dêlegura. (J21, J34)

GPÇ-113

Ez dibêm hirç, ti dibê rêç. (J5, J12, J29, J37, J43)

GPÇ-114

Ez xewê da me kîrê min xelqê da ye. (J1, J19, J22, J39, J45)

GPÇ-115

Ez zû diçim digihîjime belayê, ez hêdî diçim bela tê digihîje min. (J54, J65, J71, J88)

GPÇ-116

Ezê bibime sorayîya serê keçka dilê xelqê. (J73, J84, J99, J102, J120)

GPÇ-117

Ezê ta di derzîyê re kim, behsa meselê bikim. (J99, J103, J117, J125)

GPÇ-118

‘Ecelê bizênê hatîye çûye nanê şivan xarîye. (J91, J104, J113, J121)

²⁷ Navê gundekî Çaldiranê ye.

-Ê-

GPÇ-119

Êdî sar e, cil star e. (J2, J11, J30, J36, J48)

-F-

GPÇ-120

Filekî xêr, bavekî nexêr çêtir e. (J10, J15, J23, J32, J50)

GPÇ-121

Firîya mirîşkê, heta kadînê ye. (J4, J20, J25, J31, J46)

-G-

GPÇ-122

Ga ji garanê, qamçî ji dêlê, bajo ha bajo. (J6, J13, J24, J33, J42, J109)

GPÇ-123

Gava ‘ereba gah kete herîyê de xuyê ‘erebê gah jîyatîtir dibe. (J7, J14, J27, J35, J44)

GPÇ-124

Gava ga bikeve herîyê, xuyê ga, ga jîhatir dibe. (J3, J16, J26, J31)

GPÇ-125

Gava karê meriva hebe mirov yarê cîya xu ra jî dibêje bavo. (J8, J17, J28, J35, J41)

GPÇ-126

Gava ku Xudê hev hanî nabêje ti kurê kê yî? (J47, J51, J63, J72, J89, J94)

GPÇ-127

Gava mirtif birçî dibin behsa nanê de’wetê dikan. (J9, J18, J40, J52, J61, J77)

GPÇ-128

Gava niçîra min tê tira te’jîya min tê. (J38, J50, J64, J79, J81, J95)

GPÇ-129

Gava pîrê bi dezmêjbe, şevê li mêj pirin. (J40, J47, J53, J66, J74, J122)

GPÇ-130

Gavan ber bi malê be, jina gavan şixulkar dibe. (J57, J62, J76, J85, J93, J127)

GPÇ-131

Gavan ber garanê bizare, xu ye garanê ber garanê bêzare. (J55, J67, J75, J82)

GPÇ-132

Gayê reş nabe spî, gayê spî nabe sor. (J60, J67, J78, J83, J92, J108)

GPÇ-133

Gencekî têxî reşî kal dibe, kalekî jî têxî xaşî yê genç dibe. (J56, J69, J80, J86, J98)

GPÇ-134

Gewrîya qul bê risq nabe. (J58, J70, J87, J90, J96)

GPÇ-135

Golke malê gahê malê natirse. (J110, J116, J124)

GPÇ- 136

Gotina dirêj, meriva dike gêj. (J59, J100, J106, J111, J118)

GPÇ-137

Gotinê mezina nexşê kevirane. (J90, J107, J108, J119)

GPÇ-138

Gula ku zû bibişkive, zû jî diçilmise. (J51, J62, J75, J2, J87)

GPÇ-139

Gur cîhê xu diguhêre lê xuyê xu naguhêre. (J5, J14, J23, J31, J93, J109)

GPÇ-140

Gur hat waran, wey li halê jaran. (J8, J11, J27, J46, J123)

GPÇ-141

Gur hate diyara weylê halê feqîra û jara. (J81, J34, J96, J115, J127)

GPÇ-142

Gur hate nav malan, way li halê feqîr û jaran. (J1, J12, J25, J53, J84, J103)

GPÇ-143

Gurz li lodê, genim li kodê, tiral li odê. (J3, J22, J57, J86, J125)

GPÇ-144

Guyê hişk nerm dikin bi meriva va dikin. (J17, J33, J52, J92, J122)

GPÇ-145

Guyê şîrîkan bi newala da şer e. (Şîrîk li hev hiz nakin) (J4, J13, J32, J63, J80)

-H-

GPÇ-146

Halê hersêka tê mirinê.

GPÇ-147

Hatîye palê, bûye malxê. (J16, J26, J35, J44, J67, J85)

GPÇ-148

Havînê ber sîyê xaş e, çile jî çuwal boş e. (J7, J18, J21, J36, J41, J65)

GPÇ-149

Havînê serê meriva nekele zivistanê qoşxana meriva nakele. (J9, J20, J29, J37, J42)

GPÇ-150

Hê teze hatîye dinyayê, pifdike çirayê. (J19, J28, J39, J73, J97)

GPÇ-151

Hebe ‘Erebîye, tinebe mirtibî ye. (J10, J30, J38, J45, J94, J108)

GPÇ-152

Hebe dikim, tinebe gazî Xudê dikim. (J40, J47, J54, J70, J87, J110)

GPÇ-153

Heçî ne li govendê be, xaş direqise. (J43, J55, J64, J76, J88, J95, J105)

GPÇ-154

Heft klamê hirçê ser sêva tirş e. (J48, J56, J69, J71, J124)

GPÇ-155

Heft zîp²⁸ heft zîrzîp, heft tene heft bertene, heftê dinê bahara meye.

GPÇ-156

Heke hevalê te ker be, bira xebere te nerm be. (J50, J61, J72, J89, J97, J106)

GPÇ-157

Hêkê li paşla xu da dipêjîne. (J49, J58, J66, J98, J107, J116)

GPÇ-158

Hekîm ew e ku li birîna xu bihise. (J59, J68, J74, J83, J99, J104)

GPÇ-159

Hem dêrê bû hem jî mizgeftê. (J77, J90, J100, J120)

GPÇ-160

Hem dize hem topike. (J60, J78, J82, J91, J101, J117)

GPÇ-161

Hemû mêr nabin şêr. (J79, J111, J126)

²⁸ Dilop, teyrok.

GPÇ-162

Henek jin in, hinek jan in henek jî merhema dilan in. (J112, J118, J119)

GPÇ-163

Heq navê Xudê ye. (J114, J121, J124)

GPÇ-164

Her gîha li ser koka xu hêşîn dibe. (J111, J122, J127)

GPÇ-165

Her ketinek rabûnek e. (J32, J54, J75, J86, J107, J123)

GPÇ-166

Her pêxemberî di' a nefsa xu kirîye. (J1, J25, J39, J47, J85, J99, J118)

GPÇ-167

Her tişt xaş e wextê xu da. (J9, J14, J28, J35, J55, J76, J93)

GPÇ-168

Here welatên keran bîne peran. (J2, J11, J23, J36, J102, J113, J124)

GPÇ-169

Herkes bo mirîyê xu digirî. (J3, J15, J34, J53, J92, J126)

GPÇ-170

Herkes kurê bavê xu ye. (J10, J20, J27, J31, J48)

GPÇ-171

Herkes pirs a cîya min dike, lê ti kes pirs a bavê min nake. (J4, J12, J29, J40, J51, J65)

GPÇ-172

Herkes wek şîrê xu. (J71, J83, J95, J106, J114, J126)

GPÇ-173

Hesp tine awir çêdike. (J5, J16, J21, J33, J50, J56, J61)

GPÇ-174

Heta barê kerê giran nebe ker rê da naçe. (J8, J18, J37, J45, J59, J62)

GPÇ-175

Heta mirinê çav li kirine. (J17, J26, J43, J58, J66, J81)

GPÇ-176

Heta xiranebe çênabe. (J6, J19, J22, J38, J46, J112, J125)

GPÇ-177

Hetanî ser serîya neçî qedrê linga nizanî. (J13, J24, J64, J94, J105, J115, J121)

GPÇ-178

Hevalê ketîyan Xudê ye. (J41, J72, J96, J101, J117)

GPÇ-179

Hîm buyan hîm neke, te hîm kir jî bîr neke. (J7, J30, J49, J57, J67, J77, J87, J107)

GPÇ-180

Hinek dikin, hinek jî duxun. (J60, J63, J78, J84, J97, J108, J116)

GPÇ-181

Hûr e, kûr e, dûr e; de were veneke. (J79, J90, J100, J110)

-I-

GPÇ-182

Isa rinde ku dermanê dilê nexaşa ne. (J80, J82, J89, J98)

-J-

GPÇ-183

Ji ‘esla bipirse, ji bê ‘esilan bitirse. (J6, J18, J31, J43, J51, J85, J112, J127)

GPÇ-184

Ji ava nermik bitirse, ava gumrik netirse. (J1, J25, J40, J41, J67, J87, J107, J124)

GPÇ-185

Ji bo nefsê xu davîje hepsê. (J10, J14, J30, J48, J54, J69, J89, J108)

GPÇ-186

Ji dê û bavan hezar cure dikevin. (J4, J11, J22, J36, J69, J73, J74)

GPÇ-187

Ji derva mele ye, ji dil va file ye. (J2, J23, J34, J45, J56, J76, J94, J105, J117)

GPÇ-188

Ji henekan xûn diçe ji henekan jî av diçe. (J9, J16, J29, J32, J42, J52, J63, J72)

GPÇ-189

Ji her qunê nay ser bîst û pênc qram zîv runê. (J5, J15, J26, J37, J46, J57)

GPÇ-190

Ji kera ker çê dibe, ji mêra mêt çêdibe. (J3, J12, J21, J91, J102, J113, J127)

GPÇ-191

Ji mirîyan wetrê meriv hero hewle duxe. (J8, J13, J27, J64, J73, J88, J96, J115)

GPÇ-192

Ji qîza mirtivan xatûn çênabe. (J17, J28, J44, J53, J62)

GPÇ-193

Ji rowî ra gotine bibe mixtarê mirîşka, gotîye wer nebêjin kenê min tê. (J33, J47, J65)

GPÇ-194

Ji welîyan perî, ji perîyan xulî. (J19, J38, J61, J95, J116, J126)

GPÇ-195

Ji wî ‘ewrî baran nabare. (J57, J68, J86, J92, J101, J123)

GPÇ-196

Ji xar ra kemal tune, ji rast ra zewal tine. (J20, J35, J39, J103, J111, J122)

GPÇ-197

Jin bimire mêt jar dibe, mêt bimire jin har dibe. (J71, J82, J103, J104, J114, J125)

GPÇ-198

Jin heye meriva rezîl dike, jin heye meriva wezîr dike. (J42, J55, J75, J97, J106, J118)

GPÇ-199

Jin jin be, bi xulîya sax jî mêtvana rê dike. Lê jin jin nebe nikare îskane av bide meriva. (J83, J98, J109, J120, J121)

GPÇ-200

Jin û mêt tevr û bêr. (J52, J70, J77, J84, J93, J119)

GPÇ-201

Jin û tîcaret mêtantî nîne û hev hatine. (J58, J74, J90, J99, J104, J110)

GPÇ-202

Jin xastin qet, xayî kirin mesele ye; zar kirin qet, xayî kirin mesele ye. (J60, J79, J100)

GPÇ-203

Jina çê para mêtê xirab e. (J49, J50, J59, J66, J70)

GPÇ-204

Jina kenkenok, mêtê gergerok, dara leqleqok. (J5, J9, J15, J22, J30)

GPÇ-205

Jina revandî rûnê helandî. (J10, J17, J24, J31)

GPÇ-206

Jina şêr kîlera têr. (J1, J8, J16, J23, J29)

GPÇ-207

Jineke min heye, mala bavê xwe ye. (J4, J11, J18, J25)

GPÇ-208

Jinikê gotîye ez qîza sê me, jina mêrê çê me. (J2, J3, J12, J19, J26)

-K-

GPÇ-209

Kara reş bela serê kerê ye. (J6, J13, J20, J27)

GPÇ-210

Kê bi malê xu kê bi canê xu. (J7, J14, J21, J28)

GPÇ-211

Kê bûk e, ew berbûk e. (J32, J44, J59, J77)

GPÇ-212

Kê dike, kê duxe. (J34, J41, J53, J69, J77, J97, J106, J118, J125)

GPÇ-213

Kê kir kê ne kir, ya bê dê û bê bav kir. (J31, J42, J67, J83, J102, J127)

GPÇ-214

Kê kir kê xar. (J33, J43, J61, J79, J85)

GPÇ-215

Kê mir qîyamet ser wî da radibe. (J35, J47, J55, J62, J89, J105)

GPÇ-216

Kê neçe şer, şer pê xaş e. (J36, J45, J72, J94, J108, J122)

GPÇ-217

Kê neke laçika jina wî li serê wî be. (J40, J46, J51, J64, J75, J89, J104)

GPÇ-218

Kê tir kir? Ewê be dê û bê bav kir. (J37, J47, J54, J70, J73, J87, J91, J108)

GPÇ-219

Keçelo navê min li te, kumê min li serê te. (J39, J50, J56, J62, J80, J82, J95, J120)

GPÇ-220

Keçka bê dê wek gundekî bê rê, keçka bê bav wek gundekî bê av. (J38, J48, J57,

J65)

GPÇ-221

Kedkira nehêre, kêdxara bihêre. (J43, J66, J76, J84, J93, J110)

GPÇ-222

Kêla zêra xira dibe lê mala mêran xira nabe. (J49, J60, J63, J71, J86)

GPÇ-223

Kenê bê'ara²⁹, têxê qulkê dîwara. (J52, J68, J74, J90, J96, J105)

GPÇ-224

Ker carekî dikeve herîyê. (J78, J85, J88, J92, J103)

GPÇ-225

Ker jî nêr e; dibê meriv mêr be. (J81, J98, J107, J111, J126)

GPÇ-226

Kera ce hev girê nedin, hîmê xuyê hev dibin. (J100, J109, J119, J126)

GPÇ-227

Kera ji wexta herkes nezane. (J99, J112, J113, J124)

GPÇ-228

Kera li ba kera girê nedin hîmê tir û fisê hev dibin. (115, J121, J123)

GPÇ-229

Kerê guhsist tirê şîdyayî dike. (J114, J117, J122)

GPÇ-230

Kerê sist, tirê şîdyayî dike. (J24, J35, J44, J116)

GPÇ-231

Kerê xu rind girêde, cînarê xu diz dernexe. (J8, J28, J39, J66)

GPÇ-232

Kero cêla bero. (J2, J22, J43, J97, J106, J124)

GPÇ-233

Kes nakeve gora kesî. (J5, J15, J30, J47, J79, J94)

GPÇ-234

Kes nikare nesîbê kesî buxe. (J4, J16, J25, J34, J65)

GPÇ-235

Kesê bê kesan Xudê ye. (J7, J19, J21, J70, J93, J104)

²⁹ Kenê vala.

GPÇ-236

Kesê jinê bîne ser jinê xêrê nabîne ji dinê. (J1, J11, J33, J55, J86, J98)

GPÇ-237

Ket xilas dibe, ketik dikeve aravê. (J3, J14, J26, J46, J60, J69, J77)

GPÇ-238

Kevirê havînê bavîjine kadînê. (J10, J17, J23, J31, J42, J58, J67)

GPÇ-239

Kevrê havînê dayne kulînê. (J9, J12, J27, J36, J32)

GPÇ-240

Kevrê Şamiya³⁰eva camiya eva kanîya. (J37, J75, J83, J103, J121, J127)

GPÇ-241

Kinca kete ber pînan, serê kete ber şîretan xêra wan tineye. (J6, J18, J29, J40, J58)

GPÇ-242

Kirasê dexasa qurte. (J74, J82, J119, J126)

GPÇ-243

Kîrê te naçe kite gore. (J72, J81, J95, J101)

GPÇ-244

Ku yekî pîvaz nexaribe bên jê nay. (J53, J76, J87, J98, J125)

GPÇ-245

Ku yekî sîr nexaribe bên jê nay. (J13, J20, J114, J120)

GPÇ-246

Ku fesad nebin, gur û pez tev biçêrin. (J50, J64, J84, J90, J110)

GPÇ-247

Kûçik çi buxe ewî dirî. (J48, J57, J77, J111, J118)

GPÇ-248

Kuma daynin suala lê bikin. (J62, J73, J96, J107, J117)

GPÇ-249

Kur baş e ked boş e. (J51, J63, J102, J105)

GPÇ-250

Kur xayî kirîye bi bistana, xelqê ji lê histandîye bi xeberdana. (J78, J88, J91, J101)

³⁰ Navê gundekî Çaldiranê ye.

GPÇ-251

Kurmanc têt e xew jê ra xêr e. (J80, J89, J100)

GPÇ-252

Kurmê darê ji darê nebe, dar narize. (J99, J109, J112, J113)

GPÇ-253

Kurmê darê ne ji darê be, ‘emrê darê diçe hezar salî. (J85, J92, J113)

GPÇ-254

Kurmê şîrê heta pîrê, kurmê pîrê hatanê mirinê. (J56, J61, J108, J115, J123)

-L-

GPÇ-255

Lê lê qîzê, lê lê qîzê; qîza malanê, heta esrê razanê. (J1, J15, J36, J47, J66, J76, 127)

GPÇ-256

Lepe don li ser dilê xu xe. (J22, J33, J44, J65, J84, J91)

GPÇ-257

Lêv pêşîya dirana tê. (J5, J20, J29, J37, J42, J54, J62, J112)

GPÇ-258

Li cengê pênc şêr, pênc hezar keran çêtir e. (J2, J11, J21, J127)

GPÇ-259

Li serê qijikê qelî çênabe. (J10, J25, J68, J75, J94, J111, J126)

GPÇ-260

Lingê xu wekî bera bavê xu dirêj bike. (J3, J12, J45, J71, J97, J122)

GPÇ-261

Lomekare gunekare. (J9, J17, J26, J34, J54, J63, J80)

-M-

GPÇ-262

Mal hebûnê da mêt, mal tinebûnê da jin kifş dibe. (J4, J16, J23, J39, J41, J52, J96)

GPÇ-263

Mala diz tê bêna kiz. (J27, J38, J41, J82, J104, J125)

GPÇ-264

Mala mêra qûç e mala zêra pûç e. (J6, J13, J24, J31, J67, J83, J92, J113, J124)

GPC-265

Mala meran e kanîya zêran e. (J8, J19, J28, J32, J50, J56, J103, J123)

GPC-266

Mala meriva gora meriva ye. (J18, J30, J35, J43, J55, J116, J121)

GPC-267

Mala têr e kewanî şêr e, mala birçîye kevanî alinci³¹ye. (J7, J36, J45, J51, J74)

GPC-268

Mala zêra xirab dibe lê mala meran xira nabe. (J37, J46, J52, J93, J105, J114, J121)

GPC-269

Malek hebûnê bikeve tinebûnê hetanê çil salî bêna hebûnê lê tê, malek jî tinebûnê bikeve hebûnê hetanê çil salî bêna tinebûnê lê tê. (J40, J47, J59, J64, J71, J95)

GPC-270

Malê axê diçe canê xulîm diçe. (J38, J48, J57, J119)

GPC-271

Malê dinê qirêja destan e. (J49, J53, J61, J70, J90, J98, J101, J110)

GPC-272

Malê helal inda nabe. (J57, J69, J77, J89, J100, J102)

GPC-273

Malê mirova diçe ciheki, îmana meriva diçe hezar cîhî. (J58, J68, J72, J81, J107)

GPC-274

Malê ne kurê qenç ra ne yê xirab ra bike. (J60, J78, J87, J97, J106, J120)

GPC-275

Malxê malê haş gahê xu heye. (J28, J36, J67, J76, J94)

GPC-276

Mal qoçê mêra ne. Malê meriva hebe qoçê meriva heye. Malê meriva tinebe, meriv bê qoç e. (J12, J27, J54, J82, J105, J125)

GPC-277

Me agir bixu berda loda xu. (J1, J19, J30, J48, J55, J73, J86, J104, J123, J127)

³¹ Parsker e.

GPÇ-278

Me kur xayî kirin bi bistana, xelqê ji me histan bi navrana. (J10, J16, J56, J74, J93)

GPÇ-279

Me' r çend xar here jî rast diçe konê. (J13, J22, J41, J53, J69, J77, J95, J114)

GPÇ-280

Me' r çiqas pungê aciz e, pung devê qula wî da hêşîn dibe. (J5, J14, J24, J40, J58, J70)

GPÇ-281

Mekan xaş e bi mekîna va. (J2, J17, J88, J100, J109, J126)

GPÇ-282

Melîk yek e, zêr ê tek e; çû Kanî Spi³² para veke. (J9, J15, J26, J35, J43, J68, J85)

GPÇ-283

Menfî'et bira hev dide kuştin. (J11, J32, J49, J57, J75, J103, J124)

GPÇ-284

Mêr bi jinê, jin bi zêr, zêr jî bi agir dihele. (J8, J46, J65, J84, J92, J116, J122)

GPÇ-285

Mêr bibîne bêkes jar dibe, jin bibîne bêkes har dibe. (J7, J25, J45, J64, J87, J96, J108)

GPÇ-286

Mêr dimre nav dimîne, ga dimre çerm dimîne. (J23, J47, J63, J79, J90, J110, J119)

GPÇ-287

Mêr kuştin nerm e nerm, qîz xastin germ e germ. (J3, J18, J29, J33, J42, J80, J89, J97)

GPÇ-288

Mêr mêra nasdikin, jin camêra şaş dikin. (J6, J20, J37, J91, J106, J121)

GPÇ-289

Mêr şemsîya ser serê jina ye. (J21, J50, J59, J78, J99, J107, J120)

GPÇ-290

Mêra mêr dikuşt jina Qol Beko³³ hûr û rovî dişûşt. (J4, J31, J52, J70, J83, J121)

³² Navê cihekî Çaldiranê ye.

³³ Navê mirovekî Çaldiranê ye.

GPÇ-291

Mişkê terazînê³⁴,
berxê ber bizine,
mêrê xebera jinê,
halê hersêka tê mirinê. (J9)

GPÇ-292

Mêrek hat li derda, qûnek ranebû li berda. (J37, J60, J61, J72, J98, J112)

GPÇ-293

Mêrik menî jina xu girtîye gotîye ti ar eleng dikî qûna te diheje. (J66, J71, J102, J113)

GPÇ-294

Meriv arê têra ra dayne têr e, meriv arê birçîya dayne birçî ye. (Birçî birçî ne, têr têr in.) (J38, J39, J117, J118)

GPÇ-295

Meriv bi desta bişqite xu digire, meriv bi linga bişqite xu digire, lê meriv deva bişqite xu nagire. (J3, J20, J39, J76, J105, J114, J127)

GPÇ-296

Meriv bira kûçik bibe, bira biçûk nebe. (J10, J19, J27, J34, J53, J115, J126)

GPÇ-297

Meriv bira kûçik bibe, bira kevanî nebe. (J8, J16, J25, J32, J75, J94, J125)

GPÇ-298

Meriv heta li ser serî neçe qedrê linga nizane. (J12, J21, J47, J65, J80, J91, J124)

GPÇ-299

Meriv hetanî axayê nezana dibe, bira meriv xulamê zana be. (J1, J13, J35, J48, J58)

GPÇ-300

Meriv jin be li ser guyê xu be, ew were meriv ranabe. (J11, J23, J38, J46, J54)

GPÇ-301

Meriv mecbur be goştê mirîşka jî duxe. (J18, J26, J37, J50, J63, J77, J89, J100)

GPÇ-302

Merivek ça gahekî qert bide rex golikekî. (J2, J14, J30, J33, J42, J73, J90)

³⁴ Cîyê şil.

GPÇ-303

Mervê dîn, yan şîna da yan jî şahîya da kifş dibin. (J9, J15, J24, J43, J52, J71)

GPÇ-304

Mervê lal jê naka sual. (J4, J17, J29, J31, J49, J57, J61)

GPÇ-305

Mêvan mêvana aciz e, xuyê malê hemûka aciz e. (J28, J82, J95, J107, J111, J123)

GPÇ-306

Mêvan mêvanê Xudê ye. (J5, J22, J40, J96, J110, J120, J122)

GPÇ-307

Mezina ra mezin gotî, piçuka ra piçuk gotî. (J36, J45, J60, J62, J79, J84, J111)

GPÇ-308

Mîh bi pê xu, bizin bi pîyê xu herkes diçe li ser ‘emelê xu. (J6, J41, J59, J64, J72, J83)

GPÇ-309

Mîha gişte, beran pişte. (J66, J85, J97, J119)

GPÇ-310

Mila donke, Meta Xecê lêke meta Cecê demke. (J55, J86, J98, J108, J113, J121)

GPÇ-311

Min çi ji xêr kayê dîtye, lê kozê jî bibinim. (J67, J78, J87, J92, J103, J116)

GPÇ-312

Min emenî birî, êşa serê Nazê³⁵ firî. (J68, J99, J101, J115)

GPÇ-313

Min kumê xu xulî va daye serê xu. (J51, J69, J104, J119)

GPÇ-314

Min, bûkek hanî lez bilez, sifrika malê dîsa bû ez dîsa bû ez. (J70, J81, J88, J102, J118)

GPÇ-315

Mirazê bê dil mîna gayê bê cil. (J3, J19, J26, J35, J56, J70, J84, J100)

GPÇ-316

Mirazê bê dil mîna kirasê bê mil. (J18, J22, J37, J45, J52, J89, J95, J104, J127)

³⁵ Nazê li gundê Bêşiyê ku girêdayê Çaldiranê ye bûkeke navdar e.

GPÇ-317

Mirî mirî be, gor lê teng nabe. (J5, J20, J36, J43, J59, J66)

GPÇ-318

Mirî mirî be mirîşo buxu tê. (J11, J23, J40, J49, J63, J75, J96, J114, J126)

GPÇ-319

Mirin hespê boz e, li derê mala her kesî ye. (J1, J13, J27, J48, J106, J125)

GPÇ-320

Mirîşk radizê di xewna xuda qut dibîne. (J12, J29, J47, J53, J69, J76, J86, J93, J117)

GPÇ-321

Mirîşka reşe, her roj nexaşe. (J4, J17, J33, J42, J65)

GPÇ-322

Mirîşkê feqîra yeko yeko hêk dike. (J15, J34, J50, J54, J68, J85)

-N-

GPÇ-323

Namus xaş e lê destê bênamûsa dane. (J6, J16, J30, J44, J51, J64, J72, J81, J94, J113)

GPÇ-324

Nan jî bi rû tê xarin. (J21, J32, J60, J74, J83, J92, J110, J118, J123)

GPÇ-325

Nanê bêxoy duxe, tirê şor dike. (J10, J25, J31, J58, J77, J90)

GPÇ-326

Nanê mêran li ser meran deyn e. (J9, J38, J46, J55, J62, J79)

GPÇ-327

Nanê xu bide nan pêja bira nanekî te zêde here. (J7, J61, J87, J102, J112, J123)

GPÇ-328

Navê giran e, şehre wêrane. (J39, J78, J91, J112, J122)

GPÇ-329

Navê giran gundê wêran. (J8, J34, J57, J101, J103)

GPÇ-330

Navê gur derketiye, rovî gund xirab kirîye. (J107, J109, J120, J121)

GPÇ-331

Navê rûşvet kirîye bexşîş, yê terakin şîş. (J105, J111, J116, J120)

GPÇ-332

Ne xate ne fate, her serî li hev berbat e. (J11, J34, J56, J70, J89)

GPÇ-333

Ne yê şîna ye ne jî yê şahîya ye. (J10, J17, J26, J36)

GPÇ-334

Nêçîra min tê guyê tejîya min tê. (J7, J16, J25, J40, J53, J69, J74, J83)

GPÇ-335

Nêvan nêvana aciz e xuyê malê hemûka acize. (J1, J14, J94, J105, J113, J127)

GPÇ-336

Nexaşiyate li ser gunde an ya bin gund e? (J27, J38, J67, J83, J117)

GPÇ-337

Neyarê bava nabe dostê lava. (J9, J12, J44, J63, J85, J102)

GPÇ-338

Nîskê neke gîsk. (J3, J15, J30, J46, J65, J87, J108)

GPÇ-339

Nivîştî bêtîşt, xuyê xu kuşt. (J23, J42, J77, J98, J115, J126)

GPÇ-340

Nîyeta dil, qeda serî ye. (J19, J22, J45, J68, J100, J103)

-P-

GPÇ-341

Pê xu da li ser hêlûna mer. (J8, J20, J33, J50, J64)

GPÇ-342

Perçe nema li sûka, şerm nema li bûka, xew nema li biçûka. (J55, J75, J95, J104, J114)

GPÇ-343

Pêşîyê bipêje paşê birêje. (J2, J13, J37, J96, J106, J119, J125)

GPÇ-344

Pêşîyê buxe paşê bişikîrîne. (J21, J35, J43, J60, J82, J97, J109, J120)

GPÇ-345

Pêşkoçî hatin bi me qaîl nebûn, paşkoçî jî hatine îja ez li wan qaîl nabim. (J4, J18, J29)

GPÇ-346

Pîrê bahar nedikir mêr bike, mêr kir de'wa mala Heştteka kir. (J62, J89, J107, J116)

GPÇ-347

Pîrê nerind kir li ser gonîda rît, ne gonî rind kir quna pîrê re çu. (J5, J24, J52, J66, J76)

GPÇ-348

Pişik ne li mal e, hola hola mişkê ye. (J28, J35, J54, J72, J92, J112)

GPÇ-349

Piştî tengasîyê fireqatîye³⁶. (J6, J31, J47, J58, J79)

GPÇ-350

Piştî tirê kezî kurê. (J41, J57, J78, J88)

-Q-

GPÇ-351

Qam qama gamêşê ye, aqil aqlê kerrmêşê ye. (J32, J51, J73, J93, J123)

GPÇ-352

Qam qama mêşê ye, deng dengê gamêşê ye. (J48, J61, J90, J99, J118, J122)

GPÇ-353

Qelenê wî da bire pez, (J49, J71, J84, J101, J111, J121)

GPÇ-354

Qelp³⁷ bi kisê xu, saf bi kîsê Xudê duxe. (J80, J91, J110, J122)

GPÇ-355

Qencî dibe gincî. (J39, J59, J81)

GPÇ-356

Qirasê bedena xu ra jî rê naçe. (J8, J19, J30, J44, J55, J66)

GPÇ-357

Qîz xastin nerme nerm, mêr kuştin germe germ. (J77, J88, J99, J110)

³⁶ Rehetî, firehî.

³⁷ Dexes.

GPÇ-358

Qîzê zengîna xastina wan zor e, xayîkirina wan rehet e; qîzê feqîran xastina wan rehet e, lê xayîkirina wan zor e. (J33, J42, J51, J72, J83, J94)

GPÇ-359

Quna go ezê birîm, yê birî. (J104, J115, J126)

GPÇ-360

Quna pîs ti carî bêna xaş lê nay. (J53, J64, J75, J86)

-R-

GPÇ-361

Rê dibe bihistek neyar nabe dostek. (J1, J12, J23, J34)

GPÇ-362

Rind buna jinê, bela serê jinê ye. (J15, J26, J37, J48, J59, J70)

GPÇ-363

Roja teng meriv yarê cîya xu ra jî dibêje bavo. (J2, J13, J24, J35, J46, J57, J68, J79)

GPÇ-364

Roja xaş hema serê sibê da xaş e. (J10, J20, J30, J40, J93, J114, J127)

GPÇ-365

Rovî neçû kûlê bi xu ra hêjek jî çekiriye. (J3, J14, J25, J36, J47, J60)

GPÇ-366

Rut bi qaputin.

GPÇ-367

Ruto ha valî avê ha walî avê. (J9, J20, J29, J113, J125)

-S-

GPÇ-368

Sal bi sal heft xazî bi sala par. (J7, J17, J29, J39, J50, J52)

GPÇ-369

Sal bi sal xazî bi par. (J92, J103, J117, J125)

GPÇ-370

Sare cilik star e, germe cilik şerm e. (J71, J82, J95, J106, J118, J124)

GPÇ-371

Se, hare bendik ber e. (J4, J16, J27, J38, J45, J56, J65, J96)

GPÇ-372

Sed bavê çê îlla şîrê dê. (J11, J28, J38, J58, J80, J121)

GPÇ-373

Selam bûne tutik bûk bûne şûtik ard bûye tûyik. (J5, J18, J21, J32, J43, J62, J73, J122)

GPÇ-374

Ser sî û sê bizmara direqise. (J6, J31, J41, J67, J78, J90)

GPÇ-375

Serê du berana naçe beroşkekî. (J54, J69, J86, J97, J108, J123)

GPÇ-376

Serê du berana nava dîzekî da nakele. (J61, J74, J84, J107, J120)

GPÇ-377

Serê keçel xaş e bin kumda. (J81, J98, J109, J111, J117)

GPÇ-378

Serê lodê girt. (J91, J102, J112)

GPÇ-379

Serê neyşe çi hewcê bendike. (J76, J87, J100, J105, J116)

GPÇ-380

Serê qûnê yekê bêşe. (J63, J101)

GPÇ-381

Serî çiqas bimîne wê qunê gelek 'ecêban bibîne. (J7, J16, J25, J34, J102, J114)

GPÇ-382

Serî hebin kum zehf in. (J11, J29, J37, J55, J73, J89, J97, J106, J127)

GPÇ-383

Serî qûç e, binî pûç e. (J1, J26, J45, J127)

GPÇ-384

Serî qûnê yekî bêşe. (J10, J19, J32, J63)

GPÇ-385

Serî sed newalî newalek e, serê sed xeberî xeberek e. (J54, J69, J77, J82, J99, J118)

GPÇ-386

Serî zêr be jî quna wî guye. (J2, J13, J84, J100, J104, J126)

GPÇ-387

Sêva çê para hirçê ye. (J17, J22, J44, J66, J79, J85, J93, J109, J121)

GPÇ-388

Sexte bime rex te. (J9, J14, J94, J103, J112, J125)

GPÇ-389

Siba xêr, serê sêrîda xêr e. (J53, J64, J76, J95, J115)

GPÇ-390

Sîrek lêxe heft pîvaza xilas nabî. (J3, J12, J23, J31, J49, J56, J70)

GPÇ-391

Sor e, gir e; ne barbir e. (Yanê kêrê pênc qurîşa nay.) (J15, J24, J39, J47, J59, J67)

GPÇ-392

Sozê mêra soz e, ne tira kerê boz e. (J4, J18, J27, J36, J43)

-Ş-

GPÇ-393

Şam şeker e, welat şîrîntir e. (J5, J21, J39, J46, J57)

GPÇ-394

Şaristanê tê dîtin, goristanê nay dîtin. (J41, J52, J71, J92, J113, J124)

GPÇ-395

Şerm nema li bûkan, perçe naman li sukan, xew nema li piçûkan. (J40, J42, J58,

J61)

GPÇ-396

Şev yek e, diz hezarek e. (J48, J50, J65, J72, J91, J117, J123)

GPÇ-397

Şêr bi lepê xu mêr bi destê xu. (J51, J60, J68, J74, J96, J108, J111, J122)

GPÇ-398

Şêr şêr e, çi jîne çi mêr e. (J75, J88, J98, J101, J116)

GPÇ-399

Şixulkarê xu be, şîrînê xelqê be. (J80, J83, J105, J119)

GPÇ-400

Şîr şeker qayîl nebûye. (J81, J90, J110, J119)

GPÇ-401

Şîreta bûka malê, kîrê kerê sist e. (J1, J7, J13, J19, J25)

GPÇ-402

Şîretê bûkê quzê tutikê. (J4, J12, J20, J28)

GPÇ-403

Sîyarbûna kerê ‘eybek be, lê peyabûn du ‘eybe. (J11, J18, J27, J30)

GPÇ-404

Şox û şeng e bi nav û deng e. (J2, J8, J14, J26, J31)

-T-

GPÇ-405

Te girt bernede te berda pey nekeve. (J5, J15, J23, J29)

GPÇ-406

Te hê çevê zoq dêla rep da nedîtîye. (J3, J9, J16, J22)

GPÇ-407

Te ra guz naye parve kirin. (J6, J10, J17, J21, J24)

GPÇ-408

Te tir kir, çu xura ti ma mera. (J32, J43, J57, J68, J73, J89, J91, J103, J114, J127)

GPÇ-409

Têjikê gura nabin bira. (J40, J52, J69, J71, J87, J100, J108, J111, J121)

GPÇ-410

Têjikê me’ra bê jerî nabin. (J35, J47, J51, J65, J79, J126)

GPÇ-411

Tendûr bi tirek û fisekî germ nabe. (J39, J41, J54, J74, J92, J104, 119)

GPÇ-412

Teptepê³⁸ lê neke reprepe. (J33, J53, J83, J99, J107, J121)

GPÇ-413

Teze hatin kevn xelatin. (J38, J42, J60, J85, J93, J115, J125)

GPÇ-414

‘Te’ tê³⁹ te têda rît, baranê şuşt. (J34, J46, J59, J75, J81, J105, J113)

GPÇ-415

Ti behsa kê bikî ya ber derîye yan jî pişt derîye. (J44, J63, J82, J95, J102, J117)

³⁸ Navê nanekî ye.

³⁹ Kevirekî şimşat û dûz e.

GPÇ-416

Ti bûyî mîr Xudê neke bîr. (J36, J45, J64, J72, J86, J110, J112, J124)

GPÇ-417

Ti herî ji wî mekanî, carke dine ti bizivirî werî, nabînî wî dem û dezhahî. (J37, J48)

GPÇ-418

Ti li se wî guhê ranezê. (J49, J55, J61, J77, J94, J106, J116, J123)

GPÇ-419

Ti min bixurînî ezê te balasim. (J56, J67, J76, J96, J101)

GPÇ-420

Ti serê jorê rûniştî, serê jêrê xeber nede. (J50, J70, J80, J98)

GPÇ-421

Ti wî quşê naçî Muşê. (J62, J78, J84, J122)

GPÇ-422

Tireka ra tavehîv nava rojê yê. (J58, J66, J88, J90, J97, J118, J120)

GPÇ-423

Tiştta çû nede dû. (J7, J16, J25, J36, J47, J52)

GPÇ-424

Tiştê dest dike dê û bav nake. (J63, J85, J96, J108, J119, J127)

GPÇ-425

Tîtê mira bûye beytar. (J11, J22, J40, J45, J49, J55, J64)

GPÇ-426

Toximê baş biçîne derdê nan nekşîne. (J20, J28, J37, J42, J54, J77, J100)

-U-

GPÇ-427

Usta necar, razê wekî her car; Xudê yek e, dergâh hezar. (J8, J12, J24, J51, J95)

-V-

GPÇ-428

Vir nabin kavir. (J19, J30, J62, J83, J106, J117, J126)

GPÇ-429

Vir, bin sîya bişkulê ye. (J1, J23, J57, J82, J103, J114, J125)

-W-

GPÇ-430

Weqtê nîçîra min tê guyê tejîya min tê. (J13, J29, J43, J60, J73, J91, J107, J121)

GPÇ-431

Werdekê go ezê mîna qazê rê da herim, rê da çûyîna xu jî bîr kir. (J9, J14, J26, J35)

-X-

GPÇ-432

Xaîn kîsê xu duxe. (J2, J31, J59, J65, J84, J93, J105)

GPÇ-433

Xal xarzîya radikin, ap birazîya dadikin. (J10, J15, J21, J32, J69, J86, J102, J113)

GPÇ-434

Xalê meriva cedê merivan e. (J3, J17, J27, J53, J72, J92, J104, J115, J124)

GPÇ-435

Xalê min roda çû benîştê min dêvda çu. (J18, J33, J41, J56, J61, J71)

GPÇ-436

Xamûr⁴⁰bibe qeza, Cimşo bibe ‘eza delîl halê me yê belengaza. (J4, J34, J44, J58)

GPÇ-437

Xandin zêrê zer e. (J38, J45, J67, J78, J87, J99, J109)

GPÇ-438

Xasîyê bêzarê bêzimanê, bûkê nedînê ne îmanê. (J6, J48, J70, J81, J97, J101)

GPÇ-439

Xastiya gavan siyarbûna kerê ye. (J39, J50, J88, J111, J123)

GPÇ-440

Xazî bi aqîlê paşî. (J5, J46, J68, J75, J89, J98, J112)

GPÇ-441

Xecê lêke, cecê demke. (J66, J76, J90, J94, J110, J116)

GPÇ-442

Xelqê xerîb, kevrê qunê ye. (J74, J79, J80, J120, J122)

⁴⁰Navê navçeyê Agirîyê ye.

GPÇ-443

Xêra çavê rastê ji çavê çepê ra tineye. (J12, J23, J72, J95, J101, J125)

GPÇ-444

Xêra xu dike, pişikê xu pey dixê. (J10, J16, J30, J37, J53, J68, J115)

GPÇ-445

Xeta xar di bin gayê pîr da ne. (J7, J11, J22, J39, J41, J74, J92, J103)

GPÇ-446

Xeta xu rast bike, karê xu xilas bike. (J14, J45, J64, J85, J104, J127)

GPÇ-447

Xew û mirin yek in. (J1, J20, J34, J42, J112, J121)

GPÇ-448

Xewa mirîya tê lê xewa birçîya nayê. (J9, J19, J31, J52, J87, J106, J118, J125)

GPÇ-449

Xirabîyê herkes dikare bike lê herkes nikare qencîyê bike. (J2, J13, J51, J83, J102)

GPÇ-450

Xiyar e, lê tutika wî dîyar e. (J29, J39, J47, J73, J94, J112)

GPÇ-451

Xudê ‘emrê meriva çend sala bide ser aqlê meriva. (J3, J15, J27, J57, J65, J96)

GPÇ-452

Xudê ahê bizina kol ji bizina kel ra nahêle. (J17, J24, J33, J82, J93)

GPÇ-453

Xudê ahê kesî kesîra nahêle. (J8, J25, J44, J63, J75, J84, J113)

GPÇ-454

Xudê çîya dibîne berfê lê dibarîne. (J4, J18, J26, J32, J61, J91, J124)

GPÇ-455

Xudê derîkî digre derîkî dinê vedike. (J21, J62, J81, J114, J123)

GPÇ-456

Xudê goşt dide yê bê dirana. (J5, J35, J46, J56, J99, J108, J117)

GPÇ-457

Xudê gotîye ji te hereket ji min bereket. (J28, J36, J54, J71, J86, J105, J122)

GPÇ-458

Xudê sola min danîye. (J6, J38, J49, J60, J66, J111)

GPÇ-459

Xudê yê bin rê ser rê nexê, yê ûstê rê jî bin rê nexê. (J40, J48, J58, J67, J76, J116)

GPÇ-460

Xulîya mala meriva, ji qelîya xelqê çêtir e. (J50, J59, J70, J80, J97, J107, J119)

GPÇ-461

Xulîya welî, welîya xulî dikeve. (J69, J77, J89, J98, J99, J109)

GPÇ-462

Xut barada mezin dibin. (J78, J88, J100, J110, J120)

GPÇ-463

Xuyê fis xu dihise. (J79, J90)

GPÇ-464

Xuyê fisê xu zû dihise. (J14, J21, J45, J54, J67, J76, J90)

-Y-

GPÇ-465

Ya ku dest dike, dê û bav nake. (J9, J18, J26, J35, J59, J82, J93)

GPÇ-466

Ya şemî ya te'mî her sal bixun vî te'mî. (J41, J52, J74, J105, J114, J127)

GPÇ-467

Yan xew yan jî kew. (J1, J12, J24, J49, J84, J112, J121)

GPÇ-468

Yê bikeve govendê xu dihejîne. (J11, J28, J37, J62, J73, J102, J126)

GPÇ-469

Yê hur kirîye dizane çi hur kirîye lê yê duxe nizane çi duxe. (J10, J22, J39, J56, J75)

GPÇ-470

Yê ku dizane şixu dizane, yê ku nizane baxê niskane. (J19, J23, J95, J101, J117)

GPÇ-471

Yê me gûz e direqise, ye millet ar e ditepise. (J3, J16, J34, J72, J94, J108, J115)

GPÇ-472

Yê mesiyar bigre qûna wî şil dibe. (J5, J20, J33, J68, J86, J103, J125)

GPÇ-473

Yê nebêje bike şêr e, yê bêje bike mêr e, yê bêje neke kerê nêr e. (J15, J29, J32, J64)

GPÇ-474

Yê neçe şer, şer jê ra xaş e. (J6, J13, J25, J36, J47, J66, J85)

GPÇ-475

Yê xarî nizane çi xariye, lê yê hûr kirîye dizane çi hûr kiriye. (J17, J42, J71, J106)

GPÇ-476

Yê zane zane ye, yê nizane re baxê nîsk e. (J27, J31, J44, J53, J81, J97, J112)

GPÇ-477

Yek ça li ber meriva bisekine bê ez jina tenim. (J7, J30, J38, J46, J55, J63, J83, J124)

GPÇ-478

Yek mirinê yek pêva kirine ye. (J40, J48, J57, J61, J96, J104)

-Z-

GPÇ-479

Zikê Kurmanc têr e, xew jê ra xêre. (J8, J50, J69, J77, J91, J119, J123)

GPÇ-480

Zikê têr haj li zikê birçî tine. (J51, J70, J78, J89, J98, J107, J113, J122)

GPÇ-481

Zikê têr o, milo şêr o. (J60, J79, J87, J99, J109, J116)

GPÇ-482

Ziman îman ka guman? (J80, J88, J100, J110, J118, J120)

GPÇ-483

Zor bi kerê bikeve ji hespê zehftir banz dide. (J90, J103, J112, J127)

GPÇ-484

Zor gizêrê radike. (J15, J24, J47, J51, J69, J76, J104, J121)

GPÇ-485

Zor; meriv, ser bîst pênc teref zîv rûnê. (J1, J12, J62, J83, J101, J115, J126)

Me di nefîceya vekolîna xwe de çarsed û heştê û penç gotinên pêşîyan berav kirîye. Em dibinin ku di nav gotinên pêşîyan de gelek mijarên cuda derdikeve pêşîya me. Em li gorî van gotinên pêşîyan dikarin li ser navçeya Çaldiranê gelek agahî bidest bixin. Dema

ku em bala xwe didin gotinên jorê em van mijaran dibînin: Nesîhet (GPC19, GPC27, GPC29, GPC30, GPC31, GPC34, GPC120, GPC446) navbera jin û mêrê (GPC16, GPC198, GPC199, GPC200, GPC201, GPC203, GPC204, GPC205, GPC206, GPC207, GPC208, GPC209, GPC238) têkilîya jin û mêrê (GPC162, GPC264, GPC286, GPC287) têkilîyên civakê (GPC10, GPC11, GPC12, GPC33, GPC35, GPC37, GPC42, GPC98, GPC126, GPC156, GPC202, GPC329, GPC439, GPC458, GPC473) hereketên demsalîyê (GPC1, GPC26, GPC119, GPC155, GPC240, GPC241, GPC372), ehemmiyeta eşqê û bextewariya eşqê (GPC38, GPC40, GPC116, GPC317, GPC318) zanîn û aqilbûn (GPC3, GPC4, GPC33, GPC37, GPC42, GPC56, GPC98, GPC156, GPC168, GPC329, GPC243, GPC250, GPC260, GPC353, GPC354, GPC439, GPC442, GPC453) hevaltîya saxlem û camêrtî (GPC22, GPC47) navbera bûk û xasî (GPC55, GPC56, GPC57, GPC58, GPC59, GPC60, GPC61, GPC314, GPC316, GPC403, GPC404, GPC440) giringîya qîz xastinê, qedir girtina dê û bav, netirsîna rizqê (GPC14, GPC134, GPC236) girîngîya xebatê (GPC36, GPC82, GPC83, GPC85, GPC86, GPC148, GPC149, GPC399, GPC401, GPC459, GPC469, GPC471, G477) jîyana xerîbîyê, îftira avêtin, bext û bextewariyê, têkilîyan eqrebatîyê (GPC135, GPC145, GPC259)‘egîtbûn (GPC87, GPC101, GPC161, GPC170, GPC224, GPC266, G267, GPC270, GPC284, GPC288, GPC328, G394, GPC426, GPC451, GPC475) çav birçîbûn (GPC64, GPC65, GPC175) hîmê beleşbûnê (GPC122, GPC214, GPC216, GPC223, GPC251, GPC276) kemasîya zeman (GPC128, GPC130, GPC138, GPC167, GPC173, GPC174, GPC336, GPC345, GPC346, GPC347, G351, GPC432, GPC464, G468, G485, GPC486) ‘esaletbûn (GPC164, GPC172, GPC184, GPC193, GPC210, GPC227, GPC249, GPC261, GPC271, GPC296, GPC374) bêşansî (GPC39, GPC70, GPC140, GPC141, GPC142, GPC142, GPC211, GPC215, GPC217, GPC220, GPC222, GPC239, GPC325, GPC332, GPC343) bêhedî (GPC147, GPC150, GPC221, GPC231, GPC232, GPC262, GPC327, GPC348, GPC349, GPC367, GPC368, GPC369, GPC373, GPC380, GPC413, GPC414) zirara nefîsê (GPC54, GPC166, GPC169, GPC186, GPC235)

Ji ber ku jiyan û aboriya Çaldiranîyan li ser cotkarî û heyvankariyê ye, ev mijar jî di gelek gotinên pêşîyan de xwe nîşan dide. Xwedîbûna mêrê qenc û rind, nîşandana rê û rism û têkilîya mezin û biçûk jî tê xuya.

Di dawîyê de em dikarin bejin ku di navçeya Çaldiranê de bikaranîna gotinên pêşîyan rê û rîsmên Çaldiranîyan nîşan dide. Bi rastî wek avê mirov bifikire, çî di bin avê

de hebe derdikeve li ser rûyê avê. Em dikarin gotinên pêşîyan wiha jî binirxînin: Di nava çanda devkî ya gel de çî hebe ev tê ser ziman.

Gelê Çaldiranê gelek car di nav xeberdana xwe de gotinên pêşîyan bikartînin. Çaldiranî gava behsa meseleyekî bikin an jî di derheqê meseleyekî de biaxivin gotinên pêşîyan bikartînin. Heta di nav Çaldiranîyan de ji bo gotinên pêşîyan gotinekî wiha heye: “Mezînan ji biçûka re tişte nehîştîye.” Ev gotin bi formeke wiha jî tê gotin: “Pêşîya tişte paşîya re nehîştîye.”

2.1.2. Biwêj

Biwêj wekî gotinên pêşîyan, ji gotinên qalip pêk tên û herî kêr ji du peyvên ava dibin. Biwêj bi gelemperî gotinên mecazî ne.

Li gorî Erman Artun çar taybetîyên bingehîn yê biwêjan hene.

1. Herî kêr ji du peyvên çêdibin.
2. Ew peyvên ku di biwêjan de hatine bikaranîn bi piranî mecazî ne.
3. Biwêj qalibên taybet in ku me'neya têgîhan rewe dikin.
4. Biwêj mîna gotinên pêşîyan gotinên qalib in⁴¹.

Mehmet Oncu jî li ser terîfa biwêjan dibêje ku: Di zimanê Kurdî de komên peyvên ên teşe û qalip girtî, ku bi gelemperî xwedî wateyeke ji vegotina rast cuda ne biwêj tê gotin. Biwêjên Kurdî herî kêr ji du peyvên pêk tên û xwedî vegotîneke dewlemend in⁴².

Mehmet Oncu dibêje ku taybetîyên biwêjan neh heb in.

1. Peyvên qalip û teşe girtî ne, mirov nikare cihê peyvên biwêjan biguherîne.
2. Dema ku peyvên biwêjê tên gel hev bi gelemperî li şûna wateya rast, wateyeke mecazî didin xuyanê.
3. Biwêj, vegotinên kurt û bi kakil dihêwirînin.
4. Biwêj herî kêr ji du peyvên pêk tên, hinekên wan ji koma peyvên, hinekên wan jî wekî hevokan teşe girtine.
5. Ji ber ku gelekên wan mesder in, wekî kişandina lêkeran e.
6. Gelek biwêj bi şibandî û huner peyvê xemilîne ji bo derxistina holê ya vegotîneke zindî û bedew. Ji ber wê biwêj ne rêbazên gelemperî ne, bi vê yekê jî cudahîyê dixin navbera xwe û gotinên pêşîyan.

⁴¹ Erman Artun, *Ansiklopedik Halk Bilimi / Halk Edebiyatı Sözlüğü*, Karahan Kitapevi, Adana, 2014, s. 141-142

⁴² Mehmet Oncu, *101 Biwêj Çîrok*, weş. Avesta, İstanbul, 2015, s. 13

7. Hin peyvên şibandî wekî ku ne biwêj in wekî biwêjan tèn bikaranîn.

8. Carinan hin peyvên ku li pey hev in û li hev tèn hene ku ew jî bi şiklê biwêjan tèn bikaranîn.

9. Ew biwêjên ku rasterast malê gel in û ji hêza peyvên gel tèn, hin îstîsna ne tê de, bi wateya mecaz tèn bikaranîn⁴³.

Em di navçeya Çaldiranê de gihîştine sî û pênc biwêjan. Lê nayê gotin ku di navçeya Çaldiranê de ev qas biwêj hene. Em bawer dikin ku gelek biwêj hem li Çaldiranê hem jî di nav Kurdan de hê wek xezîneyan weşartî ne. Me li jêrê biwêjên ji navçeya Çaldiranê wiha rêz kirîye.

Biwêjên me ji navçeya Çaldiranê tespît kirine:

-B-

BÇ-1

Binê kumê min da rûnenişt. (J3, J18, J27, J31, J45, J60, J63, J125)

BÇ-2

Bûne bendikê solê xelqê. (J19, J28, J32, J48, J54, J72, J94)

BÇ-3

Bûye cil şil ketîye histîyê meriva. (J2, J11, J22, J53, J74, J117, J124)

-C-

BÇ-4

Cinet ji cihenem jî mala merivada ne. (J21, J43, J92, J105,123)

-Ç-

BÇ-5

Ça durê xu dirî. (J10, J13, J29, J40, J75, J88, J110, J111)

BÇ-6

Çi dikê kêfa sey pîr dike. (J4, J42, J78, J96, J106, J122)

BÇ-7

Çi te veşêrim, çi Xudê veşêrim. (J16, J26, J41, J67, J80, J102, J113, J120)

BÇ-8

Çingînî êdî tasê hat. (J5, J14, J36, J50, J71, J84, J95, J107)

⁴³ Oncu, **h.b.**, r.13-14-15

-D-

BÇ-9

Destê xu lê bişû! (J6, J8, J10, 85)

BÇ-10

Dêl bêjîyê hespa dikire kize kiz.(J20, J37, J44, J64, J73, J85, J93)

BÇ-11

Dinê xistiye tira sê. (J6, J17, J23, J34, J49, J56, J77, J86, J108)

BÇ-12

Dîtina êş mêş e. (J25, J33, J46, J55, J70, J79, J87, J99, J111)

BÇ-13

Diz hêlîna xu dernakeve. (J7, J30, J35, J43, J52, J68)

-E-

BÇ-14

Eger kose⁴⁴ isa îmanlîye çima navê rojê nagere. (J8, J38, J57, J65)

BÇ-15

Ezê di kelfîma bêjim bira perça dilê te birije. (J39, J58, J81, J114)

-G-

BÇ-16

Gîskek naçe qûna wî. (J59, J66, J89, J98, J116)

-H-

BÇ-17

Hêkê paşla xu dipêjîne. (J82, J97, J108, J116)

BÇ-18

Herkes xerîmê⁴⁵ xu nas dike. (J9, J61, J90, J100, J109)

BÇ-19

Hirç û govend. (J14, J26, J37, J50, J64, J79, J87, J94, J104, J127)

BÇ-20

Hur, puzur para xezur. (J1, J19, J21, J53, J113, J121)

-I-

⁴⁴ Navê kose bi dirêjahî Kosegelî ye. Lîstikeke.

⁴⁵ Xwedayê xwe.

BÇ-21

Isa ren bûye se bêrê nasekine. (J10, J29, J42, J74, J91, J102)

-J-

BÇ-22

Jin, cin, bizin. (J78, J80, J81)

-K-

BÇ-23

Kes navêje devê min tirş e. (J2, J11, J30, J47, J70, J85, J105, J120, J126)

BÇ-24

Kes newêre serê xu qalibê xu derxe. (J18, J23, J35, J63, J88, J109, J116, J122)

BÇ-25

Kuma dayînin sûala lê bikin. (J9, J16, J25, J40, J62, J73, J99)

-L-

BÇ-26

Li ser wî da girtîye. (J20, J34, J49, J56, J61, J76, J95)

-P-

BÇ-27

Pez teslîmê gur kirine. (J3, J12, J27, J44, J75, J84, J114, J125)

-Q-

BÇ-28

Qe serê qijikê qelî çê dibe? (J15, J38, J45, J65)

-S-

BÇ-29

Ser te 'ewre nabe sahî. (J8, J17, J43, J69, J83, J98, J118, J124)

BÇ-30

Simbêlê wî balte nabire. (J13, J33, J55, J72, J90, J97, J123)

-Ş-

BÇ-31

Şeko nave xu hevalê xu neko. (J4, J22, J31, J59, J68, J119)

BÇ-32

Şeva reş eyba giran. (J24, J36, J48, J57, J82, J96, J117)

-X-

BÇ-33

Xanîyê te dû nagire. (J5, J28, J39, J52, J81, J103, J113)

BÇ-34

Xaş hat min kir, xirab hat te kir. (J7, J32, J41, J65, J77)

-Z-

BÇ-35

Zik têt ê çav birçî. (J46, J60, J67, J95, J112)

Biwêjan ku me ji navçeya Çaldiranê berhev kirine, bi rastî gelê Çaldiranê exleb di navbera xwe de bikartînin. Gelek caran di nav van biwêjan de jîyana rojane jî derdikeve pêşberê me. Gelê Çaldiranê di bikaranîna biwêjan de rê û rismê xwe jî nîşan dide. Mijarên wek: Qurebûn (BÇ5, BÇ6, BÇ7, BÇ16, BÇ21, BÇ22) bawer nekirin (BÇ1) lomekarî (BÇ2) bûye bela (BÇ3) jin (BÇ4) qiyamet (BÇ13) biîman (18) bêîman (BÇ14).

2.1.3. Leqep / Navûnûçik / Navlêk

Navûnûçik jî berhemeke çanda devkî ye. Ev berhem li navçeya Çaldiranê jî tê bikaranîn. Di ansîklopedîya Tirkî de, xala navlêkê/leqebê wiha hatîye terîfkirin: 1. Bi rêya mirovan medh kirin. 2. Mirovan te'rîf û nasîn. 3. Mirovan pîskirin û tirane hildan⁴⁶.

“Navlêk” yek ji mijarên girîng ya gelnasîyê (folklor) ye. Li nava gel “leqap” jî tê gotin. Her çend hin navlêk di şêwe yan jî teşeyeke wisa de ne ku mirovan rencîde bikin, kêr û biçûk dibinin, heta carinan bi mebesta heqaretê tên bikaranîn. Di pey navê kesan yê resen li wan hatîye kirin û pê ve di sînor û tixûbê çanda wan de, li gor hin taybetîyên kesan, navê ku talîyê li wan hatîye kirin an jî li ser navê wan hatîye zêdekirin dibe nawlêka wan.⁴⁷

Di nav civakê de hin malbat an meriv ji hin alîyan ve bala civakê dikşînin. Civak jî ji vê taybetîya balkêş a malbat an merivê rê dikeve û ji bo wan navekî diafirîne. Ev navê ku ji alîyê civakê ve tê bikaranîn wekî bernavk tê binavkirin⁴⁸. Gelê Çaldiranê ji bo leqebê/navlêkê navê navnûçik jî bikartînin. Gava ‘eyba yekî hebûya li ser wî ‘eybe navûnûçik li wî dikirin. Kor bûya digotinê koro, keçel bûya digotinê keçelo, tilîya wî tûnebûya jê re digotin kopo.

⁴⁶Türk Ansiklopedisi, MEB yay. , Ankara, 1975, s. 455-456

⁴⁷ Mem Mukriyanî, **Folklorê Kurdan**, Diyarbakır: Hej. 1, 2015, r. 13

⁴⁸ Artun, **h.b.** , s. 333

Navûnûçikên me ji navçeya Çaldiranê tespît kirine:

-B-

NVÇ-1

Beşîrê Dêro keskê zêro⁴⁹

-C-

NVÇ-2

Cefo

NVÇ-3

Cemoy Îş iş

-Ç-

NVÇ-4

Çavbirçî

-E-

NVÇ-5

‘Edoy Bê Mal

NVÇ-6

‘Ekê

NVÇ-7

‘Elîyê Licê

-F-

NVÇ-8

Fesîhê Çuro

NVÇ-9

Fevzîyê Sivderê

-H-

NVÇ-10

Hecîyê Hûrik

-K-

NVÇ-11

Kamoy Totikê

⁴⁹ Me bi heman navî çîrokekê jî tespît kir r.136.

NVÇ-12

Kamoy Sivderê

NVÇ-13

Keçelo

NVÇ-14

Keremê Kivrîşkê

NVÇ-15

Keço / Keçê

NVÇ-16

Koro / Korê

NVÇ-17

Kuço / Kuçê

-M-

NVÇ-18

Memoy Şaş

NVÇ-19

Mihemedê Bêderê

NVÇ-20

Mihemedê Çe'likê

NVÇ-21

Mihemedê Sivderê

NVÇ-22

Mihêy Şapûş

NVÇ-23

Miho

NVÇ-24

Mistoyê Qûngule

NVÇ-25

Mistoy Sê Qûl

NVÇ-26

Mistoyê Ar

NVÇ-27

Miřtaqê Çêlekê

-P-

NVÇ-28

Peyno

NVÇ-29

Pozkifte

NVÇ-30

Pozmezin

NVÇ-31

Pozterikê

-R-

NVÇ-32

Reřê Şevê

NVÇ-33

Rêxo

-S-

NVÇ-34

Salihê Heřer

NVÇ-35

Serker

NVÇ-36

Serhiřk

NVÇ-37

Sergijik

NVÇ-38

Serjinik

NVÇ-39

Silêmanê Miřtaq

-T-

NVÇ-40

Tajdoyê du qûl

-X-

NVÇ-41

Xelîlê Cewo

-Z-

NVÇ-42

Zahoyê Topal

Çaldiranî jî wekî hemû Kurdan, gelek navnûçik li hev dikin. Bi piranî li ser kêmasîyên bi hev re navnûçik dibêjin. Navnûçika car caran ji bo gund hatinê (NVÇ1) nav xirabkirinê (NVÇ2, NVÇ3) bêmal bûnê (NVÇ5) ji bo rengê wana (NVÇ8) ji bo difin mezînayî (NVÇ29, NVÇ30, NVÇ31) jî tê kar anîn.

2.1.4. Di'a

Şükrü Elçin, ew banga ku li Xwedê tê kirin weki di'a binav dike. Ew bang an xîtaba ji alîyê ferdekî civakê tê kirin, daxwaza seadeta maddî û menewî dihundirîne.⁵⁰ Yanî di'a; hêvî, daxwazî, hêvî û mirazên şexsan dihevwîne.

Doğan Kaya dibêje di'a peyvên bi qalib in û di naveroka wan de daxwazîyên qenc hene⁵¹. Bi gelemperî piştî xeber an guherîneke qenc tê kirin.

Di'ayên me ji navçeya Çaldiranê tespît kirine:

-T-

DÇ-1

Tendûra te gurr be, nane te pîrr be, bextê te têr be. (J93, J112, J117, J125, J126)

-Y-

DÇ-2

Ya Rebbê 'Elemîn! Ji mi ra yardım bikî. (J51, J55, J71, J101, J103, J110)

DÇ-3

Ya Rebbê 'Elemîn! Ji me bela muhafaza bikî. (J77, J78, J89, J106, J107)

DÇ-4

Ya Rebbî! Tu me 'efû bikî. (J80, J86, J100, J110, J111)

⁵⁰ Şükrü Elçin, **Halk Edebiyatına Giriş**, Akçağ Yay. , Ankara, 2013, s. 662

⁵¹ Doğan Kaya, **Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü**, Akçağ Yay. , Ankara, 2007, s. 261

DÇ-5

Ya Rebbî! Me nexî des pîya. (J6, J8, J10, J14, J15, J20)

DÇ-6

Ya Rebbî! Malê heram me nedî xarinê. (J70, J85, J87, J90, J96, J100)

DÇ-7

Ya Rebbî! Çavê me ‘erzê xelqê venekî. (J32, J35, J37, J41, J49)

-X-**DÇ-8**

Xudê bide, nabê ti kurê kê yî. Yê bide min jî îñşallah. (J34, J36, J48)

DÇ-9

Xudê delalîyê kesikî nexê des pîya. (J43, J46, J47, J48)

DÇ-10

Xudê tu, nexaşê me ra şîfa bişînî. (J6, J49, J85, J100, J126)

DÇ-11

Xudê te rû spîke. (J8, J46, J70, J87, J103, J125)

Di’ a yên me Çaldiranê berhev kirine bi gelemperî derheqê rizq (DÇ1) bext û ji belayê dur ketin, pîranî jî ji Xwedê ‘effû û maxfîret xastin tê xuya kirin (DÇ2, DÇ3, DÇ4, DÇ5, DÇ6, DÇ7, DÇ8, DÇ9, DÇ10, DÇ11). Çaldiranîyan daxwazîyên dilê xwe bi saya di’ a yan anîne ziman.

2.1.5. Nifir

Ferdên civakê bi gelemperî piştî bûyer an muameleyeke neyînî dixwazin xwe deşarj an teskîn bikin, bi vî awayî gotinên neqenc bi kar tînin û xwe aş dîkin. Nifir gotinên qalib in⁵² gotinên nebaş in. Bi pîranî le‘net, bela û xezebê tînin ziman⁵³.

Li Çaldiranê, di nav jîyana rojane de, wekî cureyên din nifir jî ciheke girîng digire. Nifir bi pîranî ji alîyê jinan ve tê kirin.

Nifirên me ji navçeya Çaldiranê tespît kirine:

-A-**NÇ-1**

⁵² Artun, **h.b.**, s. 90

⁵³ Elçin, **h.b.**, s. 662

Afata Xudê ser te da be! (J14, J15, J20, J32, J34, J35, J36, J37, J38, J39)

NÇ-2

Afata Xudê ser te da were! (J41, J43, J46, J47, J48, J49)

NÇ-3

Afatek reş serê te da were! (J70, J85, J87, J90, J96, J100, J103)

NÇ-4

Agir bi mala te keto! (J110, J117, J125, J126)

NÇ-5

Agir bi te keve! (J6, J8, J10, J27, J54, J66, J75, J92)

NÇ-6

Agir bikeve mala te! (J3, J24, J57, J63, J113)

NÇ-7

Agir derê te keve! (J6, J8, J10, J14, J15, J20)

NÇ-8

Agir kezeba te keve! (J32, J34, J35, J36, J37, J38, J39)

NÇ-9

Agir li mala te keve pirtikê te ‘esmanan ra derkeve! (J41, J43, J46, J47, J48, J49)

NÇ-10

Agir li ser te da bibare! (J70, J85, J87, J90, J96, J100, J103, J110, J117, J125, J126)

NÇ-11

Agir mala bavê te keve! (J6, J15, J49, J70, J85, J96, J126)

NÇ-12

Agir mala te keve tu pê pirtî pirtî bî! (J8, J10, J14, J20, J32, J34, J39, J46)

NÇ-13

Agir mala te keve! (J35, J36, J47, J90, J100, J103, J110, J113)

NÇ-14

Agir pê keto! (J37, J38, J48, J110, J117, J125, J126)

NÇ-15

Agir rovîyê te keve! (J6, J8, J96, J103, J117, J125, J126)

NÇ-16

Agrê darê ser serê te da bibare! (J10, J14, J32, J43, J110)

NÇ-17

Agrê kulê mala te keto! (J15, J34, J39, J70, J90)

NÇ-18

Agrê sor li te keve! (J35, J38, J46, J49, J85)

NÇ-19

Ahê min deve te da were xarê! (J36, J37, J47, J48, J87)

NÇ-20

Ahê min devê te da were! (J1, J6, J16, J29, J58, J77, J94, J127)

NÇ-21

Ahê min difnê te bavê te ra were îşallah! (J8, J11, J65, J98, J114, J123)

NÇ-22

Ahê min difnê te ra were îşallah! (J10, J17, J55, J74, J97, J118, J127)

NÇ-23

Ahê min ji te bavê te ra nebîne îşallah! (J14, J28, J42, J67, J88, J105, J119, J125, J126)

NÇ-24

Ahê min ji te ra nebîne îşallah! (J2, J15, J26, J44, J64, J73, J99, J111)

NÇ-25

Ahê min pozê te ra were îşallah! (J9, J13, J20, J30, J50, J79, J95)

NÇ-26

Ava reş bikeve çevê te îşallah! (J4, J19, J21, J32, J45, J59, J68, J84, J108, J124)

NÇ-27

Ava reş çevê te da hato! (J5, J12, J23, J31, J34, J53, J69, J78, J92, J115)

NÇ-28

Ava reş çevê te da were! (J18, J22, J35, J40, J60, J71, J83, J93)

NÇ-29

Ava reş çevê te were îşallah! (J36, J41, J49, J87, J110, J117)

NÇ-30

Ava sar çoka te da hato! (J37, J43, J48, J90, J103, J110)

NÇ-31

Ava sor bi çoka keto! (J38, J46, J47, J70, J100)

NÇ-32

Ava zer bedena te keve îşallah! (J85, J96, J100)

NÇ-33

Ava zer te bikşe îşallah! (J25, J51, J62, J80, J91, J109, J120)

NÇ-34

Ava zer te were xwarê îşallah! (J52, J70, J85, J87, J103, J110, J117)

-B-

NÇ-35

Bav birayê te miraz nekin! (J6, J8, J10, J41, J43, J117, J125, J126)

NÇ-36

Bav birayê te mirazê te nebînin! (J14, J15, J20, J32, J47, J49, J90, J96)

NÇ-37

Bav birayê te mirazê te şa nebin! (J34, J36, J37, J38, J46, J48)

NÇ-38

Bav birê te bimirin! (J76, J89, J101, J112, J123)

NÇ-39

Bav lê mirê! (J52, J72, J86, J102, J111, J122)

NÇ-40

Bav lê miro! (J6, J15, J46, J96, J103, J126)

NÇ-41

Bav te miro! (J8, J43, J87, J110, J117)

NÇ-42

Bav te nebîno! (J10, J47, J49, J70, J100)

NÇ-43

Bavê te xêrê ji te nebîne! (J7, J20, J32, J36, J85, J126)

NÇ-44

Bayê cinan te keto! (J14, J34, J35, J37, J90)

NÇ-45

Bayê ferç te keve! (J38, J41, J48, J125)

NÇ-46

Bayê reş te bigre! (J56, J61, J82, J104, J122)

NÇ-47

Bayê reş te keve! (J106, J107, J119, J121)

NÇ-48

Bayê sor lê keto! (J6, J33, J38, J87, J103, J117, J126)

NÇ-49

Bayê sor lê neketo! (J8, J10, J14, J85, J110, J125)

NÇ-50

Bayê sor te keve! (J15, J20, J32, J37, J70, J125)

NÇ-51

Bayê tofanê lê keto! (J34, J41, J43, J90, J96, J100)

NÇ-52

Bayê tofanê te xe! (J34, J35, J36, J46, J47, J48, J49)

NÇ-53

Bê agir çûyo! (J7, J18, J27, J38, J87, J93, J106, J116)

NÇ-54

Bê av çûyo! (J6, J12, J24, J40, J53, J65, J77, J89, J98)

NÇ-55

Bê ayîk⁵⁴ bibînî! (J8, J16, J54, J68, J88, J97, J108, J127)

NÇ-56

Bê bira mayo! (J10, J13, J29, J76, J95, J105, J115, J124)

NÇ-57

Bê gor çûyî! (J14, J19, J30, J52, J64, J80, J99, J118, J123)

NÇ-58

Bê gor herî! (J15, J20, J33, J44, J66, J84, J94, J104)

NÇ-59

Bê serî bûyo! (J32, J34, J45, J55, J73, J83, J92, J102)

NÇ-60

Bedena te reş be! (J35, J36, J37, J90, J96, J110, J117, J125, J126)

NÇ-61

Bejna te here erdê! (J41, J43, J70, J85, J87)

⁵⁴ Dayîk

NÇ-62

Bela te ber derîyê te be! (J46, J47, J48, J49)

NÇ-63

Bela te ber lingê te da be! (J100, J103)

NÇ-64

Bela te bin pê te da derkeve! (J6, J8, J38, J90, J103, J110, J117, J125, J126)

NÇ-65

Bela te bin pê te da rabe! (J10, J14, J15, J46, J47, J70, J85, J87, J100)

NÇ-66

Bela te keve! (J20, J32, J34, J48, J49, J96)

NÇ-67

Bela te rast be! (J10, J43, J74, J86, J91, J111)

NÇ-68

Bela, ber derîyê te neç! (J35, J36, J37, J41, J56, J69, J78, J121)

NÇ-69

Belkî gula Seddam te keve! (J6, J37, J87, J126)

NÇ-70

Bendikê doxîna te biqete! (J8, J46, J85, J96, J110, J125)

NÇ-71

Ber bi gor bî! (J14, J38, J41, J100, J103)

NÇ-72

Ber bi gor bûyo! (J15, J34, J36, J47, J48, J90)

NÇ-73

Ber çevê te bigre! (J20, J32, J35, J49, J70, J117)

NÇ-74

Bextê te bextê se kuçik be! (J20, J43, J90, J96, J125)

NÇ-75

Bextê te reş be! (J6, J8, J36, J37, J126)

NÇ-76

Bê Xudêno, bê rojîno! (J10, J14, J15, J46, J117)

NÇ-77

Bikevî bin cemsa eskerî yê. (J32, J34, J35, J41, J47, J48)

NÇ-78

Bikevî bin wesayîtekî (J49, J85, J89, J100, J103, J110)

NÇ-79

Bin cemsa eskerîyê da bimînî inşallah! (J6, J8, J85, J87, J100, J126)

NÇ-80

Bin ereba eskerîyê da bimînî inşallah! (J38, J90, J103, J110, J117, J125, J126)

NÇ-81

Bin ereban da bimînî inşallah! (J10, J14, J41, J47, J49)

NÇ-82

Bira bavê te wê şevê li aş bûya, ti jê peyda nebûyay! (J36, J37, J96)

NÇ-83

Bira hestîyê te erde, goştê te bin pê be! (J15, J20, J43, J46, J70)

NÇ-84

Bira lê mirê! (J32, J34, J35)

NÇ-85

Bira lê miro! (J48, J49)

NÇ-86

Bira te miro! (J8, J20, J47, J90, J96, J100, J125, J126)

NÇ-87

Birûsk te keve! (J6, J14, J32, J48, J87, J103, J110)

NÇ-88

Birûsk te keve! (J10, J15, J34, J36, J43, J49)

NÇ-89

Birûsk we keve! (J35, J37, J38, J41, J46, J70)

NÇ-90

Birûska Xudê te keve! (J85, J117, J125, J126)

-C-

NÇ-91

Canzerî bibî inşallah! (J8, J10, J20, J43, J47, J90, J103)

NÇ-92

Cî war destê te nekevin! (J14, J15, J49, J85, J96)

NÇ-93

Cigara te bişewite! (J32, J34, J35, J36, J37)

NÇ-94

Cigara te bitemire! (J41, J48, J70, J85, J87, J96, J117)

NÇ-95

Cigara te devetê te da were! (J3, J17, J26, J33, J42)

NÇ-96

Cigara te difnê te ra were! (J63, J75, J101, J112, J122, J127)

NÇ-97

Cigara te pirtî pirtî be devê te ra were! (J1, J32, J65, J81, J99)

NÇ-98

Cigara te pirtî pirtî be! (J11, J22, J42, J57, J67, J79, J82, J105)

NÇ-99

Cigara te pozê te ra were! (J2, J28, J59, J61, J72, J81, J127)

NÇ-100

Cigara te qul be! (J9, J23, J60, J71, 124)

NÇ-101

Cîhê te şahîya tinebe! (J19, J27, J45, J54, J62, J72, J84, J97)

NÇ-102

Cînarê te mirat xarê te be! (J4, J21, 53, J31, J64)

NÇ-103

Cînazê te bibînîm! (J6, J8, J10, J85, J87, J90)

NÇ-104

Cînazê te vir rabe! (J14, J15, J46, J47, J48, J96)

NÇ-105

Cîya te bimire! (J20, J32, J34, J35, J36, J37, J38, J117)

-Ç-

NÇ-106

Çarka laçika spî gewrîya te biale! (J41, J43, J49, J70)

NÇ-107

Çavên dijminê te kor be! (J100, J103, J110, J125, J126)

NÇ-108

Çengê te bişkê! (J6, J8, J10, J14, J43, J47, J96, J110)

NÇ-109

Çev derketo! (J15, J20, J87, J117, J125, J126)

NÇ-110

Çev kor bûyo! (J32, J34, J35, J48, J49, J70, J90)

NÇ-111

Çev rijyayo! (J36, J37, J41, J46)

NÇ-112

Çev te kor bin îşallah! (J38, J46, J100, J103, J110)

NÇ-113

Çevê te birije ber pê te da! (J85, J90, J96, J100, J117, J125, J126)

NÇ-114

Çevê te birije ser te da! (J6, J8, J10, J41, J46, J47, J103, J110)

NÇ-115

Çevê te birije! (J14, J15, J20, J48, J49, J96)

NÇ-116

Çevê te derkeve! (J32, J34, J35, J37, J87, J117)

NÇ-117

Çevê te kor be! (J36, J37, J38, J43, J70, J85)

NÇ-118

Çevê te li derîya be! (J6, J8, J10, J46, J47, J100, J125, J126)

NÇ-119

Çevê te reş be! (J14, J15, J20, J32, J36, J37, J103)

NÇ-120

Çevê te rêya be! (J34, J35, J38, J41, J70, J85)

NÇ-121

Çevtarîya mirinê te bigire! (J48, J49, J87, J90, J110)

NÇ-122

Çira te bitemire! (J6, J8, J10, J41, J43, J46, J100)

NÇ-123

Çira te vênekeve! (J14, J15, J20, J32, J34, J35)

NÇ-124

Çûyîna te hebe, hatina te tinebe! (J47, J48, J49, J117, J125, J126)

NÇ-125

Çûyîna te hebe, wergerendina te tinebe! (J36, J37, J38, J70, J85, J87, J90)

-D-

NÇ-126

Darê te nebînin! (J103, J110, J117, J125, J126)

NÇ-127

Dê bav te bimirin! (J8, J10, J43, J46, J47, J103, J110, J117, J125, J126)

NÇ-128

Dê bavê te xêrê te nebîne! (J6, J14, J15, J20, J37, J90, J96, J100)

NÇ-129

Deng te dernekeve! (J32, J34, J35, J36, J70, J85, J87)

NÇ-130

Dengê zara nekeve guhê te! (J38, J41, J48, J49, J100)

NÇ-131

Denge zarê kurîn nekeve guhê te! (J6, J8, J10, J43, J46, J49)

NÇ-132

Dêran bî! (J47, J48, J70, J85, J87, J126)

NÇ-133

Derdê bê derman bedena te da derkeve! (J15, J20, J32, J34, J90, J96, J100)

NÇ-134

Derde bê derman te da derkeve! (J14, J35, J36, J37, J38, J41)

NÇ-135

Derdekî bê derman bikeve bedena te! (J100, J103, J110, J117, J125)

NÇ-136

Derdekî bê derman te derkeve! (J10, J15, J47, J117, J126)

NÇ-137

Derdekî bê derman te derkeve, dermanê te şîrê teyrana û qoçê kerana be! (J6, J41, J46)

NÇ-138

Derdekî bê derman te keve! (J8, J38, J96, J100, J103)

NÇ-139

Derîyê bavê te were girtin! (J14, J34, J36, J37, J43, J85)

NÇ-140

Derîyê rehmê dê û bavê te venebe! (J20, J49, J70, J85, J87, J90)

NÇ-141

Derîyê rehmê te venebe! (J32, J48, J110, 125)

NÇ-142

Derîyê rehmê we venebe! (J6, J8, J10, J103, J110, J117, J125, J126)

NÇ-143

Derîyê te bavê te were girtin! (J14, J15, J20, J32, J34)

NÇ-144

Derîyê te kîlît lêkeve! (J41, J43, J46, J47, J100)

NÇ-145

Derîyê te were girtin! (J35, J36, J48, J49, J87, J90, J96)

NÇ-146

Destê te bikşe! (J37, J38, J70, J85, J126)

NÇ-147

Destê te bişkê! (J14, J46, J70, J117, J125, J126)

NÇ-148

Destê te pûç be! (J6, J15, J20, J38, J100, J103, J110)

NÇ-149

Dev li te xar be! (J8, J10, J35, J36, J41, J43, J90, J96)

NÇ-150

Devê te kevirê reş keve! (J32, J34, J85, J87)

NÇ-151

Dew bibînî nan nebînî, nan bibînî dew nebin (J37, J47, J48, J49, J125)

NÇ-152

Dil navê te devê te ra were! (J6, J41, J51, J63, J94, J105)

NÇ-153

Dîn bî li çola keví! (J8, J11, J25, J40, J55, J74, J83, J93, J114)

NÇ-154

Diran devê te da nemîne! (J10, J16, J26, J58, J67, J82, J92, J120)

NÇ-155

Diranê devê te birijin! (J14, J29, J42, J68, J73, J91)

-E-

NÇ-156

Em cinazê te rakin inşallah! (J20, J30, J50, J61, J76, J88, J119, J124)

NÇ-157

Erd û esman biqelişe, kezeba te ra derkeve! (J32, J44, J52, J66, J75, J116, J121)

NÇ-158

Êş bikeve bedena te inşallah! (J34, J41, J57, J69, J71, J81, J95)

NÇ-159

Êş û reş bedena te keve (J35, J50, J56, J62, J77, J89, J107)

NÇ-160

Êşa zirav li te keve! (J36, J58, J78, J86, J98, J101)

NÇ-161

Êvar te nebe! (J37, J40, J50, J55, J63, J92, J119)

NÇ-162

Ez kefenê te bidestê xu beherim! (J96, J102, J113, J122)

NÇ-163

Ez te helal nakim! (J38, J64, J99, J104, J114, J123)

NÇ-164

Ez xêrê ji te nebînim! (J43, J51, J67, J74, J94, J119, J122)

NÇ-165

Ez te êtîm bibînim.

NÇ-166

Ezê çavê bavê wî kor kim (J46, J52, J65, J79, J88, J95, J106)

NÇ-167

‘Emir kurt bûyo! (J87, J90, J101, JJ112, J122)

NÇ-168

‘Emrê te bibe ‘emrê pîvoka biharê! (J100, J111, J121)

NÇ-169

‘Emrê te dirêj be, têrxarina te tinebe! (J47, J48, J53, J66, J75, J84, J97, J105)

NÇ-170

‘Emrê te kurt be! (J49, J59, J68, J77, J86, J93, J109, J118)

NÇ-171

‘Esman ser we bavê we da ser birê we da tep be! (J70, J83, J100, J108, J115)

NÇ-172

‘Esman ser we da were tep be! (J85, J89, J91, J102, J113)

NÇ-173

‘Etka⁵⁵ we qelîyayê, ber bayê sayî ketê. (J1, J18, J24, J45, J57, J62, J73)

NÇ-174

Felek li te bigere! (J20, J27, J44, J54, J96, J116)

NÇ-175

Fetisîyo! (J3, J16, J29, J31, J41, J73, J98, J107, J110)

NÇ-176

Gewrîya te da bimîne! (J9, J12, J30, J42, J61, J72, J81, J103, J117, J125)

NÇ-177

Gor bi dest neketo! (J1, J12, J23, J71, J82, J126)

NÇ-178

Gor bi gor bî! (J9, J17, J24, J31, J76, J78, J80, J126)

NÇ-179

Gor bi gor geryayo! (J2, J13, J22, J56, J69, J85, J87, J110, J126)

NÇ-180

Gor li teng bûyo! (J5, J11, J22, J58, J60, J70, J85, J90, J117, J125)

NÇ-181

Goştê canê te bihele! (J2, J13, J21, J28, J32, J46, J48, J103)

⁵⁵ Kok, malbat.

NÇ-182

Goştê canê te bihele, bibî hestî! (J7, J18, J28, J34, J41, J96, J100)

NÇ-183

Goştê canê xu bikevî! (J3, J25, J35, J38, J43, J47, J49)

NÇ-184

Goştê te mişk mer bixun îşallah! (J7, J19, J26, J28, J87, J103)

NÇ-185

Goştê te pirtî pirtî be deve te ra were xarê! (J4, J23, J32, J36, J37, J90, J125, J126)

NÇ-186

Gula eskerîyê te keve! (J5, J10, J15, J47, J85, J96, J100)

NÇ-187

Gula sibê te keve! (J5, J8, J14, J20, J37, J43, J110, J117)

NÇ-188

Gur bikeve nav pezê te! (J4, J6, J38, J46, J48, J70)

NÇ-189

Gura xwaro! (J6, J10, J20, J34, J36, J49)

NÇ-190

Gurê har te bigre! (J8, J14, J15, J35, J41)

NÇ-191

Har bibî! (J20, J48, J100, J103, J125, J126)

NÇ-192

Here gor bavê te (J6, J15, J46, J96, J103, J110)

NÇ-193

Here mi te teslîmê Xudê kirîye. (J8, J10, J14, J32, J43, J70, 85)

NÇ-194

Herî inşallah venegerî! (J34, J35, J36, J90, J117)

NÇ-195

Hetanê mirinê tu xaşîyê nebînî! (J37, J38, J41, J47, J49)

NÇ-196

Hêvîya min Xudê ye tu mirazê xu nebînî! (J85, J87, J103, J117, J125, J126)

NÇ-197

Hêvîya min Xudê ye tu sibê nekevî! (J32, J46, J96, J100, J117, J125, J126)

NÇ-198

Hey la mikava çûyo! (J2, J19, J34, J45, J59, J68, J83, J92)

NÇ-199

Hey la topa Saddam te keto! (J9, J12, J26, J39, J54, J69, J75, J95, J105)

NÇ-200

Hey la topa Xudê bedena te keve! (J1, J18, J29, J101, J112, J127)

NÇ-201

Hey la topa Xudê te keto! (J7, J16, J28, J42, J72, J114, J124)

NÇ-202

Hey lê afatek lê hafî! (J4, J17, J22, J33, J51, J66, J99, J109)

NÇ-203

Hey lê çavên te birije! (J6, J37, J87, J90, J103, J110)

NÇ-204

Hey lê çavên te derkeve! (J10, J41, J48, J70, J85, J110)

NÇ-205

Hey lê kezev lê reş bûyo! (J8, J14, J20, J38, J49)

NÇ-206

Hey lê min xêr lê nedîtyo! (J15, J35, J36, J43, J47)

NÇ-207

Hey lê nemayî! (J3, J13, J53, J63, J93, J113, J123)

NÇ-208

Hey lê pişt lê şikestî! (J25, J44, J65, J86, J107, J122)

NÇ-209

Hey lê stî lê keştî! (J5, J31, J64, J97, J121)

NÇ-210

Hey lê stî lê pelixî! (J21, J40, J50, J78, J102, J111, J120)

NÇ-211

Hey lê şepirze bûyo! (J23, J56, J77, J98, J118)

NÇ-212

Hey lê te serê xu xarî! (J32, J58, J76, J88, J106, J120)

NÇ-213

Hey lê tu ji hev derketî! (J27, J52, J79, J108, J119)

NÇ-214

Hey lê tu ji hev ketî! (J30, J55, J73, J115)

NÇ-215

Hey lê Xudê ‘emir lê kurt kiro! (J24, J57, J61, J80, J104)

NÇ-216

Hey te mêjîyê kerê xaro! (J60, J62, J71, J84, J119)

NÇ-217

Hey! Mala te xira be! (J81, J94, J111, J122)

NÇ-218

Hey! Ti bê jin bimînî! (J6, J41, J49, J87, J96, J110, J126)

NÇ-219

Hey! Ti qet têr nexu! (J10, J38, J90, J100, J125)

NÇ-220

Hey! Topa Xudê li te keve! (J8, J20, J37, J117)

NÇ-221

Hey! Xudê dîn îman te bistîne! (J14, J46, J70, J103)

NÇ-222

Hindir reş bûyo! (J32, J34, J43, J47)

NÇ-223

Histîyê te ber te da bimîne! (J35, J36, J85)

NÇ-224

Histîyê te bişkê! (J6, J8, J37, J38, J90, J96, J125, J126)

NÇ-225

Hişk bibî! (J10, J14, J41, J43, J100, J103)

NÇ-226

Hûn ber lêwîyê kevin! (J15, J20, J36, J46, J110, J117)

NÇ-227

Hûn roda herin! (J32, J34, J35, J47, J48)

NÇ-228

Îlancix gewrîya te da were! (J49, J70, J85, J87)

NÇ-229

Înşallah ti herî venegerî! (J6, J41, J90, J103, J126)

NÇ-230

Înşallah ti jêrê bikevî! (J14, J36, J85, J96, J125, J126)

NÇ-231

Înşallah ti nemêr bî! (J8, J35, J46, J87, J110, J117)

NÇ-232

Înşallah ti têr nexwî! (J10, J20, J37, J43, J70, J100, J117)

NÇ-233

Înşallah tu negihî sibê! (J15, J32, J34, J47, J48)

NÇ-234

Jan te bigre! (J6, J37, J90, J96, J126)

NÇ-235

Ji gewrîya te neçe xwarê! (J8, J20, J43, J49, J70, J85, J125)

NÇ-236

Ji mêranî bikevî înşallah! (J10, J32, J46, J100, J103)

NÇ-237

Jina te bimire! (J14, J15, J36, J110, J117)

NÇ-238

Kambax be! (J34, J35, J38, J41, J87)

NÇ-239

Karê te nîvco bimîne! (J74, J82, J105, J112, J124)

NÇ-240

Keçê mala bavê te bişewîte! (J89, J91, J107, J114, J127)

NÇ-241

Kerr bûyo! (J11, J58, J69, J80, J98, J109, J123)

NÇ-242

Kevanîya te bimire! (J3, J16, J29, J40, J55, J76, J97, J108, J120)

NÇ-243

Kevir kuçik ser te bibare! (J18, J30, J56, J67, J77, J88, J99)

NÇ-244

Kevir kuçik serê te be! (J2, J24, J44, J66, J75, J86, J106, J123)

NÇ-245

Kevir kuçik te bibarin! (J11, J33, J64, J95, J116, J121)

NÇ-246

Kevrê te ser kevra nemine însallah! (J9, J17, J26, J39, J50, J59, J65, J74)

NÇ-247

Kezeva te bişewîte! (J13, J25, J45, J57, J68, J78, J94, J123)

NÇ-248

Kezeva te deve te ra were! (J7, J12, J28, J32, J51, J72, J84, J1239)

NÇ-249

Kezeva te reş be! (J21, J31, J42, J53, J74, J119)

NÇ-250

Kezî kurê bişewite! (J1, J23, J54, J67, J79, J89, J101, J113)

NÇ-251

Kilît derîyê te keve! (J22, J52, J61, J73, J115)

NÇ-252

Koka te biqele! (J4, J60, J71, J83, J92, J102, J118)

NÇ-253

Koka we biqele! (J27, J62, J82, J93, J104, J119)

NÇ-254

Kuçik nan destê te negre! (J5, J63, J74, J86, J97, J109, J127)

NÇ-255

Kula reş mala te keve! (J9, J19, J28, J81, J104, J124)

NÇ-256

Kurê te bimire! (J11, J23, J44, J65, J77, J99, J122)

NÇ-257

Kureder! (J1, J12, J33, J64, J75, J107, J114, J123)

NÇ-258

Lawo ti qet mirazê xwe şa nebî! (J6, J8, J10, J100, J103, J117, J125, J126)

NÇ-259

Lawo ti rastê xezaba zivistanê werî! (J3, J13, J24, J45, J57, J88, J98, J108)

NÇ-260

Li te goştê domiz be! (J7, J16, J26, J54, J67, J79, J89, J121)

NÇ-261

Li te goştê xinzîr be! (J17, J29, J40, J52, J63, J76, J95, J120)

NÇ-262

Li te helal nebe! (J4, J18, J30, J39, J50, J53, J62, J84, J94)

NÇ-263

Li te heram be! (J19, J27, J32, J42, J55, J68, J80, J82, J94)

NÇ-264

Li te je'r be! (J5, J22, J51, J72)

NÇ-265

Li te je'ra mera be! (J6, J8, J10, J14, J15, J20, J32)

NÇ-266

Li te kul derd be! (J38, J41, J43, J46, J47, J48, J49)

NÇ-267

Li te xûna domiz be! (J34, J35, J36, J37, J70)

NÇ-268

Li te xûna xinzîr be! (J85, J87, J90, J96, J100, J103)

NÇ-269

Li te zehr ziqqim be! (J110, J117, J125, J126)

NÇ-270

Lingê te bişkê! (J10, J14, J15, J70, J85, J87, J126)

NÇ-271

Mal mîrat bûyo! (J6, J43, J47, J90, J110)

NÇ-272

Mala te bela be inşallah! (J8, J20, J35, J96, J100, J125)

NÇ-273

Mala te bibe mala êfîman, jina te here ser hêvîyan. (J32, J34, J48, J49, J103, J117)

NÇ-274

Mala te bişewite! (J6, J8, J10, J70, J85, J87, J96)

NÇ-275

Mala te here be mîrata! (J14, J15, J20, J32, J117, J125, J126)

NÇ-276

Mala te kambax be! (J34, J35, J36, J46, J47, J48, J110)

NÇ-277

Mala te mîrat bimîne inşallah! (J37, J38, J41, J100, J103)

NÇ-278

Mala te ne ava! (J43, J90, J96, J100, J103, J110)

NÇ-279

Mala te wêran be! (J1, 26, J57, J69, J95, J109)

NÇ-280

Mala te xira be! (J9, J18, J27, J44, J63, J82)

NÇ-281

Malê te bibe bela serê te! (J2, J11, J23, J31, J55, J68, J79, J83)

NÇ-282

Mêjî poz lê hato! (J12, J21, J33, J56, J74, J97, J109)

NÇ-283

Mêjîyê te belabe inşallah! (J7, J13, J29, J32, J58, J64, J71, J84)

NÇ-284

Mêjîyê te birije erdê inşallah! (J16, J22, J42, J53, J76, J127)

NÇ-285

Mêrê te bimire! (J25, J52, J124)

NÇ-286

Meytê te erdê bimîne inşallah! (J3, J17, J19, J111, J124)

NÇ-287

Mezin nebîyo! (J24, J28, J30, J39, J40, J50)

NÇ-288

Milê te bişkê! (J5, J45, J51)

NÇ-289

Min xêr te nedîto! (J51, 62, J73, J107)

NÇ-290

Mirazê te çavê te da bimîne! (J4, J54, J61, J72, J86, J94)

NÇ-291

Mirin li çava keto! (J59, J119, J120)

NÇ-292

Nanê te derîyan deve te kerîyan be îşallah! (J60, J75, J81, J92, J106, J111)

NÇ-293

Nanê te destê te nekeve îşallah! (J65, J77, J88, J92, J104, J116)

NÇ-294

Nanê te ser sêlê bişewîte îşallah! (J81, J91, J118, J119)

NÇ-295

Nanê te ser sêlê nekele îşallah! (J66, J89, J91, J102, J113)

NÇ-296

Nebîyê xu nebînî îşallah! (J67, J80, J91, J104, J115, J117)

NÇ-297

Negîhîjî sibê îşallah! (J101, J105, J112, J113, J114)

NÇ-298

Nesîbê te ser pişta xezalê be, xezal bireve tu negîhîjî! (J111, J112, J113, JJ114)

NÇ-299

Nexwaşî te bigre! (J104, J111, J112, J113)

NÇ-300

Oxira te nivê rê be! (J115, J116, J117, J118)

NÇ-301

Oxira te oxira xêrê nebe! (J14, J20, J34, J41, J70, J85, J96, J126)

NÇ-302

Penceşêr bikeve dil navê te da! (J6, J15, J37, J47, J87, J100, J117)

NÇ-303

Penceşêr li bedena te keve! (J10, J36, J46, J103, J110)

NÇ-304

Penceşêrê bikevî! (J8, J43, J90, J125)

NÇ-305

Penceşêr li te keve! (J32, J35, J38, J49)

NÇ-306

Piştâ te bişkê! (J10, J41, J96, J103, J126)

NÇ-307

Porê te hilbû⁵⁶ be! (J6, J37, J70, J90, J125)

NÇ-308

Porê te kur be li ser bav birayê te da! (J14, J46, J85, J100, J117)

NÇ-309

Porê te kur be li ser bavê te da! (J8, J36, J87, J110)

NÇ-310

Porê te kur be li ser birê te da! (J15, J34, J38, J43, J49)

NÇ-311

Porê te kur be li ser te da! (J20, J32, J35)

NÇ-312

Porê te kur be! (J20, J46, J90, J110, J126)

NÇ-313

Porê we qurbe ser we bavê we da! (J6, J10, J41, J96, J125)

⁵⁶ Robe, Bibewşe.

NÇ-314

Porkurê! (J32, J47, J85, J100)

NÇ-315

Qansêr li hato! (J8, J47, J87, J117)

NÇ-316

Qansêr te da derkeve! (J14, J36, J70, J103)

NÇ-317

Qirka te şil nebe! (J34, J35, J37, J48, J49)

NÇ-318

Razan hebe rabûn tinebel! (J15, J38, J43, J110)

NÇ-319

Rêşa pûç bedena te da were! (J14, J41, J87, J103)

NÇ-320

Risqê te ser pişta xezalê be, xezal bireve tu negîhêjê! (J6, J37, J49, J126)

NÇ-321

Roda herî inşallah! (J10, J43, 48, J100, J125)

NÇ-322

Stî keşto! (J8, J35, J47, J96, J117)

NÇ-323

Stîyê te bişkê heft cîya însallah! (J15, J34, J46, J90)

NÇ-324

Stîyê te bişkê! (J20, J32, J70, J85)

NÇ-325

Şer derê mala te kê m nebe! (J36, J38, J115, J116)

NÇ-326

Şevê dernekevî inşallah! (J85, J87, J100, J103, J117, J125, J126)

NÇ-327

Şîn mala te keve! (J14, J15, J34, J35, J46, J49, J70, J110)

NÇ-328

Şîn mala te ranebe! (J6, J8, J37, J43, J48, J90, J96, J126)

NÇ-329

Şîrê min ji te heram be! (J10, J20, J32, J38, J110)

NÇ-330

Şîva şevê te hisret be! (J49, J47, J49, J70, J90, J96)

NÇ-331

Ti poşmam bûyê, ser bedena te da. (J36, J46, J100, J103, J125, J126)

NÇ-332

Ti çola bikevî! (J20, J32, J47, J90, J117)

NÇ-333

Ti devê gurekî har da herî! (J6, J38, J43, J48, J110)

NÇ-334

Ti gora xwe da nebînî inşallah! (J8, J10, J32, J36, J49, J49, J70)

NÇ-335

Ti goştê canê xwe bikevî! (J14, J15, J34, J37, J85, J87)

NÇ-336

Ti her du çavan bibî! (J35, J87, J125)

NÇ-337

Ti kerr lal bî! (J6, J8, J10, J43, J46, J47, J117)

NÇ-338

Ti mezin nebî! (J32, J34, 35, J90, J96, J100)

NÇ-339

Ti nebîyê xwe nebînî îşallah! (J14, J15, J20, J36, J38, J1039)

NÇ-340

Ti parçe parçe bî! (J37, J41, J48, J70)

NÇ-341

Ti pirtî pirtî bî! (J49, J85, J87, J126)

NÇ-342

Ti qansêrê bikevî! (J10, J43, J100, J103, J125)

NÇ-343

Ti rêya rast neçî! (J6, J38, J49, J110, J117)

NÇ-344

Ti rezîl ruswa bî! (J8, J15, J20, J47, J85, J96)

NÇ-345

Ti roda herî! (J14, J34, J70, J87, J96)

NÇ-346

Ti ru spî nebî! (J32, J35, J36, J46)

NÇ-347

Ti tucara rêya rast neçî! (J90, J96, J125, J126)

NÇ-348

Ti zarê xwe nebînî îşallah! (J6, J10, J46, J47, J117)

NÇ-349

Tofan ser te da were! (J8, J43, J49, J70, J103, J110)

NÇ-350

Topa asiman te bikeve! (J14, J15, J36, J96, J100)

NÇ-351

Topa eskerîyê te keve! (J20, J32, J37, J87)

NÇ-352

Topa Saddam te keve! (J34, J35, J38, J41, J85)

NÇ-353

Topa Êris we keve! (J15, J47, J70, J85, J100, J117, J126)

NÇ-354

Topa Xudê li te keve! (J20, J36, J41, J49, J96, J110)

NÇ-355

Urta te biqele! (J8, J34, J38, J103, J125)

NÇ-356

Weremê bikevî inşallah! (J6, J35, J43, J48, J90)

NÇ-357

Weylê kulê kezeva te da yê! (J10, J32, J46, J87)

NÇ-358

Weylê kuro! Xudê te histando! (J14, J37, J48, J85, J96, J117)

NÇ-359

Weylê Xudê! bela xu bide te! (J8, J32, J49, J125, J126)

NÇ-360

Xêrê ji te nebînim! (J6, J10, J20, J36, J41, J47, J70)

NÇ-361

Xêrê ji xu nebînî! (J14, J34, J100, J110, J117)

NÇ-362

Xudê ‘emrê te kurt ke! (J15, J35, J38, J43, J103)

NÇ-363

Xudê ‘ezeba xu li ser te bibarîne! (J37, J46, J87, J90)

NÇ-364

Xudê bela xu bide te! (J8, J41, J48, J85, J90, J117)

NÇ-365

Xudê belayê bîne ber pê te da! (J10, J20, J35, J49, J96, J100)

NÇ-366

Xudê ji te mi ra nehêle! (J15, J34, J38, J103, J110)

NÇ-367

Xudê mala te xirabke, mihtacê ber porsa aşan ke. (J32, J36, J43, J87, J125)

NÇ-368

Xudê qirê li nav pezê te xe! (J37, J46, J70, J126)

NÇ-369

Xudê rihê te bistîne! (J20, J48, J70, J103, J110, J117)

NÇ-370

Xudê te bistîne ne dereng e! (J6, J14, J36, J49, J85, J126)

NÇ-371

Xudê te bişkêne! (J10, J15, J47, J87, J96)

NÇ-372

Xudê te kevir ke! (J8, J37, J41, J48, J90)

NÇ-373

Xudê te mezin neke! (J38, J46, J85, J96, J110, J126)

NÇ-374

Xudê te nehêle! (J10, J20, J32, J38, J70)

NÇ-375

Xudê tu cara te serfiraz neke. (J6, J15, J49, J103)

NÇ-376

Xudê we bişkêne! (J8, J14, J20, J36, J43)

NÇ-377

Xudê we xe, bavê we xe! (J34, J43, J90, J103)

NÇ-378

Xudê! Ti, evî merivî li kevirekî xî. (J35, J37, J41, J46)

NÇ-379

Xurîya bikevî inşallah! (J47, J48, J87, J125)

NÇ-380

Yaxa min li wî xilas bikî. (J48, J87, J117, J126)

Lêkolîna me ya li ser nifiran qedîya û me di navçeya Çaldiranê de sêsed û heştê nifir peyda kir. Tê xuya ku ev nifir piranî ji aliyê jinan ve tê gotin. Em dibinin ku mijarên nifiran piranî li ser jîyana rojene ye. Ji ber ku jin li ber zor û zehmetîyên dinê, dixwazin dilê xwe rehet bikin. Ji ber vî halî li serî nifiran dixin. Gelek nifir li ser agir (NÇ4, NÇ5, NÇ6, NÇ7, NÇ8, NÇ9, NÇ10, NÇ11, NÇ12, NÇ13, NÇ14, NÇ15, NÇ16, NÇ17, NÇ18) ah (NÇ19, NÇ20, NÇ21, NÇ22, NÇ23, NÇ24, NÇ25) ava reş (NÇ26, NÇ27, NÇ28, NÇ29, NÇ30, NÇ31) ava zer (NÇ32, NÇ33, NÇ34) miraz nekirin (NÇ35, NÇ36, NÇ37) bav mirin (NÇ39, NÇ40, NÇ41, NÇ42) felç (NÇ45, NÇ46, NÇ47, NÇ48, NÇ49, NÇ50, NÇ51, NÇ52, NÇ60) bela (NÇ62, NÇ63, NÇ64, NÇ65, NÇ66, NÇ67, NÇ68) mirin (NÇ71, NÇ72, NÇ73, NÇ81, NÇ104, NÇ105, NÇ130, NÇ157, NÇ163, NÇ166, NÇ168, NÇ169, NÇ171, NÇ178, NÇ179, N180, NÇ181, NÇ182, NÇ183, NÇ184, NÇ185, NÇ186, NÇ187, NÇ188, NÇ198, NÇ201, NÇ208, NÇ213, NÇ214, NÇ215, NÇ216, NÇ221, NÇ226, NÇ227, NÇ228, NÇ234, NÇ236, NÇ287, NÇ288, NÇ290, NÇ292, NÇ297, NÇ298, NÇ391, NÇ322, NÇ327, NÇ328, NÇ329, NÇ339, NÇ340, NÇ341,

NÇ342, NÇ346, NÇ347, NÇ349, NÇ351, NÇ352, NÇ356, NÇ359, NÇ361, NÇ362, NÇ363, NÇ367, NÇ370, NÇ371, NÇ374, NÇ375) qeza (NÇ77, NÇ78, NÇ79, NÇ80) bira mirin (NÇ84, NÇ85, NÇ86) birûsk (NÇ87, NÇ88, NÇ89, NÇ90, NÇ91) cixare (NÇ94, NÇ95, NÇ96, NÇ97, NÇ98, NÇ99, NÇ100, NÇ101) çav derketin (NÇ110, NÇ111, NÇ112, NÇ113, NÇ114, NÇ115, NÇ116, NÇ117, NÇ118, NÇ120, NÇ121, NÇ122) bêderman mayîn (NÇ134, NÇ135, NÇ136, NÇ137, NÇ138, NÇ139) mala bavê wêran bûn (NÇ140, NÇ141, NÇ142, NÇ143, NÇ144, NÇ174) derd (NÇ159, NÇ160, NÇ161, NÇ162, NÇ223, NÇ229, NÇ235, NÇ256, NÇ282, NÇ326, NÇ335, NÇ336, NÇ350, NÇ364, NÇ368, NÇ369) mal xirabûn (NÇ274, NÇ275, NÇ276, NÇ277, NÇ278, NÇ279, NÇ280, NÇ281) bêrizq mayîn (NÇ293, NÇ294, NÇ295, NÇ296, NÇ299, NÇ318, NÇ321, NÇ331) qansêr (NÇ303, NÇ304, NÇ305, NÇ306, NÇ316, NÇ317, NÇ320, NÇ343) keçel bûn (NÇ308, NÇ309, NÇ310, NÇ311, NÇ312, NÇ313, NÇ314, NÇ315) histî keşandin (NÇ224, NÇ225, NÇ323, NÇ324, NÇ325) dest keşandin (NÇ147, NÇ148, NÇ149,

Xencî van xalan; ‘ezaba Xwedê, afad, bêdê, bêbav, bêbira, bêmerzel, bêmezin, bêzirriyet, bêîman, bêmal, bêwar mayîn jî di gelek nifiran de derdikeve pêşberê me.

2.1.6. Çîrokên Gelêrî

Şükrü Elçin gava çîrokên gelêrî te’rîf dike dibêje ku çîrokên gelêrî ji mehsulên wek efsane, çîrvanok (masal), menqîbe û destanan çavkanîyên xwe hildide û wan di nav xwe de dihewîne û wek roman derdixe pêşberê gel⁵⁷.

Çavkanîyên çîrokên gelêrî; efsane, menqîbe û destan in. Di çîrokên gelêrî de hêmanên çanda devkî gelek zêde ne û mirov dikare bibêje ku berîya ku hîn roman di nav gelên rojhilatî de belav nebibû, gel hewcehiya romanê bi çîrokên gelêrî diqedand⁵⁸.

Wek termek, yanî çîrokên ku ji alîyê gel ve hatine afirandin û di nava gel da belav bûne, ji alîyê hin kesan ve ji hin kesên din re hatine gotin û demeka dirêj bi awayê devkî hatine parastin. Çîrokên wiha, welew ku paşê ji alîyê hin kesan ve hatibin nivîsîn jî, ew malê gel in û çîrokên gelî yên giştî ne.⁵⁹

⁵⁷ Elçin, **h.b.**, s. 444

⁵⁸ Kaya, **h.b.**, s. 361

⁵⁹ Bozarslan, **h.b.**, r. 546

Çîrokên Gelêrî yên me ji navçeya Çaldiranê tespit kirine:⁶⁰

Çç-1

Çîroka Çemê Xûnê⁶¹

Kok Axa li wira Qubika⁶² da bûye. Kok Axa îja zehf mezin bûye. Aram Paşa jî li Wanê bûyê.

- Digo: Îja serê salê dibû, ‘eyd bûya herkesî beranek hildida dibirine mala Kok Axa. Çiqa axaler hebûna.

- Dibê: Îja datinî.

- Dibê: Îja beran dahanî konda wexta goşt birinç nedida mêvanê xu, ew beran dahanî bidîyê wan dixesand, piştê xesandinê,

- Digo: Bişîne bira here nav pêz. Ewana tev dûşûnmîş dibên,

- Dibên: Yaw pekî me ji wî ra pez hanîye ew çima beranê me dixesîne.

- Qey dibê: Yanî min we hemû xesand. Ewana isa dibêjin: Deng diçe ‘Elî Beg. ‘Eli Beg pê dihise. ‘Elî Begê Mîrze Axa li Tucîyê⁶³ rûdinê. ‘Elî Begê Mîrze Axa

- Dibê: Mi ra du hev diz bînin. Yekî kal tê, yekî cahil⁶⁴ tê.

- Dibên: Beg te çima gahîz me kirîye.

- Dibên kuro Kok Axa me aha hemûka dixesîne. Kê we derbekî lêxe ezê, evê kal ra sed mîhê bex bimê. Ewê cahil jî ezê bizewîcînim, konekî bidimê sed mîhê bidimê.

- Dibên: Baş e.

- Dibên hûn dikarin?

- Dibên: Em dikarin.

- Dibên: De baş e.

- Dibên: Beg dizanî tê ça bikî?

- Dibên ti me ra kulavekî bînî, nava rûn da temîz biqelîşînî, ‘eynî don veqetînî.

- Dibên: Tê me ra gilokekî rîs aha badî bînî.

- Dibên: Tê me ra du heb derzî bînî, bavê xu re bêjim, qamûşekî dîne qul dike, çê dike, temîz kêlekêkêda dipêçe, kêleka dinê jî serê wê dihêle vala.

⁶⁰ Çîrok di nav cureyên edebîyata gelêrî de yek jî cureyên herî popûler e. Lê di merheleya berhevkerinê de em rastê vê cureyê nehatin. Yanî me di navçeya Çaldiranê de qet çîrok tespit nekir.

⁶¹ Li Çaldiranê hem navê gundekî û hem jî navê çemekî ye.

⁶² Navê gundekî Çaldiranê ye.

⁶³ Navê gundekî Çaldiranê ye.

⁶⁴ Ciwan.

- Dibê: Tê li her serê wî tijî morîstang bikî. Dibên ev her dizana rê dikevin têne vira Qubika. Dibên wextê yê xu bigîhîne kon dêna xu didinê seyê Kok Axa isa nin meriva dixun.
- Bavo dibê: Kulava derxin. Kulav bi don e, qet qetî dike, davêje, herekî kulavekî hildide. Ev kerên kulava qet ret dibin, sê pêdan dikevin, ewana xu digîhîne Qubika. Dêna xu didin Zerîfa qîza wî û jina wî li Qubika razane. Dibên wextê razay dibên, yek dibêje yekî dinê
- Dibê: Kuro êdî berê sibê zelal bû.
- Dibê: Îsa xewa min tê.
- Dibê: Ezê qasekî serê xu daynim tu nobetê bigre hetanê sibe zelal be.
- Dibê: Ew wextê serê xu datîne ew ê dine jî li ser pîya disekine, benîştê xu dicû.
- Dibê: Ew gedê cahil, dibêje yê kal
- Dibê: Kuro tivinga min bigre. Hema diçe ber disekine benîşt li dev derdixe. Ewa xewra diçe. Yek dikeve Qubikê dinê, yek vira Qubikê. Delingê derpê Zerîfê yek vedike, yekî dine wextê pifê morîstang nake morîstang radibên, ewan derpê xu davêje, derpê wextê hildidin ewana rêkêfê konê Kok Axa dikin. Diçin destê fişeng datîne ser cîhê Kok Axa. Ev gilokeke bend jî davêje vira hemasan dirêj dike lêxin... Dibêjin Kok Axa Welle! Ha ho! Derpê Zerîfê birine, Kon qelişandine, destê fişek jî danîne ser belgî. Kuro - Dibê: Bigerin ka eva kê kirîye? Dêna xu didê bend li alîyê Bayîzaxa hatîye.
- Temam dibê: Eva ‘Elî Begê daye ber me, kirîye. Ser wî ev şerê Xûnê li ser vî çêbûye. Hev dixin, hev dikujin, çem xûn dikişe. Ji bona wî dibêjin gundê Xûnê, çemê Xûnê. (J57)

Çç-2

Çîroka Yavûz Siltan Selîm û Şax Îsmail

Şah Îsmail ça hatîye vira û ça derketîye? Ev pîrsa gelek xerîb e, gelek dûr e.

Wexta Şah Îsmail hatîye vê derê, wî çaxê zozangeh serbest bûne. Sêsid kîlomêtre Îranê da serbest bûne. Li Tirkîyeyê dikaribû biçûyayî zozana sêsid kîlomêtre jî li valîda serbest bûye li Îran bihata vira.

- Digo: Êdî Îran li valîda bihata li vir nedisekîni, sêsid kîlomêtrêyî diçû derdikete sinirê Gîhadîne⁶⁵

⁶⁵Navê navçeyeke Agirîyê ye.

- Go: Îja muddetekî zef hatin, êdî.
- Digo: Gundekî da bûne hezarekî. Bûne ‘eslê wê derê êdî nediçûn.
- Digo: Yavuz Siltan Selîm hate vî memleketî,
- Go: Wexta hat Şah Îsmâil pê hisya. Pê hisya, dêna xu day Yavuz Siltan Selîm hate Bayîzaxa. Yavuz Siltan Selîm hate Bayîzaxa, Şah Îsmail koç kir çû derkete sûtîyê Îsmâilbaba (Fetoyê ‘Emo), wira qalekek heye. Çû qalekê da asê bû. Yavuz Siltan Selîm gava hat “Topê Abîdê” eskerê xu daynî. Demek şûnda, bi eskerê xu çû li ser Şah Îsmâil, ne wekî herp, ne wekî hev xistin. Cîhê Tirkîyeyê bû, wexta ku çû Yavuz Siltan Selîm heta Tebrêzê derbas bû. Îja Şah Îsmâil
- Gotê go: Ti çima ez hatim li ser te sêsid kîlomêtre...
- Go: Ti derbas bû hatî heysid kîlomêtre..
- Go: Êne ti deh sala hatî...
- Go: Me ane gorê wî deh salî hesap kirîye em derbas bûne. Îja hatin cake eynî sinorê xu kifş kirin. Sinir olarak bême’nî henek cîhê Îranê kete ber cîhê Tirkîyeyê, hene cîhê Tirkîyeyî kete ber sinirê Îranê. (J16)

Çç-3

Vê Dinê An Dinêya Dinê?

Dibên padîşahek hebû ye du kurê wî hebû ne. Îja padîşah zefh merivekî baş bû ye. Merivekî bi hikimdar bû ye. Îja padîşah Rebbê ‘Elemê dîne xewnê da

- Dibe: Ti dixazî ez vî dinê ‘ezap bime te yan wê dinê.
- Dibê: Welle! Ya Rebbî! Ez hema hiz dikim vî dinê ‘ezap bikişînim. Ewa dinya dinê tişteki zehf zor e. Ezê hema vê dinê ‘ezap bikişînim. Wexta isa gotîye, jêra cap tê.
- Dibê: Ez hiz dikim vê dinê ‘ezabê xu bikişînim.
- Dibên: Baş e.

Rojek cabê dine Paşê,

- Dibên: Welle! Aşê te ters wergerîya ye. Heft aşê wî hebû ne - de berê aşekî kê hebûya gelek zengîn dihate hesap kirin -
- Dibên: Welle! Aşê te tamamî wergerîya ye. Êêê!

- Dibê: Îşê Xudê ye. Dibe. Bira can sax be. Cabê didinê
- Dibên: Welle! Pezê te, dewarê te filan derê da roda çû. Ewa merva vî hesabê dewam dike, welhasil tiştekan nabîne.
- Dibêje jina xu dibê: Qîzê! Em herine cem rûspî yê gund da çika me nakine gavanê gund. Ditirsim me negrin. Aş çû, pez çû, dewar çû, dem dezgah çû, tu tiştekan nema.
- Dibê: Welle! Ti herî ce, em êvîra⁶⁶ xu dernekevin zefh xaş dibe. Êêê!
- Dibê baş e. Diçe ce mervê aha pê sekini
- Dibê bavo: Ka tu xu ra bûyî çî, me ra bibî çî? Te maleke zeng û zîng bela kir. Êêê!
- Dibê baş e. Diçe pîrs dike.
- Dibê: Welle! Filankes, min çûye tamamê bi cînarên ra gotîye, cînar hez nakin te bigrin.
- Dibê: Çîma?
- Dibên: Te ka paşatîya me da çî kir, tê niha li vira çî bikî?
- Dibêje jina xu, jina wî
- Dibê: Filankes hema em vira barkin herin. Mala xu, hema dem dezgahê xu tep dîkin, serê xu hildidin diçin. Diçine kê derê? Em bêjin diçin cikî mînanê⁶⁷ Doxubayîzîdê yan jî diçine cikî mînanê Îdirê.
- Dibên: Bira cikî isa⁶⁸ be kes nasneke. Yê me pê ra hevaltî kiribin bira qet me nebînin. Rojek du roja wira disekinîn, radibe diçe cem beledîye başkanîyê wira veyaxûd meznê wira. Rûspîyê wira, mixtarê wira, wê derê ra
- Dibêje: Filankes ez hatime, ez belengaz im, hema min berê xu daye we, du hev kurê min hene, gavantîya mehelê bidine min, ez bibime gavanê mehelê. Pîrs dîkin
- Dibên: Heqet gavanê mehele tine⁶⁹. Dikine gavan. Dikine gavan, îja gavanîke dort dortlix⁷⁰ dike. Dewarê wana, çûyîna wana, hatina wana... Milet, dêna xu didinê merivekî zefh baş e. Jina wî qe dernakeve derva, kesî nahêre. Dû hev kurê wî hene, her kurê wî qe

⁶⁶ Cih

⁶⁷ Wek hev

⁶⁸ Wisa

⁶⁹ Tune

⁷⁰ Rind, Baş

dernakevin derva. Yanî îltîfateke temîz pê ra çê dibe. De paşeyekî memleket bûye. Rojekî kerwanek tê wê derê. Kerwan kincê wana gelek qirêj digrin. Pirs dikin

- Dibên: Qe jineke baş tine, em kincê xu bidinê bira kince me bişû.

- Dibên: Welle! Jina gavanê gund heye, hema dibên rûyê kesî nanêhêre.

- Dibên: Eger hûn biherin ancax bidine wî jinikê bişû.

- Dibên: Memleket hemû zengîn e, kesekê kinca bişû tine. Diçin teq teq derî dixin, jinik dernakeve derva. Pişt derîva

- Dibê: Kerem kin, we xêr e.

- Dibên: Welle! Dayê, tûccar başîyê me kinc dane me, evna kincê îşçîyanin tê bişûyî emê heqête bidin.

- Dibê: Bavo durê malê kevin, ez kinca naşûm. Tê dibêjine axayê xwe. Axa

- Dibê: Wellehî! Virda hikmetek heye.

- Dibê: Kuro herin pera, zêra bine, boy Xudê, çika jinikê bibînîn, jinik çakîne ye? Diçin, velhasîl jinikê zorlamîş dikin, jinik

- Dibê: De Welle! Wi hatine ber derî, ber derê me behsa Xudê, pêxembera dikin...

- Dibên Axê me mêjker e, boy Xudê filan- hâlbuki vira dikin-. Jinikê sewrat dikin. Jinik wexta kinca dişû, kinca isa radixe - de germa havînê bûye – kinca dîne, ‘eynê wek ûtîyê rast dike, çaxê tîn kinca beherin, axa dêna xu didê ev kincana tu kesi wek jinikê rind neşûştîye. Axa

- Dibê: Kuro hûn dikarin ewê jinikê bigrin mi⁷¹ ra bînin.

- Dibên: Welle! Axa eger em jinikê bixapînin, bigrin bînin. Cake⁷² tîn ber derî teq teq derî dixin.

- Dibê: Ew kê ye?

- Dibê: Dayê Welle! Axê em şandine, gofîye bira bide xatirê Xudê evî pereyî xu re hilde, heqa kincê me temîz şuştine. Wexta behsa Xudê dike, jinika qijik dibê de qey Misilmanin, jinik hema ça derî vedike, devê jinikê digrin, jinikê dikine nav sandoqekî da, her gede jî

⁷¹ Min

⁷² Careke

malê tik tenê dibinîn. Navê yekî Mihemed e, navê yê dine jî ‘Ehmed e. Jinikê dibin diçine cem axê xu. Jinikê dînin tên, axa dêna xu didê ya rebbî hûsnî cemalek e.

- Dibê: Kuro odê dernexin, barê me barkin em herin. Jinikê dine ser barekê devekî - ewna bira herine hesabên xu, em îja werin dora her zaran- Her du zar digîrîn ax û zarîyan dîkin, bavê wana tê, dêna xu didê derî ser piştê, her zar isa girîyane xun⁷³ çavê wan rijîyane.

- Dibê: Kuro ‘Ehmed, Mihemed ka cîya⁷⁴ we?

- Gotin: Welle du hev meriv hatin, kincê xu dane şuştin. Carke dinê hatine, hene pere hanine, cîya me girtine birine. Gavan

- Dibê: De Xudê histandîye... Dizane hal mevzî akîne ye. Xelk

- Dibên: Bavo jina te nebaş bûye, daye pey xelqê çûye em çabikin. De Xudê gava bistîne. Axa (gavan)

- Dibê: Welle! Xêra min ji vendera⁷⁵ nema. Hema ez sewa jina xu vendera mabum. Ez im du hev zarin, ezê zarên xu hildim heme cîkî başqe. Şehîrekî başqe bigerim, elbet du hevê itanê mala Hecî Miheme⁷⁶ yê qote nan bidine deste zarê min, yê zarê min xayî bikin. Welle! Navê Xudê ez vira nabînim. Serê gunda here ti naçî. Tabîî hêdî hêdî diçe, rastê çemekî tê, çemekî zefh mezin, dibê: Ez her du zaran bime pişta xu biherim, ez pê nikarim, ewana yê roda herin, her zarên jî roda herin. Çemek çemekî wekî Xûnê.

- Dibê: Hema ‘Ehmed biçûke, ezê ‘Ehmed bidime pişta xu dervasê walî bikim, Miheme mezin e, ezê bejim kuro tu vira bisekine xu neavêje av mavê, ezê werim te jî beherim. ‘Ehmed dide pişta xu qederekî diçe, pê wî dikeve zaneke, ewk dibe ‘Ehmed ser pişta wî dipeke dikeve nav avê, bingeha wî sor bûye. Dike nake pê nikare bigre. ‘Ehmed ketîye nav ava sar, kuro

- Dibê: Mala min xirabû ‘Ehmed çû, qet nebe ez vegerime Miheme. Verdigere, hetanê nîzkayî ya wî pê dikeve, dêna xu didê, gurekî li rastê da Miheme hildaye herik tu naçî. Hey

- Dibê: Mala min xirabû çû. Rûdinê ax dike, zarî dike. Gazî Xudê dike.

⁷³ Xwîn

⁷⁴ Dîya we

⁷⁵ Li vendera

⁷⁶ Mezinêkî û rûspîyekî Çaldiranê tê qebûl kirin (1926-1989)

- Dibê: Ya rebbî, ez ‘evdê tebûm. Avê dikeve derbasê walî dibe. Dêna xu didê, şehirekî mezin, diçe ber deve dikanekî, mêja nivro da disekine dêna xu didê, xuyê dikanê dere dikanê dadaye çûye mêjê. Ew jî hema di de pey pê ra diçe mêjê. Mêj dikin verdigerin dîsa tên ‘eynî pêşîya dikana xu da disekine. Birçîye zor dibîne dikanê dinihêre, mêrik
- Dibê - xuyê dikanê – kuro ewa meriva sibê da wira sekînîye, ewê mixe. Şikeke⁷⁷ kotî mêrik digre.
- Dibê: Eger mixe? Kuro hema ezê gazî bikim, gazî du ‘evda jî bikim, bira wêrin bibînîn, ku çika ewa meriva ji bona çi mi dixe. Îşçîyê xu dişîne ce axê
- Dibê: Bira were. Mirad Axa tê ber disekine
- Dibê: Keremke axa.
- Dibê: Tu çima vir sekiniyî? Qurban
- Dibê: Welle! Ez bêkesim, kesekî min tine, merivê min tine ne.
- Dibê: Hema ez vir sekînîme, min gotiyê xêra pêxember ji bona Xudê kê nonekî bide min?
- Dibê: Ha te re pere xura nan bistîne.
- Dibê kêfa nan e, êvarê cîhê razana min tine ye.
- Dibê: Pekî ez te bigirim îşçî, tê bikaribî mira bixebitî?
- Dibê: Welle tu min bigrî îşçî, ez ê rojê deh dana destê te paçkim.
- Dibê: Ezê heqê te çi bidim?
- Dibê: Ez heq te naxazim.
- Dibê: Hema, ez roja mirim, hemû tiştê min xaş helale te be. Tê min kefenkî beherî çelkî tamam e.
- Dibê: Ne xêr. Dêna xu didê bû êvar, merivekî hespek hanî hat, axa lê sîyar bû – xuyê dikanê –

⁷⁷ Guman

- Dibê: Ewî bi zehmet, debê gote min tu jî were em herin. Diçin devê hevşîyekî mezin, me vekir, xan manekî mezin, temîz, malekî cengî, maleke aqil selîm tên disekînin. Nesîbe ha! Diçe mala wî, êvarê axa dibêjê dibê: Navê te çî ye?
- Dibê: Navê min Mirad e. Dibê baş e.
- Dibê: Eva oda ji te ra.
- Dibê: Nanê te, ava te, xarina te wê naha bine te, hevaleke te jî naha were cem te.
- Dibê: Sibê şefeqê ez ça rabûm tê jî mi ra rabî mêjkî.
- Dibê tu mêjkî mêjneki mehzuya min pê tine, dibê: Ti mira rabî werî dikanê, hetanê êvarê tê ce min bî. Hetanê êvarê, êvarê dîsa emê tev wêrine malê.
- Dibê: Wey! Ser çavê min. Em îja êdî bira wira dewam bike, berdestê wî be. Jinik hildan çûn, axa jî hat wir bû îşçî. Navê wî gavantîyê derket bû Miradê Îşçî. Herkesî hijê kir, ehlaqê wî temîz e, herkesi gazî kir go were ce me.
- Go: Welle! Ez nayêm! Ez axê xu nahêlim nayême cerm we. Rabbil ‘Elemê îja wergerande ser başîyê. Emê îja werin dora her kurê wî. Kurê wî hat kete şîka⁷⁸ êş da. Av tê dikeve şîk da, şîk aş verdigerîne. Ewa merva hate ber derê êş ku bikeve êş, aşvan hat eva ser devê sûrê girt. Navê wî ‘Ehmed bû, zarê wî tinebû, hilda dêna xu dayê gedek xuva çûye, Av ketîye deve wî, zikê wî, çavê wî. Bêna wî hatîye girtin, gede hanî hate êş, bêmenî nefes⁷⁹girt çêkir. Gede hate ser hemdê xu, gede li der dora xu nêhêrî. Kuro!
- Go ti kurê kêy? Ti ji ku hatî, tê ku da herî?
- Gede go: Welle! Ez nizamim.
- Go: Bavê min, ez dame pişta xu, hanî hatim derbaske
- Go: Avê li me xist, bavê min xeliqî ez jî hatim derketime li vira.
- Go: Rehma Xudê li dê bavê te be, te jî min xilas kir. Welle!
- Go: Lay û kurê min tine ne, hema ti bibe evladê min. Destê wî paçkir.

⁷⁸ Cihê ku di tê de av tê.

⁷⁹ Bêhn.

- Go: Hema ti bavê min, ez jî kurê te. Hilda bir çû. Jinikê jî qebûl kir. Êdî hema bû kurê malê. Zefh hijê kirin. Êdî felek vergeriyaye da. Em îja vergerine dora Miheme. Miheme gur hilda bir çû, şivanan dêna xu danê zarek devê gur da.

- Şivanan go: Halla halla⁸⁰pez gemî dane peyda, devê gur da gede derxistin. Ewa jî hanî hatin, şivanekî îxtîyar hebû, gahîz wî jî kirin.

- Go: Welle ezê beherim ji xu ra xayî bikim. Ewa jî havîtine meytêvê. Meytêvê da her du zar ‘eynî dersxanekî da dixunin.

- Go: Ne ewa dipirse dibê: Tu kurê kê yî, ne ewê dinê dipirse dibê tu kurê kê yî? Bavê gede ku gura birîye çûye navê wî Miheme bû ye. Miheme dibê: Welle! Bavê min me hanîye derbas be bi bire min ve lê roda çû xeliqî. Min jî xilas kirine û ez hanime li vî rojê. Baş e.

Em werine ser kê? Em werine ser paşê. Paşê şehir. Paşayê şehir çû emrê Xudê. Cîhê ku lê miraz kiri bû tê li wira, îşçî dêna xu didin paşa mir. – De bere paşetî hebûye. Meriv zeyîf nebûne, qene’et hebû ye – Yanî herkesi qene’et kirîye. Teyrek hebû ye. Teyrê paşê. Li serê kê rûnê ewa dikirine paşa. Iro memleket ma bê paşa, memleket ma bê paşa. Memleket da îro paşetî ket. Memleket da sibê paşetî ket. Dehê dinê paşetî ket. Kê were paşetîya wira bike. Kurê wezîr dibê: Ezê bibim paşa. Kurê qadî

Dibê: Ezê bibim paşa. Kure Hecî Esed

Dibê: Ezê bibim. Kurê Hecî Mihemed

Dibê: Zengîne vî memleketî ez im, ezê bibim. Temam dibêjin: Ezê bibin.

- Dibên: Emê bibin. Rebbê ‘Elemê hez nake ewna bibin.

- Dibên: Emê çi qirarî bikin? Bêmenî dînin tîn.

- Dibên: Teyrê me yê paşê heye emê teyrê berdîn, kurê paşê jî heye.

- Dibên: Xudê bike li serê kurê paşê rûnê. Mirad Axa pê dihise direve tev dikeve hindirê kadînekî. Derî ser xu da digire.

⁸⁰ Şewq.

- Dibê: Boy Xudê belkî teyr were qe bira kesek nebîne. Teyr digere digere tê li hindirê ew cîyê ku axê tê da maye teyr li ser serê Mirad rûdinê. Mervê wê devrê tèn Mirad wira derdixin dikutin, dibine mala mervê xu. Çend hev li wira
- Dibêjin: Hûn çima wî dikutin. Axa
- Dibêje: Kuro hûn çima ewî dikutin? Bînine kêleka min. Axa çima dibêje bînine kêleka min?
- Dibê: Bînine kêleka min belkî teyr tê ser sere min rûdinê, wextê ku dibine wir, carke dinê teyr berdidin. Carke dine teyr tê li ser serê Mirad rûdinê. Teyr dîsa çû kete kebûna⁸¹ xu. Mervê wê dewrê ên mezin dibên ewa îşçî ye, Wellehî!
- Dibên: Emê paşetîyê bidine wî, em qebûl nakin. Mirad Paşa dibe padişahê wê memleketî. Dibe paşa. Îja paşekî ça. Padişahêkî ‘edeleta wî dort dortlix.
- Dibên: Baş e. Ewna wexta wî mervî dikine paşa, ewa jî dibe padişahêkî ‘edaletê. Paşa çi dibêje. Paşe dide îlan kirin, du û sê sala dibe paşa.
- Dibê: Mira du hev zar lazimin, du hev gence xandî.
- Dibên: Baş e.
- Dibên tèn îlanê dişînine her dere. Bavê Miheme
- Dibê Welle! Ezê Miheme beherim, heta naha min xayî kirîye. Ezê biherime ce paşê, belkî
- Dibê: Tişteki, Rebbê ‘Elemê belkî tişteki dide min. Bavê ‘Ehmed jî
- Dibê: Welle! Ez êdî îxtîyarim, kalim, şivanim.
- Dibê: Ezê beherim, belkî bibe tişteki. Qet nebe bira ew me binêhêre. Bavê wî
- Dibêjê: Kuro tu hiz dikî?
- Dibê: Ez hiz dikim. Bavê dine jî
- Dibê: Bavo ti hiz dikî?
- Dibê: Erê, ez hiz dikim. Yek dibe çaycî, yek jî dibe xurekçî. Herdik ber deste paşê dixebitin. Îja herdik daîma ce hev bû ne. Hev ra nabêjin tu kurê kê yî, tu ji ku derê hatî,

⁸¹ Hêlîn.

tu ku derê herî? Carekî behs nakin. Eger sal zeman derbas dibe, êdî gelek zeman dikeve ortê, ewa mervê cîya wana revandîye, ewa jî kare xu dike

- Dibê: Ezê jî herime wî şehre. Şehrekî aha adil e.

- Dibê belkî eşyayê min were firotanê. Ku da jî here jina xu jî xu ra dibe. Êdî mehra wî biriye, jinik bûye jina wî. Cake jinik hiz nake, ema êdî Xudê histandîye. Tê salekî wira dibîne, eşyayê xu derdixe firotanê, kuro ewa merva çika satişeke rind dike.

- Dibê: Welle! Emê hedîyekî çekin, paşê ra beherin.

- Dibên: Baş e. De kincê wî çaxê eger îşlik be, eger ewk be, eger çekêt be, jê ra çê dikin dibin.

- Dibên: Emê paşê re beherin. Wexta ku diçin xelatê bine paşê, paşê wir nîne. Paşê êvarê tê malê

- Dibê: Kuro Miheme ewî dibê mi ra hedîyek hanîye, çika bîne dêna xu bimê da. Dîne dêna xu didê, hedîyê vedike.

- Dibê: Peh! Jina wî dikeve bîrê.

- Dibê: Kuro wextekî jina min êynî akîne kinç ûtî dikir. ‘Eynî kinç anîye qet kirîye.

- Dibê: Kuro xazila îman Qur-an’ê, min ew meriva teklîf⁸² bikira.

- Dibên: Wexta paşê îşçîyê xu dibîne

- Dibê: Kuro hûn ê herin cerm wî mervî, ewa û sîyarê xu va, heçya ewnê nav şehirda eşya difiroşin sibê nêvanê me ne. Emê jî hedîyekî bidine wana. Bira dîyaloxa me çê be. -

Dibên: Baş e.

- Dibên: Teklîf dikin. Dînin tê, dîsa hedîyeke dine dînin, îşlikekî ûtî kirî. Paşê dêna xu didê dîsa ewna kinca ûtî kirina wana ‘eynî kirine. Mirad Paşa dibêje, dîsa dibêje ewê tüccar...

- Dibê: Kesekî te mala ewkê da maye, nemaye.

- Dibê: Welle! Hema kulfeta min maye û du hev jî îşçîyê min maye. Yaw!

⁸² Pêşniyaz

- Dibê: Me nan daye pêşîya xu da, nan ber min da naçe. Yaw kulfeta min tineye. Here kulfeta xu bîne.
- Dibê: Du hev îşçîyê minê zefh temîz hene ezê bişnime ber çadira te, bira her îşçîyê te werin nan bixun. Ez xulam dibê nabe. Paşa!
- Dibê: Çîyê te çû ezê bidim. Dibê îşçîyê min zefh saxlemin. Mirad Paşa dîne ‘Ehmed û Mihemed negotine em kurê paşênê ha! Herdik çûne wê derê, ber çadirê. Wan herdikên dinê, dişînin tê. Ça wan hebûye, çay dixun. Miheme
- Dibêje: ‘Ehmed, Miheme birayê wî mezin e.
- Dibê: ‘Ehmed! Îja çika sal e, em ce hev in.
- Dibê: Ti xelqê kîjan gundî yî?
- Dibê: Ez xelqê Bayîzaxa me. Li Bayîzaxa kîjan gundî?
- Dibê: Bêşî⁸³.
- Dibê: Li ti?
- Dibê: Welle! Ez jî xelqê Bayîzaxa me û gundê Bişaraxa⁸⁴ me.
- Dibê: Kuro pekî ti xelqê Bayîzaxayî û tu kuro kê yî? ‘Ehmed halê wî hate bîra wî.-
- Dibê te kezeva min dax kir. Kuro!
- Dibê: Çima çî ye? Ji mi ra jî bêje.
- Dibê: Filankes; ez kurê Mirad Paşa me. Wextê go: Ez kurê Mirad Paşa me, Mihemed xuy da. Xuyê li ser wî ra davêje. Jinik jî hindirê çadirê da bûye. Wana dînlemîş dike. Kuro!
- Dibê: Çakîne Mirad Paşa?
- Dibê: Kuro ez kurê Mirad Paşa bûm. Bavê min, min walî çêm hîşt. ‘Ehmed da pişta xu derbas kir. Bavê min mir, ‘Ehmed jî xeliqî.
- Dibê: Kuro ez ‘Ehmed im.
- Dibê: Ça?

⁸³ Navê gundekî Çaldiranê ye.

⁸⁴ Navê gundekî Çaldiranê ye.

- Dibê: Welle! Kuro ‘Ehmed ez im. Herdik xu davîjine ser des pê yê hev, digîrin.
- Dibê: Cîya me aha birin, bavê me aha kirine gavan. Bavê me aha em xilas kirin. Gura ez birim, ti jî belkî avê da xeliqî çû, çû. Herdik li ser hevda digirîn, jinik devê çadirê vedike.
- Dibê: Xudê we herdika xayîke
- Dibê: Êne ez jî cîya we me.
- Dibên: Ti ça cîya me yî?
- Dibê: Lê ew kurê kerê hat ez birim çû, aha naha ew jinika biribû ez im. Ça?
- Dibê: Erê Welle! Jinik, gedeyan li ser hevda digirîn, digirîn dikevîne hindirê çadirê da, digirîn, zarîya dikin, ax dikin. Destên her du gedeyan sere xu didine ser çiçikê jinikê da radizên. Em îja bizvirine walî. Her du îşçî nan dixun û dibêjin emê herin, emê her du îşçîyê te jî bişînin. Tê, îşçî dêna xu didine her du zarok li paşka jinikê da nin. Nava cî da nin, kincê wan a li wan e. Yalnız desten wan stûra jinikê da ne. Destên wan li ser çiçikê jinikê da ne. Her desten jinikê jî ber sere zara da bû ye. Cabê dine paşê...
- Dibên: Welle! Ew her du merivan ketine çadira te ce jina te. Naha xirabîyê dikin. Tê dêna xu didê, şûr dikşîne lêxe, dibên: Em cabê bine paşê ku bira paşa were wana akîne bibîne. Ewana diçin gazî paşê dikin. Paşê û vekîlê xu û vezîrê xu tèn.
- Dibên: Emê herin çadirê.
- Dibê: Emê bikujin.
- Dibê: Na. Nekujin.
- Dibên: Em îfada wana bigrin, paşê. De paşa paşekî ‘edaletê bû ye.
- Dibê: Êne hanine jina mira xirabî kirine.
- Dibê: Na. Tu ketî mintîqa min. Çi hebe, ceza yê ezê bidim. Ceza min kiriye.
- Dibê baş e. Hildin dînîne meclîsa xu. Meclisa xu çêdikin. Hikimeta xu çêdikin.
- Dibên: Herin jinikê û her du meriva hemûka hildin bînine wira. Jinikê, gede û gedê din va, hersêka hildidin û wan ra derekekî dardakirinê çêdikin. Paşa!
- Dibê: Yalnız pîyê wana nexine ‘erdê.

- Dibê: Ewana akîne bisekinin, emê îfada wana bigirin. Îfada jinikê digrin.
- Dibên: Pekî ev her du zaran çima ketine çadira te.
- Dibê: Herdik kurê min in. Ça kurê te ne?
- Dibê: Evna herdikana kurê Mirad Paşa ne. Mirad Paşa mêrê min bû. Evî mervê hane zilimkar, hat ez zorê hildam bir çu. Behsa Xudê, pêxembera kir. Min kincê wan şûştin, dana wan beherin. Wana jî ez xistime barê xu da birim. Ewana hatine ber min ketine îro îfada xu dane. Herdik jî kurê min in. Mirad Paşa
- Dibêje: Axa!
- Dibêje: Belkî kurê te bimire. Welle! Eva jinika jina min e. Ev herdik zar jî kurê min in.
- Dibêje: Heqê kê darda kirine? Ya boy Xudê, wexta te hijê Xudê bikira te ew gunekarîya nedikir. Gava roja wî were heq cîyê xu dibîne. (J16)

ÇÇ-4

Çil Bavê Çê Dajo Li Ser Şîrê Dê

- Du hev axa hebûne, zehf jî hijê hev kirine. Îja her axa jî qîzê xu dane mêr. Axa!
- Dibêje axayê dinê da
- Dibê: Sibê dewata qîza min e tê werî dewatê?
- Dibê: Welle! Sibê dewata qîza min e jî
- Dibê: Ez nayê.
- Dibê: Ez ê berdestîyê xu bişînim.
- Dibê: Ê baş e. Sibê berdestî wi tê axa pêşva tê
- Dibê: Ka, axa nehat?
- Dibê: Welle! Dewata qîza wî bu jî te ra jî gotibû, ez hema pêş wî va hatim. Eynî qaîdê axatîyê wî jê ra hurmet dike. Wexta isa jê ra hurmet digre, çaxê rabe here, berdestî hespê xu digre were here, axa dibêje berdestî: Here ez û tu, tu wek şîrê xu.
- Dibê: Axa xatrê te. Diçe ce axê xu, axê wî jî êvarê tê dibêje axê xu
- Dibê: Axa, dibê filankes, tu çû yê ce axa, axa te re çî kir, çî hurmet, çî qîmet da te.
- Dibê: Axa! Axê cîya min ça da gayîne.

- Dibê ça?
- Dibê ez ça çûm, ez dame ber sola, dame ber ava hespa, axa!
- Dibê: Allah Allah
- Dibê: Quro Xudê bela xu bide wî, kena me hijê hev fikir, me hev ra hurmet digirt, evî çima akîne kir? Çend roj dikeve ortê, axa çarsîyê digere dêna xu didê, ew axayê dinê. Te qîza xu daye mêr, dêna xu didê axa lê jê dur dikeve. Dibê pey eva çima min xeyîdîye?
- Dibê: Xudê evî tiştêk bihistîye.
- Dibê: Axa, axa!
- Dibe: Ca were wir.
- Dibê: Mala te ava be, ti çima isa durê min ketîyî?
- Dibê: Min te ra got ezê berdestîyê xu bişînim te nava xelqê da çima berdestîyê min isa rezîl kir.
- Dibê: Ça?
- Dibê: Hal mewzû akîne, akîne.
- Dibê: Hespê te vir e?
- Dibê: De sîyar be emê hene mala me. Sîyar dibin tên dêna xu didên berdestî derê malê rûniştîye, axayan
- Dibên: Selam ‘eylekum, ‘eylekummesselam. Berdestîyê axê çev dikeve radibe sepya-
Dibê: We’! Axa tu ser çevê min bavê min re hatîyî.
- Dibê: Rehma Xudê li bavê te be. Axa tê serê hespê axê bigre, axa
- Dibê: Negre bira berdestîyê te serê hespê min bigre, bikşîne hindir. Ez û ti em terka hev nekin. Paşê bira were ce te hespa te jî bikşîne. Hespa dikşînîne hindir. He heval hindir de rûdinên. Eger bavo hurmeta wî çaxî çay be, nan bu ye çi be bi hev ra dixun. Kuro!
- Dibê: Berdestî were vira.
- Dibê: Lawo ez û ti, ti û Xudayê xu, min çi xirabî te ra kir.
- Dibê: We’!
- Dibê: Axa ti dibêjî xirabî?

- Dibê: Te ez dame ser serê xu. Axê dinê dêna xu didê, hindirê xu da
- Dibê: Evî çima akî kir? Axê dinê
- Dibê: Koro lawo, te nego ez çûme, ava hespa min dane kişandinê.
- Dibê: Belê min gote te.
- Dibê: Îja bêje axê wexta ku ez sîyar kirim, zeyîya⁸⁵ mi kir, çi gote min?
- Dibê: Welle! Min gotê ti here ez û ti, ti şîrê xu. Aaa! Îja Xudê ji te razî be.
- Dibê: Îja de were ku pirs ke çika şîrê min çakî ye da?
- Dibê şîrê te çikarî ye?
- Dibê: Ez çila da bum.
- Dibê: Ez heft rojî bum cîya min mir.
- Dibê: Bizineke me hebu, hê çilê min derneketibu.
- Dibê: Pîrka min anî hat ez berda me şîrê bizine. Govalek min dimêt govalek karê dimêt.
- Dibê: Çilê min panzdeh roj mabu
- Dibê: Bizin jî 'îşk bu.
- Dibê: Êêê wî çaxî ne şîr hebu ne tiştekan.
- Dibê: Min jî tiştekan nedixar.
- Dibê: Pîrka min kete nava gund pirs kir gotin Welle! Dêlikek filan mehlê ferîtiye⁸⁶ du tulê yê wî heye.
- Dibê: Pîrka min çû ewa dêlika û her tulê wî anî hat nava xanîyê me da girêda.
- Dibê: Danekî ez berdidima ser, govalek min dimêt.
- Dibê: Danekî jî her tule dimêt.
- Dibê: Îja te gote min here ez û ti, ti şîrê xu. Ka îja minê çi bigota. Şîrê min şîrê bizinê û dêlikê bu, min ê çi bigota. Îja te hêca gote min ti Xudê, kete bîra min te wi çaxî bigota ez

⁸⁵ Piştî dewatê cara 'ewil çuyîna bûkê ya malê bavê xwe. (Çîrokbêj di vira de di me'neya xelatê de bikaranîye.)

⁸⁶ Welidiye.

û ti, Xudê min ê bigota a axê hat aha min re hurmet kirîye, axê aha qedrê min girtîye, axê aha ez dame pişta xu. Gotîye hemuka eva berdestîyê filankesê ye.

- Dibê: Axa isa nîne? Axa

- Dibê: Eşedillah isa ne. Ez neheqim. Niha çi dike şîrê dê dike. Erê rast e, bav jî şert e, feqet şîrê dê şert e.

- Dibê: Bav temîz be, dê temîz be him şîr temîz dibe e, him toxim temîz dibe. Wi çaxî ça dibe, dibe nanê Kırık Bahare⁸⁷. (J16)

Çç-5

Kurê Mîr

Dibên: Kurekî mîr hebûye, de bere ça digotin Mîrê Botan, mîr jî hebûne. Axa jî hebûne. Îja ez te ra bêjim. Mîr mala wî zozana bûye. Kurekî wî jî hebûye. Kurê xu zewîcandî ye. Daweta kurê xu kirîye. Hanîye emre Xudê, bûk mehekî malê maye nemaye çûye emrê Xudê. Kurê wî kincê jina xu, zêrê wî, kelmelê wî hildide ber serê wî, çûye ber serê wî rûniştîye, girîyaye gotîye: Ya Xudê ezê isa bigîrîm Xudê ya rihê min bistîne yan jî jina min bo min rabe. Bavê wî diçe

- Dibê kurê min! Mirî ranabin, jina te jî mirî ye. Ez mîrim, ez zengînim, ezê te bizewîcînîm. Ezê şuna yekî dudîya bînim. Tu çîma digirî. Welle! Min zefh hijê kirîye. Dike nake gede sewrat nabe.

- Dibê: Wellehî! Ezê li wira bimirim, hûnê min kêleka wî çe'l bikin. Gede wira dimîne, êl radibe diçe ewa tenê dimîne wira. Hemasa digirî di'a dike. Rebbê 'Elemê emir mîlyaketekî xu dike

- Dibê: Rabe bêje wî 'ewdê min bêjê, nesîheta lê bike, bêjê: Ev mirî ranabin. Eva mir çû. Here bêje bavê xu bira te bizewîcîne. Boşîne beklemîş neke.

- Dibê: Îkna ke bira rabe here. Ewa meriva, ewa mîlyeketa dikeve suretê însana tê.

- Dibê: Kurê min!

- Dibê: Ha. Dibê: Tu çîma digirî li ber wi merzeli?

⁸⁷ Genimê ku biharê tê çandin

- Dibê: Welle! Hal bi hala. Jina min bûk bû, emre Xudê cîh hanîye. Min jî zefh lê hijê fikir. Ez dixazim Xudê min jî bikûje, kêleka wî, mi wira defin ke.
- Dibê: Kurê min isa nîne. Tu kurekî mîrekî, bavê te zengîne. Here bira bavê te, te bizewîcîne. Here çima heyeta xu ewk dikî. Mirîye çûye, êdî ranabe.
- Dibê: Mimkunata wî tine.
- Dibê: Îllahî ez terka wî nakim. Xudê bira rihê min bistîne. Ezê li cer wî bim.
- Dibê: Kurê min de tu rabe, bira merzelê wî vebe. Merzelê wî radibe serê wî vedike, serê wî radibe. Serê wî verdigerîne, serê wî radike. Heçî
- Dibê: Bêje Ya Rebbî, ji bo rizaya te ‘emrê min çi mabe li ser rûyê dinê de, nîve wî hîbeyê wê jinka xu dikim. Wextê gede dibêje, jinik kefen ra radibe ser xu. Radibe ser xu. Gede, hela radike, xu davîjine pêşîra hev, ser hev da digîrîn.
- Dibê: De rabe meherin. Ez ber tavê mirime. Îro du sê roj e. Em herin ser avekî, em cîkî avekî bixun, dezmêjekî bigirin. Diçine ser avê dezmêj bigirin.
- Dibên: Boy Xudê. Ê mêj kirin nekirin. Gede dibêje jinikê
- Dibê: Çoka xu dayne, îro çend roje ez qe ranezame. Ez serê xu bime ser çoka te ezê razêm. Jinik wexta çoka xu datîne dêna xu didê mêrê wî spî bûye. Eger yaşê wî sîh be, bûye çil pêncî. Lê yaşê wî yaşlî bûye. Serê wî spî bûye. Êdî jinik dêna xu didê heyran, ez evî kalî... Em qet yaşîmîşê hev dibin? Wellehî!
- Dibê: Ezê ewî bihêlim herim. Kincekî xu derdixe ber serê wî bilind dike, lê dixê diçe. Cîda dihêle. Eva Xudê bizanibe kî çaxê hişyar dibe, radibe dêna xu didê jinik tine. Êêê -
- Dibê: Xulî serê min be. Welle! Kurê min jî mitanê min be kurê min ê bibe dola şivan gavana. Bavê min gote min jî
- Go: Kuro were emê yeke isa bînin, bira avê destê wî neke. Min xebera bavê xu nekîr. Ewî bixu ez cîda hîştîm çû. Mêrik dêna xu dide xu ew bûye kalekî heftê salê.
- Dibê: Ez ça bikim ça nekîm?
- Dibê: Wellehî! Êdî ez ser bavê xu naçim. Şhrekî berfîreh, derdikeve cîkî şhrekî, dêna xu didê kanîkeke mezin, jin min avê ser çavê xu dikin, dêna xu didê sê meriv jî hatine nêçîrê. Nêçîr, çi girtine xu ra rûniştine se kanîyê xeber didin. Xeber didin ew jî guhê xu dide wan.

- Dibê: Çika çi dibêjin? Behsa jinikekî dikin.
- Dibê: Welle! Kurê paşê hatîye nêçîrê, xu ra jinek dîtîye. Jinik dibê çûye daweta kurê paşêye. Aaa! Xudê zane dibê: Ewa jina min e. Radibe
- Dibê: Hûn kêne e, xelqê ku derê ne?
- Dibê: Welle! Em xelqê filan şehre ne. Îja kurê paşê dibê: Nêçîr jin qe qebûl dibe?
- Dibê: Welle! Jina te meriv qêmîş nake dêna xu bidê. Paşa jî
- Gotîye: Çadirekî her şehirekî vegirtîye.
- Gotîye: Têne çadirê heta du hefta eger xuyê wî dernekevin wê çaxê ye werin xuyê wî dernekevin ezê daweta wî bikim kurê min. Welle! Ewa kerr radibe diçe ba çadirê
- Dibêje nobetçîya
- Dibê: Hûn dikarin çadirê vekin ez dêna xu bimê çika ew kê ye? Du sê gopalan lê dixin
- Dibên: Kuro bûka paşê ye. Law tu kurê kerê ti dikarî law.
- Dibê: Ha te ra ha zêrê hanê.
- Dibê: Hema durva devê çadirê veke ezê dena xu bimê. Zêrê xu dixê cêva xu, çadirê bilind dike. Dêna xu didê jina wî ye. Nerm vedigere. Diçe ce paşê
- Dibê: Paşe!
- Dibê: Ha!
- Dibê: Êne eva jina, jina min e. Te hanîye didî kurê xu.
- Dibê: Kuro ça dibe?
- Dibê: Ha, hal hewalê min ev e.
- Dibê: Kuro virê te. Bi gotina te nabe. Diçin jinikê dînin. Jinik
- Dibê: Vira dike. Jinik
- Dibê: Paşa!
- Dibê: Ez layîqê wî me. Ewa kalê heftê salî ye. Ezê ça wî kalî bikim. Ça bahar dikî?
- Dibê: Kurê min qe şahîdê te he ne?
- Dibê: Welle! Şahîdekê min he ye, lê aqlê min nabire ez ewî bibinim.

- Dibê: Welle! Şahîdê te ney, jinik te qebul nake ezê ji daweta wî bikim. Ewa radibe henekî serê xu bejêr dike gelek ûzulmîş dibe. Qederek çûye derketîye çi dêna xu didê mervê wî, wê wêda tê. Kurek tê deste wî paç dike.

- Dibê: Kale tû ça hatî? Dibê: Welle! Min dît. Te çima xebera min nekir. De, min gote te were here, bavê te te bizewîcîne. Mirî ranabin. Çima te mala xu xirab kir? Welle!

- Dibê: Êdî min yanlişî kirîye. Tê werî mi ra şahîdî bikî.

- Dibê: Baş e. Diçine ce paşê. Paşê gahîz dike

- Dibê: Tu ça lê dizanî ewa meriva, ewa jina, jina wî ye. Tu naz dikî? Welle!

- Dibê: Ez çaxê rêwî bûme, ez çûme min dêna xu dayê merivek ser merzela digîrî. Ewa jinika mirî bûye.

- Dibê: Min cîyî bûkê jê ra nesîhet kirîye. Xebera min nekirîye. Xudê Te'ala jî di'a wî qebûl kirîye. Jinik jî rabûye. Lê naha jinikê ewa cîda hîştîye hatîye. Welle! Ez boy Xudê şahidim eva jina, jina wî ye. Jinik dibê haşa ewa vira dike. Êêê!

- Dibê. Baş e. Lê tu bizivire bere xu bide qiblê, ti

- Bêje bê: Ew emanete ku ewî mervê ji boy Xudê hîbê min kirîye, ez emanetê wî îade dikim. Jinik bê perwe, dibê: Emanetê ce min boy Xudê min îade wî kir. Welle qirînî kete jinikê. Kalê jî inda dibe. Paşa radibe

- Dibê: Kuro te çima me ra nego ewa heke Cibraîl bû, ewa mîlyaket bû, ewa çi bû? Êêê!

- Dibê: Welle! Paşa te gote min tu vira dikî. Êêê! Welle! Şahide min jî ew bû. Paşê tê

- Dibê: Kuro!

- Dibê: Ewî forqê⁸⁸ beherin veşêrin, çelkin. Namekî dinivîse dide wezîrê xu kince xu diguhirîne, du hev meriv xu ra hildide, du hev derwêş hildide dibê ezê derwêş olarax, ezê herim nava memleket bigerim. Seyahetekî bikim. Heta salekî

- Dibê: Ez nayê. Heta, sala min tamam be ezê werim jî, jinek jî dibê memleketê min de mabe. Ezê serê wezîr lêxim.

⁸⁸ O....pî. (Gotina Çîrokbêj)

- Dibê: Çiqa jin hebe tê komqir kî serê wan lêxî. Ewa radibe diçe diçe heta sala wî tamam dibe, sala wî tamam dibe dêna xu didê, qaffleke jina valî va, qaffleke jin jî walîva digere pey
- Dibê: Welle! Wezîr emrê min pêk nehanîye. Hema emir dide cellada
- Dibê: Bira serê wezîr jêkin. Welle! Cellat xu digîhînîne wezîr
- Dibê: Yaw serê min jê nekin, min beherine ce paşê bira îfada min bigire. Hemen hildidin dibine ce paşê.
- Dibên: Te serê wî lê nedeya hanîye ce min.
- Dibê: Paşayê min îfada min bigire, tu paşayê dîne Îslamê yê. Îfada min bigire.
- Dibê: Paşê serê min jê ke. Ez heqlî me! Yaw dibê: Ka tu heqlî bû. Min emir da te, te çima emrê min pêk nehanî? Paşam
- Dibê: Bavekî min heye ‘emrê wî sed sal e. Bavê min êdî îdare neke, nava pembû da em xayî dikin. Bavê min!
- Dibê: Bavê te ra sed salî emek daye.
- Dibê: Ewî gahîz min kirîye, gotîye kurê min, serê jina lê nexe. Tu nikarî zurîyetê dinê bibirî. Xudê Te’ala jin çêkirina bona însan jê peyda bin. Ewa paşa hêrsa wî hatîye, heqereteke mezin e, ewê neke.
- Gotîye: Ê paşayê were serê min lêxe.
- Gotîye: Na, go paşa hat, tu bîne ce min. Paşa!
- Dibê: De rabe meherin çika, dêna xu didin bavê wî nava bel’gîkî da odekî da, wezîr
- Dibê: Yaw! Padîşahê min
- Dibê: Te çima ewa ‘emrê min daye îptal kirinê. Min emir dabû kurê te.
- Dibê: Padîşahekî min, min sed salî xîzmeta bavê te kirîye. Geleka tu jî bona xatirê bavê te, paşa jî
- Dibê: Bona xatirê bavê xu îfada min dînlemîş bikî.
- Dibê: Bêje paşayê min!
- Dibê: Tu ji ku hatî?

- Dibê: Welle! Cîya min ez hanîme dinyayê.

- Dibê: Wekî jî jin nebe însanê ku were dine, tu qaydê çê nabe. Te, ewa hêrsa te hatîye te jî emir daye kurê min, serê wî jê dikî. Berê serê min jê ke, paşê yê wî jê ke.

- Dibê: Welle! Ti jî heqlî yî. Wezîr jî ‘efû dîke. Aa! Welle! Ewa jî êdî memleket terk dîke diçe, serê xu hildide diçe. Padîşah dîsa ‘eynî te ser textê xu dewam dîke.

- Dibê: Ez êdî serê jina name lê danê. Heqet xebera wane. Zurîyetê were birandinê. Ewa mêrê jinikê jî lê dixê diçe êdî naçe ce bavê xu jî. Ew jî hema serê xu hildide diçe. Êdî Xudê bizanibe ku da diçe? Êdî diçe, dimire dimîne ça dibe? Êêê! Welle! li wira son dide. (J65)

Çç-6

Çîroka Klama Xelîl Begê

Ez ji te ra çîroka “Klama Xelîl Begê” bêjim. Xelîl Beg, birazîyê Behlûl Paşa ye. Behlûl Paşa nebîyê Îshaq Paşa ye. Xayî Qela Doxubayîzdê ye. Xelîl Beg birazîyê Behlûl Paşa ye. Ez navê bavê wî nizanîm. Behlûl Paşa kurê Îshaq Paşa ye. De îja zamanekî, de hema meriv li ku buna, kîjan wîlayetê merivekî xurt hebûya, em bêjin mesela Bayîzaxa, ew meriva muheqeq dibû padîşahê Bayîzaxa.

- Dibê: Tu paşa yî. Ew jî isa. Li wira Siphan gola me ya Pirreşîd⁸⁹ heye. Eva jî zozana ‘Emer Axa yê Milî ye. ‘Emer Axa yê Milî jî li milê Başqala⁹⁰ radibe tê wira zozana. (Îja me ça bihîstîye, êdî vir e raste em nizanîm. Gune histîyê gotîya be.) Navmalê ‘Emer Axa yê Milî jî hebû ye. Navmalê ra, em dibêjin seyîsê hespa wî, ewa wî. Wî çaxî mîna xilama bûye. Ema li xulama ferqlîtir bûye. Êm bêjin ew axa bûye, ku da biçûya nêçîrê, biçûya gezmaxê muheqeq ewa jî xu ra dibir. (Behlûl Paşa xu ra dibir) Navmalîyê xu jî xu ra dibir. Îja qîzeke wî hebû ye. Navê wî Perîşan bûye. Bixu çav berdidê. Xelîl jê ra digotin. Xelo çav berdidê.

- Dibên: Rojekî Perîşan pê dihise. Tê hewalê jî wî ra dibêjin. Rûdinê

- Dibê: Xelo eva, kuro tu kuro merivanî. Tu seyîsî. Hespê kişanê bavê min î. Navmalî me yî. Xulamê me yî îşte kehyayê me yî. Kuro te deve xu da ku şerpikandîye, te

⁸⁹ Ev gol li gundê Yekmalê ye.

⁹⁰ Navê navçeyeke Wanê ye.

- Gotîye: Dile min ketîye Perîşanê. Wellehî!
- Dibê: Ezê poz guhê te bime jêkirinê. Xelîl Beg serê xu hildide direve dibê: Ez lêxim herim.
- Dibê: Direve tê vira derbas dibe tê diçe Qela Bayîzdê⁹¹. Diçe Qela Bayîzdê dêna xu didê bermalî Xelîl Begê li wira.
- Dibê: Bermalîyê wî seyîsê hespê wî. Xelîl Begê genç bûye, nezewîcî bûye. De îja ter⁹² bûye. Kurê bega bûye. Ji xu te ra bêjim, bi serê xu bûye. Îşê wî rew, nêçîr bûye. Kuda diçe bi xu ra dibe. Rojekî lê dihewile. Xelîl Beg!
- Dibê: Were ji mi ra bêje tu çima nezewicîyî? Memleket hemû bin emrê we da ye. Tu qîza kîjan axayê bixazî ku nene te? Dike nake Xelîl Beg ji xu Xelo xilas nake. Kuro
- Dibê: Xelo!
- Dibê: Çi?
- Dibê: Xelo!
- Dibê: Pêşkoçî hatin bi me qaîl nebûn, paşkoçî jî hatine, îja ez lê qaîl nabim. Yanî me'na wî: Qîzê 'ewil li wextê gençîya min de ez wana qaîl nebûm, ewê naha îja ewana min qaîl nabin. Pêşkoçî, paşkoçî jî tê ev me'ne yê.
- Dibê: Xelîl Beg!
- Dibê: Ku tu îzna min bidî, min qîzek cîkî dîtîye. Ezê herim binêhêrim, ku nedabine mêr, ewa qîza sade layîqê te ye. (Dilketiya xu ra ha!) Tê xatirê xu jê dixaze. Tê derbasê gola Siphânê⁹³
- Dibê: Diçe Perîşan dêna xu didê Xelo dîsa li wira ye. Kuro!
- Dibê: Min ne gote te ney. Êdî ney wan dera, li wan dera negere.
- Dibê: Perîşan!
- Dibê: Xudê ez hatime, çika te mêr kirîye mêr nekirîye?
- Dibê: Li Qela Doxubayîzdê seraya Behlûl Paşa.

⁹¹ Qesra Îshaq Paşa.

⁹² Nû.

⁹³ Navê goleke Wanê ye.

- Dibê: Birazîyê wî xort e, ‘ezeb e, ne zewîcî ye.
- Dibê: Tam layîqê te ye.
- Dibê: Ez bo na wî hatime. De îja çîqa em bêjin şet û şurtê Xelîl Begê hene, jê ra dibêje. Sîyarekî wihane, kincê wî ahane. Rê çûyîna wî ahane, hespa wî ahane. Bi dar û cixara wî ve Perîşanê re anlatmîş dike. Dizvire lêdixe tê ce Xelîl Begê!
- Dibê: Bêje apê xu Perîşan nedane mêr. Em herin te ra bixazin. Dibêjine Behlûl Paşa, Behlûl Paşa!
- Dibê: Mîrê Hekarîyê lêxe derkeve wê derê, alîyê Başqala, were ez wî zefh durê hevin. Xelîl Beg!
- Dibê: Ew mintiqê min e, tu jî birazîyê min î, qîza ke bêjî ezê te ra bixazim.
- Dibê: Xelo ez û tu emê herin. Emê herin bibinin. Ew Xelo dine rê diçin.
- Dibê: Ew roj jî Perîşanê qîz bûkê êlê hildane derketina zozanan. De şixo zozane, pincare, mendike... çîyê diçînin. Perîşan, aha dêna xe didê du sîyar derbas dibên. Hewaleke wî hebû ye zefh hijê kirîye. Navê wî Fatma bûye.
- Dibê: Fatma cê were wira.
- Dibê: Tu ewê hanê nas dikî?
- Dibê: Welle! Ewa benzemîşê Xeloy bermalîyê we yê wextekî dibe.
- Dibê: Erê.
- Dibê: Ew sîyarê peşîyê?
- Dibê: Welle! Ez nizanim.
- Dibê: Xelo wê rojê hatibû, ji mi ra salixê sîyarekî dabû. Ewa hebe nebe ewe. Xelo ça gotîye, ew tiştê Xelo gotine hemû ser wî merivî mevcûd e. Hespê wî ye, her tiştê wî ye, heybetlî, şû bû... Berê qotik hebûne, qolbaş hebûne, şû bû... Îja a wira rûdinê.
- Dibê: Ezê klamekî bêjim, eger ew be dibê yê li min bizvirin. Nexêr ew nebin zaten yê bine rêya xu herin. Îja
- Dibê: (Perîşan dibêje)

Xelîl Bego! Mil dîvarê Siphân golê li vî banî

Xelîl Begê! Kum kilosê xu girêda biro manî

Xelîl Bego! Înşallah tu li mala bavê min nêvanî

Tev lorî mevano, serê Perîşanê bi heyrano

Can bedenê, min qurbano.

Xelîl Beg disekine, Xelo diçe. Kuro!

- Dibê: Xelo, Xelo!

- Dibê: Çi ye? Kuro!

- Dibê: Dengek tê min, yek klama davîje ser min. Îja dile Xelîl Beg jî ber Perîşanê dernayê. Dilê Xelo jî. Dibê Xudê ji te razî, dibê êtîmekî lê wê welatê ye. Tê derdikeve wî serê wan top mopa îşte... Ber axakî itanê te dibîne. Pê dikeve qewlika, bendika dibêje yanî. Ewa dibêje, tiştê nebûyî dibê

- Dibêje: Kuro!

- Dibê: Xelo, ça dibêje hema ez im. Careke dinê Xelo wê derê Xelo bi xu poşman dibe. -

Dibê: Tey min yeke ça hanî serê xu. Careke dinê dibêje.

- Dibê:

Xelîl Beg, mil dîvarê Siphan golê li wan kaşa

Li bejn bala Xelîl Begê min dinêhêre li qoltix û qalbaşa.

-Dibê: Fatma eger tu sîyarê pêşîyê nas dikî, nas bike

Ku tu nas nekî,

-Dibê: Li qela Doxubayîzdê Xelîl Beg birazîyê Behlûl Paşa ye.

Xelîl Beg li ewê dizivire, Xelo!

- Dibê: Kuro Xelo, kuro min nas dike. Kuro ez birazîyê Behlûl Paşa nînim? Yaw axa!

- Dibê: Were nene qafê xu.

- Dibê: Hûn mêrkê axa, reîs hema wisa ewa xu dikevîne kêf, zewqa dinyayê, tu xebera min bike dibê tu were. Perîşan!

- Dibêje: Ewê dibêje wê hewala xu

- Dibê: Fatma! Ezê ev klamê bêjim. Hemîn ew sîyarê pêşîyê Xelo ye ewê wî jî Xelîl Begê ye. Îmkan tine.

- Dibê ezê evê bende jî wan ra bêjim. Yanî ewî meqamê, ewê malê jê ra çi dibêjin.

- Dibê ezê bêjim. Limin zivirîn, zivirîn ê nezivirîn

- Dibê: Bê'eslî dîsa bin Xelo da ye.

- Dibê:

Siphan golê şertê li halê li pirê

Xelîl Beg hespekî kumik sîyarê fettanê gilê

Dar ji wira destên Xelîl Begê, li Şîraza⁹⁴ danzdeh gilê.

Kuro!

- Dibê: Xelo! Welle! Ewa min nas dike.

- Dibê: Axa were, wexta ew penî dide hespa... Perîşan!

- Dibêje, Dibê: We'! Le'net were bavê te. Ti bixu hat, bixu mi ra got, bixu salxê wî da... Weqasî jî bûyî şeytanê orta me. Dilê wî te'mil⁹⁵ nekir. Careke din

- Dibê: Şeytan!

- Dibê: Çika ez Xelîl Begê nazivirînim. Ewana diçin derê kona mala bavê, ewa derê mala Perîşanê. Perîşan wana tèn dêna xu dinê, aha nêvanê wan in. Nêvanê wan in, de çadir bûne, çadirê vedikin. Dêna xu dinê, Xelîl Beg bi Xelo ve rûniştine. Kêfxaşîyê dide wan, mîrkûtê bi berê pê darê bi bême'nî singê bipê dora kona, dora çadira, erdê da dikutan, yekî jî wana hildide, dibêje,

- Dibê: Kuro Xelo!

- Dibê: Çî yê Perîşan?

- Dibêje: Were serê dar li min bigre ez bikutim.

- Dibê: Jêr va bû ewr esman, şilî hat dibê: Bira ew nebe.

⁹⁴Dareke zehf mezin û meqbûl e. (Gotina Çirokbêj)

⁹⁵Berxwedan.

- Dibê: Bira çadir ew bûye, darizilî bûye.
- Dibê: Bira dilop neke. Bira totkê Xelîl Begê, totkê wî yanî, kincê kevn jê ra bînin. Lacîwerd kincê te, dibê bira şil nebe. Îja mîrkût dide ser milê xu
- Dibê:
 - Xelîl Bego! Ewr û esman, req û teq e.
 - Baran dibare ji Xudayê min ê heq e.
- Dibê:
 - Ezê dikim mîrkutekî li nav guhê Xeloyê Bayîzdi xim
- Dibê:
 - Tirsim Xelîl Begê bixeyîde bêje: Perîşan xulami min neheq e.
- Dibê: Xelk diçe, ewana radibin sîyar dibin bin kona dikevin tên go werin Xelîl Beg
- Dibê: Kuro Xelo!
- Dibêje: Çî ye?
- Dibê: Em hatine çî, me çî got? Ka te ne de'w kir, te ne got ne erê ne na?
- Dibê: Axa de tu li vir be îja ezê heme xazgînî yê. Diçe dibêje. Bavê wî 'Emer Axayê Mîlî yî jî
- Dibê: Madem birazîyê Behlûl Paşa ye, qîzeke min qurban kir. Radibe tê dibêje Xelî Begê!
- Dibê: Heyran berdaye min.
- Gotîye: Ti bî ezê bidime te. Ez ça qîza xu bimê. Ez ewî ne nas dikim ne erê. Xelîl Begê!
- Dibê: Kuro tu seyîsê hespê min î. Çakîne dide te, nade min? Radibe bixu tê ser kursîya xazgînî yê 'Emer Axayê Mîlî. (Berê kursîyê xazgînî yê hebû ne. Berê isa jê ra gotine.
- Dibêjin: Kê biçûya li ser kursîyê rûnişta, ku muheqeq li wî malê qîzek hebû ya
- Digotin: Temame, hatîye xazgînî yê.)
- Dibê: Xelîl Beg, 'Emer Axayê Mîlî dibêje
- Dibê: Min hêca xulamê te ra got.

- Dibê: Qîzeke min qurbana te kirîye. Birazîyê Behlûl Paşa, paşayekê memleketekî ye. Lê dixu derdikeve were we derê
- Dibê... Dewata wî dike. Êê nîhayet Perîşanê li wê derê dide dewata wî dike. De êş serê Xelo digire.
- Dibê: Kuro hey li min ê. A min ça bi destê xuli mala xu xirab kir. Te dît min çakir? Min hanê Perîşan da Xelîl Begê. Hinde dilê min jî tê da... Radibin çendek dimînin
- Dibê: Xelîl Beg!
- Dibê: Îja êdî em herin. Apê te tefekura me dane. Naha me digerin. Kes nizane em hatine vira. Nîhayet ‘Emer Axayê Mîlî, sed sîyara ji wan ra datîne. Têne Gilî Çayê diçin, binya Bayîzdê, gundê Pira Hamok⁹⁶ av derbas dibe. Darek jî li gundekî jî binê wî kanî lê derdikeve, li ser wî kanîyê datînin.
- Dibê: Emê xu ra rojek duduyan ji wira bin. Nêçîrê bikin, kêf seyranîyê bikin. Bêhna xu bistînin. Îja emê herin. Sibê Xelîl Beg radibe diçe nêçîrê. Xelo xu davîje nexaşîyê.
- Dibê: Serê min dêşe. Xelîl Beg ku diçe, tê çadirê. Tê çadirê, ce Perîşanê.
- Dibê: Perîşan!
- Dibê: Te va ‘eyan e. Dilê min zefh te da heye.
- Dibê: Min tu bi destê xu da mêt. Min te da Xelîl Begê. Wellahî! Ti bidî xatirê navê Xudê pêxembera. Ez hema carekî ramûsanekî ji te bistînim ev jî besê min e. Perîşan
- Dibê: Kuro Xelo!
- Dibê: Tu kurê merivanî. Te zefh emek mala bavê min daye. Te zefh nanê me xarîye. Yaw ez û tu durê hevin. Ka çakî dibe? Dike nake ji xu lê xilas nake. Îja Perîşan mîrkûtekî datîne qafê wî. Qafê wî dişkê. Ewa jî hema radibe bi wî xunê va, sîyar dibe bere xu dide qela Bayîzdê ce Behlûl Paşa. Çaxî dikeve cima’eta wî hindir, Behlûl Paşa lê dinêhêre
- Dibê: Kuro Xelo eva meheke, çil şeve kuro hûn ku ne, hûn çi ‘elemê dane.
- Dibê: Xudê mala te xira bike. Hûn axa, beg, paşa... hûn akîne ne.

⁹⁶ Di nav sînorê Bayîzdê de ye.

- Dibê: Em çûn derketine gola Siphan golê, ‘Emer Axayê Mîlî. Nav dengê wî te bihîstî bû. Qîza xu da Xelîl Begê te ra şand. Xelîl Begê jî pê ra rabû rûnişt.

- Dibê: Ewa em du rojê me ye jî em Pira Hamokê ne.

- Dibê: Min gotîye heyran amoşna te ye. (De şeytanî yê dike da.) Amoşna te tê. Nizam çîyê te tê. Bes e, şerm e. Bi mîrkuta daye qafê min. Ez ancaxî dest pê wî derketim. Revîme lêda me hatime. Pey wî hemen bire sîyar, sîyar dibin. Jorda tèn, jorda tèn. Xelîl Beg derdikeve wî çîyayê, kevirê Qalûz heye. Pêşberê Bayîzê ye. Derdikeve wira dêna xu didê, yaw! Bire sîyar dora çadirê girtine. Ji bixu xu gotîye ewna kê ne, cerbê⁹⁷ se Xelo da girt? Xelo nexaş, Perîşan tenê...

- Dibê: Ew roj jî nêçira wî du sê hev teyr bûne, du sê hev kîvrîşk bûne, çi bûne teke.

- Dibê: Bi hespê re tê. Hespê re tê, bi qamçîya tê, tê peya dibê: Xelîl Beg, Xelo diçe pêşîye.

- Dibê: Xelîl Beg netirse!

- Dibê: Apê te ye bihîstîye, em hatine wê derê, bona te hatîye. Kuro!

- Dibê: Mala te xira nebûyo, ziranê min qetîya. Hespê dide yekî dikşîne. Xelîl Beg! Wextê tê hundirê kon Behlûl Paşa rûniştîye. Ew pişt Xelîl Begê va disene. Îşaretê ewê dike (De ya xun pekyayê. Kinc mincê wî, delingê wî, xuna wan nêçîr.) Îşaretê dide

- Dibê: Ew xuna, xuna serê min e. Heqa li min daye, xuna serê min e. Kêf xaşîyê dine hev, şû bû. Saliq li hev ra didin.

- Dibê: Xelîl Beg! Ez birazîye xu emê setrençekî bileyîzin paşê herim. Şamdilxaz. Kê me kê behere. Setrenç kişik e. Şamdilxaz jî wî çaxî akîne bûye. Em bêjin wexta ku ara du heva da hebûya. Bigota tu malê xu hemû bidî min geleka bidayê.

- Dibê: Tê qîza xu bidî min gela bidayê. Nabûn tinebû. Şamdilxaz ew e. Yanî navê wî şertê nay gotinê. Yanî nabê ezê evê qaxizê bi me te. Li ser wî qaxizî. Şamdilxaz da dilê min çi bixaze tê ewî bidî min. Te ji min bir. Tu jî ‘eynî, min jî te bir ‘eynî. Îja

- Dibê: Dileyîzin. Direve dibêje Perîşanê. Perîşan!

- Dibêje: Kuro Xelo tu hê li vendera digerî?

⁹⁷Qaçaxçî.

- Dibê: Rabe!
- Dibê: Here qarşîyê ewkê bisekine, qarşîyê Xelîl Begê bisekine. Xelîl Beg setrençê dide der
- Dibê: Îşêkî serê me derkeve. De xu bixemilîne, xezûrê te hatîye. Dewsa bavê te ye. Yaw tu kon da çi rûniştîyî? Kêfa serê min e. Min serê xu girê daye çûye. Ku wexta ‘Emer Axayê Mîlî, Perîşanê dinêhêre... Pîî! Bixu serxoş dibe zaten.
- Dibê: Sê cara jê dibe. Xelîl Begê jî xu ra lê dinêhêre. Yanî Perîşanê dinêhêre. Ew jî dibê sê caran (gotina çîroka wî çaxî) sê cara lê dibe.
- Dibê: Apo! Şamdilxaza xu bixaze. Kurê min dibê: Ka ezê çi bixazim? Malê min heye, zaten malê min jî malê te ye, yê te jî yê min e.
- Dibê: Welle ezê hema qarşîyê Perîşana qîza ‘Emerê Axayê Mîlî, henek laqirdî te bikim. Henekê xu te bikim.
- Dibê: Apo tu zanî.
- Dibê: Kuro ewî bîne be situna kon girêdin. Xelîl Begê bi şîrta gire didin.
- Dibê: Wexta mile wî dikevî ber şîrîtê. Xelîl Beg dêna xu didê çi: Yaw damarê wî da xûn sekinîye. Apo!
- Dibê: Tu çi dikî? Li şamdilxaz şamdilxaz, tê min bikujî bikuje hema gulekî berde min, ka eva çî ye? Damarê min da
- Dibê: Xûn sekinî. Hey!
- Dibê: Deyyuz! Tu herî derkevî gola Sîphan golê, ‘Emer Axayê Mîlî, Perîşanê ji mi ra bişîne, eva çil şeve tu, pe ra radîbî – rûdinê- rûniştîyî, tev radîzê şu dikî bû dikî. Pey
- Dibê: Mala min xirabe, dilê xu da
- Dibê: Ewa demek kî şeytanîya Xelo ye. Perîşan jî pê dihise.
- Dibên: Du hev çaxê ser milê Xelîl Begê da diçikîne. Agir berdidê
- Dibên: Xelîl Begê bi mûma dişewîtînin. Sîyar dibin, Perîşanê hildide tê qelê. Qelê dest dewatê dike,
- Dibê: Perîşan ezê dewata te bikim. Perîşan dêna xu didê ne deste wî digîhîje bav, bira, xuşka, heftbira. Ne erê ne na. Dêna xu didê nabe

- Dibê: Behlûl Paşa!

- Dibê: Çi?

- Dibê: Ezê derim ser mînaraya te, ser mînaraya qelê

- Dibê: Sê bend klamê ezê te ra bêjim. Îja ezê peyabim paşê ezê dewata xu bikim.

- Dibê: Hilkişîya serê mînarê

- Dibê: Behlûl Paşa! Ji Siphana golê heta vira,

- Dibê: Tu rabe serê Perîşanê kurke ser ‘Emer Axayê Mîlî, heft bira

- Dibê: Xudê qebûl neke ji Xelo, şeytanê malê re

Xelîl begê min destê Behlûl Paşa da kirîye dar pîncir a.

Yaw!

- Dibê: Perîşan! Wan ew mewê hîkeyeta nebêje. Peyabe were dewatê. Ya! Padîşahana, sîyar dileyîzin, meriv direqîsin.

- Dibê: Ma dudu.

- Dibê:

Behlûl Paşa ez çi bêjim, çi nebêjim,

Bi Xudê ez destê Xelîl Begê kerr sewsê⁹⁸ gêjim

-Dibê: Bi xatirê te ezê xu qela, mînara qelê da xu bavêjim.

Perîşan jorda xu mînarê de davêje. Bira ew here paramparçeyî be... Kuro!

-Dibê: Cê mi ra Xelo bigrin boy Xudê be. Xelo him birazîyê min mi da kuştinê, Perîşanê jî xu kuşt... Digerin dêna xu didin kêleke qehwekî rûniştîye, fişkînîya nêrgîleya wî ye dikşîne. Ewê jî li wê derê dikujin, de Xudê rehma xu dê bavê gotîya ke, kê gotîye me akîne hildaye... (J79)

⁹⁸ Serxweş.

Çç-7

Kok Axa

Naha Kok Axa bixu ‘eslê xu Êzîdî bûye. Wextê Osmanlî Împaratorî da bolgeke “Fila” dane emrê wî da, axa jî bûye. Yalniz bolgeke mezin danê. Yalê Qelenîyê bigireheta were here Erdîşê. Qelenî Îranê ye. Çaldîrana Îranê ye. Navê wî Qelenî ye. Ewa bolga heta here derkeve yalê wê bolgê ew heye, Şop heye, Puldeşt heye. Heta bigire nêzîkê derê çêmê Erez. Wira çîyayê Axrîyê re were, here gelîyê Zilan. Bi bolga Ozalpê aha destê wî da bûye. Yanî ew jî mîna eyalet walîsîkî. Wî çaxî destê Osmanlî Împaratorluxu de mîr bûye. Wira ra wextê tê de îja tu neçûyê Îranê. Îranê yalê Erez, wira jê ra dibêjin Aram. Gava meriv bêje Aram mîna Edenê, Çukurovayê ye. Germ e wira. Niha jî tu sed kîlometre herî dîsa germ e. Ewa zivistanê çûye wê derê. Havînê jî hatîye vira Qubika da. Ew gundê Qubika heye alîyê Alîkelle ye. Çîyayê Alîkelle Qubika ye. Havînê hatîye wira zozana. Yalniz axayê wê bolga me zefh bûne. Mesela ‘Elî Begê Zor Mîrze Axa hebûye ayrî Zor Mîrze Axê Elî Begê jî nebû ye. Wextê Zor Mîrze Axa da bûye. Wextê ‘Elî Begê Torinî⁹⁹ ‘Elî Begê mezin wextê wîda bûye. Ondan sonra bavê Nadir Begê mesela vira axa hebûne waxtê wan da bûye. Axayê wê bolgê Torin hebûye, axa jî hebûne...

Ewana serê salê ku bihatana wira da bihar bihar beranê axatîyê her axakî jê ra beranekî hildida dibir. Beranê axatîyê digotin diçûne mala wî beranê xu hildidan yê bixu jî bidana deste xu xulamê xu, yê bixu jî pê ra biçûna. Yê wira rûniştina kon da yê wira bidî çavê wana ewa beranê wan bixesanda. Yanî me’na wî çî ye? Me’na wî: Dibêje karşîyê min kes tine. Axa ez im. Ez merva aha dixesînim. Bidî çavê wana, bidî çavê wana. Hetta axa kî beranekî bê qoç birîye qol. Beranê wî daye pêşî de ezîyetek jî dayê, xeracek jî lê histandîye. Ku ez qol im. Yanî beranekî qol qoçê wan heye. Demek wî çaxî ferqlî bûne, ew bûne. Şandîye xeracekî zêde jî lê standîye, hanîye şuna beranekî nizam çend beran jê standîye. Yalniz jî yawerê wî hebûne. Serkar jê ra dibêjin. Naha jî hene. Mesela ornekekî bidim: Xanê¹⁰⁰ da digo: Bekoyê ‘Elî Serkar. Ewa serkarê malê axa daîma bûye. Serkar wî çaxî serkarê axa hebûne. Serkarê wî jî wergî berav kirîye. Sureklî du hev xulam dane ce xu da, sureklî evê bolgê bigre heta here Erdîşê Gelîyê Zilan ve Ozalpê xeraç berav kirîye. Yanî xerac nîne aslinda wergî ye wextê Osmanlîyan da. Ama zefh jî merivekî bê

⁹⁹ ‘Eşîreke Kurdan e.

¹⁰⁰ Navê gundekî Çaldîranê ye.

edep bûye. Mesela biçûya gundekî da digo kîjan jin rind bûya, digo hûnê êvarê bînine cer min. Ewana rojekî diçine ewê da. Diçine yalê Erdîşê alîyê Gelîyê Zîlan wira Mîh heye. Navê gund Mîh e. Wira diçe wira, wira jî Mîhê jî here gundekî din, navê gund bîra min çûye. Wira radibê ezê herime filan gundî. Nava gund ra derbas dibe, çavê wî jinekî dikeve.

- Dibê: Eva jina hanê

- Dibê: Ezê îro herime filan gundî. Sibê ezê jî wî gundî bizivirim, hûnê ewî jinikê mi ra bînin. De roja biçûya cîkî neh deh pez jê ra şerjê dikirin. Gahîz millet dikirin. Ewî nonê xu dixar, digote millet jî

- Digo: Hûnê wergîya xu jî bînin bidin. Gotî ewî gundî en az deh panzdeh pez şerjê kira gahîz gundîya kira. Serkar him nonê xu dixar him jî wergî didanê, him jî ewî milletî ji wira nan dixar. Ewa wextê

- Dibê: Ewê jinikê hûnê mi ra bînin.

- Dibê: Ez diçime filan gundî, filan gundî. Ewa diçe. Ewa merivê wira, mixtarê gund, mezinê gund, wira kê be gahîzê jinikê dikin

- Dibêjinê: Kehyayê Kok Axa çûye filan gundî, yê sibê were. Ti jî sibê sûslenmîş be pûslenmîş be xu bixemilîne, tu yê herî ce. Jinik radibe. De jinik nikare tiştêkî bêje. Jinik

- Dibê: Temam. Jinik radibe, zareke akî biçûk, destê wî digire. Zozanê mala 'Elî Begê. 'Elî Begê mezin, torin dibêjin. Zozanê wan jî durbûye. Epey durbûye. Yalnız Gelîyê Zîlan bûye. Jinik destê wê zarikê digire diçe. Hildide diçe. Diçe konê 'Elî Begê vegirtî bûye. Zaten nava konada konekî mezin bûye. Diçe deve kon, çarşefa xu xudike, bi çarşefkirî diçe, derê kon vedike. Dêna xu didê 'Elî Beg rûniştîye. Ew cime'eta wî hemû dorê, belkî çil pêncî mêr konda rûniştine.

- Dibê: Qîza min!

- Dibê: Te çima xu reş kirîye. Derî vedike dikeve hindir disekine.

- Dibê: Qîza min te çima xu reş xeş kirîye.

- Dibê: Axa! Min bihîstîye tu mirîyî, ez jî hatime şîna te. Dibêje cime'etê xu

- Dibê: Derkevîne derva.

- Dibê: Çika evê jinikê cabeke isa da min.

- Go: Tu mirîyi, ez jî hatime şîna te. Çika de'we çîye? Cime'eta xu derdixe derê malê.
- Dibê: Qîza min! were çika te çima ewa kelîma got?
- Dibê: Axa! Hal mesele me yawerê Kok Axa ev. Çûye niha filan derê ye. Sibê yê were. Sibê gotî ez jî xu bixemilînim herim bikevime paşla¹⁰¹ wî. Ti, ti wijdana xu. Ez jî namusa te me.
- Dibê: Baş e.
- Dibê: Qîza min! Tu derkeve ber dere çadirê bisekine.
- Dibê: Tu ber derê konê bisekine.
- Dibê: Tu ber derê konê bisekine, ezê cime'eta xu hildime hindir. Cime'eta xu hildide hindir da
- Dibê: Ewa yawerê Kok Axa hatîye vê bolgê da wergîya xu berav dike, çûye filan gundî
- Dibê: Hal, mesela me vî mervî vî jinikê, Kok Axa ev e. Yawerê wê ev e. Kê we ewî merivî bikûje, ezê qîza xu bidimê. Hemû dûşûnmîş dibin. Herekî qirşikekî hildidin dûşûnmîş dibin. Pêşîya xu dikolin. Serê bejêr dikan. Deng li kesî dernakeve. Camêrek radibe
- Dibê: Beg!
- Dibê: Ezê vî îşî bikim.
- Dibê: Tu rûnê, ewnê dinê de
- Dibê: Derkevîne derê malê.
- Dibêje wê merivê dibê tê çakî bikî?
- Dibê: Welle! Ez û ewna, em sê hev in. Ez û du hev jî kurê min hene. Ewna sisê ne, em jî sisê ne.
- Dibê: Ezê jî wana bikujim.
- Dibê: Tu bixaze kuştina xe.
- Dibê: Baş e. Ewana planê xe datînin.

¹⁰¹ Hembêz.

- Dibên: Yê filan gundî re werin. Newal heye. Yê wê newalê re werin. Ezê wê newalê da dibê ezê çara wê binêhêrim. Neyse ewana qirarê xu dikine yek. Ewana diçin. Dibêjine jinikê

- Dibê: Jinik tu here ‘eynê sûslenmîş be, bira ewana jî nanê xu hazir kin. Bira kesî lê nehisînin. Tu kesî pê nehisînin. Ewana diçine gund da. Nakine dengî. Gund nan hazir dike. Ewa merivana diçin ‘eynî mîna cîkî mîna Giregewra¹⁰² bûye. Gelîkî wekî Tuzederê.¹⁰³ Ça ji alîyê goma mala Hecî Xalit derdikevin. Derdikevin digihîjine wan da. Tê digihîjine wan da.

- Dibê: Emê lêxin.

- Dibê: Emê zarê xu ra

- Dibê: Emê filan derê, min çav kire we, tê yekî bigirî ti jî yekî bigirî, ezê jî gede bixwu bigirim. Ser hespê da bavîje ser serê wan. Baş e.

- Dibên: Tabî ewana tedbîrlî ne, bi sîlahin. De wî çaxî şûr bûne, mexeze bûne, çi bûne, çi... Ewana wexta têne wira, tèn digihîjine wan, digihîjine wan da dewam dikin xu ra sohbet dikin. Tên, merkebeke teng hebûye. Cîkî êdî ku kes wana nebîne. Çav dike her zarê xu ra, her yek xu davîje ser serê yekî. Ev jî xu davîje ser serê yawer. Yawer davîje ‘erdê. Serê hersêka jê dikin. Cendekê wana cîkî çe’l dikin. Serê wanê jêkirî dixine xurcikekî tèn. Dikine xurcikekî. Tabî axa dizane. ‘Elî Begê dizane. Ewana yê vê saetê werin. Cime’eta xu dîsa berav dikin. Berav dike, dêna xu didê, derî vekir hat, derî vekir hat

- Go: Selam ‘eylekim, ‘eylekim messelam. Ti xêr hatî. Ser çava ra hatî. Ti hatî? Te qe mi ra çi hanî?

- Dibê: Min te ra sê hev qerpuz hanî. Xurcîkê vala dike serê hersêka jî davîje ortê. De îja cime’et dêna xu didê tiştêkî xerîb. Serê sê hev meriva, wan meriva hanîye.

Qîza xu didê da. Qîza xu didê da yalniz

- Dibê: Kok Axa netîceyê da yê pê bihise. Yê me ra şerekî bike. Em jî pêş da tedbîra xu hildin. Çunkî eva meriva kesin yê tiştêkî bîne serê me. Ewa dibêje wê cime’etê da

¹⁰² Navê çîyayekî Çaldiranê ye.

¹⁰³ Navê gelîkî Çaldiranê ye.

- Dibê: Mi ra derpê jina Kok Axa lazim e. Madem ku we ewa neqedand, yek wey mi ra ewî bîne. Yek radibe

- Dibê: Ezê bînim.

- Dibê: Baş e. Grubeke wira jî grubeke ‘Elî Begê henek merivê wî ye. Aha geveze û arsız bûne. Wexta biçûna mala ‘Elî Begê bi çîzma va diçûne ser xalîça da. Yanî sole xu dernedixistin. Isa bêperwe bûne. Gotine wana jî “Gîzme Sor”. Ewna ra dibêjin “Gîzme Sor” yanî “Mêrxas”. Berê digotin: “Şoreşger”. Şoreşgerê wan bûne, mêrxasê wan bûne, fedaîyê wan bûne. Neyse ewa meriva diçe. Ewa mervê dibê ku ezê herim derpê jinikê bînim, diçe. Ewa diçe xu dixê rismekî belengazekî, feqîrekî, dîlencîkî. Sureklî çend roja xu ber wê konê xu dirêj dike. Çend roja xu ber wî konê xu dirêj dike. Berekê wa jî ber kona axê tê. Qamûşekî ji xu ra pêş da, dibê tijî morîstang dike. Devê wana jî aha her du pembû û pîne va jî dixê da. Ewê jî cêba xu da digerîne. Netîcê da tê şeş heft roj... Rojek tê ber derê konê axa. Sê çar roj xu wira dirêj dike. Hetta axa

- Dibêje: Ewa çîye?

- Dibên: Feqîrek e. Jina wî jî belengazek e. Xu ra dîlencîtîyê dike, hatîye vira, ber konê radizê, dibîne, gune ye. Ewna wextê radizên, bi şev diçe, waxtê ewna radizên, jinik jî radizê. Dîne delinga jinikê vedike, qamûş dixê, pif dike. Ew morîstang dikeve vicûda wî, derpê wî. Ewa jinik tabîkî qaşintî maşinti jinikê digire –haşa- derpê xu dixê, davîje wira. Ewa jî derpê jinikê hildide tê. Tê

- Dibê: Temam. Derpê dînên, dêna xu dinê axê de. Axa, Kok Axa ra cap dike

- Dibê: Ti nêvanê min î. Tu filan rojî nêvanê min î. Baş e. De rojên wan kifş dikin. Ormeyîn roja bazarê bazarê nêvanin. Nêvanê we werin. Sed pezî dide şerjê dide şerjê kirin. Sed pezî şerjê dike. Evê sed hev sîyarî ve were ya. Sed sîyarî ra dibêje tu nêvanê min î. Sed hev ske, skeyê hespa, tevlê hespa. Skeyê wan va hazir dike. Gahîz çaycî yê xu, qehwecîyê xu dike. Dibê werine vira.

- Dibê: Kok Axa vexta yê were.

- Dibê: Qehwecî ti, goreva te: Ti qehwa xu te danî, ti darkê wî, cixara wî hildî –bidizî- pêşîya wî.

- Dibêje çaycî jî

- Dibê: Wextê te çay danî, ti jî tîsbîya wî bidizî. Eva goreva we her dika. Winê kesîn wana bikin. Neyse sîyar tîn. Sîyar tîn. Sed sîyarê vê tîn. Herekî tevl, hespekî ayrî ayrî temîz tevl didin. Konê axê jî mezin bûye, tabî. Sed sîyarê tê da cî bibe. ‘Elî Begê mezin ne demek. Merivekî êl, ‘eşîr... Axa wekî devletekî bûye. Ewana wan ra qehwekî datîne darkê cixarê hildide. Çaycî wexta çaya xu datîne, tîzbîyê hildide.

- Dibê: Axa! Me goreva xu kir.

- Dibê: Werine wira. Sîyarekî jîyatî mi ra lazim e. Yekî mînanê te.

- Dibê: Ez axa.

- Dibê: Eva tîzbîya axê, eva darkê axê. Tê hildî herî. Tê herî mala axê, tê jina axê ra bêjî, tê herî Qubika, tê

- Bêjî: Axa li mala ‘Elî Begê dawetê dane

- Gotîye: Bira Zerîfa qîza min xu bixemilîne, were dewatê da.

- Go: Ku ka axa vira nîne, emê çay bizanibin?

- Dibên: Aha! Eva nîşana wî. Tîzbîya xu, darka xu bi mi ra şandîye. Daye min

- Gotîye: Eva jî nîşana min e. Biherin dêşanê wan xin, bira werin. Qîzik bira were.

- Dibên: Jina wî ra bêjin: Bira qîza xu Zerîfe Xanimê bişîne. – Naha jî nebîyê Zerîfe Xanimê heye.- Ewana radibin. Ewa sîyara dikeve rê tê. Yalnız ti hatî

- Dibê: Ti filan rêyê werî. Orneyîn, mesela ti rêya Tendurekê ra nay. Tê walî din re werî.

- Dibê: Baş e. Ewa bira xu ra were. Ewana wexta ku jê ra çay may datînin, çay dixin

- Dibê: Axa!

- Dibê: Çêm ber malê dikişe.

- Dibê: Bira millet dezmêja xu bigire weyaxut bira desten xu ser çavên xu bişûn, heta me jî sifre nan hazir kirin. De axa sureklî qarşîyê derî rûniştîye. Mêrkê axa naçe qulçê konda rûnanê. Karşîyê derî da pêşîya wî açixe, tê xuyanê. Ewana diçine ser avê da, ‘Elî Beg!

- Dibêje: Dibê, darekî qarşîyê çadirê derê hane biçikînin. Derpê jinikê bînin dardakin. Neyse ewana darda dikin. Ewana diçin ser çavê xu dişûn. Waxtê ku nan tê, sed hev sinî, sed hev kelle serin. De sed hev pez şerjê kirîye. Kelle dînin, nan dînin, hazir dikin. Wextê

loqmekî duxe, serê xu bilind dike, çavê wî derpê yê xastik¹⁰⁴ dikeve. Çavê wî pê dikeve, dêna xu didê: Xastika jina xu nas dike. Hema nan naxe

- Dibê: Rabin. Yaw!

- Dibên: Axa ça bû?

- Dibê: Emê rabin. Dikin nakin

- Dibê: Emê rabin. Ewana sîyar dibin, nan naxun, rê dikevin diçin.

Ewa merva diçe ce jina Kok Axa nîşanê dêşan dixê

- Dibê: Eva nîşana axa ye.

- Gotfye: Bira Zerifa qîza min were dewatê. Qîzik xu dixemilîne tê. Bira ewa jî li rêya din were. Ewa tê. Tê mala xu da. Tê mala xu

- Dibê: Ka Zerîf?

- Dibê: Welle! De Zerîf te neşandibû pey, bira were dewatê.

- Dibê: Yaw! Dewata çi, halê çi?

- Dibê: Aha! Nîşana te.

- Dibê: Hoppala!

- Dibê: Demek kî em teze hatine oyunê. Kok Axa!

- Dibêje. ‘Elî Beg neyse hemen me’ra xu li wira dibire. Şerî’et rê dide. Xu ra me’r dike. Eva Kok Axa jê ra cabê dişîne.

- Dibê: Şerê min wî ra şer e. Ewî, eva boyaxa hanîye serê min, şerê min şer e. ‘Elî Beg merivê xu, êla xu, ‘eşîra xu, eskerê xu va tev tê vira. Topê Kurgûlî¹⁰⁵ heye. Li wira disekine, wira dimîne. Çadir, madirên xu li wê çîyayê wedigirin. Eskerê xu wira, çadirê xu datînin. Ewana jî tîn alîyê Xûnê, walê çêm çadirê xu datînin. Ewana walê çêm in. Ewana jî valê çêm in. Ewana de îja, wî çaxî nava çêm da, li hev dane. Waxtê axa

- Dibê: De îja ez dime pêşîyê da, dikeve nav şer da. Yekî mîna Xalisê birayê minê uyanix

- Dibê: Bavo! Gîzme sorê te ez im. – De gîzma va derdiketine ser xalça –

¹⁰⁴ Ji bo derpê jina tê gotin.

¹⁰⁵ Navê cihekî Çaldiranê ye.

- Dibê: Ewana dernekevîne er meydanî em nikarin.
- Dibê: Temam. Êdî dikeve histîyê wan da jî. Ewana derdikevin nava wî çemî da hev dixin. Yanî ewa çêm a xûn dikişê. Ji bo wî
- Dibêjin: Çêmê Xûnê. Wira ewa çema xûn dikişê. Heta qira gîzmê sora tê yên
- Dibên: Êdî piştî wî jî şikest. Gîzme sorê me jî çûn. Piştî eskerê Kok Axa jî şikest. ‘Elî Beg pêşta lê dide. Êdî lê didin. Welhasilî Kok Axa jî wî memleketî sûrgûn dikin. Naha jî şehîdê wan merivan Topê Kurgûlîyê ye. Ti herî naha jî merzelên wan hene. Merzel çêkîrî nîne. Hema kêlikê wan hene. Lê meriv zane merzêlin. Ewana isa berdidine Kok Axa li Bayîzaxa derdixin. Zerîfe Xanim naha jî nebîyê wî hene. Bire nebîyê wî henin. Car cara em hev dibinin. Zerîfe Xanim me’ra xu dewam dike. Zarê wî çê dibe. Hê niha jî carna hêrsa millet tê dibêjin
- Dibên: Nebîyê Zerîfe Xanimê kafir in. Zerîfa Êzîdî dibejin. (J1)

Çç-8

Keçka Biaqil

Îja dibê zemanekî padîşahê hebûye. Rojekî dibêje wezîrê xu

- Dibê: Wezîr! Emê rabin kuro em nava milletê xu bigerin. Yaw!
- Dibê: Em hemasa hindirdanin. Tebdîl kiyafet dibin. Yanî kincê xu diguhêrin. Em bêjin rengê porê xu axir diguhêrin. Bona herkes nas neke. Digerin cîkî wan dibe êwar
- Dibê: Ewa berê xu binê, tekel gunda emê hema Xudê, kîjan mal derkete pêşîya me, emê bibine nêvanê wî. Diçin wê gundî. Diçine derê malekî disekinîn, derî dixin. Jineke baş, qîzeke delal derî vedike. Mêvanê xu ra
- Dibêje: Kerem kin. Mêvan diçin rûdinin. De nasnake.
- Dibên: Bavê te?
- Dibê: Welle! Bavê min gavanê gund e. Heywanekî cînarê me nehatîye lê digerin. Divê ewê ji niha yê were. De îja îzzet, hirmeta wî çaxî çî dibînin... Gavan tê. Gavan tê, xoş bêş, gavan jî nasnake. Heta sibê. Sibê radibin tîn
- Dibê: Dilê paşê zefh dikeve qîzikê. Pir dilê wî dikeve qîza gavan. Tê mekanê xu.
- Dibêje: Wezîr!

- Dibê: Wezîr tê herî filan derî, tê herî mala gavîn.
- Dibê: Ezê heme çi paşayê delal?
- Dibê: Tê herî qîzîkê mi ra bixazî.
- Dibê: Paşa! Ezê ça bixazim?
- Dibê: Welle! Tê herî bixazî. Tê çi gavanîya wî kî. Dilê min ketîye qîzîkê. Baş e. Ser çava. Çaxê wezîr diçe, qîzîk dêna xu dide, yaw ew nêvanê wê rojê hatîye ew e. Ewa vê carê jî wezîr e.
- Dibê: Bavo barikem me xetayekek kirîye? Çax?
- Dibêje: Me xeta kirîye?
- Dibê: Ewê hanê mêvanê me yê wê rojê, qiyafetekî başqeda bû. Naha jî ez dêna xu didê mê da, wezîr e. De helbet wî çaxî ewê wana hebûne. Lomê ewk dike. Selam eleykum, eleykum messelam. Gavanê qijik dest pê lê dicirife.
- Dibê: Gelo me çi qusur kirîye, ewa careke dinê li me zivirî? Neyse rûdinên. Xoş bêş. Divê filan kes, wezîr
- Dibêje: Netirse.
- Dibê: Xudê em hatine dewa merivtayî te dikin. Merivtayîya çakîne?
- Dibê: Wellehî! Ez hatime qîza te ezê padîşah ra bixazim. Wê rojê ew hevalê min jî padîşah bûye. Hey li min! Qîzîk cinî dibe. Wedigere
- Dibêje qîza xu: Qîzîk dûşûnmîş dibe, taşînmîş dibe.
- Dibê: Bavo! Îşê te pê tine.
- Dibê: Ezê werim, ezê werim ce wezîr. Eger odê be, xanî be, çi be lê rûniştine. Qîzîk tê, wezîr
- Dibê: Ez hatime, ezê deste te padîşah ra rabigirim. Padîşah mezin bûye. Şêst heftê sal ‘emrê wî bûye. Ê!
- Dibêje baş e. Paşayê şehîr min bixaze, qîza gavan, ez layiqê xu dîtîme, ez paşê nekim ezê kê bikim. Ê!
- Dibê: Baş e. Qelendê xu bixazin. Bavê wî

- Dibêje: Welle! Ez qarîşê qelend nabim. Qîza minê bêje. Ê!
- Dibêje bêje:
- Dibê: Qelendê min heyjdeh berindî¹⁰⁶, bîst beran, çil hev exte¹⁰⁷, pêncî deve, şêst aqil, heftê merîfet.
- Dibê: Eva qelendê min.
- Dibê: Bîne, ser çavê xu! Ezê paşê nekim, ezê kê bikim. Welhesil wezîr radibe şa dibe. Sîyar dibe, berê xu dide qonaxa paşê da. Lê dixê diçe. Gelo êdî rêya rojekî bûye, çi bûye, lê dixê diçe. Selam eleykum, eleykum messelam. Paşa
- Dibê: Wezîrê delal!
- Dibê: Tu hatî?
- Dibê: Erê.
- Dibê: Te ça kir.
- Dibê: Min des girt. Ê baş e. Te des girtîye. Axir qeydê we, gotinê we bû çi?
- Dibê: Padîşahê delal!
- Dibê: Hijdeh berindi xastîye. Bîst hev beran xastîye. Çil hev exte xastîye. Pêncî hev jî deve xastîye. Şêst hev aqil, heftê hev jî merîfet xastîye. Kuro paşa nava hişê xu da diçe. -
Dibê: Eva çakî qelend e.
- Dibê: Xudê ji te razî. Çima devê te tineneee, pezê te tineneee, beranê te tineneee. Kuro!
- Dibê: Wezîr!
- Dibê: Ka îja dewsa wê qîzê
- Dibê: Padîşahê berê xu bida min te ça îdare bikira. Kuro qîzikê mi nekirîye. Tu kurê merivanî. Yaw ça te nekirîye? Eee hee!
- Dibê: Wezîrê delal, de were rûnê. Lê ez bêjim, ezê serê te jêkim ha! Ez êdî nahêlim tu sax bigerî. Paşayê delal
- Dibê: Min çi kirî ye? Gotinê qîzikê ev in.

¹⁰⁶ Peza yek salî re tê gotin.

¹⁰⁷ Hespê ku -bêmenî- batkîyê wan diavêjine kelbetan.

- Dibê: Gotinê qîzikê te jê fem nekirîye. Demek qîzik ji te aqiltir e. Ti wezîr î, ema qîzik ji te aqiltir e.
- Gotîye: ‘Emrê min, Ez hijdeh salî me. Yanî me’na hijdeh berindî, berindî hê neçûye be berîn. Hê hesmanî qîz e.
- Dibê: Ez hijdeh salî me. Mi ra lazim e xortekî bîst salî. Paşa çilê xu derbas kirîye. Êdî exte jî bûye. Zaten bûye pêncî, lêva wî jî daliqî bûye, mînanê lêva deva bûye. Şêstî da jî însan merîfetan ji aqilan inda dike hêdî hêdî. Heftê da hêdî hêdî aqil jî ret dibe hêdî hêdî. Ka ez ê ça jê paşê bikim. Kuro!
- Dibê: Ez nekirime. We’! Dibê: Padîşahê min, aqlê sîyê min e.
- Dibê: De, îja minê serê te jêkira, lê tu ketîyî vê ortê. Îja rabe ez ti em tev herin ezê îja ev qîza merîfet bi aqil ezê ji kurê xu ra bixazim. Ev jî
- Dibêje: Ez nahêlim kes ewî ji xu ra bixaze behere. Radibin, wextekî qîzik dêna xu didê direve tê
- Dibê: Bavo! Wezîr û paşa tev huva hatin.
- Dibê: Qîza min te tiştekî isa gote wezîr, aha Orhan Paşa yê serê me jêke. Neyse tê rûdinên. Xeberdan xoş bêş.
- Dibe: Qîza min were!
- Dibê: Padîşah gazî dike tê, dide rûniştandinê kêleka sandaliya qabilê xu.
- Dibê: Te ev qelena ji wezîr xastîye.
- Dibê: Wezîr bêfem e. Fem nekirîye. Ti qîza min î. Îja ez hatime destê te bigirim ji kurê xu ra. Tu bibe bûka min. Aaa!
- Dibê: Paşayê delal. Ez wî çaxî qarişê qelend nabim. Bavê min distîne nastîne, çi dide çi nade, tu didê nadê... Ez gurur duymiş dikim padîshahekî şehir were min bûk olarak kurê xu ra behere, ez ew dibim.
- Dibê: Wezîr, îşê min te ret bû. Neyse êzê êdî te azad kim, eva mesela vê jinikê vê qîzikê heta dayanmîşê Îranê dibe Melik. (J79)

Çç-9

Paşe û Wezîr

Dibê dîsa wezîr bûye padîşahê xu bûye. Rojekî

- Dibê: Wezîr! Wezîr

- Dibê: Çî ye?

- Dibê: Wezîr, çika were ezê te denemîş kim. Çika ti çakîne wezîrî?

- Dibê: Keremke padîşahê delal.

- Dibê: Wezîr!

- Dibê: Li dinyayê sê tiştê min hene ezê te ra bêjim. Te derxist tu wezîrê min î, te dernexist jî ezê serê te lêxim. Padîşahê delal,

- Dibê: De bêje padîşahê delal.

- Dibê: Wezîrê delal,

- Dibê: Sê tiştê min hene. Sînîke min heye zefh mezin e. Duvekî berana nav dane. Şûrekî wî duvekî dibire. Ne sinî tijî dibe, ne duv ret dibe, ne jî şûr ko dibe.

- Dibê: Tê mi ra derxî. Wezîr zefh dûşînmîş dibe.

- Dibê: Padîşahê delal!

- Dibê: Tê çil rojî roj bidî min.

- Dibê: Ezê çil rojî bona wan kelîma roj bime te. Te tişteki isa gotîye

- Dibê: Aqlê min mantiqa min hilnade. Wezîr zefh digere. Zefh digere, caba wî kesî nade. Rojê wî jî hindik dibinin.

- Dibê: Hemî ez bizvirim jî paşê serê min lêxe. Ez nezvirim jî êdî vira ezê herim. Min derxist derxist weqtîyle. Min dernexist ez zaten nayime vir. Serê xu hildide terke dinya dibe. Çav zozanekî dikeve. Dêna xu didê, lê êleke zef giran danîye, bire kinç, bot, kişyane ser kanîyê avê dibin. Selam ‘eylekum, ‘eylekum messelam.

- Dibê: Gelo qîzno dibê: Yek we tasek ava sar bide min? Wana yeke tas bişelbik pê tijî dike avê didê. Avê dixê. Berê xu dide konekî diçe. Ber konekî diçe: Selam ‘eylekum, ‘eylekum messelam. Dêna xu didê ew qîzik, qîzika av daye.

- Dibê: Bavê te?
- Dibê: Bavê min çûye ewê, çûye îmanê.
- Dibê: Birayê te?
- Dibê: Birayê min çûye sebrê.
- Dibê: Cîya te?
- Dibê: Cîya min çûye çûye yekî bi duduya dike. Hallah! Hallah! Wezîr disa pê nizane. Wezîr!
- Dibê: Allah! Allah! Kuro!
- Dibê: Ez rastê tiştê çar têm. Wellehî!
- Dibê: Ezê bisekinim, hetanê nexrîyê derva hatin. Çika îmana bavê wî kanêye. Here îmanê xerç ke, here bîne. Neyse wextekî dêna xu didê: Welle! Filankes hat, serowalîyê jî dêna xu didê çar pênc hev ga bar kirîye. Genim têr ser ga bar kirîye hanîye, dîne deve kon vala dike.
- Dibê: Pî! Kuro şixo zaten nan îman e. Kuro nan nebe îmana meriva jî tine.
- Dibê: Birêz dewat, birêz dewat. Dêna xu didê barê sê çar hespa titûn bar kirîye tê,
- Dibê: Wellehî eva jî sebre. Cîya wî jî tê. Qîzik ji sual dike.
- Dibê: Dayê jina filankesê çar bû?
- Dibê: Welle! Welidî, jê ra zarek bû. Kuro!
- Dibê: Xudê mala min xirabke, ser min wezîrtîya min de. Kuro ez wan caba nizamim wan bidim. Ez çakî hetanê niha wezîrê paşê bûme. Dilê xuda
- Dibê: Wellehî! Hebe nebe qîzikê wan kelîmê min derxe. Lê qîzik nas dike. Qîzik yanî durufê wî, ewê wî zane. Merivekî xalî nîne. Wezîr e. Nizîkê were, filankes tu ji ku dere tê, tê ku derê herî, tu kîjan êlê yî, kîjan şehre yî? Welle! Ez filan derê hatime. Ez diçim meseleke min heye. Ez hatime bi qîza te ra çozmîş bikim. Tu çar dizanî qîza minê çozmîş ke?
- Dibê: Ez dizanim yê çozmîş ke. Gazî qîza xu dike.
- Dibê: Bavo, eva wezîr e.

- Dibê: Berde bira here, emê bela wezîr bikşînin. Îşê me
- Dibê: We tine. Ber digere
- Dibê: Qîza min!
- Dibê: Yê serê wî di falan jêkin.
- Dibê: Wezîrê delal! Derdê te çî ye?
- Dibê: Qîza min!
- Dibê: Welle! Hal meselê min akîne. Ma çar roj pênc rojê hanê. Xudê zemanê min ret dibe, yê serê min jêkin.
- Dibê: Wezîrê delal!
- Dibê: Tê hemî bibî serê me da bela Xudê hizke.
- Dibê: Sînî dinya ye.
- Dibê: Ew duvê nav da însane. Şûrê wî Ezraîl e. Te kijan memleketî heta niha bihîstîye? Mirî mirine
- Dibên: Cî tine çelkin. Însan jî ret nabe heta qiyametê. Ezraîl jî zaten şûrekî tûj e, ko nabe. Mesela te ewa te dibê ev e. Şa dibe. Wî şevê têr radizê. Sibê radibe penîya didê tê derdikeve dîvana paşê.
- Dibê: Wezîrê delal! Tu hatî?
- Dibê: Belê!
- Dibê: Te çakir?
- Dibê: Paşayê min, mi çozmîş kir.
- Dibê: Bêje.
- Dibê: Padîşahê min, sînî dinya ye, Duv însane, şûr jî 'Ezraîl e. Şûrê wî duvê dibire, duva pez
- Dibê: Ne ew tijî dibe, ne şûr ko dibe.
- Dibê: Wezîr!
- Dibê: Çi?

- Dibê: Eva kê te ra gotîye, tê ji mi ra bêjî. Te eva bixu dernexistîye. Wezîr dikeve oyînê. Padîşahê min
- Dibê: Eva çil şevê min ez malda me pê da ketime.
- Dibê: Na! Tê rast bêjî. Kê derxistîye, kê te ra gotîye? Tê rast bêjî.
- Dibê: Padîşahê min
- Dibê: Çi te veşêrim, çi Xudê veşêrim. Hal mesela min aha: Ûmeke girane aha, qîzeke wî, wê ûmê heye. Qîza filan merivê mîr e, çi ye axir heye. Seroveye.
- Dibê: Ewî ji mi ra derxist. Paşê
- Dibê: De rabin, sîyar bin. Sîyar dibin, sî çil sîyarî kerwan dide. Ser xu dikevîne terka rê. Qîzik wextekî dêna xu didê çîyayê zenber.
- Dibê: Bavo!
- Dibê: Bavo! Wezîr huwa. Mi gote te, yê serê me, yê têxê belayê.
- Dibê: Qûr- an'a te xandî ew e. Pêşîyê jî, ya kêlekê jî ew jî padîşah e. Ewê dinê ji meriv, merivê wan in. De îja hatin. Êdî tê xeracê giredin, te li çi girêdin. Ez êdî tev nabim. Tê peya dibin derê kon da. Ew jî koneke mezin, merivekî mezin e. Seroba wî, êla tê, hemûkê tê da rûnên, xoş bêş. Padîşah
- Dibê: Filankes!
- Dibê: Çi ye?
- Dibê: Tu zanî, ez hatime vira çi?
- Dibê: Ez nizanim.
- Dibê: Ez hatime, tê qîza xu bidî min.
- Dibê: Baş e.
- Dibê: Welle! Ez bejime qîzikê, qîza xu. Dibêje qîzikê, qîzik
- Dibê: Tu min nedî jî yê serê me lêxe. Hem en îyîsî bêje erê. Padîşah
- Dibê: Bira qîza te were vê dere, sê hev kelîmê min hene ezê bêjimê qîzikê
- Dibê: Baş e. Qîzik tê, dibêje bêje padîşahê delal.

- Dibê: Des bigirin.

- Dibê: Ezê herim. Salek te ra mohlet. Salek wî çaxî kuwî zivirin hatin, êla tê ezê wê çaxê werim te sîyar bikim. Ez werim te sîyar bikim. Lê! Ji te kurekî me hebe, Ji me'îna we hanê 'ereba derê kon, ji wî hespê ez lê sîyar, cenîk li berda. Eva jî kîskê min e. Mora min zêr e. Şeş zêr tê da ne. Ez vekim, ew şeş zêr geleka neh zêr tê da bin. Wî çaxî ezê te biherim. Ku ewana akîne nebin ezê serê te lêxim.

- Dibê: Bavo min gote te wezîrê bibe bela serê me da. De were nava wî îşê da derê. Tê çar derkevî? Hev nedîtî. Sadece wî qasî hev dibînin. Dilê dîtina bûka jî wî çaxî ewe. Sîyar dibin. Ya Allah, ewana lê dixin tîn, qîzik dikeve dûşmîşîya bavê xu.

- Dibê: Bavo ti rabe. Eşyakî giran mînanê manîfatûrayê derxe. Em şehîrê padişahê da emê dikanekî vekin. De şehîrê paşê Çaldiranê, Çaldiranê maxazeke mezin, dibîne tijî manîfatûra dike. Kincê mêra xu dike dibe xortekî çardeh salî. Navê xu datîne Hûseyîn. Esnafiyê dike. Esnafiyê dike. Hey xu li seraya padişahê dikişîne. Heta pê ra tanîşmîş dibe. Paşa jî dêna xu didê isa xortekî muteber e, isa baş e...

- Dibê: Padişahê min ti qe setrençê metrançê nizanî bileyîzî?

- Dibê: Welle! Ez dizanim.

- Dibê: Em xu ra setrenç bileyîzin. Ka ez bona te tîm madem. Ez tu bûne merivê hev, em xu ra bileyîzin.

- Dibê: Çi?

- Dibê: Emê şamdîlxaz bileyîzin.

- Dibê: Tu zanî. Dileyîzin qîzik jê dibe.

- Dibê: Bêje çi dixazî?

- Dibê: Welle! Ezê ji te çi bixazim. Min êpêyce deyn meyn daye devdorê gundê te, tê hema hespekî bidî min, ezê du sê roja wan deynê xu berav kim. Başqe ezê çaj malê te bikim. Kuro seyîs!

- Dibê: Hespê bîne Hûseyn Axa bira bihere. Hespê hildide dîne. Afêdersin. Dibe xanê da, tewlê da. Dibe kê derê da teslîmê me'îne dike. Îşê me'îne ret dibe. Dîne cake hespê paşê teslîm dike. Cara dinê ji xu ra dileyîzin. Cake jê dibe.

- Dibê: Îja vê carê çî dixazî kena?
- Dibê: Welle! Tê mora xu bidî min, ezê eşyayê xu berav dikim. Ezê herim
- Dibên: Ewna zefh in. Haydût maydût serê rêya me ye. Cîyê me zefh asê ye.
- Dibê: Bira mora te lê be. Heke werin ezê bêjim malê filan padîşahê ye. Huva mora wî jî ser e. Belkî deymîş nebin. Paşa morê digre didê. Dîne derê kîsik vedike. Sê zêrê dinê jî berdide ser, cake dinê mora paşê dikişîne ser ewê jî dike cêba xu. Cara sisîya ku tê dileyîzin, îja ew xu dêsta berdide. Yanî paşa dibe. Berîya wî jî
- Dibê: Paşa em şamdilxaz dileyîzin.
- Dibê: Te tiştê gotîye şamdilxaz e. Tiştê emanetek ce min heye, ew emanet niha jî wekî din şemdilxazê tu çî dixazî bixaze. Paşê pê uyarmîş dike. Paşê jê dibe. Çaxê paşê jê dibê: Kerem ke padîşahê delal. Dora te ye. De vê carê axir me te nikaribû da. Paşê duşinmîş dibe
- Dibê: Yaw ezê niha çî wî bixazim. Welle!
- Dibê: Tê wê emanetî çî be, tê bidî min.
- Dibê: Paşa emanet yê xelqê ye. Ez nikarim bime te. Ku min berê te ra got.
- Dibê: Qûr- an na tê wê emanetî bidî min. Paşayê delal.
- Dibê: Îja emanet nay dayînê. Ew emanet
- Dibê: Qîzeke li cer min e. Îja
- Dibê: Ka nabe.
- Dibê: Pey! Welle! Tê bidî min. Ev şemdilxaz nîne. Tê bidî min yaw! Ê baş e.
- Dibê: Îja êvarê filan saetê were malê, ew bike. Padîşahê te xu ra bira bikeve wî şabûnê. Ew jî tê kare padîşahê dike. ‘Ezep, hûrmet, îkram, nanê wî, şû bû... Zemanê yê nîzika were, Îja kincê xu yê mêranîyê derdixe, hildide. Xu temîz dixemilîne. Paşa tê hindir. Çav pê dikeve... Ka filankes?
- Dibê: Çû da.
- Dibê: Yê ce mi te be? Êdî çûbe otêlê, çûye maleke cînara...

- Dibê: Îşev ez ti tenê ne. Paşa jî tev qîzîkê radizê. Emre Xudê sibetirê rê dikeve. Tê memleketê xu.
- Dibê: De çîroke êdî ewa çî ye? Ez êdî nizanim. Me'nî cenîk çê dibe ji hespê, jinik ji hemle dibîne jê ra kurek dibe. Zêr jî hemû tamam kirîye xu ra. Sala paşê salavat dibe ewana dizvirine ser obê xu. Padîşahê te dibêje wezîr!
- Dibê: Sîyar be. De em herin. De qirarekî me hebûye. Axir em cîkî zewîcî bûne. Aaa! Qîzîk wextekî dêna xu didê, sîyara lê xistine nalîn.
- Dibê: Bavo! Padîşah hat. Karê nan bikin. Çaxê padîşah tê bînya kon li me'îna tew dayîye. Me'înê dinêhêre cenî li ber e. Li hespê dinêhêre. Kuro!
- Dibê: Ewa ez xewna dibînim yan axir çî ye ew? Hespê min me'înê hev nedîtiye. Em rêya deh roja sîyarî meriv here, em nagihîjine hev. Mutleqa dibê belkî benzere wan ku hev dîtîbin. Anî bin me'în, ber çêkirine. Çaxê tèn rûdinên konda. Qîzîk milê gede digire dîne datîne qundaxa paşê.
- Dibê: Rûnê. Paşa!
- Dibê: Ew çî ye?
- Dibê: Kurê te ye. Ça kurê min e?
- Dibê: Kurê te ye. Paşa lê dînihêre. Neynikê dide ber xu wî. Kuro hema 'eynî ye. Halla! Halla! Paşê dibîne metel.
- Dibê: Qîza mêrik!
- Dibê: Çî ye?
- Dibê: Ez niha me'înê zarê qebûl nakim. Hespê rind e. Hespê mi da zefh rinde. Tipî wî dane. Ew tîpê mi da jî meriv zefh in. Te ewana xu ra çolê girtine. Ti ewa min bîne, kîsik bîne. Îşê min te yê kîsik da saf be. Çûnkî
- Dibê: Mora min ayrî ye. Mora min jî cêba min dane. Çaxî kîsik dîne didê, încelemîş dike. Dêna xu didê mora wî xira nebûye. Mora padîşah bûye. Morê radike dêna xu didê neh zêr tê da.
- Dibê: Qîza min îja êdî were sira wî mi ra bêje. Ewa çîkarî bûye? Eee! Hey!
- Dibê: Padîşahê delal!

- Dibê: Çî ye?
- Dibê: Filan wextî, filan tarîxê qe esnaf hatine şehrê te? Padîşah dîne hişê xu
- Dibê: Belê.
- Dibê: Ew esnaf kê bû?
- Dibê: Hûseyn bû.
- Dibê: Te wî, we ça dikir?
- Dibê: Tu îja bêje, ya xu wî. Îja padîşah min te ra çî gotîye, padîşah jî jê ra dibêje.
- Dibê: Padîşahê delal! Min hesp te stand, bir teslîmê me'nê kir. Min mor te stand bir ew mora ewil rakir, avêt, sê zêr kire ser, mora te kişande dev. 'Eynê mor. Ew emanet ku min digote te, emanete xelqê ye, dest lê bikişîne. Zaten min hiz dikir tu bêjî na. Ewa jî ez bûm. Xudê mala te xirab ke. Kuro ezê herim ka benzerê te, benzerê hespê ku derê bînim? Ewa mesela akîne bi vî celebê ret dibe. Kêrê te were ney êdî Qûr-a'nê Kerîm evane. (J79)

Çç-10

Qûr'an 'Erdê Xistin

De îja ew roja îja ewa dibêhê. Ewa dibêhê.

- Dibê: Ew
- Dibê: Welle! Min bihîstîye qeza Taqûrîya yek rabûye, dibe
- Dibê: Navê min Hûseyn Xan e. Xencî min geleka xan tinebin. Esker dike dibe Celalîya jî Xalika ji Misir, ka ewana 'eşîrê pir giran in. Heta tu bixazî giran in. Her 'eşîr belkî niha du hezar mal in. Milekî Îranê, meriv vira hidûdê me yê Hecî Xatûnêku diçe Îranê, Qerebax, cîyê av têda bejêr dibe. Diçe eva ava diçe Qelenî. Ji wê avê milê rastê Heyderî ye, milê çepê Celalî ye. Ew roj jî dibê emrê Xudê kurekî wî kurê Hûseyn Begê Taqûrî çû ye emrê Xudê.
- Dibê: Cabê dine
- Dibê: Tahir Xan karê xu kir hate ser tê şer. Eva dibêje meleye xu
- Dibê: Mela dibê here pêşîya Tahir Xan lawayî lê bike. Cinazê kurê min erdê ye, bira moletê bide min, ez cinazê kurê xu hildim.
- Dibê: Îja çî dixaze yanî xu zefh jî alçatmîş dike yanî dibê ez şer jî nakim.

- Dibê: Aha ez mîna heywanekî ser tewla wî bim. Ez qelsê wî bim.
- Dibê: Îja zefh hewalî bûye, zef bilind bûye, zefh qure bûye. Zefh jî mêrxas bûye. Şah ra jî şer kirîye.
- Dibê: Çaxî tê mele Qûr'an'ê dîne pêşîyê. Dîne pêşîyê qamçî davîjê. Destê mele da qamçikî Qûr'an'ê dixê
- Dibê: Eva çî ye, te hanîye pêşîya min? Qûr'an dikeve erde.
- Dibê: Dêl bêjîyê¹⁰⁸ hespa dikire kize kiz. Agir dibarî serda. Celalîya ferqinde dibin. Bavê Xalit Axa navê wî nay bîra min. Navê wî bîra min dabû lê vê qasê nay bîra min. Celalî ye, Xeliqî ye.
- Dibê: Kuro Hecî Îsmailê Xudê tev bûye. Vira Kurtika¹⁰⁹ Mamedî¹¹⁰, ew jî wî çaxî geñç bûye, nav da bûye.
- Dibê: Xudê dibê: Eva, agir e, dibare.
- Dibê: Eva meriva xu xelfê girtîye. Xu bidine alîkî, kêfa wî ye.
- Dibê: Celalî ye.
- Dibê: Tahir Xan dibê: Birê te miro
- Dibê: Dêl bêjîyê hespa hemû şewitî. Agir dibare li 'esmana. Qûr'an'ê da, Qûr'an kete erdê. Yaw!
- Dibê: Wî mêrkê Celalî hemasa isa nin. Me hesp bi qelenî ne'l kirine ji kevira digire, bine lingê wana, agirê ber ne'lê ber hespa ne davîje. Çaxî şer çê dibe bitûmê Celalî ya ser dikişe, Celalîya şer nake. Her sê bira tenê dimînin. Aaa! Êdî klamê da te ra gotîye. Merzelê wana wira ye ha. Li vira orta Şerebegîya wî çîyayê Alîkelle jê ra Kanî Miksa dibêjin. Mîna cîkî hûn çê dibêjin gola qaza, tiştêkî wisa bellî başlî ye. Li vir e. Cinazê hersêka ji li wir e. Ev olaya rastî bûye. Çîrok nîne yanî. Îja ewa Zezê, qîza Cemîlê dibihê, tene ser. Îja ser cênazê wan. Tê ser cênazê bavê xu.

Arekî da Tahir Xan dibêje Serhing

¹⁰⁸ Porikê hespê.

¹⁰⁹ Navê gundekî Çaldiranê ye.

¹¹⁰ Navê 'eşîreke Kurda ne.

- Dibê: Em rabin

- Dibê: Celalîya revîn. Kesek pişt me tinene em hersêk tene ne. Ew jî eskerekê giran in. Wî çaxî dibêjê

- Dibê: Min gora cîya te go. Min gote te, xelfê te girtîye. Te xebera min nekir. Wellehî! Êdî mirina Serhing heye revîna wî tine. Ewna jî tene kuştinê. Heta fişengê wana hene didine xevatê, fişengê me ret bûn emê herin. (J79)

ÇÇ-11

Çîroka Klama Hiso û Nazê

Nazê meta Hecî Mihemedê Xalit Axa ye, Pira ‘Erdê¹¹¹. Mikaîlî ye. Hûseyn Hemoyî¹¹² ye. Hesên ‘Evdalê¹¹³, gund bûye. Hûseyn bi Nazê dergîstî bûye. Emrê Xudê nexaşî lê radibe. De nexaş dikeve. De wî çaxî doxtor tinebûne. Tişte tinebûne. Îja sond dixast

- Digo: Wextê hatiye Çaldiranê, mi bixu dît. Kerem¹¹⁴

- Digo: Min Nazê dît.

- Go: Mi bixu lê sual kir. Mi

- Go: Nazê ev klamana kê gotine.

- Dibê: Kerem mi negotine. Heft bent jî Hiso got. Roja ez sîyar kırım yê min beherin, em derê kolikê em sekinin. Min xatirê xu jê lêxast. Destura min neda. Gotîye heft bende min hene. Ezê te ra bêjim. Wê şevê jî emrê Xudê cî dîne.

- Dibêje: Îja navê bavê Xalit Axa çîye, ez nizanim, Ozman Axa ye, çî ye? Hûseyn nexaş dikeve. Mitanê ba lê radibe. Jê ra dibêjin. Kotîbûnê ra berê digotin “ba” lê rabûye. Yanî Tirkî dibêjin “Cûzam”. Wê nexaşîye dikeve. Îja gund dibêjine birî wî

- Dibêjinê: Birê xu çarekî lê bike. Bûlaşicî ye. Îja gundê hemû pê bikeve. Îja

- Dibê: Dibin, zangek wira hebûye. Dengê zangê da kolikê çê dikin. Binê zangê herhal vala bûye. Pûş mûş, gîha mîha tê da rast dikin, dibin datînîne wira. Nazê çend sala hemasa

¹¹¹ Navê ‘eşîreke Kurda ne.

¹¹² Navê ‘eşîreke Kurda ne.

¹¹³ Navê gundekî Çaldiranê ye.

¹¹⁴ Keremê Kor (1922-1997) dibêjinê. Dengbêjekî Kurdan e.

lê dinihêre. Diçe pûşê binê wî, teze dike. Nan dibe, nan dide. Zimanê wî jî derdixe dimije.
Dibê belkî ew derde Xudê daye te

- Dibê: Belkî dikşe mi jî. Nabe.

- Dibê: Xelqê 'elemê nedayê. De îja rojekî dibêjinê Hiso!

- Dibê: Welle! Nazê dane mêr.

- Dibê: Êdî îşê te cer min ret bû. Gûstîla te zivirandin.

- Dibê: Nazê dane mêr, yê werin beherin. Gundek kêleka Erdîşê, navê hêvîya Nazê jî tê da dibêje

- Dibê: Heno Xatûn e. Nazê diçe ser hêvîyê. De îjâ yê derbas bin dibêje yekî dibê bêjine Nazê, çend sal emekê me li hev hebû, bira hema were xatirê xu min bixaze here. Ez bibînim bira dîsa here. Nazê zaten wî çaxî dibêje sîyara

- Dibê: Wextê em wira derbas bûn – de bi def bûne, bi dewat bûne –

- Dibê: Geleka hûn wî defê nexin. Ewê nexin. De ew berbû diçine deve kolikê. Ew berbû diçin dere kolikê peya dibin.

- Dibê: Hiso bêje.

- Dibê: Nazê heft bend klamê min hene. Ezê ji te ra bêjim.

- Dibê: De bêje ser çava ser sera. Wan heft benda jê ra dibêje. Xatrê xu jê dixazin. Diçin.

- Dibê: Emrê Xudê wê şeve diçe emrê Xudê. Eva klama zefh ya zûda nîne. Herkes dizane. Yanî xênçtirê we genca ti kê sual kî yê bizanibe. (J79)

Çç-12

Heqê Xu Heq Kirîye

Dibên jinikek çûye, yekî Sêêrtê deyn dayê. Feqîr bûye, tişteki wî tinebûye. Tişteki wî tinebûye

-Digo: Mêrkê Sêêrtê hatîye çûye derê malê

- Gotîye: Filankes malê ye.

- Gotine: Na Welle! Mal nîne.

- Gotîye: Ku da çûye?

- Gotine: Welle! Çûye xebatê, lê çûye ku derê em nizanin. Mêrik gotîye jina wî
- Gotîye: Dayê!
- Gotîye: Min malê xu dayê, min hene eşyayê xu daye. Naha pere min li ser e, ezê ça bikim?
- Gotîye bira qet netirse. Da lêxe here. Êêê van roja tûccar tèn. Pezê tûccara wana tèn. Ezê bikevime bax bostanê serê qirşika. Ezê hirîya hemû berav bikim. Min hirî berav kir, Xûşka teyê bade, birîze, bişû, bade, birîze. Ezê tême xalîçe, were ezê heqê bire xu bimê. Naha lêxe here. Mêrik kenîya ye. Jinik
- Gotîye: Çima nekene? Heqê xu heq kir êdî, loma dikene (J81).

Çç-13

Yê Bêaqil Kê Ye?

Go carekî padîshahek hebû. Mesela Paşayê Wanê bêjim. Paşayê Wanê sal zeman dikeve arê, rojekî nexaş dikeve. Wexta nexaş dikeve, sê hev kurê wî hebûne. Kurê wî yê biçûk nav wan da zefh bîlgîlî bûye. Gahîz hersê kurê xu dike

- Dibê: Kurê min, wesîyetê xu wan dike
- Dibê: Ezê bimirim.
- Dibê: Yalnız wesîyeteke min heye.
- Dibê: Hûn her sêk jî zarê min in.
- Dibê: Yalnız kurê mine biçûk, aqlê min li wî dibire. Heke wesîyeta min ew bîne yêrê. Êê!
- Dibê: Bavo bêje. Tu ewk bikî, heta me were, emê wesîyeta te bîne yêrê.
- Dibê: Kurê min!
- Dibê: Ez wexta mirim, heftekî şîn çêbû, şîna min kês pês bû, torbek zêrê min heye. Torbe zêrê min heye. Tê hildî bikevî memleketa bigerî. Tê, merivekî bêaqil kê be, tê bidî wî. Dîn na, bêaqil yanê, sefêk. Yekî bêaqil kê be, tê bidî wî. Rojek du roj, heftek dikeve arê, paşayê Wanê, mesela paşê Wanê dimire. Wexta dimire heftekî şîn çêdibe. Şîna wî kês pês dibe. Rojekî hersêk bira gahîz hev dikin. Birayê biçûk dibêje herdik birayê xu
- Dibê: Bira! Şîna bavê me kês pês bû. Lê bavê me tişte me ra gotibû.

- Dibê: Ka çi gotîye? Qanûna wî wasîyeta wî ew bû. Geleka em bîne yêrê. Gunê xu jî kirîye stîyê me. Gotîye kî gotîye wexta ez mirim, şîna min red bû, hûnê evî torbê zêrê min heye. Hûnê bigerin memleketa, bigerin kê dere dibe, hûnê merivêkî bêaqil kê be hûnê evê zêrê min bine wî. Êê herdikê mezin, de berê jî bavê wan, aqlê wî wan nebirîye. - Gotîye: Welle! Bira, ‘emûyî¹¹⁵ ye. Ka emê ku da herin bigerin bêaqila. Emê ku da bibinin. Disa bigota dîn, dîtina wî hebû. Ka bê aqil em nikarin bibînin. De!

- Dibê: Hûn dizanin. Yalnız!

- Dibê: Bavê min wî çaxî jî gotîye geleka hûn dile xu nekin. Gotîye kurê min aqlê min te dibire. Ez yê biçûkim jî ez êdî we ra saygisizî ji dikim. Zêrê xu hildide diçe. Em bêjin vira rê dikeve ser Bîtîsê diçe mesela Mûşê, Dîyarbekirê, nizam ku derê kê derê digere yekî bêaqil tineye. Mesela rojekî diçe Edenê. Derdikeve Edenê dêna xu didê, de mêrkê xerîb e. Derê qehwekî rûdinê. Çay jê ra tê çay duxe. Dêna xu didê li jor da mîna mitînga, ça ce me miting çê dibe. Millet wê da tê, qelebalixek tê, slogana davîje qîre qîre... Tê, têne nêzik qehwê. Ewê qehwecî jî diçe mitîngê. Dêna xu didê tik tenêkê dimîne. De mêrkê xerîb e. Ew jî hemasa qîre qîre diçe. Diçin êpece disekine. Xuyê qehwê dizvire tê dibêje yaw!

- Dibê: Te jî mi hîştî çûyî. Êne tu qehwecî yî. Ewa millet hemû çû, tu jî çûyî. Ewa mesela çibû?

- Dibê: Ewa slogan havêtin. Ewa dewat bû, ewa şahîtî bû, ewa çi bû?

- Go: Welle! Eva şahîtî, dewat nebû. Eva paşayê şehîrê me yê berîya naha çend sala paşa bûye. Îro sêçim çêbûye, paşayê me yê teze, teze bûye. Eva paşa ketîye. Anayasa me da, ûsula gelenexê me da, êdetê me da ew paşayê ku bikeve, yanê em haşa, em kerê sîyar dikin paşopê, dêla kerê jî dine deste wî da. Millet jî rex dikeve hû dike hû dike hetanê heftêkî akîne nava şehîr da digerînin. Yaw!

- Dibê: Ça paşa bûye, çakîne hûn akîne dikin. Welle!

- Gotîye: Hîngî ewa me çê bûye, ewa atayê me da çêbûye, gelenegeke me da çê bûye. Ew ‘ededekî me ye. Paşê me kîjan bikeve, em dînin, paşopê kerê sîyar dikin, dêla kerê dine dêst. Zar rex dikevin, yê kevira davîjê, yê avê davîjê. Heftêkî ewî nav çarşîyê da digerînin.

¹¹⁵ Hemû, zehf

- Dibê: Temam. Duşinmîş dibe
- Dibê: Xudê min dît!
- Dibê: Min dît.
- Dibê: Yê bêaqil paşê naha bêaqiltir kes tineye.
- Dibê: Paşê we yê naha ku derê ye?
- Dibê: Welle! Qazanç kirîye. Hefteke li naha serayê da rûniştîye.
- Dibê: Aaa! Temam e. Radibe torbê xu hildide, torbekî biçûk e, zêrê xu hildide, pere çaya xu jî dide dibê: Îja ez serayê jî nas nakim.
- Dibê: Hema ezê mecîdîyek, perekî bime te, yekî da, yêra paşê nîşanê min ke. Qehwecî gahîz zarekî dike dibê: Kuro kuro cê were vira. Tê.
- Dibê: Kuro aha te ra deh pountê hanê, tê ewî merivê xerîb, beherî derê seraya paşê. Wextê
- Dibê: Behere derê seraya paşê gede şa dibe. Perê dane hetanê êvarê bixevite dest nakeve. Îşê saetekî ye.
- Dibê: Dêrdixe derê serayê
- Dibê: Aha! Eva derê serayê...
- Dibê: Ev e.
- Dibê: Ev e.
- Dibê: Ti here. Diçe ber derî, em bêjin qorumayê wî hene, ewî wî hene
- Dibê: Ezê paşê ziyaret kim. Ez memleketekî serhedê dûr hatime, xerîbim. Yaw!
- Dibê: Ti çi dixazî emê bidine te. Ti dûr hatîyî. Eger ti feqîr bî, eger tu ewk bî em tişteki bine te, tê çi boşê paşê bibînî.
- Dibê: Na, Welle!
- Dibê: Gere ez paşê ra gorîşmîş bim. Çunkî ez memleketekî serhedê dûr hatime, îşekî min pê heye. Diçin dibêjine paşê, paşa
- Dibê: Bêjinê bira were hindir.

- Dibê: Welle! Ez dûr hatime, serhedê hatime. Tê hindir.
- Dibê: Selam eleykim, eleykummesselam. Wira rûdinê. Jê ra çay dixaze, heke qehwe be wî çaxî, xîzmetçiyê wî jê ra dîne. Çaya xu duxe, ewa xu duxe
- Dibê: De bêje, kerem ke de bêje. Tu ku hatîyî, derde te çîye? De bêje, siqintîke te hebe, durumeke te hebe.
- Dibê: Welle! Paşayê min, Welle! Hema ez bi merivekî tenê ez memleketê serhedê hatime.
- Dibê: Wasîyeteke bavê min hebûye, wekî sewa wasîyeta bavê xu ewa memleketa hemû gerîyam heta ez hatim derketime Edenê. Êê!
- Dibê: Bêje. Tiştêkî em biqedînin, em te ra yardimcî bin.
- Dibê: Welle! Bavê min! Eva torbê zêra torbê bavê min e. Bavê min wexta mirî ye, wesîyetek kirîye
- Gotîye: Tê bigerî, memleketa bigerî kîjan merivekî bêaqil bû, tê bidî wî ha. Mervê dîn, mervê feqîr na, kîjan bêaqil be.
- Dibê: Kurê min ka yê bêaqil kê ye? Here hizkî nav şêher da bigere. Bona wî jî ez beqçîkî jî bime te, xu ra bigere.
- Dibê: Na, Welle!
- Dibê: Lê çî?
- Dibê: Xudê hema min te bêaqiltirkes nedîtîye. Kuro gahîzke, kuro beqçî were serê wî lêxe. Kuro ez paşa, kuro tu min nas dikî, kuro ez kê me? Belê ez te nas dikim. Tu paşayî. Hefteke jî te qazanç kirîye.
- Dibê: Wekî ez paşa me, kuro çakî ez bêaqil bim, ez bûme paşa? Bêaqil ça dibine paşa? Êê!
- Dibê: Paşayê min! Nexeyîde. Ti serê min jî lênexe, çika ez îfada xu bidim, dîsa ceza min çibe, ezê ceza xu bikşînim. Dibêje
- Dibê: Paşayê min dibê: Naha, paşayê berê, deh salî kirîye, panzdeh salî kirîye. Sankî ew paşayê berîya te, dibê îro ketîye. Ez hatime nava şêher gerîyam, haşa

- Dibê: Kerê sîyar kirine, paşopê lê sîyar kirine, dêla kere jî dane deste wî. Zar, çol çocixê mehlê hemû, yê avê davîjê, yê dendikê êmîşa davîjê, yê kevira davîjê. Nava xelqê da digerînin. Êêê! Min gotîyê eva kê ye? Gotine eva paşayê me yê deh panzdeh sala paşetî kirîye ew e. Ewî, bêaqiltir kes tineye. Tê jî sibê bikevî, ‘eynê wî bî. Îro, naha tu sibê bikevî, sêçim çêbe tê jî isa bibî?

- Dibê: Erê, Welle!

- Dibê: Wekî, isakîne be, te bêaqiltir kes tineye. Wekî tê sakîne rezil bî, paşê deh salî bîst salî paşetî bikî, paşê jî bikevî, te kere kin paşopê, dêla kerê bine destê te...

- Dibê: Îja yê te bêaqiltir kes tineye.

- Dibê: Xudê min merivê xu dîtîye. Dûşinmîş dibe, taşinmîş dibe cake

- Dibê: Xudê ewî kelîmeke mantiqlî got.

- Dibê: De deh deqîqa min musade bike. Gazî wezîr, wekîlê xu dike, mîna qomîsyona xu gahîz dike

- Dibê: Kuro!

- Dibê: Ezê îstîfa bikim.

- Dibê: Yaw! Padişahê min, eva du sale em ketine sêçimê. Me pere daye, me nizam çî kirîye. Meriv hatine kuştin. Me çî kirîye çî nekirîye te ancax qazanç kirîye.

- Dibê: Na, Welle! Ez îstîfa dikim. Ew wezîr jî qomîsyonê da gahîz dike

- Dibê: Kuro gahîz doxtora kin, paşayê me şabûna tevlihev kirîye. Lê qazanç kirîye. Gahîz doxtora dikin, doxtor dêna xu didinê

- Dibên: Qardeşîm tişteki wî tine. Paşa jî

- Dibê: Yaw! Ez dîn nînim, ez cinî jî nînim.

- Dibê: Hal hewal, mesele ha, ha, ha... Ewa meriva ça hatîye, demekkî min bêaqiltir kes tine. Heqeta Xudê ev e.

- Dibê: Ez îstîfa xu didim. Dîlekça xu dinivîse, îmza xu lê dixê.

- Dibê: Dîlekça xu dide, dibêje ewî merivê da jî

- Dibê: Tu jî were, ez paşa me qîzeke min heye ezê bime te.

- Dibê: Ça?

- Dibê: Xudê te heq kirîye. Qîza min jî dibê, tu kesî qayîl nabe. Ez jî aîleke temîz im.

- Dibê: Welle! Ez jî aîleke temîz im. Welle! Birayo, qîza xu jî da wî merivî da

- Dibê: De tu ser çevê min ra hafî. Ew jî diçe mala xu, aha Welle! Mesele jî isa red dibe.
(J95)

Çç-14

Kurê Pîrê

- Go: Axak hebû, axayê zilmê bû. De axayê berê yê zilmê bûn.

- Go: De îja em bân berê axaler hebûn. Axayê zilmê go rojekî

- Go: Mesela axak, mesela Heyderan, mesela Hesenan... Axayê Heyderan cerba xu dişîne li ser malê Hesenan. Em bêjin nêçîrê bire pezê wî dîne. Çendek dikeve arê ew jî dîne tê, eskerê xu cerbê xu dişîne. Wextê dişîne ser gundê wî da ewa dibêje kî

- Dibê: Gahîz gundîya hemûka dike, berav dike. Heft heşt kurê wî ne, heft heşt birayê wî hebûne... Gundîyê wî dibên kuro cerbê ser gundê me da girtîye. Em hemû sîlahlanmîş bin.

- Dibê: Yê talanê me beherin. Êê!

- Dibê: Baş e. Kesî gund da nahêle. Pîrek hebûye. Ew bûye kurê wî bûye. Gahîz kurê pîrê jî dikin

- Dibên: Bira kurê pîrê jî were.

- Dibên: Wexta tèn cime'et berav dibe, ew

- Dibê: Axa kurê xu, birayê xu wana naşîne. Hemû xu ra ser doşekê rûniştine, de axa ne ya... Yê cîna min feqîr meqîr, kurê pîrê jî tek meriveke, şûrekî dide kurê pîrê. Ewê feqîr hemû diçin. Şer çêdibe, ewk çêdibe. Hemû têne kuştin, kurê pîrê birîndar dibe, dibine mala pîrê. De îja bê ber gule, gepa wî ra ketiye li çena wî ra derketîye. Nikare nan buxe. Bikevçîya şorbê berdide devê wî. Wextê berdide deve wî hevek diçe îçê wî yê dinê jî boxaza wî ra dertê. De isa gule lê ketîye, mesela: Saxdan lê ketîye soldan derketîye. Rojek du roja dîsa nexaş e. Dibêjine axa.

- Dibên: Axa! Kurê pîrê zefh nexaş e.

- Dibên, şorbê berdine devê wî boxaza wî ra derdikeve, isa gule lê ketîye.
- Dibên: Ew wezîrê xu va em bêjin ewê xu va mixtarê xu va diçin serîk dine kurê pîrê.
- Dibên, duruma wî perîşane...
- Dibê: Kurê min duruma te ça ne?
- Dibê: Welle! Bira canê axê min sax be! Hema bira canê axê min sax be, duruma min rind e. Yekî mîtanê mine bêaqil jî li wira rûniştî bûye. Heşa gotîye: Min nizam çi devê cîya te kiro. Kuro şorbê devê wî ra berdinê, boxaza wî ra derdikeve. Paşê jî kurê xu birayê xu va huva ser doşeka rûniştine. Îja hê jî dibê: Axa! Canê te sax be. (J95)

Çç-15

Ne Oxîyan War Ne Dînleyen War!

- Go: Rojekî axayê rovîya gazî rovîyê xu dike. Rovîya hemûka mîna wî çîyayê me yê Tuzederê. Hemû rovîne da. Koma xu hemû berav dike, gazî rovîya dike
- Dibê: Rovî de berav bin. Rovî hemû berav dibin.
- Dibê: toplantîyê wana dike dibê: Kuro aha mera qaxiz hatîye, cab hatîye. Qaymaqamê Çaldiranê emir daye. Heta heftekî hûnê hene nava şehir, serbestin. Mirîşka, hindîyan. De rovî dijminê mirîşka, hindîyan in.
- Dibê: We serbest dike, qarişê we nabin. Kes we naxe. Çunkî qaymeqam îlan kirîye, eva yazî jî daye min. Dîne herkî em bêjin, mîna kunyekî davîje stîyê wana. Şadibin, rovî diçin
- Dibên: Kes qarişê me nabin. Dikevine nava şehir, dikevîne nava mirîşka. Rê dikevîne, gava kunyê davîjine stîyê xu. Sibê radibin dikevîne nava gund. Mehle qompîle radibe. Hema rovî mîna surîyekî ketine nava gund. Bo heyrok, minî hev kirin, jin sewa mirîşka tu zanî... Gazî hev dikin.
- Dibên: Rovîya mirîşk xarin. Yê darê hildide, yê tirpanê hildide, yê bêrê hildide... Dikevine nav rovîya. Rovî disekînin
- Dibêjin: Yaw cê bisekinin. Yaw ewî qaxizê bixûnin. Qaymeqam emir daye me. Kê dînlemîş dike. Lê dixin. Heçî guhê wan jê dikin, heçî dêla wan jê dikin. Henek tene kuştin, yê dine jî direvin, ancaxî xilas dibin diçin. Dêna xu didinê, axa ber partê xu dirêj kirîye, tavê daye... Dêna xû didê hemû hatin. Yê tê hemû birîndar in. Bavo dibê we xêr e.

- Dibên: Xudê mala te xirab ke. Te çi me kir? Te qaxiz da me, te go qaymeqam îzîn daye we. Me hê xu neda nava gund, nîvê zefh hate kuştin, nîvê din jî hemû seqet suqet bûne hatine.

- Dibê: Kuro we qet negote wana, eva kunya qaymeqam e.

- Gotine: Welle! Me go jî. Ne oxîyan var ne dînleyen var. Welle! Em hemû seqet suqet bûn. (J95)

Çç-16

‘Eslê Şîrê

-Go: Carekî axakek hebû, tek kurekî wî hebû. Kurê wî hebû

- Go: Sond xar

- Go: Kurê min yek e. Kurê min bira bigere, dinyayê da memleketa hemû bira bigere, destê xu bavêje qîza kê, çi bixaze ezê bidimê. De axa ye, paşa ye, zengine jî. Kurê wî dibe xort, ama kurê wî nazewîce. Rojekî gayîz wezîr û wekîlê xu dike.

- Dibê: Kuro bêjinê bira bikeve nava memleketa xu ra bigere. Kîjan wîlayetê digere bira bigere

- Dibê: Bira, destê xu davêje kîjan, qîza kê, dibê Xudê ezê jê ra bixazim. Êê dibê baş e. Wezîr wana dînin gede îqna dikin. Gede radibe, ez te ra bêjim, hespê xu hildide, de îja wî çaxî hesp hebûne, deve hebûne, lê ‘erebe tinebûne. Du hev jî qorume dinê, em bêjin xurcek jî zêr dine, sewa bira xu ra xerç ke. Digere em bêjin vira lê dixê diçe Îranê, Iraqê, Surîyê diçe derdikeve Yemenê. Cîhê ‘Erebîstanê Yemenê. Wexta diçe Yemenê sual dike, diçe mala paşayê Yemenê. De ew jî kurê paşê ye. Qabîliyeta wan, de ewê wan tabîî, paşê li zef yaxin bûye.

- Dibê: Ez herime vî şehîrî, şehîrê xerîbe. Mala paşê ku be, ezê herime nêvanê mala paşê. Ka ezê herime nêvanê feqîr fuqare çi bêjim. Radibe diçe. Diçe derê mala paşê sual dike, nişanê dikin. Diçe mala paşê. Selam ‘eylekum eylekummesselam. Qoruma marumayî wî bekçîyî wî paşê dibinin.

- Dibêjin: Xêr e bavo.

- Dibê: Welle! Ez memleketekî doxuyê hatime. Mesela ewê hatime. Digerim. Ez xu ra hatime gerê, hatime bibime nêvanê paşê.

- Dibê: Baş e. Nêvanê paşê. Diçin dibêjine paşê, paşê
- Dibê: Madem memleketekî dur hatîye bira were. Tê wexta gazî dike, ew derbas be here dîvanê, dêna xu didê, qîzek derbas bû. Wexta qîzikê dibîne
- Dibê: Çev qîzikê dikeve, tabî qîzik zefh jî parlax bûye. Wexta çev pê dikeve
- Dibê: Xudê mîn dît. Ez heqa gerîyam, mînanê Îranê, Iraqê, Surîyeyê cîhê dine gerîyam, 'Erebîstanê wira derketim hatime Yemenê, min akîne tek dît. Ji wana sual dike - Dibê: Eva bûk e, qîz e.
- Dibê: Welle! Eva qîza paşê ye. Yalnız
- Dibê: Ewa, xazgînîyê wî zefh tîn lê paşê naxaze. Êêê! Qîzik kesî begem nake.
- Dibê: Baş e.
- Dibê: Ew begem nake ew qolayî ye. Ku em xeberdin, ez dikarim ewî îkna kim. Diçe mala paşê rûdinê, ji te ra bêjim, gundî tê, şehir tê hemû tê, dora wî, ewî
- Dibê: Nêvan hatîye.
- Dibê: Heta êvarê hev bela dibin. Nanê xu duxin, ewa xu duxe.
- Dibê: Kuro cîyê nêvan daynin. Cîyê nêvan odêkî datînin.
- Dibê: Çika were, tu ku derê hatî, ti çi yî, neyin nesî yî? Îja tu hatî mala paşê. Heta niha kes nêvantî qet nehatîye mala paşê. Kê were tê koşkê.
- Gotîye: Welle! Ez jî kurekî paşekî me. Mesela paşayê Tirkîye yê me. Aa! Xudê ez xu ra digirim.
- Gotîye: Xêr e xu ra digerî. Ez hema digirim. Akîne gencim. Min ti qîz begem nekirine. Welle! Bavê min jî ewk kirîye, ez şandime, ez çûme Îranê, Iraqê, Surîyê yê. Eva ez bêjim du sê mehe ez digirim.
- Gotîye: Here tu ku derê qîzek xu ra dît
- Dibê: Ezê te ra bixazim. Kurê min ku derê begem ke.
- Dibê: Welle! Ez jî hema hatim tesadûfen mala te.
- Dibê: Te sual kirîye, qîzê min hene tine ne?
- Dibê: Min nizanibû qîzê te hebûne. Ez tesadûfen hatime. Yalnız paşayê min

- Dibê: Yek derbas bû min dît, min sual kir gotine min, go qîza te ye. Êê gotîye baş e. Wextê te dîtibe, qîza min be baş e. Raste qîza min heye. Yalnız
- Gotîye: Kurê min Welle! Qîza min te begem ke, ezê bime te. Ku yalnız te begem neke ez qîza xu name te.
- Dibê: Welle! Baş e.
- Dibê: De kuro gahîz qîzikê kin bira beherine odayekî, bira ew nêwan xebêrdin. Gede jî zefh aqillî bûye. Heta tubêjî aqillî bûye. Diçin wira em bêjin saetekî du saeta li hindirê odê da xeber didin, hev îkna dikan. Qîzik dêna xu didê heqqueten çîqa ewk hatine hetanê naha yekî aha ewk tineye. Cabê dine paşê. Paşê
- Dibê: Temam.
- Dibê: Heftekî bira li vira bimîne, kurê min! Bira def dewata te bikin, qîza xu bime te ti herî. Sibe ren dibe. Em bêjin gazî gundîyê xu dike paşa, me'ra qîza xu dibire. Heftekî cer xu def dewat dike
- Dibê: De kurê min, rabe qîza min hilde, herekî hespekî sîyar dike. Em bêjin çend hev meriv jî pê ra datîne
- Dibê: Bira hetanê sinirê Tirkîyê yê derbas be, têxine sinire wî werin. Wextê divê rojek be, du roj be qîzikê datîne sinirê Tirkîye yê derbas dikan, piştî xu dinê dizvirin tên, ew jî tê mala xu. Cabê dine bavê wî da
- Dibê: Welle! Kurê te hat. Jinek jî xu ra hanîye.
- Dibê: Temam. Şa dibe. Heft roja heft şeva ew jî tixe dewat cer xu. Dimîne salek du sal sê sal dikeve arê. Heke salek be du sal be. Rojek jinek dibêjê
- Dibê: Tu kurê paşeyî ez jî qîza paşê me.
- Dibê: Ne bavête got, ne jî te got. Eva du sal e te ez hanime
- Dibê: Êê hema ez herim serîk bime mala bavê xu
- Dibê: Baş e. Gede cabê bavê xu ra dişîne. Bavê wî
- Dibêjê: Hay, hay! Ser çavê min.
- Dibêje: kurê min here. Sibê, jê ra du hev hesp ewk bikin, here heftêkî deh roja dibînî bimîne. Tê. Sibê rê dikevin, diçine em bêjin derdikevine ça bêjim wan çîyayê me yê lê

Şemzînê li wendera, çîyayê rastê hene. Wana dibe şew. Şew dikeve ser, dibê êwar. Mêrika dibêjin eva çîyê xerîb e.

- Dibê: Şev kete ser me

- Dibê: Ema hema vendera hespê xu cîkî bihêlin, heta sibe li me ren bû. Wexta jinik

- Dibê: Temam e. Hespê xu ditewînin. Radibin wendera digerin dibê: Emê wendera bigerin, wendera qezete mezete ew mew hebin. Emê herin cîkî da bimînin heta sibe li me ren bû sewa em rê mê bizanibin. Walî digerin valî digerin dêna xu didinê xu ra kulekî dibînin. Yanî maxarekî dibînin. Kuro!

- Dibê: Werin min maxarek dît, emê îsev tê da razên heta sibê. Diçine wexta dikevîne hindirê maxarê, henek diçin de maxara ne, qul qulkî ne, şikeft in. Tê da nin, dêna xu didinê cîkî derdikeve cîhekî fire da. Yatax goşt her tişt têdane. Allah, Allah!

- Dibê: Kuro eva mal e, eva çîye. Gede jetona wî dikeve.

- Dibê: Jinik!

- Dibê: Em birçîne. Bise em nanê xu buxun. Dêna xu dide nanê wan jî hazir e, yêmekê wan jî çêkîrî hazir e, hê kes jî tine. Tê da yatax hene, ewk hene.

- Dibê: Em nanê xu buxun, ezê te ra meselê bêjim.

- Go: Nanê xu dixin.

- Dibê: Jinik!

- Dibê: Were emê xu virda veşêrin.

- Dibê: Çima?

- Dibê: Eva mal e.

- Dibê: Eva ji xu mala kê be... Yaw!

- Dibê: Eva mal nîne.

- Dibê: Yalnız, eva dera, dijminê bavê min hene. Gava evna, ewê Iraqê, Tirkîyeyê zemanekî zefh hev dane. Bavê min jî zefh wan kuştine. Ewana qaçaxê Şahê Îraqê ne. Ema xu vira veşêrin. Em vira ne beled in. Xudê, bizanibin yê me li vira bikujin, bizanibin kurê paşayê Tirkîyeyê ye. Êê!

- Dibê: Baş e.
- Dibê: Em ça bikin. Walî digerin, walî digerin diçin dikevîne qulçikekî, wextekî xu tê da vedişêrînî. Wextekî dimîne, nîvê şeve çêdibe, dêna xu didê xirme xirme hespa hatin, derê walê peya bûn, hespê xu tewirandin, hat ketine hindir. Yekî daye pêşîyê. Mîna wan ewê dibên daxlar qralî yekî isakîne. Piştî wî hemû meriv pey, hemû bi sîlaha ketine hindir. Jinik çav pê dikeve
- Dibê: Mêrik evna kê ne? Mêrik
- Dibê: Êne min te ra ne got. Sebir ke ka hetanê sibe ren bû. Emê xu virada veşêrin. Ewna sibe zû dîsa herin bigerin, ewna qaçax in.
- Dibê: Baş e. Henek rûdinên. Mêrika virda wêrda henekî xeber didin. Yek dudu yaw!
- Dibêjin: Nanê me kême bûye. Axirîyê kême e. Eksîk meksîk, yêmekê me eksîk e. Meriv meriv ketine vira ça bûye? Yaw!
- Dibê: Kê dikare were vira. Eva cîya bixu berê ye. Êê!
- Dibê: Baş e. Ewna nan manê xu duxun. Ez te ra bêjim serê xu datînin dikevîne nav cîyê xu, herkes radizê. Wextekî şevê jinik
- Dibê: Mêrik kuxika min tê.
- Dibê: Jinik nekuxe. Ti bikuxî mêrika yê me bikujin. Wê ti dibêjî: Çil pêncî meriv bi tiving bi sîlah in. Ez wana rind wana zanim. Ewna dijminê bavê min in. Dike nake jinik
- Dibê: Welle! Kuxika min tê. Kuro!
- Dibê: Yeke ça hate serê min. Hela be digere îqna dike. Hevek disekine, êpêce disekine
- Dibê: Mêrik
- Dibê: Bê me'nî mîza min tê. Yaw!
- Dibê: Xudê! Bela xu nede te. Ka ezê mîzê ça bikim?
- Dibê: Hema, heşa derpê xu da berde.
- Dibê: Welle! Ez nikarim derpê xu da berdim. Ez xu pîs nakim. Ka ezê xu ça pîs bikim.
- Dibê: Îja tê ça bikî?
- Dibê: Ezê derkevîm.
- Dibê: Êê tu derkevî, mêrika jî me bikujin.

- Dibê: Xudê! Nabe.
- Dibê: Allah! Allah! Dike nake pê nikare, jînik derdikeve. Radibe derdikeve ortê. Wextê derdikeve ewna hişyar dibin. Pî!
- Dibên: Meriv ketine hindir. Hemû radibin tên. Jinik jî qîza paşê ye bedew e. Hemû çav pê dikevin. Qralê wana radibe
- Dibêje: Dest meste wî girêdin.
- Dibêje: Çika were tu çi yî? Tu ku hatî, neyin nesî yî?
- Dibê: Welle! Ez bûka falan paşayî me. Ez hatime werim herime mala bavê xu. Pey!
- Dibê: Em jî zaten qaçaxê sebebê bavê te ne.
- Dibê: Ka mêrê te?
- Dibê: Huva, qeflê dane. Ew jî qefla pişte dane. Diçin mêrik derdixin. Mêrik dînin.
- Dibên: Kurê min dibê: Ti kurê filan kesî yî?
- Dibê: Erê.
- Dibê: Ti dijminê bavê me yî. Ti qe werdigerî? Ti hema rind hatîyî? Êê
- Dibê: Baş e. Êê
- Dibê: Baş e. Ez rind hatime. Henek dibêjin: Em niha bikujin, henek dibêjin em paşê çi bikin. Qral
- Dibê: Ewî pîse pîs bidine ber dîwar, şîrîtê bînin werin pê girêdin. Bira hetanê sibê hema ser pîya bisekine, heta sibe ren bû emê sibê zû rabin serê wî jê kin.
- Dibên: Baş e. Dînin, gire didin. Şîrîtê bi serpêya dihêlin. Dikeve nav cîhê xu. Jinik jî dikeve nav cîyê qral da, ewê axê wana, kêfa xu dinêhêre. Ewa wexta diçe, boncîkê wî heye. Ku da here xu ra digerîne, isa ozel xayî kirîye. Boncî, niha şehira ça xu ra digerînin, bendîkê wî isa hebûye.
- Dibêjine: Kuçik. Kuçkê wî jî hemasa pê ra ne. Kuçik jî wîra hema ketîye hindirê kulê dane. Ew jî xu ra bira wira da be. Ewna wextekî hemû xewra diçin. Kuçik diçe dora kurê axê diçe. De ew jî isa hîm kirîyê, kuçik isa ewk kirîye, eyîtim daye da, kuçik bi pê pençerokê xu, bi devê xu lê dixê bi şîrîtê dibire. Şîrîta wî wexta dibire, mêrik de îja destê wî vedibe, mêrik radibe şûrê xu hildide, dikeve nav. Nava cîya ha. Sîlah mîlaha gule jî

bernade, sewa deng neçe. Serê deh heva lê dixê. Jê dike davîje wê derê. Ew qral henekî radizê.

- Dibê: Kuro qe çi heye?

- Dibên: Welle! Qe çi hebe? Hema çavê xu da hev, ewê serpîya jî hema xewra çû dêna xu day teyrekî qerekuş hat kete nav çil teyrî, serê deh heva lê da ma sî hev. Êê

- Dibê: Baş e. Ti xewa min zanî, heta sibê ez hişyar nabim. Cake dinê serê xu datîne radizê. Ewa cake dinê radibe dehê dinê jî jê dike. Dîsa qasek disekine qral

- Dibê: Qe çi heye?

- Dibê: Welle! Teyrê qerequşê serê çil hevîda bîst hev lê da ma bîst hev. Welhasil dehê dinê jî dide ser.

- Dibê: Welle! Min bîst jî lê da, li mane bîst. Allah! Allah!

- Dibê: Baş e.

- Dibê, Dibê: Sibe hindik ma. Henekî dinê jî disekine, çaxî radizê, mêrik lê dixê sîyê dine jî dertê dimîne deh.

- Dibê: Cake hişyar

- Dibe, dibê: Kuro qe çi heye?

- Dibê: Welle! Teyrê qerequşê serê çilî sî tê da ma deh. Êê

- Dibê: Baş e.

- Dibê: Ma heveke te. Ezê niha deha dêşanê te kim. Isa xewnarojka bibîne. Henekî radizê ewna radibe ewa cake serê neh heva lê dixê. Serê wî tenêkê dimîne. Cake hişyar dibe, dibê: Kuro qe çi heye?

- Dibê: Welle! Teyrê qerequşê serê sîh û neh heva lê da maye serê yekî tenê. Êê baş e dibê.

- Dibê: Sibe ma çend deqê hane

- Dibê: Ezê rabim serê te lêxim.

- Dibê: Ka buxe paşê bişikirîne. Radibe dêna xu didê çi, serê hemûka jê kirine ew tenê maye. Herdik hev dixin. Qral zefh quvvetlî bûye. De qral bûye, axa bûye, paşa bûye...

Hev dibin tînin, hev dibin tînin, ewa gede digre davîje erdê. Kurê paşê davîje erdê, wextê davîje erdê, jinik

- Dibê: De şûr bavîje stûya. -Bavîje stûyê mêrê wî ha! De jinikê binihêre ha- Wexta ewa deste xu davîje şûr, bavêje stûyê wî Boncî xu li nav çav guhê wî dixê. Kuçik ewî dixê erdê, dikeve ser serî gede serê wî jê dike

- Dibê: Hey!

- Dibê: Ez qurbana xu me li vî serî.

- Dibê: Temam e. Qurbana bejn beynela stûyê wî. Mêrik dibê: Ewa te hanî serê min tişte nake. Serê qral jî lê dixê. Sibe li wan ren dibe, jina xu hildide gêrî dizvire diçe serê xu hildide diçe berê xu dide memleketê xu. Naçe mala bavê jinikê. Hilde tîne, kesî ra jî nabêje. Bavê wî wira tê dibêje hûn çima hatin?

- Dibê: Bavo Welle! Em diçûn, serê rêya me da qaçax hebûn. Em rabûn, de dijminê me hene. De me nikaribû derbas bûna.

- Dibê: Baş e, kurê min. Bavê wî dimire. Gede dîne tê jina xu koşka xu da wira cilikekî datîne wira, kincê gincir. Ew hemasa wî qulçikekî disekine, qulçikekî koşka xu da jî doşekeke mezin datîne; mîndera, belgîyan tîne were Boncî ser rûnê. Dide ser wira. Xîzmetkar wextê nanê wî tînin, nonê xu duxe. Nonê wî yê kuçikê, qabê wî ayrî ayrî tîne pê nonê xu duxe. Nanê ber kuçikê berav dikin, ew kilmê tînin dîne ber jinikê. Jinik yê ber kuçikê çi hebe ewî duxe. Rojek, du, deh, meh salek sakîne dikşîne... Rojek yekî nûtilê min radibe feqîr xu ra diçe dibê: Ezê herim jêrê bixevitim. Tê derdikeve Tirkîyeyê. Tê

- Dibê: Ku dere îş heye

- Dibên: Welle! Paşa îşê vê şehîrê dide. Tê mala paşê.

- Dibê: Paşê dibê: Çî ye?

- Dibê: Welle! Ez hatime, ez feqîrim. Ez digirim, îş digirim. Min bihîstîye paşa îş dide. Xîzmetçî be, çi be te ra lazim e.

- Dibê: Baş e kurê min. Dora xu dinêhêre dê kuçikek wira ser doşekê, mînderê. Îsanek mincir însan e ça hebe, him jî wira mêrikek wira ro ro tê herdik tev hev nan duxun. Qabek ayrî dine kuçikê, qabê ber kuçikê hildidin tînin dine ber jinikê. Jinik bêhal, qotek du qota duxe, berav dikin hildin dibin. Dişinmîş dibe taşinmîş dibe

- Dibê: Xudê çî îş hebe dibê: Îşek nav vê îşî da heye. Paşa dibê: Kurê min tu çima dûşinmîş dibî?
- Dibê: Paşê min
- Dibê: Welle! Eva însan, eva kelb. Akîne, te akîne kir ez ewk bûm, ez tereddutê da mam. Ewa çî ye?
- Dibê: Îşê te tev vî îşî da tine.
- Dibê: Welle! Paşa ez meraq dikim. Carke dinê mêrik dibê: Aha ez derdê te sual kim ti nizanibî ezê serê te jî lêxim.
- Dibê: Welle! Paşayê min ti serê min jî lêxi ji mi ra bû meraq.
- Dibê: Kurê min pekî eva însan e, eva jî kuçik e.
- Dibê: Erê!
- Dibê: Eva kuçik e.
- Dibê: Welle! Eva kuçkê min e, eva jî jina min e. Aa! Îja
- Dibê: Cewaba wî ti bide. Dûşinmîş dibe taşinmîş dibe
- Dibê: Yaw!
- Dibê: Ewa jina wî ye, hem jî însan e. Hestîyê ber kuçikê dimîne dide ber wî, eva kuçika demekkî ozel e. Ser doşeka, yêmekê wî ozel tê, yêmek duxe hestîyê ber kuçikê dimîne dine ber jinikê.
- Dibê: Çî îş hebe li vir da heye.
- Dibê: Paşayê min
- Dibê: Ha însan, ha heywanek kê dibe bira bibe
- Dibê: Jê ra ‘esil lazim e, ‘esil.
- Dibê: Helal be! Kurê min. De îja ez te ra bêjim. Mesela xu ‘eynî serî da dibêje.
- Dibê: Eva kuçikê min, hatibû min xayî fikir, hat ez xilas kirim. Eva jî jina min bû, qîza falan paşayê ye mikur jinê ye. Ewê jinê akîne mi ra kir.
- Dibê: ‘Eslê pak bû ha heywan ha însan. Demekkî ‘eslê kuçikê ‘eslê vê jinikê temîztir e. De

- Bêjin: Jinikê mêrik derxist, mêrika werine kuştin, kuçikê mêrik xilas kir. Kuçik kuçik bû jî bi'esil derket. Jinik jî bê'esil derket. Ru ser 'esil e. Çi dibe bira bibe. Heywan be, bira însan be. Çi dibe bira bibe ku 'esil çê nebû... Kuçik bi'esil bû, çima axê wî heqa ew xayîkirîye. Heqa xu ra gerand, xu ra dibir. Yanî bêşikiranî, bêşikiranî nekir, bê'eslî nekir. Jinik jî qîza paşê bû jî mêrê xu ra bêbextî kir. 'Eslê wî tinebû. Bê'esil bû. Mikrî bû. (J95)

Çç-17

Sebr

Tê tê de îja em bêjin zûva çûye tê dêna xu didê bihar e. Wê derbas be, çemek rabûye, av isa li hev ketîye mînanî gola qaza¹¹⁶, ka yê li kura bide çêm. Henekî li çêm dinêhêre

- Dibê: Ez ê bime çêm. Carke dine

- Dibê: Kuro ez bîst salî li wî kelmê gerîyam da, li bo meriv sebrê bigîhîje meqset û mirazê xu. Devê çêm ketîye dêna xu day sîyarek wê da tê, tivinga wî li milê wî da, kumê wî, hespê wî girêdayî, kupa wî li ber, hespê temîz da avê. Da avê heta çû orta çêm, avê li sê çar pêlek dane hespê. Hesp ket mêrik bi roda çû, hespê day tovira derket, eva kuredeya ku mecbur e li hespê ra li dezgîniya hespê digre darda dike digre mêrik çû - Dibê: Êdî hesp ma ez ê hespê sîyarbim. Hespê sîyar dibe, rex çêm dikeve qederekî tê dêna xu didê cîkî fireh, çêm tenik lê dikevê derbasê alîyê din dibe. Tabî dezmêj mezmêja xu digire, mêja xu dike, şikra xu Xudayê xu ra dike. Bendika xu vedike dêna xu didê çî hetanê berdevê wî tijî zêr e. Dikeve rê bere xu dide şehre xu, heta tê şehre xu saet dibe yanzdeh manzdehê êvarê. Mala xu nas dike, diçe derê mala xu hespê xu derê mala xu girê dide, destê xu dide derî, dêna xu didê derîyê malê vekirîye. Dikeve hindir dêna xu didê sobe dişxule. Karola wî jî pişt sobê ye. Jina wî jî razaye, gencek jî tevî jina wî razaye. Gencekî taylan, destê xu daye li ser sîyê jina wî sekinîye. We' dibê: Evî dêlikê ez xapandim! Destê xu dixê cêba xu kêra xu derdixê bide ber kêra, cake dinê tê qafê wî

- Dibê: Kuro çika bisekine

- Dibê: Li meriv bi sebrê digîhîje meqsetê û mirazê xu. Derdikeve derê malê cake dinê teq teq dêrî dixê, jina wî

- Dibê: Ew kê ye? Mêrik

¹¹⁶ Navê goleke Çaldiranê ye.

- Dibê: Ez im.
- Dibê: Ez hatim. Jinik destê xe dide ber derî
- Dibê: Min tiştêk te sual kiribû te hanî?
- Dibê: Er ê.
- Dibê: Çiye?
- Dibê: Meriv bisebrê digîhîje meqset û mirazê xu. Tê hundir. Qedera deh deqîqa rûdinê. Jinik dengê gede dike
- Dibê: Kuro rabe bavê te hatîye ez te rica dikim here destê bavê xu.
- Dibê: Eva kurê min e
- Dibe: Ehe'.
- Dibê: Xudê tinemayî min kurê xu kuştibu.
- Dibê: Dêna xu bidê, wexta tu çûyî gede du salî bu, nûzdeh salê te ye tu çûyî, gede niha bûye bîstyeke salî. (J9)

Çç-18

Beşîrê Dêro Keskê Zero

Îsoy Zahoy 'Elebelekî¹¹⁷ namûçik li meriva dikir. Yekî xelqê Dêro¹¹⁸ diçe wê derê

- Dibê: Welle! Ezê xan manê mala Hisnê Efendî bikirim. Xan manê mala 'Emêyê Kemal Xoce. Wana dibe
- Dibê: Ez ê wan xan mana xu ra bikirim.
- Dibê: Ê baş e. Îso jî hemali wira derdikeve. Îso
- Dibê: Hecî Beşîr te xêr e, tu hatî?
- Dibê: Welle! Îsmâîl ez hatime li van xan manana bikirim, min jî bîhîstîye tu, nava xelqê dikî, ka yê çi bêjine min? Yê bêjine min Beşîrê Dêro? Êdî dibê Welle! Wexta dibêjine te Beşîrê Dêro, hema bira bejine te Beşîrê Dêro Keskê Zero. (J16)

¹¹⁷ Navê 'eşîreke Kurdan e.

¹¹⁸ Navê gundekî Çaldiranê ye.

Çç-19

Mem û Zîn-1

Berê behsa Mem û Zînê dikirin. Memo xelqê vê derê Doxubayîzdê ye. Zînê xelqê Cizîrê ye. We dere bi xewna da, bi ewada hev dîtibûn. Ne îşê înterneta bûn, ne îşê telefona bûn, ne îşê televizyona bûn. Îsakîne bi peyatî, bi xewn, bi tewn behs kirine. Zînê jî qîza wî padîşahê yanê Cizîrê bûye. Îja mîrê Botan bûye. Memê xelqê vê dere Doxubayîzdê bûye. De vê derê hemasa behs kirine, behs kirine heta çûye derkertîye wê derê. Wê derê gava hev dîtine, êdî nehîştine, Beko ‘ewan ketîye orta wana da. Bi fesadî, bi şeytanî nehîştîye. Beko wî çaxî, destê Mîrê Cizîra Botan da ew bûye. Berdestê wan bûye. Xebircîyê wan bûye. Aqîlbendê wan bûye. Mîr dewamlî gahîz Beko kirîye. Xu ra daye xeberdanê, xu ra jê fikir hildane, ji ew hildane. En sonê, en sonê, Beko dêna xu didê ku Memo jî vê dere Bayîzdê çûye, derketîye Cizîra Botan, dewa qîza mîr dike. Zînê qîza mîr e. De îja isakîne, isakîne digêrînin, en sonê ewana, êvarê Memê digirin. Memê hildidin dibine diwana mîr. Memê dide xeberdanê da. Du hev muma li ser milê Memê, de îja wî çaxî diçikîne. Ew mûmana hemû dihelin ji cendekê Memê ra heta diçin. Diçe dil cîgera wî da. Memê dikûjin yanê. Memê dînin bi mûma bi ewa dikuvin. Wî çaxî Zînê jî, wî çaxî li Memê ra zefh heyran bûye. Dilê wî zefh ketibûye Memê da. Beko ‘Ewan dikeve orta wana da. Beko dayîma fesadîyê ce bavê Zînê dike. Wî çaxî emrê Xudê êdî nale nala Memê bûye. Memê wî çaxî sewa neyêşe, gulekî berdê, hêdî hêdî Memê dikuvin. En sonê Memê dibin dora ewê digêrînin. Li dora ewa mîr digêrînin. Dora koşk, sereya mîr digêrînin. En sonê da Memê emrê Xudê cî dîne. Zînê kerba¹¹⁹ dibe’ece. Zînê jî li wira dimire. Yanê Zînê kerba wî dimire. Li kerba eşqa wî bûye. Ew jî emrê Xudê cî dîne. Êdî herdik li dinya dine digîhîjine hev. Yanê ne îşê laqirdîya ne, ne îşê nebûnîyê ye. Ne haşa îşê îftîra ye, vira ye. (J56)

Çç-20

Mem û Zîn-2

Memê diçe eskerîyê. ‘Eyşê jî xasîya Zînê bûye. Eskerî jî heft sal bûye.

- Dibê: Bira Zînê çavê însana nebîne. Zînê isa bedew bûye

¹¹⁹ Keder.

- Gotîye: Tu kes bira çavê jina Memê nebîne, heta Memê teskera xu bistîne. Zînê dixê odekî nonê wî didê, diçe ber pê hemasa nesîhet, gav bi gav diçe, saet bi saet teselîya Zînê dike. Teselîya Zînê dike. Heft salê Memê ret dibe. Memê
- Dibê: Welle! Ezê herim. Ez ‘Eyšê, berbanga sibê hişyar nakim. Ez hema herim. Ez deng ‘Eyšê nakim, ezê deng Zînê bikim. Memê diçe derê oda Zînê dixê. Zînê
- Dibê: Tu kêy?
- Dibê: Ez Memê me.
- Dibê: Boy Xudê ney ber oda Zînê, here ber oda ‘Eyšê.
- Dibê: Çima?
- Dibê: ‘Eyšê rabe xewa sibê, yê bêje çika kê ye? Kê hatîye nav cîhê Zînê. Memê
- Dibê: Welle! Ez qêmîş nakim, cîya xu xewê rakim, xewa sibê. Hema ezê herime oda Zînê. Wextê Memê diçe bikeve nav cî nivînê Zînê, ‘Eyšê radibe. Berbanga sibê radibe mêja sibê. Diçe derî dixê. Dêna xu didê yek cî nivînê Zînê da.
- Dibê: Weylê zeman xirabî. Demek kê ez xewê da mam. Welle! Îro hatine ketine cî nivînê Zînê.
- Dibê: Ez gulê berdim, gule dibe dengê dinê.
- Dibê: Welle! Sorayî bime serê keçka dilê xelqê. Bira deng neçe guhê xelqê, sewa xatirê namusa Memê. Wextê gulê dide serê dile Memê
- Dibê: Ez gulê dime serê dilê Memê, qêrînê tê Zînê, nalînê tê Memê.
- Dibê: Inê enê ez Memê.
- Dibê: ‘Eyšê qirikê êne ez Memê me. Heft salê min ez gurbetîyê me.
- Gotîye: Min nizanibûye tu Memê yî. Min go qey, kuro xelqê ye, ketîye nav cî nivînê Zînê da. Êê gûle nabe, gule navê dinê ye. Ezê sorayî bime serê kezeva dilê Memê ye. Qêrînê tê Zînê, nalînê tê Memê. Wextê Memê eskerîyê bûye, têjîya Memê dewamlî derê malê girê dide, ‘Eyšê dan dan nane wî didê.
- Dibê: Eva tejîya Memkê min e. Memkê min çûye eskerîyê, heft sal e. Ezê tejîya Memkê xu, ezê Zînê isa xayîkim însan çavê nebînin, heta Memê heft sal eskerî kir. Îja wexta Memê dikuşe, qêrînê tê Zînê, nalînê jî tê Memê.

- Dibê: Weyla!

- Dibê: ‘Eyšê qirikê me’rumê. Tu bixu xu bu bahîsê Memkê xu.

- Dibê: Ji boy Xudê derdora mala min neçin ney. Nebêjine min, tejîya Memkê min îske îske. Ez ‘Eyšê me. Ez serê salê du heywîn dike deste goşt.

- Dibê: Ji boy Xudê be de îja Memê wexta diçe Zînê dibêje min isa Xudê ra we’ed kirîye heft sala min însan nedîtîye min çava tu kesî nedîtîye. Wellehî! Ezê bixu xu bibime bahîsê xu. Ezê xu jî bikujim. Wexta Zînê jî dimire ‘Eyšê

- Dibê: Bidine xatirê Xudê Qûr-an’ê hûnê Zînê bine rex Memê ye. Min jî bira Memê bikeve orta min Zînê ye. Heta ez xaşim darê dinê ye, ewa bira bikeve bîra ‘Eyšê ye. Navêjine min tejîyê Memê îske îske, ‘Eyšê serê salê zêr dihelîne her du dest bihistek.

‘Eyšê tê wexta kurê xu dikuje, buka wî dibe’ece, ‘Eyšê jî dibe’ece...

-Dibê: Wellehî! Hûnê Memê têxine orta min Zînê da. Niha merzelê Memê orta cîya wî, jina wî da ye. (J6)

Çç-21

Mem û Zîn-3

Zînê Cizîrê bûye. Zînê qîza Cizîrê bûye. Memo li Dîyarbekirê bûye. Wextê wan da navê Dîyarbakirê Amed jî nebûye. Memo kurê Alp Paşa ye. Wê çaxê dora Dîyarbekirê sur bûye. Libe mal, libe bîna, xan manê wî çaxî her çi bûne libek li derê malê tine bûye. Bitûnê wê sûrê da bûye. Dû derîyê sûrê hene ancax ew derî vebûna gîrîş – çikiş hebûya, ku venabûya kesî nikaribû xu bida sûrê. Hê niha jî sûra wî kifşe.

Ewna herdik xewnê da hev dibînîn. Yalnız Zînê tê Dîyarbakirê. Memo naçe Cizîrê, xewnê da. Zînê tê cer Memo. Tê Dîyarbekirê. Zînê Cizîrê ye. Memo jî xelqê Mexrep Zemînê ye. Zînê tê. Memo wextekî çavê xu vedike, dêna xu didê cerm hevin. Pekî

- Dibê: Tu ke yî? Ew jî

- Dibê: Tu kê yî? Tu şev çima hatî vê dere, nav cîyê min, hatî yataxa min, hatî oda min? Ew jî

- Dibê: Tu hatî. Her du bi hev nakin. Bi hev nakin

- Dibê: Rabe em derkevîne derva, kanîke rewz (hewz heye).

- Dibê: Ewa kanîya hewz Memo

- Dibê: Hewşa min da ne. Ew jî

- Dibê: Kanîke akîne, bi hewz felan hewşa min da ne. Derdikevin dêna xu didinê, Zînê dêna xu didê êê rast e. Zînê hafîye cer Memo. (Xewnê da) Gustîlên xu hev digûhêrin. Navê wan ser gustîla nivîsî bûye. Gustîla tîlîya xu Zînê dide Memo, Memo gustîla xu dide wî. Ku sibê Memo radibe tê were ser avê, ku destê xu bişû, Allah! Allah! Dêna xu didê, gustîla wî nîne. Zînê ser nivîsar e. Ya rebbî

- Dibê: Ew Zînê kê ye, çî ye? Qizka, îşev xewna min dane ew e. Ew jî wira ‘eynî li wira dibîne. Ew jî Cizîrê ser hemdê xu ye. Dêna xu didê ku navê Memo ser gustîla wî ye. Gustîla ça. Ku wî, îja bi vî avayî bi hev ra dibine aşiq. Ewna aşiqin. Ewna aşiqê heqîqî ne. Herdik jî. Îja melayê Memo hebû ye. Alp Paşa jê ra meleyek girtîye. Dixune da. Wî çaxî xandin mele bûne. Mîna medresa. Jê ra. -Ça mêrik me’elimê ozel digire, kurê xu dide xandinê. ‘Eynî isa. Îja mele dêna xu

- Didê: Memo tevlihev kirîye. (Yaw) Tê şikat bavê wî dike. Te ce Alp Paşa.

- Dibê: Padîşahê min, hal meselê Memo aha. Bê deng jî bûye. Ewa wî, meriv dibê qey qafê wî yêrê da nîne. De xu qaptirmîşê ewê kirîye, eşqê kirîye. Walî walî ewk dikevin pey

- Dibên: Memo aşiq e. Memo aşiq e. Memo kehyakî wî hebû ye. Hespê wî xayî dike. Navê hespê Memo Bor e. Xayî dike. Memo, Alp Paşa dibêje hespê ewk bikin. Qeyd bikin. Berê qeyd hebû. Binê lingê hespa da hebû. Hesp xayî dikirin. Qeydê hespa hebûn. Hetanê wî axirîyê yê me jî hebûn. Hespa qeyd dikirin. Em bêjin bona diz nebin. Bona çolê lê sîyar nebin, qeyd dikirin lingê wana. Kîlît bû, kîlît dikirin. Mîna kelemçê naha, ‘eynê isakîne. Navê wê qeyd bû.

- Dibê: Qeyd kin bira Memo, pê ew nebe. Lê sîyar nebe, pê neçe. Êdî zefh yanê tê halekî xirab. Şevkî derdixe sîyar dibe. Sîyar dibe, dibê: Li orta sûrê isa hespê dide, isa hespê çar qamçî dike, hesp sûrê pertav dike. De îja te sûr dîtîye, çiqa bilind e. Êdî îrada Xudê tê da hebûye. Bo sûrê pertav dike. Tê hema isa diçe. (Zefh dirêje ha! Nay gotinê. Hema çend liba bêjim. Serê wê te wekir.) Zefh diçe, pênc şeş roj rêda diçe. Şev roj... Hesp dêna xu didê qeydik tê da nemaye. Heywan pê ra zar tê. Jê ra zar tê.

- Dibê: Erê Memo! Ew jî klamekî dibêje.

- Dibê:

Erê Memo! Çi sîyarekî melûlî mestî,
Heft roje tu mi dajoyî qet nawestî,
Serê xu bejêrke dibê: Qeydê lingê min birî,
Gîhande hestî.

Memo ku jorda xu hespê davêje, dêna xu didê çî lingê hespê sade hestî, ew tenê maye. De îja çakî, çakîne dike dişkêne. Bi pelê pincarê dide. Ser pê hespê qeç dibe. Careke dinê diçe.

-Dibê: Berê Şettê Cizîrê, navê çemê Cizîrê berê Şet te. Jê ra

- Dibê: Şet tê. Cizîrê, ew ava niha derbas dibe. Şettê li wira şivan hebûye. Kê hebûye sual dike? De

- Dibê: Çem nerm e.

- Dibê: Delalê wê çemê kîjanê? Ewa pê dêşan dixê.

- Dibê: Aha tu ku wira bajoyî, tu wira ra derbas dibî. Derbas dibe. Derbasê walî dibe. Çaxê derbas dibe, derbasê walî dibe, dêna xu dide, du sîyar li pey xezalekîne. Xezal diçe, her sîyar pey xezalê ne. Nêçîra wana ya, ama hespêwan pê ra nagîhîne. Memo serê boz berdide, xu berîya wana digîhîne xezalê. Wî çaxî zemanê sîlaha nebûne. Tîr hebûne, mizraq hebûne, oq hebûne. Îşte bi oqa destê xu lê dide. Xezal dikeve. Peya dibe şerjê dike. Her du sîyar jî tîn peya dibên

- Dibê: Neçîra me ye. Memo

- Dibê: Nexêr.

- Dibê: Min lê daye.

- Dibê: Hûn pê ra negîhîştin. Hespê we hilneda. Yek ji wana yek jî wana dibezine hev. Dibezine hev

- Dibên: Tu kê yî?

- Dibê: Ez xelqê Mexrep Zemînê¹²⁰ me. Kuro dibê: Xelqê Mexrep Zemînê me. Kuro!

¹²⁰ Dîyarbekir.

- Dibê: Xelqê Mexrep Zemînê li wendera?
- Dibê: Navê yekî Qere Tajîdîn bûye. Nevê yê dine jî Seyfedîn bûye. Her dik jî birayê hev bûne.
- Dibê: Kuro em herdik birayê hev in, eva jî tik tenêkê ye. Pekî!
- Dibê: Tu ku da herî?
- Dibê: Ezê heme mala mîr. Çi qeyîdê?
- Dibê ezê jî bona qîza wî herim. Qîzik dergîstîya Seyfedîn e. Yanî tê dogîtaya¹²¹wî ye. Qere Tajîdînê ji bire xu re bixaze. Bi Memo re tartîşmîş dibin.
- Dibên: Oyleyse ti nêvanê me yî. Nêçîra xu hildidin tev diçîne nêvanê Qere Paşayî. De îja ortêda zefh qebralix hene. Yanî gotinê da henek neyêne hişê min de. Zefh dikşîne. Nîhayet ev jî li hev miraz nakin. Bekirî ‘Ewan dibe şeytanê wan. Dikeve ara wan. Êdî ez nikarim zede bêjim. (J79)

Çç-22

Çîroka Navê Bayîzaxa

Navê Bayîzaxa esas merivê li vir da bû ne. Ew merivê berê, navê wî Bayîz bû ye. Navê wî li ser wî navê Bayîzaxa lêkirine. Du bira bû ne. Ew ê dinê jî navê wî Bişaraxa bû ye. Gundê Bişaraxa jî huva derhanê ye. Ev jî gundekî Bayîzaxa ye. Bişaraxa û Bayîzaxa her du birê hev bû ne. Bişar Axa li ser rêya Doxûbayîzdê ye. Li vir da diçî dikeve milê rastê, wê da tê dikeve milê çepê. Piştê Bişaraxa gola qaza jî li ser Bişaraxa tê. Gola qaza ra niha dibêjin Kelefa. Kelefa jî destê Bişaraxa da bûye. (J16)

Çç-23

Dirbas Xan

Yekî hilda

- Go: Go, em Wanê, go em gola Nawîrê bûn. Gola Nawîrê¹²² zefh mezin bû. Yêra çarsid donimî bû. Me zebî diçand.
- Go: Me nan datînî.

¹²¹ Devkî.

¹²² Navê goleke Wanê ye.

- Go: Îja Kurmanca me da, em birin, em kuştin.
- Go: Wextê Kurmanca em birin
- Go: Rev bi me ket.
- Go: Em file revîn.
- Go: Em revîn.
- Go: Dirbas Xan hebû. Dirbas Xan axê Şemskîya bû.
- Go: Êleke giran bû.
- Go: Em sibê rabûn
- Go: Me dêna xu day, Dirbas Xan çar hev kotan girêdaye, zebîya golê radike.
- Go: Me pê nikaribû, radike.
- Go: Me çû gote axê, min navê axê bîr kirîye.
- Go: Me çû go axê xu, me
- Go: Dirbas Xan çûye zevîya me ya golê radike.
- Go: Du hev hanî jî me şandin.
- Go: Go, neçin nebezinê
- Go: Herin bêjinê bêjin: Axê ti selam kirî gotîye bêjinê Dirbas Xan, ewî nanê mala bavê min xarîye, ew nan ber çewê wî tê. Ewê bêjinê werin.
- Go: Ew her mervê me çûn. Çûne Dirbas Xan.
- Go: Gotine Dirbas Xan! Gotine axê gotîye bira zebîyê xu ra rake. Ew nane me yê xarî ber çavê wî nay?
- Go: Wextê wan he merva isa gotê
- Go: Dirbas Xan her çar kotan berdan, kete rê hatê mala xu.
- Go: Wê salê gendîgirane¹²³ kir.
- Go: Me îdara xu pê kir.

¹²³ Nan diavêjî ‘erdê, salek şûnda hêşîn dibe.

- Go: Gelek cînarê me tirsax Dirbas Xan çûn. Gelek Êzdîyê pizmamê me, tirsax Dirbas Xan çûn bûne Misilman, bûne Mihemedî.
- Go: Lê Dirbad Xan tev me nedibû.
- Go: Xirabî ji me ra nedikir.
- Go: Li wira da gele pizmamê me hene.
- Go: Êzdî ne.
- Go: Bûne êla Dirbas Xan. Heqetî niha Şemskîya nîvê wî êla Dirbas Xan e. Bavê xu ra bêjim wî çaxî
- Go: Xanêda Xana ‘Elî Begê da, gunê te sitîyê min be
- Go: Xan hemû kurapê min bû.
- Go: Bavê min ‘Elî Beg birê hev bûn.
- Go: Mihemedê Esedê dengbêj heye.
- Go: Mihemed kurapê wî bûye.
- Go: Ewana jî tirsax Roma Reş bûne Mihemedî. Hemû Mihemedîne û Mikailî ne. Ewî wî çaxî digo, gotina wî... (J81)

Çç-24

Xulîya Bin Lingê Te

Bavê min sed qavir dabû xocekî xelqê Çelebîbaxê.¹²⁴ Saeta xu jî dabûyê hedîye.
Bavê min

- Go: Sîyabend here qavira bîne were. Meherin perê me bîne, çika dînya xiradibe.
- Dibê: Îja apê mine Sîyabend çû.
- Dibê: De malê xu barkin birevin.
- Dibê: Me malê xu barkir.

¹²⁴ Navê beldeyeke Erdişê ye.

- Go: Em revîn em hatine ûstê Devetaşê¹²⁵ me konê xu wergirt xistine kon. Sîyabend tê dêna xu didê: Kes tine, gund bela bûye, çadirê xu berav kirine, mal xirabûne.
- Dibê: Mala we xirabe eva çi bû we hanî serê min.
- Go: Danzdeh tivingê hikûmatê jî dabûne me
- Digo: Wê ce me bibin.
- Go: Hecî!
- Go: Yaw!
- Go: Wira!
- Go: Em man.
- Go: Em mehekî wir man.
- Go: Me wira barkir em hatine ser Şêx Cindî¹²⁶.
- Go: Me Şêx Cindîyê danî.
- Go: Êla Başimîya¹²⁷ jî gihîşte me.
- Go: Em mehekî jî li wira man.
- Go: Meha me li wira tamam bû.
- Go: Me barkir. Me
- Go: Emê berê xu bine Îranê, emê herin.
- Go: Yekî Başimî
- Go: Gotê emê êdî barkin.
- Go: Emê wê şeve barkin.
- Go: Gote me
- Go: Bombeke zefh zexm xirabûye.
- Go: Go, emê niha herin. Berîya sibê emê şova derbas bin.

¹²⁵ Navê cihekî Erdîşê ye.

¹²⁶ Navê ‘eşîreke Kurda ne.

¹²⁷ Navê ‘eşîreke Kurda ne.

- Go: Gotin emê derbas bin netirsîn. Taximek gava hat, ezê bombe bavîjim. Hûn jî tivingê wana jê bistînin.
- Go: Em hatin berbanga sibê, nizîkê şovê
- Go: Hecî! Em dikuxin. Kuxik me digire. Hecî!
- Go: Kuro nekuxin.
- Go: Eskerê me bibihisin
- Go: Mi go: Xudê ji te razî, esker Çaldiranê ye. Yê kê derê me bibihise. Tu dibêjî.
- Go: Kuro na.
- Go: Mi go êne bomba te heye. Gava hatin tuyê bomba xu bavêjê, emê xilaz bin.
- Go: Weylê! Miraz çava da mayî.
- Go: Xeberê ça acî jî dibêje min. Welhasil
- Go: Em çûne hidûd. Hidûdê Îranê Tirkîyê yê.
- Go: Me hidûd çadir vergirt, kevirê spî da.
- Go: Malê me wira ma.
- Go: Hecî, gundîyê me li wira man. Qaçax hatin, hema li me sekînîn.
- Go: Qaçax mala apê minê Hemzoyê qijik.
- Go: Çûbun yûzbaşî girtibûn li eskerîyê.
- Go: Hanî bû yûzbaşîyê eskerîyê hildidan dihatin.
- Go: Êvarê qaçax dihatin. Êvarê pişte hespê wan sîyar dikirin.
- Go: Bavê min çav wana ket
- Go: Kuro werine vira. Kuro hûn kurê merivane. Yan gulekî berdinê bikujin, yan jî evî boy Xudê azad bikin.
- Go: ‘Elî rabû
- Go: ‘Ehme! Ka kuro emê berdinê yê here ku derê?
- Go: Ku hûn bine min ezê beherim.

- Go: Yûzbaşî dane bavê min.
- Go: Bavê min, dûrbînê nêhêrî.
- Go: Çadirê wana gola boxa¹²⁸ bûne.
- Go: Bavê min sibê zû gahîz yûzbaşî kir.
- Go: Were
- Go: Welle hûnê min beherin bikûjin.
- Go: Bavê min
- Go: Ez te nakujim, ezê te beherim ce eskera. Binê aha ezê dûrbînê bime te. Binê, eskerî aha hatîye filan cîhî. Ezê te beherim filan cîhî. Ezê te teslîmê eskerîyê bikim, vegerim. Ez naym. Ez werim yê min bikujin, eskerê min bikujin. Ezê te beherim, gava çadir hatine xûyanê ezê te berdim tu here nava eskerîyê, ezê jî vegerim werime cîhê xu.
- Go: Baş e.
- Go: Yûzbaşî zefh ditirsîya.
- Go: Bavê min dîne tê, alîyê gola boxa, alîyê Bişar Axa va derdikeve.
- Dibê: Aha eva eskerî ye, êdî tu here.
- Go: Tu jî mi ra were.
- Go: Mî go: Yûzbaşî ezê te ra werim heta nêzîk. Lê yê min bîbinin, yên mi bikujin. Ez newêrim werim. Dîqat ke nebî tu diçî dibê filan merivî min hanîye. Pey min dikevin min dikujin. Min bona Xudê te 'efû kirîye. Te xilas dikim.
- Go: Gote min, heçîyê isane! Tu pîyê xu bilindke, ezê xulîya bin lingê te bixim îja herim.
- Gotîyî: Go ez isa nakim. Kalkê min
- Go: Ez tişteki isa nakim.
- Go: Go, min ji Xudê ra we'd kirîye. Min gotîyê: Kê min xilas bike, ezê xulîya lingê wî paçkim. Îja ez xalîya bine lingê te nexum.
- Go: Min lingê xu pirtikî bilind kir, min dêna xu day lingê min xiste devê xu, xwar.

¹²⁸ Navê goleke Çaldiranê ye.

- Go: Xatirê xu min xast. Herdu destê min paçkir. Em çûne hidûd.
- Go: Em, meha me tamam bû. Payîz ser me da hat.
- Go: Kedalîya¹²⁹ hatin.
- Go: Go em mala te biherine Îranê.
- Go: Min go Welle! Ez naym.
- Go: Gotin êê tu nay, îja tê kuda herî?
- Go: Mi go, ka çikanê ez beklemîşkim, çika hetanê çendekî ça dibe.
- Go: Îbrahîm Bey hebû. Bavo ‘Elo. Kurapê Şîrîn Begê.
- Go: Qeymeqam nebû. Paşê
- Go: Qeymeqam çû.
- Go: Qeymeqamê Bêgrîyê himayîlek¹³⁰ qaydê morkiribû. ‘Ehmed were emê ‘Ehmed ‘efû kin. Bira sirf vegere were, neçe Îranê. Bira teslîmê me be, emê berdin.
- Go: Îbrahîm Begê gotinê
- Go: Emê vegerin.
- Go: Vegerin.
- Go: Vegerin. Nîvê şevê xu dane hidûdê Îranê.
- Go: Pezê me jî
- Go: Xudê da, mala apê minê ‘Elî
- Go: Ezê xayîkim bişînim.
- Go: Ew jî tev me bû.
- Go: Ezê xayîkim, baharê pezê te bişînim. Tam sed pêncî mîh.
- Go: Welle! Hecî, ewna çûn.
- Go: Me malê xu barkirin, em hatine Bayîzaxa.

¹²⁹ Navê ‘eşîreke Kurdan e.

¹³⁰ Nivişt.

- Go: Bolûk qumatanîyê Bêgîrîyê hat.
- Go: Dilê we kîşan gundî dixaze ezê wî gundî bime we.
- Go: Me
- Go: Welle emê hene Gewrika¹³¹ Gewrika gundê bavê me bû. Me
- Go: Emê hene wira.
- Go: Em hatine Gewrika. Me malê xu Gewrika danîn.
- Go: Pûşê Gewrika rabûye, aha davîje li vira meriva, li hev alandîye.
- Go: Xûşkeke me hebû navê wî ‘Eyşo bû.
- Go: Me
- Go: De êdî hûn vir bin, emê hene Bêgîrîyê. Em tamam top bûn.
- Go: Me danzdeh tivingê hikûmatê jî hildan
- Go: Em çûn.
- Go: Em çûne Bêgîrîyê. Qeymeqam hat
- Go: Îbrahîm Beg hat.
- Go: ‘Ehmed tu hatîyî, me te ‘efû kir.
- Go: Tiving hemû muayene kirin.
- Go: Dîsa du tiving girtin dane me.
- Go: Deh tiving jî me teslîm kirin. Gotine me
- Go: De vegerin.
- Go: De em hatin Gewrika. Me dêna xu day Xudê ser kesîka da neyne. Gewrika agir pê ketîye, hema ancax nivînê xu hildane, tamam şewîtiye. Ne gîha maye, ne tiştêk maye. Gundek hemû şewîtiye. Kuro we çakirîye?
- Go: ‘Eyşo ya xûşka min hilda
- Go: Go, go, Welle! ‘Ehmed zar hatine ce min gotine em birçîne

¹³¹ Navê ‘eşîreke Kurda ne.

- Go: Min jî çûye pez bizin dotine, hanîye hatîye. Min gotîye ez ji wan ra pişirûkê¹³² çêkim.
- Go: Me pişirûk çêkirîye.
- Go: Me pişirûk çêkirîye
- Go: Ba hatîye, bayê lêxistîye agir vendera ketîye. Me kirye nekirîye, me xîret nekirîye, me hema ancax nivînê xu hildaye xu avêtîye vê ewkê. Me xu havêtîye vê berojî.¹³³
- Go: Welle! Em êdî Gewrika da man.
- Go: Em wirda cî bûn. Me şer çê bû. Axalera hemû hikûmetê girtin.
- Go: Hanî hatin, çem ce me derbas dibûn.
- Go: Welle! Em jî rê da man Hecî. Me jî devam kir.
- Go: Orta me Bayîzaxa jî tinebû.
- Go: Em henekî gund da man, a Welle! Cakedinê em hatin ketine Çaldiranê. (J81)

Çç-25

Qeder

Em behsa qedera Xudê bikin. Mele ‘Ehmed Eleşkîrtê¹³⁴ mele bûye. Mela ‘Ehmed

- Go: Zemanêkî Rebbê ‘Elemê xilqeta tûmê însana kirîye. Qeder, nesîp, ‘ecl.
- Go: Ev hersêk xeybin. Sirf terefê Xudê ye.
- Go: Wekê dinê gayrê îxtîyarî destê însîn dane feqet
- Go: Dîsa girêdayê qedera Xudê ye.
- Go: Dibên merivek filan derê lêxistin kuştin.
- Go: Jê ra sebeba çê dike. Ewa sebaba deste kê da, destê filankesê da hatîye kuştin. Feqet
- Go: Rebbê ‘elemê sakîne hez kirîye. Îro
- Go: Ez behsa qederê dikim.
- Go: Ezê meselekî ser qedera we ra bêjim.

¹³² Şîr.

¹³³ Navê çîyayê Gewrika (Çaldiran) ye.

¹³⁴ Navê navçeyeyeke Agirîyê ye.

- Go. Gotibû hûn hemû xu kerkin. Ez we ra bêjim deng we re we. Wana go baş e. Bi apalayê, şîne da
- Go: Go qedera Xudê ku da here qeder xira nabe.
- Go: Siltan Silêman pêxember, qaftaqaftê xu xukir.
- Go: Îja Rebbê ‘elemê got:
- Go tê ser qederê gahîz bitûnê însan, teyr, heywan, kê hebe tê gahîz kê çika dikare qederê xira bike an na. Gahîz temama kir. Temama
- Go: Îşê Xudê bike nayê xirab kirin. Teyrê Sîqet¹³⁵
- Go: Ez dikarim qederê xirab bikim.
- Go: Wexta ku teyrê Sîqet rabûye ser xu gotîye: Ya Siltan Silêman pêxember! Ev qedera tu bêjî ez dikarim xira bikim.
- Go: Siltan Silêman pêxember
- Gotye: Go, gotye tê ça xirabkî?
- Gotîye: Tij mi ra bêjî ezê xirabkim.
- Go: Yek jî gund rabûye.
- Go: Ewî jî gotîye: Ez gotna Teyrê Sîqet testîq dikim. Ezê wî qederê betal bikim.
- Dibê: Baş e.
- Go: Qîzek îro padîşahê mexrebê ra dizewice.
- Go: Kurek jî padîşahekê meşrebê ra.
- Go: Qedera her dika serê hev e.
- Dibê: Îja em wî qederê xirab kin, em çi bixazin tê bidî me.
- Dibê: Wee! Ser çavê min.
- Dibê: Teyrên Sîqet û qund rabûn hewa ketin. Bira ewna hewa kevin, emê îja behsa qîza padîşahê meşrebê bikin. Qîzik jî gede bîst salê tamam be weyaxud deh panzdeh salê wî tamam bû, bû muderrîs ser behrê ket çû.

¹³⁵ Mezinê Teyran e.

- Dibê: Wextê ser behre ket, pir çû hindik çû...
- Dibê: Çû nivê rê da adaya Betlanoz
- Dibê: Li wî dere da bag lê rabû. Wexta kul ê ba rabû
- Dibê: Ewa mileqatê wî, ew mileqatê ser gemiye tamamê jî geda qetya
- Dibê: Gede ser textekî çû. Bême'nî pala xu da kendalekî. Gede şeveqê çavê xu vekir, dêna xu day ya Rebbî! Cîkî adake hema dar diçe lê dikeve, kerek tenikê gede ra xilas dibe. Gede derbasê adê dibe. Dêna xu day adake zefh mezin e. Ema kes tê da tine ye. Ne însan tê da he ye, xêncî heywanê yirticî¹³⁶ tiştekan tê da tine ye. Gede
- Go: Ya Rebbî!
- Go: Min, heqa xand, heqa îlm degiş kir
- Go: Çika em herin dêna xu bidinê ewa çika qeder çi qirarî akîne bû. Eva ça bû filan, paşê
- Go: Min xandîye. Xudê çi hiz bike yê isa bibe.
- Dibê: Gede nivro kete nav bax baxçe gerya. Sêv xarin, tirî xarin, meyve tiştê başqe xarin birçî bûna wî hate yêrê.
- Dibê: Îja gede zefh tî bû. Xarê behrê bû dêna xu dayê behr zehf şor e.
- Dibê: Bin darekî da rûniştî bû, dêna xu day aveke xaş bin behrê derket. Derdikeve diçe behrê. Dewsa avê jî hemasa kifş e. Ava wî jî spî çîl e. Avê dine jî şor e.
- Go: Ya Rebbî eva hikmeta te ye.
- Dibê: Gede binê darê da xarê avê bu, gede kulma xu aha tijî kir bixe, dêna xu day resmeke qîzekî kete kilma wî.
- Go: Gede aha jêrê nêhêrî dêna xu day qîzek nîne hûsnî cemalek e. Têpa darêda deh mêtêre bilindîyê da bû ye.
- Go: Mala min xirabe
- Go: Ka ezê wî qîzikê ça bînim? Ezê ça bînime jêrê? Ne qîzik dikare were jêrê, ne ez dikarim herime jorê. Dêna xu dayê qîzik pê kenîya. Qîzikê îşaret dayê

¹³⁶ Wehşî

- Go: Here xu cîkî da weşêre teyr hat, yê te pirtî pirtî ke. Gede çû koka darê da xu weşêrant.
- Go: De bisene, dêna xu day gundeke yek jî teyrekekî terikî bê wefa qasî hespekî waxtekî ma, dêna xu day hê teyr çûn. Çûn cake gede derket. Gede derket
- Go: Ez ça werime ce te. Destê xu jêra hejand
- Go: Here. De gede qederekî çû dêna xu day laşekî gakûvîkî¹³⁷ wê derê ye. Dêna xu day postê wî wir e. Goştê wî tamamê teyr xarîye, feqet postê wî hestî yê wî mane. Hizkirina Xudê isa bû ye. Dêna xu dayê wê derê ye. Qîzik jê ra îşaret kir.
- Go: Tu dikarî bikevî hindirê wî
- Go: Bira teyr were te hilde bîne jor ê. Gede
- Go: Kurê te miro!
- Go: Ka teyr dikare deh hevê mînanê te hilde. Deste xu jê ra aha kir
- Go: Deh hevî mînanê te jî dikarin bikevine hindir. Wira
- Go: Teyr dikare
- Go: Baş e.
- Go: Isa bike, bira te nebîne. Piştta xu bidê, bere xu nede. Dêna xu day teyr sibetirê dîsa hat. Qîzik girîya, teyr
- Go: Ti çima digirî? De qîzik bûye aşiqê gede, gede jî bû ye aşiqê qîzikê.
- Go: Male te xira nebe!
- Go: Ez tik tenêka li ser serê wî darê. Ez ne dikarim peyabim herime jêrê ne dikarim hevraz heme jorê. Ya!
- Dibê: Hema tiştekek hebûya min xu ra pê bileyîsta.
- Go: Çi dibêjî?
- Dibê: Postê gakûvîkêaha wê dere ye. Isa bike bira xira nebe, tiştekek lê nekeve.

¹³⁷ Xezal.

- Go: Têxe nav pencê xu da mi ra bîne dayne vira, ez jî xu ra pê şabim. De hizkirina Xudê qey hebû ye, qîzikê rîca kir. Teyr bi pencê xu ewa postê gakûvî yê, qoçê wî ve bi hestîyê wî ve hilda hanî hat, danî ser serê darê.

- Go: Temame.

- Go: Temam e.

- Go: De êdî de herin. Ew çû, gede derket hat. De gede ne zimanê qîzikê dizane ne jî qîzik zimanê gede dizane. Qîzik zimanê teyr dizane, gede jî zimanê însana dizane. Hev dane xeberdanê, çi kirin çi nekirin de Siltan Silêman Pêxember gotîye: Sala bîstî emê gede û qîzikê bînine cer min. Çika te qîzik daye mêr, nedaye mêr.

- Go: Gava sala bîstî wî tamam bû, tê bînî werî vê derê. Şert digirtin, qabûl dikin. Dêna xu danê bîst sal tamam bû. Gede gote qîzikê

- Go: Hespê te niha yê werin me beherin.

- Go: Tu ça pê dizanî.

- Go: Welle! Kitêb wextekî destê min hebû ye, min xandîye

- Go: Ewî kitêbê mi ra behs kirîye. Dibê bêje wî mervî da wexta te dibe bira te nexer nava baskê xu, bira te bide ser milê xu. Dibê baskên wî neheje, nikare bifire. Hemû behrê, du roj ser behrê ra derbas bin. ‘Erzbît¹³⁸ Siltan Silêman pêxember hatin cab dane teyr

- Go: Bîst tamam bû. Tê qîzikê hildî bînî werî. Ewî jî qebûl kir. Qîzik ku wextê hat, qîzikê

- Go: Welle! Ez nikarim bikevime dest pêyê te

- Go: Lê ez êdî hîmê li vendera bû me

- Go: Hema tê min têxî hindirê wî şikeftê de ezê bikevimê

- Go: Ezê xu temîz girêdim

- Go: Tê me me bayaxî isa bihêlî. De Rebbê ‘Elemê hizkirina isa pê bûye. Ew qîzik tev ketine hindir. ‘Erzbîta ewna hildan, hildan birin danîne pêşîya Siltan Silêman. Hildan hanîn hatin dêna xu day mexlûqat isa ber Siltan Silêman pêxember berav bûne. Ya Rebbî bitûnê dinya, ji teyra, ji heywanata, ji însîna... bitûn behra rabûne. Anî hatin li wira danîn.

¹³⁸ Efrît.

Wexta ku danîn gede berîya qîzikê derket, destê qîzikê girt. Teyr ku dêna xu day, teyr zefh mehçûp bû. Gazî kund kir, kund jî dêna xu day, tabî kund jî zefh mehçûp bû.

- Go: Êne te digo ezê ewî qîzikê beherim qedera wî aha bikim. Eva kurê padîşahê Mexrebê ye. Mi gote te qedera wana serê hev in. Rebbê ‘Elemê isa hiz kirîye. Îsal heft sal e, eva geda cerm qîzikê ye. Qissa Silêman pêxember isa bû ye.

- Go: Feqet gede xandîye, qîzik jî gotine nexandîye. Me’ra wana nehatîye birin.

- Go: Têkilî hev du nebû ne.

- Go: Heft sal e qîzik cerm bû ye.

- Go: Te ewa zara te ku hanîye?

- Go: Hev begem kirine.

- Go: Ya Siltan Silêman pêxember!

- Go: Min tobe kirîye.

- Go: Min nezanî kir.

- Go: Meselê Xudê zefh bûn.

- Go: Min jî xu ra sucekî zefh mezin kir, gunehêkî zefh mezin çê kir.

- Go: Îro şunda bira isa ehed be, ez tu wexta qarişê îşê Xudê nebim. Dibê: ew jî kur niha herdik jî girêdayêne pişte çîyayê Qafê da ne. Piştê çîyayê Qafê. Naha Rebbê ‘Elemê: Qeder yek, ‘ecel did, nesîp sisê. Eva hersêkana gayîbin. Wekêdinê hemû jî kifşin. Rebbê ‘Elemê rehmê te jî bike, me jî bike. (J16)

Çç-26

Qaçaxçîtî-1

Me vira pez dikirî. Wextê me pezê xu dikirî, me pezê xu dida Îranê. Em diçûn me esker didîtin. Serê pez me dida eskerîyê. Eskerîyê alîyê me pez derbas hidûdê Îranê dikirin, dizvirîn. Serê pêz me bertîl dida. Wextê me pezê xu dibire Îranê, min dibire Tehranê, Tehranê jî min difiro. Min Tehranê pez dida kuşterî¹³⁹.Îja min pez dida. Rojekî

¹³⁹ Cîyê pez tê da tê ser jê kirin. Mezbaxane.

min paşporta xu malê bîrkiribû nebiribû. Emê pez beherin bine şerjê kirin ber derî subayek jî Îranê ber derê kuşterê bû. Berderfîye. Gote min

- Go: Sen 'Ecem misin? Mi

- Go: Evet. Çi gote min, min

- Go evet. Min newêrîbû bigota na. Hema çi bigota min, min

- Digo: Erê. Çûnkî mi

- Go: yê bêje min hanî paşaportin? Yox. Mi

- Go: Yê min bigre bavîje hepse. Az bîşî Tirkî xeber dida, me hev sewrat dikir. Min wira isa xu da egle kirin, heta merivê me derketin. Kuro min

- Go meherin, ewê me bigrin. A Welle! Wira, em destên wan derketin. Em hatin şevêkî diduya em Tehranê man, razan otêlê. Êvarê otêlê berber dihat serê me kûr dikir. Me yek hezar dida. Yek milyon me dida wan sêrê me kûr dikirin.

Me êvar da des pê dikir, em diçûn. Wexta em diçûne derê hidût, esker jî digîhîşte me. Tivingê xu hemû didane me. Em carekî çûn. Hezar, hezar dused pez û dewar e. Me bir. Me

- Go: Emê Tepelîyê¹⁴⁰ ra herin. Ez bi rojî bûm. Rojî ya meha remezanê bû, me digirt. Em çûne wira hevaleyê min hebû

- Go: Meherin Kevlîreşê em şîvê bixun, paşê herin. De mi

- Go: Meherin. Me çû wira şîv xar. Em rabûn wira hatin. Me dêna xu day pêşîya mala me girtine nahêlin herin. Kuro: Kê ye?

- Go: Welle! Xelqê Hecî Xatûnê ye. Navê wî jî Hiso ye.

- Go: Welle! Hûn toprax bastî nedin, em vira derbas nakin. Kuro mi

- Go: Ez toprax bastî bidime we! Kuro eva Qûr-an be ez nadim. Ya ez tême kuştin, yan jî ezê çar gula berdim bira pez were girtin. Ezê bêjîm Welle! Pezê min wana da girtin. Ezê pezê xu jî we bistînim. Welhasil Mihemedê Teyfo xu zefh havîte min. Mi

¹⁴⁰ Navê gundekî Çaldiranê ye.

- Go: Miheme min Qûr-anê sond xarîye. Ez serê pezê xu jî nadim. Pênsid pez yê min bû. Nizam çiqas pez û dewar jî yê wan bû. Welle! Wana çi da nizam. Lê min neda. Min neda, îja pezê xu derbas kir. Min hilda ez çûme Îranê. Min pezê xu firot. Me lêxist em hatin. Em hatin rojekî em çarşiyê tèn, min dêna xu day, piştê gîdîşa min. Ez im, Ce'ferê rihmetlî ye. Me dêna xu day du makîne pez girtin. Girtin, hema ça peya bûn gahîz min kirin: Hecî! Hecî!

- Go: Bide xatirê Xudê Qûr-an'ê tê werî. Ez çûm min dêna xu day Celoy Gerwêkê 'Elebelekî.

- Go: Me pez Wanê kirîye, hanîye.

- Go: Tîcarê qartê me tine.

- Go: Pêşî girtin birin. Du hev keleşê me jî hundirê şofor mehelîyê dane. Ez Ce'fer em çûn. Me

- Go: Pez yê me ne. Ça yê we ye? Me

- Go: Aha qaxizê me. Pez yê me ye, me kirîye hanîye em xayîkin Bayîzaxa da. Me pez histan. Ewna dûşûnmîş dibin. Mi

- Go: Hiso!

- Go: Ha! Minê naha pezê te bida girtin. Tu dihatî pêşîya min. Naha îro tu qurbana Celo bî. Me pezê wana bijart. Min çar roja jî li mala xu xayîkir. Heftê heştê beran bû. Me çed roja xayîkir. Paşê me pezê wana girt dane wan, birine mala xu. (J81)

Çç-27

Qaçaxçîtî-2

Mesela sibê, pezê te hebûya. Yê li Îranê digihîştine hev dihatine hev dihatine Bayîzaxa. Pezê mala Hecî Esed, pezê mala Hecî Mihemed distandin.

Qaçaxçî li Îranê digihîştine hev dihatin li vira, ji deh heva jî destekî dikirin.

-Digo: Werin emê herin pezê wan bidizin beherin. Dihatin çarsid pênsid pez, hezar pez qaçaxçîya lêdixist dibirin diçû, bisîlaha tu peyketîya, xuyê pêz dikûştin. Îja mervê ku sîlahên wan hebûna pey diketin. Êdî pey pêz nediketin diçûn diketine pêşîya pêz. Mesela

vira ku dere? Pezê Bayîzaxa biçûya pişt ûstê Bişaraxa dikete pêşîyê. Ku pez dihata wê derê wira bêmenî ew xuyê pez diçû pêşîya qaçaxa. Gahîz dikirê

- Digo: Pezê me bihêlin herin. Ku bihîştina biçûna hemî şer çênedibû. Ku nehîştina şer çêdibû. Meriv dihatine kuştin.

Kalkê min hate kuştin Qeymezê¹⁴¹, Tepelî Xopa da. Behsa Qeymez dike, klameke wî heye.

Qeymezê Xopan devê sêz e

Gulekî Nadir Begî ketîye sê kiramê pêz e.

Şikênandine qad û qudimê Mehmet Beg ê.

Ewa Qeymez çê bûye. Şer Qeymez çê bûye. Pîrîkeke min li wira hatîye kuştin. Navê wî Fatima ye.

Berê “Dîlo” dikirin. Klam davîtine li ser mirîyan. Lê ka ye çî bigotina li hev bihata?
(J16)

Çç-28

Qaçaxçîfî-3

Em sibe zû hetanê êvarê Îranê bûn. Me diçû çay dihanî, cixare dihanî, gore dihanî...

Zemanekî zefh xaş bû. Em xu ra des pê eskera diçûn. Eskerê me hidûd da pere me distandin, paşê me derbas dikirin. Pez, dewar zemanekî dikişîya Îranê. Pêşîya devrîme îja Îranê ji dihat. Piştê devrîmê esker nadiren îzîn dida me. Berê em nav hevdabûn. Berê dihatine gund em sîyar berav dibûn. Em digîhîştine hev, me berê serê wana diday, tev jî diçûne hidûd. Em diqulibîn diçûn, ewna jî diçûne tabûrê. Walî jî ew hebûn. Wî çaxî eskerê Îranê hebû. Li hidûd tinebû. Li Îranê, Tirkîyeyê lê dinêhêrî. Mîna naha nîne. Naha meriva dikuje. Ev, hema xet heye rakirine. Yanê direktora rakirine ku meriv sera derbas dibe. Xulîyê dewsa pê meriva tê xûya. Hema meriv derbasê walî dibû, êdî te xu ra klam bigota, tiştê nedibû. Zehmet li vira bû. Vira esker nebûya yanî esker ku derbas nekira, teymena, subaya ku derbas nekira, meriv qaçaxî jî em diçûn. Hema hene cara em rastê hev dihatin.

¹⁴¹ Navê gundekî Çaldiranê ye.

Me li hev dida yaxut de wana gule mile ser mera dikirin. Me jî penî dida hespa em direvîn me wan nedixiste xuyî...

Em bi hespa, peya... Walî jî zaten Celalî¹⁴² ne. Em diçûne nav hev. Li vira ortaxê me hebûn. Tiştê me li vira dibir wana li wira difiro. Tiştê me wana ra me tembe dikir, wana me ra dihanî, me vira difiro. Ka me çî nedihanî... Heta me bizmarê ne'lê hespa jî min hanîye. Tirpan, şene... Ez çizanim... aqlina ne gelirse. Pez, dewar, heywan, eva makîna kinca... Zefh alwêreke xaş tê da hebû. Îdara wî memleketî giran bû. (Nay bîra te) Zemanê ewê da, zemanê Cumhuriyet Halk Partîsîyê da isa quyrûx bû; şekir quyrûx, çay quyrûx, nizam çik quyrûx, quyrix oxlî quyrix bû. Tiştê tinebû ya me bixu qe mineta me nebû. Çinkî me qe tiştê Tirkîyeyê nedixar. Qe me çaya Tirkîyeyê me qe nas nedikir, renga wî çakîneye, me nas nedikir. Hemû ji Îranê dihat. Qazyax, de elektrîk tinebû. Me dihanî lokiz vê dixist. Îşte evna akîne bûn. Wî çaxî zefh xaş bûn. Akîne zefh xaş çû. De îja êdî siqîye. Îran zefh siqî digire. Eskerê me tabî êdî ketîye kula. Em bêjin qereqola şev dertên dernayên ez nizanim, axir me vê axirê dewar dihanî rûyê alîyê Tirkîyeyê tişte tinebû. Îran digre digre, qet moletê nade meriva dikûje. Hema gulê berdide dikûje, qe nahêle. Kes jî tişteki li wan napirse. Kes jî naçe nay. Niha esker wê tepeyi gahîz kê, bê: Werinê Îranê jî kes naçe. Hem tê da îş tine, hem jî eskerê Îranê zefh pîse. (J79)

Çç-29

Çîroka Klama Hecî Îsmailê Qûbê

Êrê dinyayê, dinyayê, dinyayê, dinyayê

Ezê li diwarê cîhê qalê, li girtim gavan li gawurê kêşê, ser kêşê.

Di sîyera 'Egîdê sîyar bûye, kurê wî sîyar bûye Mîreva zaîlê kulê ket e, ser pêşê.

Evana klamana yên mala Hecî Îsmailê Qûbê ye. Yê mala Hecî Zahirê Mihêyê Çayirê¹⁴³. Îja 'Ewdal mêrke, 'Ebdî xelqê Îranê ye. Pezê ewê dibirin. Cerb digotin jê ra. Berê

- Dibê: Welle! Îro cerbê Îranê havêtine ser serê pezê mala Hecî Mihemedê Teyo. Pezê wan tamamî top kirin birin. Cerb yanî diz, qaçaxçî. Sî sîyar, pêncî sîyar, meriv digîhiştine

¹⁴² Navê 'eşîreke Kurdan e.

¹⁴³ Navê 'eşîreke Kurda ne.

hev, pezê te zozana bû. Davîtime ser, ya Allah! Îja Hecî Îsmailê Qûbê, mala Hecî Zahirê Mihê neyar û dişminê hev bûn. Cabê dine Hecî Îsmail

- Dibê: Pezê Hecî Zahir birin. Bavê Hecî Zahir, Kalkê Hecî ewa

- Dibê: Kuro! Ez Hecî Zahir dijminê hev in.

- Dibê: Îja Hecî, Hecî Zahir mala xu nîne. Ez jî rûnê, pezê wî bidî çavê min beherin. Em gundekî da ce hev bûne. Wî çaxî radibe bire sîyar dide pêşîya xu, bi eqrebê xu va parava pey pêz dikevin. Hecî Îsmailê Qûbê pêz dizvirîne. (J79)

Em di davîya berhev kirina çîrokan de dibînîn ku bîst û neh çîrokên navçeya Çaldiranê ketîye destê me da. Ev çîrokan bi giştî bêformelê destpêkirinê destpê dike. Bi tene di çîroka (ÇÇ29) de bi formela destpêkirinê destpê dike.

Bi giştî çîrokên di navçeya Çaldiranê de dikeve di kategorîya çîrokên aslî û rastî de. (ÇÇ1, ÇÇ2, ÇÇ3, ÇÇ4, ÇÇ5, ÇÇ6, ÇÇ7, ÇÇ8, ÇÇ9, ÇÇ10, ÇÇ11, ÇÇ12, ÇÇ13, ÇÇ14, ÇÇ16, ÇÇ17, ÇÇ19, ÇÇ20, ÇÇ21, ÇÇ22, ÇÇ23, ÇÇ24, ÇÇ25, ÇÇ26, ÇÇ27, ÇÇ28, ÇÇ29). Di çîrokên (ÇÇ3, ÇÇ4, ÇÇ9) de davîyên de bextewarî û şadbûn heye. Lê çîroka (ÇÇ11) an de di dawîyê de bêbextî heye.

2.1.7. Mamik/Tiştanok (Bîlmece)

Bi gelemperî helbestî, yanî menzum in. Mamik di pêşveçûna melekeyên zîhnî de bi kêr tîn in. Wekî din ji ber ku di tarza lîstîkan de tê îcra kirin û dibe sedema kêf û şahîyê.¹⁴⁴

Mamikên Navçeya Çaldiranê:

MÇ-1

Digotin digo: Koprîya xezalê, totê newalê?

Caba wî: Hîv e. Derdikeve paşê dîsa diçe ava. (J9)

MÇ-2

‘Elok gilîda, kumik serî da?

Ewa xaşxaşke. Yanî qalikê xu ser xu radike. (J9)

¹⁴⁴ Kaya, **h.b.**, s. 160

MÇ-3

De'nîya qurtisî, ser bana reqisî?

Eva jî teyroke. Wexta dikeve bilind dibe. (J9)

MÇ-4

Digo: Odeke şuştî muştî, bire feqî tê da rûniştî?

Eva jî dev diranê însîn e. Diran şuştî ye û hindirê dev dane. (J9)

MÇ-5

Kesk sor mala wan, mişk me'r mala we.

Bersiv: Desmala bûkê (J43)

MÇ-6

Avê dixim naşkê, kêrê dixim dişkê.

Bersiv: Hêk. (J64)

MÇ-7

Xilindir, milindir kurê bavê bilindtir.

Bersiv: Dûman. (J64)

MÇ-8

Ez çûme Çaldiranê, mi dêna xu daytanga Korgêşê¹⁴⁵ jinek rastê min hat. Dibê: Ev geda çîyê te ye? Dibê: Metê! Eva kurê min e. Yalnız birê mêrê min e. Eva ça dibe? Kurê kurê wî yê jî birê mêrê wî ye jî eva ça dibe?

Bersiv: Naha du bira hebûneyan jî du kurê apê hev hebûne. Bavê her da dimire. Her dik jî ne zewîcî bû ne. Ewna dibên: Kuro zanî, tu werê emê ça bikin? Tu hema cîya xu bide min, ez jî cîya xu bime te. Ew cîya xu dide wî ew jî cîya xu dide wî. Cîya yekî mêr dike kurekî dîne. Ewa dinê kur nehanîye. Ewa kur nehanîye, ewê kurî dide mile xu dibê: Çîyê wî yî? Dibê: Kurê kurê wî dibe çî yê wî? Dibe: Birê wî. (J57)

Me ji navçeya Çaldiranê heşt hev mamik berhev kir. Ev mamik li ser xwezayî (MÇ1, MÇ2, MÇ3, MÇ7) diran (MÇ4) û li ser xarinê ne (MÇ6).

¹⁴⁵ Bazîdaxa, Ebexe, Çaldiran.

2.1.8. Zûgotinok / Çîvanok (Tekerleme)

Zûgotinok/çîvanok ji gotinên klîşe pêk tên û di vê cureyê de hest û fikir bi riya mubalexe, dijîti û 'ecêbîyê tê parvekirin her wiha ji wezn, qaffîye û aliterasyonan tê îstîfade kirin.¹⁴⁶

Divê girîngîya zûgotinokan a di mijara perwerdeya zimanê zikmakî de neyê îhmalkirin. Wekî din zûgotinok di neqilkirina nirxên civakî de jî roleke muhim dilîze. Zûgotinok her çi qas bi serê xwe cureyeke serbixwe ye jî carînan di naveroka çîrok û mamikan de jî cîh digire.¹⁴⁷

Zûgotinok / Çîvanokên me ji navçeya Çaldîranê tespît kirine:

ZÇ-1

Xaz xaz

Pez li gaz

Keça naz

Sîr û naz

Wekî maz

Bela gaz

Xaz xaz

Berî û caz

Şar û şaz

Hat bi haz

Xaz xaz (J6)

ZÇ-2

Bêrî berî, berya mîya

Şîr bide van zerîya

Zêrî badan wan gulîya

Şîr berda bin qutîya

Qutî teqya, doxîn bizdîya

Zêrî şermkir zû revîya

Zarok pê kenîya (J49)

ZÇ-3

¹⁴⁶ Kaya, **h.b.**, s. 707

¹⁴⁷ Elçin, **h.b.**, s. 589

Kalê kalê hiz hizî
Ber tendûrê qelizî
Kutek xar nanek dizî. (J126)

Me piştê lêkolîna xwe sê zûgotinok bidest xist. Lê ez bawer dikim ku li navçeya Çaldiranê ev qas hindik zûgotinok tune ne. Mixabin me ev qas zûgotinik bi dest xist. Înşallah di rojên pêşîya me de an em an jî lêkolînerên li ser Çaldiranê dixebitin zûgotinokên nehatibin berhev kirin derxine holê.

Di zûgotinokên Çaldiranê de xuya dibe ku bi saya qafiyeyan zûgotinok hatine çêkirin. Di naverokê de jî behsa heywanên permalî kedîkirî dikin. Di zûgotinoka sêyemîn de jî tê dîtin ku em bi saya van berheman di derheqê agahîyên jîyana gelê Çaldiranîyan de jî xeberdar dibin.

2.1.9. Metelok

Metelok di Ferhenga Enstîtuya Kurdî ya Zana Farqînî de wekî; mesel, çîroka folklorik a kurt, gotina pêşîyan a kurt, qisse, anekdot, pêkenok, wecîze, kelema kubar hatîye terîf kirin.¹⁴⁸

Îzolî jî di ferhenga xwe de peyva metelokê wekî: Gotinên pêşîyan û wecîze terîf kirîye ku vê ferhengê peyva metel jî; yek wekî “mamik” wateya duwem wekî “heyret”, “heyirî man” bi kar anîye.¹⁴⁹

Di xebata xwe Zargotina Kurda de Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl di qismê mesele û metelokan de nimûneyên xwe ji biwêj, gotinên pêşîyan û hin gotinên li hevhatî yên wî terî didin ku jê tê fêmkirin bê ew mesele û metelokan çawa dinavînin.¹⁵⁰

Metelokên me ji navçeya Çaldiranê tespît kirine:

MTÇ-1

Lo lo lo, can dev deling tijî paxîşo,

Nêçîrvanê kew kujo.

Lo lo lo, lol kiro,

Ceh genim tev kiro,

Pê dewata xu kiro. (J49)

¹⁴⁸ Ferhenga Kurdî-Tirkî, amd: Zana Farqînî, weş: Enstîtuya Kurdî, r. 1202, 2004, Stenbol.

¹⁴⁹ Ferheng, Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî, amd: D. Îzolî, weş: Deng, r. 393, çapa 5., 2007, Amed.

¹⁵⁰ Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, Zargotina Kurda, weş: Aram, c. II, r. 332-352, 2013, Amed.

MTÇ-2

Wêda tê dikuxe,
Serê gîzma wê kixê,
Nenka wî çevê wî buxe. (J49)

MTÇ-3

Ez dew dêkim dew nabe,
Jera me'rê kor nabe,
Axta Ahmed xew rabe,
Taştêya wî jî kar nabe,
Temborê¹⁵¹sêrî rabe,
Delîla halê min çabe. (J49)

MTÇ-4

Gelo Xudê Ahmed, çima nehat, çima nehat,
Bi teji bû bi tûle bû, yar file bû,loma nehat. (J49)

MTÇ-5

Digo: Kuro kuro xew rabûye,
Çuncik tenbur lê babîye,
Kerba çûye ker gaye. (J7)

MTÇ-6

Lîyane lîyane, kes nizane Şêhê ku dane,
Şêhê çûye mala Ehmed dane.
Şêhê çû ji derda, Ehmed rabû berda,
Şêhê Tirkî xeberda,
Ehmed Tirkî nizanibu, simbêla xu ya sor bada. (J45)

¹⁵¹ Tûncik.

MTÇ-7

Xudê ji te razî

Wekî te me kire gazî

Xudê kurekekî bide te

Navê wî bike Razî. (J65)

MTÇ-8

Ne xema min e,

Ne dema min e,

Qirçe qirça benîştê min e,

Gahê sor qelendê min e. (J20)

MTÇ-9

Zemanekî were xew nabîne piçûka,

Perçe nabîne sûka,

Xeber namîne piçûka. (J85)

MTÇ-10

Serê salê binê salê,

pîr qurbana qoqê kalê. (J85)

MTÇ-11

Ez çi bêjim çi nebêjim,

ez derdê dila hem kerr im hem ez gêjim. (J43)

MTÇ-12

Çemê gundê me çemîne,

We binîda cot gemîne. (J43)

MTÇ-13

Hurik murik bi rê da

Nava gulê gîhê da

Paşka qîza xelqê da

Qîza xelqê kulm pehn lê da

Go: Kurê xelqê wê da. (J35)

MTÇ-14

Kuro tu kurî, singê keçka zozanî,

Min jî vî kurî ra kirî. (J35)

MTÇ-15

Singê keçka zozanê, min jî vî kurî ra kirî.

Tiştêkî ne tiştanî, nava mirîya da siltanî. (J35)

MTÇ-16

Kuro lolo lolo loliko, kero loliko, deling paqijo.

Ketîye çokê bêmêjo, nêçîrvano kevkujo. (J35)

MTÇ-17

Kuro kuro xew rabûye,

Çûnçik tenbûr lê babîye,

Kerba çûye ker gaye,

Şîr şekir qayîl nebûye. (J95)

MTÇ-18

Hurik murik di rê da,

Nava gula gîhê da,

Paşka qîza xalê da.

Qîza xalê penek lê da,

Go: Kure kere lê wê da. (J6)

MTÇ-19

Munê Munê porteqala Waşîntonê,
Li vî Muradê leme leme,
Hebîbe! Murat dibê: Ez boxe me,
Qîz hûn ku da herin ez pey we me. (J6)

MTÇ-20

Gilo milo di rê da,
Paşka qîza xelqê da.
Qîza xelqê pehnek lê da,
Go: Kurê kerê lê wê da. (J6)

MTÇ-21

Qîz titûna bewrera,
Buka sibê êvara.
Xelqê jinê xu berdan,
Qîz titûna me pîr bû.
Maye hevîya kurê xelqê da.
(Li ser me ma) (J6)

MTÇ-22

Ha ki na mi kir namînî,
Kara min berxa binî.
Ha ki na mi kir namînî,
Kara min î, berxa minî,
Kena min tewnek danî,
Nexşê ortê gul danî. (J85)

MTÇ-23

Kuro kuro kuriko,

gîzme alo xiriko. (J35)

MTÇ-24

Zirta zêranê,

cîya kuranê. (J35)

MTÇ-25

Tozo¹⁵²bê qedro,

bê qiraro,

bê sozo. (J7)

MTÇ-26

Bi malo, bi xatî, bi xalo

Bê îmano; bê xatî, bê xalo. (J126)

MTÇ-27

Kil kil meşkê,

kelî lo lempê vêxe vîşkê. (J84)

MTÇ-28

Tifînga deste Xalê Miheme sê tîr e, lê dixe Nadir dikûje.

Bûye Ferhat Paşa ketîye kirê Tendûrekê¹⁵³,

Îşev êvarda eskerê Tirkîyeyê pey ketîye nagire. (J66)

Li devera Çaldiranê me bîst û heşt metelok berhev kir. Ev metelok bi piranî ji alîyê dayîkan ve tê karanîn. Exleb wextê ku zarokan radizînin wê gavê dixwînin.

Em gava ku li naveroka metelokan dinêrin dibînin ku behsa zarên kurîn (MTÇ1, MTÇ2, MTÇ3, MTÇ4, MTÇ5, MTÇ6, MTÇ7, MTÇ19) qelend (MTÇ8) evin (MTÇ11, MTÇ14, MTÇ15) û behsa qîza xelqê (MTÇ13, MTÇ18, MTÇ20, MTÇ21) dikin.

Em gava ji alîyê şiklî ve li metelokan dinêhêrin, dibînin ku metelokên Çaldiranê ji du rêz (MTÇ4, MTÇ10, MTÇ11, MTÇ12, MTÇ14, MTÇ15, MTÇ16, MTÇ23, MTÇ24,

¹⁵²Di Çaldiranê de navê mirovekî ye.

¹⁵³ Navê çiyayekî Çaldiranê ye.

MTÇ25, MTÇ26, MTÇ27) sê rêz (MTÇ2, MTÇ5, MTÇ9, MTÇ28) çar rêz (MTÇ7, MTÇ8, MTÇ17, MTÇ19, MTÇ20) pênc rêz (MTÇ1, MTÇ6, MTÇ13, MTÇ18, MTÇ21) û şeş rêzikan (MTÇ3, MTÇ22) pêk tê.

Ji alîyê qafiyê ve jî mirov dinêhêre dibine ku di nav metelokên Çaldiranê de nîv (MTÇ1, MTÇ14, MTÇ15) tam (MTÇ5, MTÇ16, MTÇ17, MTÇ21, MTÇ25) û zengîn qafiye (MTÇ1, MTÇ2, MTÇ3, MTÇ4, MTÇ6, MTÇ7, MTÇ8, MTÇ9, MTÇ10, MTÇ11, MTÇ12, MTÇ13, MTÇ18, MTÇ19, MTÇ20, MTÇ22, MTÇ23, MTÇ24, MTÇ26, MTÇ27) hatîye bikaranîn.

2.1.10. Heyranok

Heyranok, kurtehelbestên lîrik in. Li ser eşqê, evînê, pesna yaran, delalî û sipehîtiya yaran, keç û kurên Kurdan ji bo hevdu çêkirine. Jê re payîzok û panok jî tê gotin.¹⁵⁴

Ev helbest, bi awayek stranan li ser evîndarîya du kesan radiwestin û di heman demê de di navbera du kesan de tê gotin. Yek dibêje, ya din jî bersiv dide. Bi taybetî yek xort e û yek jî keç e.¹⁵⁵

Heyranok ji alîyê jin û mêran ve li hember hev têne gotin. Di dema lîstikên govendê de alîyek dibêje û yê din lê vedigerîne. Kelecan cîhekî girîng digire. Hestên evînê, bextewarîyê xurt in. Teşbîh û pesin zede ne. Muzîka wan herikbar e. Gotina wan hêsan e. Cureyekî dûrîkan e. Erotîzm bi awayekî siruştî di nava kilamê de cih digire. Dema ku li dîwanan têne xwendin, mijarên lehengîyê jî dihewîne. Her çarîn bi heman risteyê diqede. Rîtm û awaz heta dawîyê wekî hev didome. Her çarîn tê dubarekirin.¹⁵⁶

Heyranok, ji hêla keç û xortên Kurdan, berî zewacê têne gotin. Heyranok bi gilî û gazindên evînê barkirî ne. Keçik, bi zimanekî bilind, lê sivik ji bo zû bêne jiberkirin, distirînin. Heyranok, piştî zewacê jî nayêne jibîrkirin. Jin, bi reng û formên nû derbasî nîfşên nû dikin û di nav gel de belav dibin.¹⁵⁷

Heyranokên me ji navçeya Çaldiranê tespît kirine:

HÇ-1

Digotin: Xezûrê te yê bêje: Kuro

¹⁵⁴ M. Xalid, Sadînî, **Heyranokên Kurmancî**, İstanbul: Weş. Nûbihar, 2011, r.9

¹⁵⁵ Nezîr Silo, **Wêjeya Devkî**, Kovara Zend, Stenbol: Zivistan, 2006, Hej: 3, r.68

¹⁵⁶ Tekin Çiftçi, **Kulam û Jin**, İstanbul: Weş. Nûbihar, 2014, r.42

¹⁵⁷ Mîthat Kutlar, **Aşkla Örülmüş Dörtlükler, Heyranok**, Kovara Qijika Reş, Ankara: 2010, j. 2, r.33

“Diz hatine dor mala kin,
Jinikê bêje: Kuro diz mala kin.
Kevanîyê bêje: Pitê na, diz nîne,
Yê bêje: Dizê zermemika ne.”
Lorî lorî, lorî lorî can qurban. (J43)

HÇ-2

Dibê: Oda bavê te du qat e.
Ne Mishef e, ne Tewrat e.
Xudê kurê reîsê devletê bikuje,
Ça nahêle ez qasekî werime ba te. (J43)

HÇ-3

Dibê: Gelî kur e, we darket e.
Dibê: Were xewka min waxt min raketim.
Wezê çîqa bidim hewalê ketim. (J43)

HÇ-4

Dibê: Mêrga mala bavê te mezin e,
Xu ra girkê ser o bin e.
Dibê: Welle! Dibê: Serê hona dîsa gede lokê min e. (J43)

HÇ-5

Dibê: Oda mala bavê te du qat e.
Kuro gede ne sebre ne tebate.
Welle! Xudê zane xasî yê xu daye ber tendûrê,
Kûçika ça nahêlin ezê qasekî werime bal te. (J43)

HÇ-6

Dibê: Qemer bi çîla çêtir e,

Guhê wan qemera xurê gir e.

Qiçê dibêje cîya xu dibê:

Min qîzikek dîtîye qemer e.

Dibê: Welle! Dayê “Qemer bi çîla çêtir e,

Guharê guhê wê qemerê xurê gir e. (J43)

HÇ-7

Desmala serê min qîçik e,

Dibê: Welle! Zêrê sitîyê min da çar liçik e.

Welle! Necîbe min kurê te meclîsa da min sual kirîye.

Dibê: Welle! Yekî suret sor e, çar gurçik e. (J43)

HÇ-8

Dibê: Pezê bavê te, yê pir e.

Nivî kel e, nivî kur e.

Welle! Melîk tu kes tine,

Here êdî qêranê pezê mala bavê te bibire. (J43)

HÇ-9

Dibê: Welle! Qeç hatî, xirab hatî, zora pera xurê gir e.

Mêrkê qebûl nekirîye, yê dinê hatîye havêtîye zora pera xu ra biriye. (J18)

HÇ-10

‘Erebo! Dengî dengî te, şapşetî qehwe rengî.

Welle! Wext qurbanê evî bejine evî dengî. (J43)

HÇ-11

Dibê: Neçe Wanê, Wan dudu ne,

Serê rê qavanê¹⁵⁸

¹⁵⁸ Pêlê behrê.

Dibê, mêr kuştine.

Dibê: Serda çîmek hema dilê min serda kil qilçikî çavê min e. (J43)

HÇ-12

Cînar, cînar, cînar lê cînarê.

Xazila malê me cînara mala we bûya,

Derê me bixilqatî gerdana te bûya.

Orta mala me da cam şîşe bi pencere bûya.

Bira ewa kirasa jî bedena min tinebûya.

Ewana jî eşq klamê bûme. (J79)

HÇ-13

Hîv derketye hîva zer e,

Min ê mêzera xu havêtîye ber e,

Hîv çû ava, tu ji were min behere. (J6)

HÇ-14

Hîv derketîye, hîva geş e. Dibê: Leylo Mejno tev bimeşe.

Sîyarê boz e, boz qemer e, Ihsan bajo were ber çenqê bêderê.

Tilîya min ê belkî here çavê we yê qederê. (J43)

HÇ-15

Şilî barî qe venekir,

Axalera karê xu kir,

Kuro lawo ez ya te bûm, Xudê nekir. (J49)

Heyranokên di devera Çaldiranê de me berhev kirine panzdeh heb in. Di nav van heyranokan de mijarên curbicur hene. Ev mijar bi rastî di nav jîyanê de jî derdikeve pêşîya me. Di nav jîyana rojane ya Çaldiranîyan de çî hebe heman tişt di heyranokan de jî tê dîtîn. Mesela evîn mijareke gelek giring e. Vê mijarê gelê Çaldîranîyan bikar anîye û meseleyên din jî bi kar anîne. Gelê Çaldîranîyan di nav heyranokên xwe de wek Kurdên

dinê behsa memikan kirine (HÇ1). Negîhîştana evîndaran (HÇ2, HÇ2, HÇ3, HÇ4, HÇ5) rindbûna keçka qemer (HÇ6) pesin dayîna zarên kurîn (HÇ7, HÇ8) û evîndarîyan keçka cînarane (HÇ9) jî xuya dibe.

Heyranokan mirov xêncî mijaran, bi alîyê teşê jî mêze bike dibine ku (HÇ1, HÇ6, HÇ12) bi şeş rêzika, (HÇ2, HÇ5, HÇ7, HÇ8, HÇ11) bi çar rêzika, (HÇ3, HÇ4) bi sê rêzika, (HÇ9, HÇ10) jî beyîtekî ava bûne.

ENCAM

Me di vê xebata xwe de armanc kir ku berhemên devkî yê nêvçeya Çaldiranê ku heta niha ji alîyê vekolîneran ve nehatine qeyd kirin, bi metodeke akademîk qeyd bikin û li lîteratura Edebîyata Gelêrî ya Kurdî zêde bikin. Ev berhemên devkî ku di nav pêvajoya jîyana modern de her diçe tune dibe, bi vê xebatê ve hindik jî be ji ber tunebûnê xelas bûn ku ev encam ji bo me dilşadîyeke mezin e. Di dawîya vê vekolînê de ji bo vekolîner û xwendevanan ferhengokek jî hatîye amade kirin. Her wiha em dikarin maddeyên jêrê wekî encama vê vekolînê pêşkêş bikin:

1. Navçe ji hêla taybetîyên tarîxî û erdnîgarî ve hatîye danasîn. Aborî, nifûs û hwd.
2. Di merheleya hîlbijartina kesên çavkanî an hosteyan de heta ku ji me hat, me kesên hoste, pişpor tercîh kir.
3. Di vê xebatê de riyeke wiha hatîye meşandin: Bo nimûne ewil di derbarê mamik, lorik, qewlêrk, çîrok û cureyên din de agahîyên teorik hatine dayîn, pişt re ew melzemeyên ku hatine berhevkirin di xebatê de cihê xwe girtine.
4. Di netîceya vê xebatê de melzemeyên ku hatine bi dest xistin bi vî awayî ne:

485:	Gotinên Pêşîyan
36:	Biwêj
42:	Leqep
11:	Di'a
381:	Nifir
29:	Çîrokên Gelêrî
8:	Mamik
3:	Zûgotinok
28:	Metelok
15:	Heyranok

Ev melzemeyên me li jorê rêz kirine bi tevahî 1038 heb in.

5. Em di nav berhemên çandî yên vê navçeyê de rastî hêmanên mustehcen hatin. Mirov dikare bibêje yek jî taybetîyeke wan berheman jî mustehcenî ye. Lê em wan hêmanên mustehcen zêdetir ji çavkanîyên devkî yên mêr dibîhîzin. Sedemên vê yekê jî qaîdeyên kevneşopîyê ye. Ger ku çavkanîya devkî jin be û di merheleya îcrakirina berhemeke devkî de hêmaneke mustehcen hebe behsa vê hêmana mustehcen naye kirin, yanî li vir otosansûrek heye. Lê mêr di heman rewşê de wek jinan tevnagerin û bi rehetî berhemê îcra dikin.

6. Yek ji wan berhemên devkî yên ku ji alîyê me ve hatîye berhevkerin jî çîrok e. Em di wan çîrokan de zêde rastî formelên destpêkê nehatin. Mirov dikare bibêje sedemên vê yekê ev in. An çavkanîya devkî zêde hoste, pispor nîne an jî ew formelên destpêkê ji alîyê îcraker ve hatîye jibîrkirin.

7. Wek tê zanîn navçeya Çaldiranê di sinorê Îranê de ye. Bazirganîya neqanûnî (qaçaxçitî) di aborîya navçeyê de ciheke mezin digere. Em di nav berhemên devkî yên navçeyê de, bi taybetî ji çîrokan derheqê çavkanîyên aborîya navçeyê de rastî agahîyan tên.

8. Gava ku me metin xwandin me dît ku, di devoka Çaldiranê de daçek û paşdaçek pir kêmtên bikaranîn û her wiha paşdaçek bê pêşdaçek tên bikaranîn.

Paşdaçekên “re”, “ve” û “de” jî wekî “ra”, “va” û “da” tên bikaranîn.

9. Tesîra zimanê Tirkî li ser devoka Çaldiranîyan gelek zêde ye. Wek mînak, navê çîrokeka me ya panzdeyan de “Ne oxîyan war ne dinleyen war!” biraste rast ji peyvên Tirkî pêk hatîye. Ev jî nîşanê me dide ku cînartîya miletan li ser ziman jî xuya dibe.

10. Li ser xebatên qada Çaldiranê em têgihîştin ku cînartîya miletan bi tenê li ser zimanê tesir nake. Bi heman awayî di nav berheman de jî me dît ku ji alîyê lîstîkavan ve jî tesîr heye. Wek mînak: Kosegelî.

11. Me di vê xebatê de hewl da ku em dewlemendîya çandî ya navçeya Çaldiranê bidin nasîn, nimûneyên edebîyata devkî yên vê navçeyê bi riya berhevkirineke rêkûpekk bigihînin xwendevan û lêkolîneran. Em hêvî dikin ku ew materyalên ku hatine berhevkerin ji lêkolîneran re bibe çavkanîyeke ewleh.

ÇAKANÎYÊN DEVKÎ

- Adak, Abdurrahman, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, İstanbul: Weşenxaneyaya Nûbihar, 2013.
- Adıyaman, Atilla, Esnaf, “Gotînên Peşîyan” Çaldiran, 3 Tebax 2015.
- Adıyaman, Yılmaz, Esnaf, “Heyranok” Çaldiran, 12 Tebax 2015.
- Aladağ, Ayhan, Memûr, “Gotînên Peşîyan” Çaldiran, 2 Tîrmeh 2015.
- Aladağ, Cevahir, Kevanî, “Di’ a” Çaldiran, 26 Tebax 2015.
- Aladağ, Filiz, Kebanî, “Zûgotinok/Çîvanok” Çaldiran, 16 Tîrmeh 2015.
- Aladağ, Gülcemal, Kebanî, “Metelok” Çaldiran, 23 Tîrmeh 2015.
- Aladağ, İhsan, Cotkar, “Nifir” Çaldiran, 22 Tîrmeh 2015.
- Aladağ, İzzettin, Cotkar, “Metelok” Çaldiran, 11 Tebax 2015.
- Aladağ, M. Salih, Esnaf, “Çîrokên Gelêrî” Çaldiran, 19 Tîrmeh 2015.
- Aladağ, Muhyittin, Memûr, “Di’ a” Çaldiran, 18 Tîrmeh 2015.
- Aladağ, Mustafa, Cotkar, “Tiştanok” Çaldiran, 10 Tîrmeh 2015.
- Aladağ, Orhan, Memûr, “Metelok” Çaldiran, 9 Tîrmeh 2015.
- Aladağ, Perihan, Kebanî, “Navûnûçik” Çaldiran, 25 Îlon 2015.
- Aladağ, Sıddık, Cotkar, “Navûnûçik” Çaldiran, 19 Tîrmeh 2015.
- Aladağ, Tuba, Kebanî, “Di’ a” Çaldiran, 11 Tîrmeh 2015.
- Alakom, Rohat, **Di Folklorê Kurdî de Serdetiyeke Jinan**, İstanbul: Avesta Yayıncılık, 2009.
- Alan, Remezan, **Folklor û Roman**, Stenbol: Weşanên Peywend, 2013
- Artun, Erman, **Ansiklopedik Halk Bilimi / Halk Edebiyatı Sözlüğü Terimler-Motifler-Kavramlar**, Adana: Karahan Kitapevi, 2014.
- Arvas, M. Emin, Esnaf, “Nifir” Çaldiran, 15 Îlon 2015.
- Arvas, Vehbi, Mamoste, “Nifir” Çaldiran, 26 Îlon 2015.

- Assmann, Jan, **Kültürel Bellek Eski Yüksek Kültürde Yazı, Hatırlama ve Politik Kimlik**, İstanbul: Ayrıntı Yayınları, 2015.
- Avcı, Bekir, Cotkar, “Çîrokên Gelêrî” Çaldıran, 2 Tîrmeh 2015.
- Avcı, Cemal, Cotkar, “Tiştanok” Çaldıran, 19 Tîrmeh 2015.
- Avcı, Erhan, Esnaf, “Çîrokên Gelêrî” Çaldıran, 5 Tîrmeh 2015.
- Avcı, Eyüp, Karker, “Zûgotinok/Çîvanok” Çaldıran, 30 Tîrmeh 2015.
- Avcı, Ferit, Esnaf, “Gotinên Pêşîyan” Çaldıran, 29 Tîrmeh 2015.
- Avcı, Ferzender, Esnaf, “Dî’ a” Çaldıran, 29 Tîrmeh 2015.
- Avcı, Gülten, Kebanî, “Bîwêj” Çaldıran, 7 Tîrmeh 2015.
- Avcı, Halis, Karker, “Çîrokên Gelêrî” Çaldıran, 11 Tîrmeh 2015.
- Avcı, Muhlis, Karker, “Navûnûçik” Çaldıran, 14 Tîrmeh 2015.
- Avcı, Nihat, Esnaf, “Nifir” Çaldıran, 25 Tebax 2015.
- Avcı, Sıddık, Esnaf, “Di’ a” Çaldıran, 17 Tebax 2015.
- Avcı, Suat, Esnaf, “Zûgotinok/Çîvanok” Çaldıran, 28 Tebax 2015.
- Ayaz Muzaffer, Esnaf, “Tiştanok” Çaldıran, 30 Tebax 2015.
- Ayaz, Fikret, Esnaf, “Tiştanok” Çaldıran, 26 Tebax 2015.
- Ayaz, Koçer, Esnaf, “Navûnûçik” Çaldıran, 19 Tebax 2015.
- Ayaz, Mirbadin, Karker, “Bîwêj” Çaldıran, 28 Tîrmeh 2015.
- Ayaz, Nadir, Karker, “Metelok” Çaldıran, 23 Tîrmeh 2015.
- Bali, A, **Gotinên Pêşîyan ên Kurdî**, İstanbul: weş. Pelê Sor, 1993.
- Bayezîdî, Mela Mehmûdê, **Adat û Rusûmatnameê Ekradiye**, İstanbul: Weşexaneyaya Nûbihar, 2012.
- Bayrak, Orhan, Memûr, “Heyranok” Çaldıran, 12 Tebax 2015.
- Bayrak, Selahattin, Karker, “Gotinên Pêşîyan” Çaldıran, 3 Tebax 2015.
- Benjamin, Walter, **Son Bakışta Aşk**, sun. ve haz. Nurdan Gürbilek, İstanbul, Metis Yayınları, 2008.

- Bilici, Arif, Esnaf, “Metelok” Çaldiran, 2 İlon 2015.
- Bilici, İbrahim, Cotkar, “Biwêj” Çaldiran, 26 Tebax 2015.
- Bilici, Nasır, Esnaf, “Gotinên Pêşîyan” Çaldiran, 29 Tebax 2015.
- Bilicitürk, Bedia, Kevanî, “Nîfir” Çaldiran, 7 Tîrmeh 2015.
- Bilicitürk, İsmail, Esnaf, “Çîvanok” Çaldiran, 9 Tîrmeh 2015.
- Bingöl, Abdulkadir, **Gotinên Pêşîyan û Biwêj Deyimler ve Atasözleri**, İzmir: Weşexaneyê Na, 2014.
- Binici, Faruk, Memûr, “Metelok” Çaldiran, 5 İlon 2015.
- Borak, Mustafa, **Zargotin û Rewşa Pirtûkên Gotinên Pêşîyan**, Kovara Zend, Stenbol: 2010.
- Bozarşan M. Emin, **Ferhenga Kurdi**, İstanbul: weş. Deng, 2011
- Bulum, Kutbettin, Memûr, “Di’a” Çaldiran, 3 İlon 2015.
- Çakan, İkrâm, Cotkar, “Tiştanok” Çaldiran, 27 Tebax 2015.
- Çeçen, Rıfat, Esnaf, “Nîfir” Çaldiran, 22 Tebax 2015.
- Çınarcı, Mehmet, Cotkar, “Tiştanok” Çaldiran, 24 Tebax 2015.
- Çınarcı, Süleyman, Cotkar, “Metelok” Çaldiran, 19 Tebax 2015.
- Çifçi, Tekin, **Klam û Jin**, İstanbul: Nûbihar, 2014.
- Çobanoğlu, Özkul, **Âşık Tarzı Kültür Geleneği ve Destan Türü**, Ankara: Akçağ Yayınları, 2000.
- Çobanoğlu, Özkul, **Türk Dünyası Epik Destan Geleneği**, Ankara: Akçağ Yayınları, 2003.
- Çobanoğlu, Özkul, **Türk Dünyası Ortak Atasözleri**, Ankara: Atatürk Kültür Merkezi Bakanlığı Yayınları, 2004.
- Demir, Ahmet, Cotkar, “Çîrokên Gelêrî” Çaldiran, 1 Tebax 2015.
- Demir, Emin, Cotkar, “Biwêj” Çaldiran, 22 Tîrmeh 2015.
- Demir, Ercan, Esnaf, “Nîfir” Çaldiran, 1 Tebax 2015.

- Demir, Mehmet, Cotkar, “Çîvanok” Çaldiran, 13 Tîrmeh 2015.
- Ekici, Metin, **Halk Bilgisi (Folklor) Derleme ve İnceleme Yöntemleri**, Ankara: Geleneksel Yayıncılık, 2013.
- Ekîncî, Hayrettîn, **Dengbêjî**, İstanbul: J&J, 2013.
- Ekmen, Fazıl, Memûr, “Heyranok” Çaldiran, 19 Tebax 2015.
- Elçin, Şükrü, **Halk Edebiyatına Giriş**, Ankara: Akçağ Yayınları, 2013.
- Ellul, Jacques, **Sözün Düşü**, çev. Hüsamettin Arslan, İstanbul: Paradigma Yayınları, 1998.
- Ertan, Şakir, Karker, “Heyranok” Çaldiran, 23 Tebax 2015.
- Ertopçu, Murat, Esnaf, “Nifir” Çaldiran, 26 Tebax 2015.
- Ertopçu, Nesim, Esnaf, “Navûnûçik” Çaldiran, 2 Tebax 2015.
- Ertopçu, Tevfik, Esnaf, “Biwêj” Çaldiran, 4 Tebax 2015.
- Farqînî, Zana, **Ferheng-Sözlük**, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, 2004.
- Fırtına, Mehmet, Cotkar, “Metelok” Çaldiran, 29 Îlon 2015.
- Fırtına, Şirin, Esnaf, “Gotinên Pêşîyan” Çaldiran, 19 Îlon 2015.
- Goody, Jack, **Sözlü Kültür**, Milli Folklor Dergisi, 2011, say. 83.
- Gökalp, Ziya, **Türkçülüğün Esasları**, İstanbul: 1965.
- Gönül, Celal, Esnaf, “Bîwêj” Çaldiran, 16 Tebax 2015.
- Hanalp, Reşit, Memûr, “Di’ a” Çaldiran, 18 Tebax 2015.
- İnceay, Ekrem, Cotkar, “Zûgotinok/Çîvanok” Çaldiran, 1 Tebax 2015.
- İnceay, Ferman, Memûr, “Navûnûçik” Çaldiran, 30 Tebax 2015.
- İnceay, Mustafa, Esnaf, “Zûgotinok/Çîvanok” Çaldiran, 21 Tebax 2015.
- İnceay, Rıza, Cotkar, “Çîrokên Gelêrî” Çaldiran, 29 Tebax 2015.
- İnceay, Said, Karker, “Zûgotinok/Çîvanok” Çaldiran, 28 Tebax 2015.
- İnceay, Seyithan, Memûr, “Biwêj” Çaldiran, 21 Tebax 2015.

- İnceay, Yüksel, Kebanî, “Biwêj” Çaldiran, 14 Îlon 2015.
- İnceay, Zulmat, Şofêr, “Zûgotinok/Çîvanok” Çaldiran, 11 Tebax 2015.
- Îzolî, D, **Ferheng Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî**, Amed: Weşenên Deng, 2007.
- Karakoç, Salih, Memûr, “Çîrokên Gelêrî” Çaldiran, 11Tebax 2015.
- Kaya, İhsan, Esnaf, “Çîrokên Gelêrî” Çaldiran, 25 Tebax 2015.
- Kedali, Abdurahman, Memûr, “ Çîrokên Gelêrî” Çaldiran, 6 Tîrmeh 2015.
- Kedali, Yılmaz, Memûr, “Gotinên Pêşîyan” Çaldiran, 29 Tîrmeh 2015.
- Keleş, Nezaket, Kebanî, “Di’a” Çaldiran, 17 Tebax 2015.
- Keleş, Osman Nuri, Memûr, “Gotinên Pêşîyan” Çaldiran, 22 Tebax 2015.
- Kenan, Avcı, Esnaf, “Biwêj” Çaldiran, 11Tîrmeh 2015.
- Koç, Emîn, Şofêr, “Navûnûçik” Çaldiran, 6 Tebax 2015.
- Koç, Fidan, Kevanî, “Çîrokên Gelêrî” Çaldiran, 23 Îlon 2015.
- Koç, Halil, Esnaf, “Nifir” Çaldiran, 5 Tebax 2015.
- Koç, İbrahim, Cotkar, “Navûnûçik” Çaldiran, 19 Tebax 2015.
- Koç, Mehmet, Memûr, “Çîrokên Gelêrî” Çaldiran, 14 Tebax 2015.
- Koç, Yaşar, Karker, “Tiştanok” Çaldiran, 16 Tebax 2015.
- Koçak, Aynur, Sözlü Kültür Ortamından Elektronik Kültür Ortamına Menkıbeler: Mehmet Emin Tokadi Örneği, İstanbul: **Türk Kültürü ve Hacı Bektaş Veli Araştırma Dergisi**, 2005.
- Kurt, Mustafa, Esnaf, “ Çîrokên Gelêrî” Çaldiran, 25 Tîrmeh 2015.
- Kurt, Salihe, Kebanî, “Metelok” Çaldiran, 22 Tîrmeh 2015.
- Kutlar, Mithat, **Aşkla Örülmüş Dörtlükler, Heyranok**, Kovara Qijika Reş, Ankara: 2010, j. 2.
- Lêvî – Strauss, Claude, **Irk, Tarih ve Kültür**, çev. Haldun Bayrı ve diğerleri, İstanbul, Metis Yayınları, 1997.
- “Leqep, Navûnûçik, Navlêk”, **Türk Ansiklopedisi**, MEB yay. , Ankara: 1975.

- Metin, Fırtına, Esnaf, “Gotinên Pêşîyan” Çaldiran, 6 Îlon 2015.
- MukriyanîMem, **Folklor a Kurdan**, Diyarbakır: Hej. 1, 2015, r. 13
- Oncu, Mehmet, **101 Biwêj Çîrok**, İstanbul: Avesta Yayıncılık, 2015.
- Oncu, Mehmet, **Gotinên Pêşîyan**, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, 2014.
- Ong, Walter J. , **Sözlü ve Yazılı Kültür**, İstanbul: Metis Yayınları, 2010.
- Ordîxanê Celîl&Celîlê Celîl, **Zargotina Kurda**, Amed: Weşanên Aram, c. I-II, 2013.
- Otman, Ferit, Esnaf, “Biwêj” Çaldiran, 19 Îlon 2015.
- Otman, Ömer, Esnaf, “Biwêj” Çaldiran, 15 Îlon 2015.
- Öztopçu, Nihat, Esnaf, “ Çîrokên Gelêrî” Çaldiran, 29 Tebax 2015.
- Pertev, Ramazan, **Edebiyata Kurdî ya Gelêrî**, İstanbul: Avesta Yayıncılık, 2015.
- Sadinî, M. Xalid, **Heyranokên Kurmancî**, İstanbul: weş. Nûbihar, 2011.
- Sadinî, M. Xalid, **Heyranokên Kurmancî**, İstanbul: Weşenxaneya Nûbihar, 2011.
- Sadinî, M. Xalid, **Mamikên Kurmancî**, İstanbul: Weşenxaneya Nûbihar, 2011.
- Sadinî, M.Xalid, **Çîrokên Gelêrî**, İstanbul: weş. Nûbihar, 2011.
- Saintyves, P. , **Folklor El Kitabı**, İstanbul: Haşet Kitapevi, 1951.
- Sanders, Barry, **Öküz’ün A’sı, Elektronik Çağda Yazılı Kültürün Çöküşü ve Şiddetin Yükselişi**, Şehnaz Tahir (Çev.), İstanbul: Ayrıntı, 2010.
- Sevdi, Gülizer, Kebanî, “Heyranok” Çaldiran, 23 Îlon 2015.
- Sevdi, İbrahim, Memûr, “Di’a” Çaldiran, 4 Tebax 2015.
- Silo, Nezîr, **Wêjeya Devkî**, Stenbol: Kovara Zend, Hej. 3, Zivistan 2006.
- Songül, Aladağ, Kebanî, “Tiştanok” Çaldiran, 14 Tîrmeh 2015.
- Taş, Aynur, Kevanî, “Heyranok” Çaldiran, 8 Tebax 2015.
- Taş, Celal, Şofêr, “Bîwêj” Çaldiran, 9 Tebax 2015.
- Taş, Ceylan, Xwendekar, “Nîfir” Çaldiran, 13 Îlon 2015.

- Taş, Erol, Cotkar, “Tîştanok” Çaldiran, 3 Tebax 2015.
- Taş, Fırat, Mamoste, “Nîfir” Çaldiran, 13 Îlon 2015.
- Taş, Hakan, Karker, “Biwêj” Çaldiran, 29 Tebax 2015.
- Taş, Hâkime, Kevanî, “Di’a” Çaldiran, 1 Tebax 2015.
- Taş, Halime, Kebanî, “Heyranok” Çaldiran, 7 Tebax 2015.
- Taş, Halis, Memûr, “Gotinên Peşîyan” Çaldiran, 27 Îlon 2015.
- Taş, Handan, Kebanî, “Tîştanok” Çaldiran, 12 Tebax 2015.
- Taş, Handan, Xwendekar, “Zûgotinok/Çîvanok” Çaldiran, 9 Îlon 2015.
- Taş, Hatice, Kebanî, “Metelok” Çaldiran, 19 Îlon 2015.
- Taş, Hediye, Kebanî, “Heyranok” Çaldiran, 23 Tebax 2015.
- Taş, Melek, Kebanî, “Heyranok” Çaldiran, 9 Tebax 2015.
- Taş, Necibe, Kebanî, “Biwêj” Çaldiran, 18 Îlon 2015.
- Taş, Nurten, Kebanî, “Tîştanok” Çaldiran, 24 Îlon 2015.
- Taş, Sabiha, Kebanî, “Tîştanok” Çaldiran, 7 Îlon 2015.
- Taş, Savaş, Esnaf, “Heyranok” Çaldiran, 17 Tebax 2015.
- Taş, Tevfik, Esnaf, “Naûnûçik” Çaldiran, 18 Tebax 2015.
- Taş, Veysi, Esnaf, “Çîrokên Gelêrî” Çaldiran, 7 Tebax 2015.
- Taş, Yaşar, Esnaf, Çîvanok” Çaldiran, 25 Tebax 2015.
- Taş, Zahide, Kebanî, “Heyranok” Çaldiran, 25 Tebax 2015.
- Tedikçi, Barış, Esnaf, “Gotinên Peşîyan” Çaldiran, 5 Tîrmeh 2015.
- Tedikçi, Cahide, Kebanî, “Navûnûçik” Çaldiran, 3 Tîrmeh 2015.
- Tedikçi, Gülsüm, Kebanî, “Gotinên Pêşîyan” Çaldiran, 2 Tîrmeh 2015.
- Tedikçi, Mehmet, Esnaf, “Heyranok” Çaldiran, 7 Tîrmeh 2015.
- Tedikçi, Yavuz, Esnaf, “Metelok” Çaldiran, 9 Tîrmeh 2015.
- Turan, Kasım, Qesap, “Gotinên Pêşîyan” Çaldiran, 22 Îlon 2015.

- Uzunyay, Nusret, Esnaf, “Zûgotinok/Çîvanok” Çaldiran, 1 Tebax 2015.
- Wallerstein, Immanuel, **Jeopolitik ve Jeokültür**, çev. Mustafa Özel, İstanbul, İz Yayınları: 1993.
- Yıldırım, Dilaver, Esnaf, “Çîrokên Gelêrî” Çaldiran, 30 Tîrmeh 2015.
- Yıldırım, Dursun, **Türk Bitiği Araştırma / İnceleme Yazıları**, Ankara: Akçağ Yayınları, 1998.
- Yıldırım, Emine, Kebanî, “Dî’a” Çaldiran, 12 Tîrmeh 2015.
- Yıldırım, Hakan, Esnaf, “Navûnûçik” Çaldiran, 21 Tebax 2015.
- Yıldırım, Hüsnü, Mamoste, “Gotinên Pêşîyan” Çaldiran, 26 Tîrmeh 2015.
- Yıldırım, Murathan, Memûr, “Çîrokên Gelêrî” Çaldiran, 17 Îlon 2015.
- Yıldırım, Muzaffer, Esnaf, “Zûgotinok/Çîvanok” Çaldiran, 19 Tîrmeh 2015.
- Yıldırım, Nadir, Memûr, “Heyranok” Çaldiran, 18 Îlon 2015.
- Yıldırım, Sıracettin, Esnaf, “Nifir” Çaldiran, 4 Tîrmeh 2015.
- Yıldırımçakar, Mehmet, Kürt Anonim Halk Edebiyatında Heyranok Van Yöresi Örneği, **(Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi)**, Muş Alparslan Üniversitesi SBE, 2017.

FERHENGOKA NAVÇEYA ÇALDIRANÊ

A

adrês	: navnîşan, rêmal
Alîkelle	: navê gundekî Çaldiranê ye
alîkî diçû	: alîyekî diçû
aman	: firaq
anha	: a niha
ane gorê te	: li gorê te
ar	: ard
arav	: wextê di kinç şuştinê de ava pîs re tê gotin
arê bidê	: navber bidê
Asî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
asîr	: tîrşîk, avşor
axirî	: di dawîyê de
axta	: a niha
ayrî	: cûda

B

bahar nake	: bawer nake
baj	: xerac
banz	: gav
Başimî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
Başqala	: navê navçeyeke Wanê ye

başqe	: wekî din
Bayîz	: navê navçeyeke Agirîyê ye
Bayîzaxa	: navêkî Çaldiranê berê ye
Bazîdaxa	: bnr. Bayîzaxa
bedew	: rind
bêder	: bender
begem kir	: ecibandin
Bêgîrî	: navê navçeyeke Wanê ye
behs dikin	: qal dikin
bêjî	: porikê hespê
bêkar	: ‘ezep
bême'nî	: bêmane
bên	: bêhn
Bekirî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
bela dike	: belav dike
bendik	: xurcîk, heyber
berav kirin	: berhev kirin
berbû	: berbûk
berindî	: navê peza yek salî ye
berojî	: navê çiyayekî Gewrika(Çaldiran) ye
berteref	: kesekî zefh nexweş
bertîl	: ruşwet

Bêşî	: navê gundekî Çaldiranê ye
bex	: berx
bîçer	: makîna gîhê
biherim	: bibim
birra	: bila
birê wî	: birayê wî
bîstyek	: bîst û yek
Bişaraxa	: navê gundekî Çaldiranê ye
bixazin	: bixwazin
bîye	: bûye
C	
cab	: bersiv, xeber
cahil	: civan
cake zivirîn	: careke din zivirîn
carke dine	: careke dine
ce hev	: cem hev
ce	: cerm
cêla te	:mîna te
Celalî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
cemse	: ‘ereba eskerîyê
cendek	: term
cergubez	: navê govenda ku jin û mêr bi hev re dileyîzin

cerb	: qaçaxçî, diz
cî	: yatax, nivîn
cîkî başqe	: cihekî din
cîkî isa	: cihekî wisa
cîna min	: wek min
cînar	: cîran
cîya te	: dîya te
Ç	
ça bêjim	: çawa bêjim
ça bikî	: çawa bikî
ça ne	: çawa ne
ça?	: çawa?
Çakî?	: çawa?
çadir	: kon
çakîne bînim?	: çawa bînim
çakîne bînim?	: çawa bînim
çakîne?	: bi çi awayî
çaw	: bendê ku bi badana gîha tê çêkirin
çê	:baş, rind, sipehî
çe'l	: kort, çalik
Çelebîbax	: navê beldeyeke Erdîşê ye
çend hev	: çend heb

çiftexas	: cureyeke perçeye
çikarî?	: ka çawa?
çiqa?	: çiqas?
çi qirarî?	: bi çi awayî?
çîl	: spî
D	
d'en	: genimê kelandî
da xebera	: kifrî kir
da	: de
dagerîyan	: çûn
dahat	: dihat
dake	: bike hindir
datinî	: dadinî
davîtine para	: diavêtine paşîyê
day	: dayê
de's	: dehş
debo	: teneke
dedixin	: derdixin
degişke	: biguhire
deketa	: derketa
delav	: cihê herî tenik yê çem e.
dêlegur	: asena

deprem	: ‘erdhej
dêre	: fistan
dergîstî	: destgirtî
Dêro	: navê gundekî Çaldiranê ye
dervas	: derbas
des mal	: destmal
des pê	: dest û pê
des pê kir	: dest pê kir
destek	: alîkarî
Dewtirş	: navê gundekî Çaldiranê ye
deyn leke	: deng leke
deyşa	: de îja
dezmêj	: destnimêj
digo	: digot
dînlemîş dikir	: guhdarî dikir
dişxûle	: dişewite
dixarin	: dixwarin
dogîta	: devkî
don	: rûn
dûşûnmîş dibe	: difikire
E	
‘edet	: kevneşopî

‘Elebelekî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
‘erbît	: ‘efrît, cin
‘erse	: cih
‘erzbît	: ‘efrît, cin
‘etka te	: koka te, malbata te
‘Etmanekî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
‘eyd	: cejn
‘eynê	: mîna
e	: ez
ehed	: sond
Eleşkîrt	: navê navçeyeke Agirîyê ye
en hindik	: herî hindik
en îyîsî	: ya herî baş
Erdîş	: navê navçeyeke Wanê ye
exte	: hespê ku batkîyê wan diavêjine kelbetan
eyîtîm	: perwerde
Ê	
Êgekumet	: navê gundekî Çaldiranê ye
‘Etmanekî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
êl	: ‘eşîr
êpê	: gelek, zefh
êtîm	: sêwî

êvîra : cih

F

fem : fêm

ferîfîye : welidîye

File : Ermenî

firaqetî : rehetî, firehî

forq : orispî

G

gakûvî : xezal

gazî dikir : gahîz dikir

gede : lawik

gele xaş bû : gelek xwaş bû

gendîgiran : nanên ku diavêjine erdê salek şûnda hêşin bibe

gevez : sor

Gewrika : navê gundekî Çaldiranê ye

gezmax : gerîn

Gîhadîn : navê navçeyeke Agirîyê ye

Giregewra : navê çiyayekî Çaldiranê ye

go : got

gola boxa : navê goleke Çaldiranê ye

gola nawîrê : navê goleke Wanê ye

gola qaza : navê goleke Çaldiranê ye

Gomik	: navê gundekî Çaldiranê ye
Gorî	: qurban
gizilgo	: hirîya tevlihev
guhdirêj	: ker
gûrz	: koma gîha
H	
heban	: çantê şivanan e
he merva	: her du merivan
he ro	: her roj
hêca	: a niha, bistek berê
hêca	: hêja
Hecî Xatûn	: navê gundekî Çaldiranê ye
hedîye	: xelat, dîyarî
hema isa	: hema wisa
Hemoyî	: navê 'eşîreke Kurdan e
hemûka	: hemûyan
hemûşk	: hemî
herekî	: her yekî
Hesen 'Evdal	: navê gundekî Çaldiranê ye
hesipkî	: hesmanî, wek
hetanî	: heta
hev ra	: bi hev re

hev	: heb
hevşî	: cihê pêz û dewar
heyjde	: hijdeh
hêliz	: navê pincarekê ye.
hij nakim	: hez nakim
hîlbû	: rabe, bibewşe
himayîl	: nivîşt
hine	: boyaxa bi toz tê çêkirin
hinde	: ewqas
hindir	: hundir
hirî	: rîs
hisandin	: bîhîstin, haj pê hebûn
hiz	: hez
hom	: nezan
huwa	: waye, va, wa, ev e
I	
‘îşk	: hişk
idî	: êdî
iha	: wiha
inê	: dayê
inda	: winda
isa	: wisa

Î

îptal	: betal, feramoş
îskan	: cam a çay wexwarinê
Îsmâîlbaba	: navê gundekî Çaldiranê ye

J

jajerûn	: xwarineke ji rûn û ard çê dibe
ji boy	: ji bo

K

kalî	: kîjan alî
kanê?	: ka?
Kanî Miksa	: navê çiyayekî Çaldiranê ye
kap	: navê kapê herî mezin e
kapek	: kepek
karola wî	: yataxa wî
kebûn	: hêlîn
Kedalî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
kelefa	: dêran, wêran
keleske	: ‘erebeya hespan
kelp	: kûçik
kenahu	: qaşka giravî
kenawo	: qaşka
kenê bê’ar	: kenê vala

kerba	: keder
Kerra	: navê gundekî Çaldiranê ye
Kevrê Şamîya	: navê gundekî Çaldiranê ye.
kêlik	: kevirê ku dafînine ser merzel.
kêzik	: morîstang
kir	: gir
kiras	: binkinç
kişik	: setrenc
Kolkolka	: navê gundekî Çaldiranê ye
komqir	: qetlîyam
kon	: çadir
kosegelî	: lîstikek e
kulav	: keçe
kulfet	: jina bimêr
Kulîzerk	: navê gundekî Çaldiranê ye
kumgustîl	: lîstikeke Kurdan e
Kurtika	: navê gundekî Çaldiranê ye
kuşter	: mezbaxane
kuta bûye	: xilas bûye
kutan	: lêdan
L	
laqirdî	: henek, tinaz, yarî

leyîstik	: lehîstok
lod	: komkirina gurzan û li ser hev
loma	: ji bo
M	
mal	: heywan
malderxistin	: piştê destgirtina bûkê, çûyîna mala bûkê
malxê	: mezinê malê, reîsê malê
Mamedî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
me’r	: mar
me’r kirin	: mehr kirin, nîkah
merzel	: gor
mêj	: nimêj
mexrep	: êvar
mexrep zemîn	: Dîyarbekir
meytef	: dibistan
mi	: min
mi dêna xu daye	: min lê nihêrî, min bala xwe dayê
mi’elim	: mamoste
Mihemedî	: Misilman
miherin	: em herin
Mikaîlî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
mikur	: îftirekar, xaîn

minminîk	: perperok, pepûle
mîh	: mî
mînanî	: wek, hev
mirtoxe	: xwarineke bi ard û rûn tê çêkirin
mîta	: mîna, wekî
mitêl	: rûyê nivîna
morîstang	: kêzik
N	
naha	: niha
namûçik	: navûnûçik, leqep
Nanparêz	: navê gundekî Çaldiranê ye
navtêdan	: fesadî
nebî	: nevi
nefes	: bêhn
nem dibe	: nerm dibe
nemûş	: neqş
nerdevan	: derence
nêvan	: mêvan
nitanî	: wekî, mîna
nivî	: nîv
nîzka çêbe	: nêzîka çêbe
nota te	: mîna te

nûtilê min	: wek min
nûzde	: nozdeh
O	
olay	: bûyer
ortax	: şîrîk
ortê	: navîn
orxan	: lihêf
Ozalp	: navê navçeyeke Wanê ye
P	
para pey va	: li dû
parava	: li alîyê paşîyê
part	: koma gîhayan
parve kirin	: dabeş kirin
paşil	: hembêz
paşport	: pasaport
pêgermok	: volte
pêkî wê	: pîyekî wê
pey	: li dû
peyn	: pîsîyê heywanan
piçûk	: biçûk
piltan	: pincareke bi bêhn e
pînek	: pîneyek

pîpelok	: derence
Pira ‘Erdê	: navê gundekî Çaldiranê ye
Pirreşît	: navê goleke Çaldiranê ye
pişirûk	: şîr
ponije	: difikire
poz	: difin
pûng	: gîhakî bêhnxweş
pûrt	: pirç
Q	
qalin	: stûr
qapût	: sako
qarşî	: li hember
qawe	: qahwe
qe	: qet
qefes	: sing
qelp	: dexes
qerpûz	: zebeş
qerqaş	: spî, çîl
Qeymez	: navê gundekî Çaldiranê ye
qeynek	: genimê qelandî
qîç	: zer ê girtî
qîr	: reş, reşê girtî

qop	: seqet
Qubika	: navê gundekî Çaldiranê ye
qûç	: kevirên biçûk
qudim	: çok, ling
qutîk	: qutîyek

R

ra	: re
red dibe	: xilas dibe
rêkêf	: êrîş
reng rism	: dirûv
rîs	: hirî

S

sakîne	: wisa
salixdan	: medhîye
Sariqşî	: navê gundekî Çaldiranê ye
satiş	: firotin
se	: ser
se sîya	: ser stûya
Sellik	: navê gundekî Çaldiranê ye
sepet	: selik
Seregola	: navê gundekî Çaldiranê ye
seva carke din	: ji bo carke din

seva te	: ji bona te
sewa min	: ji bona min
sews	: serxweş
Seyîtkî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
sêrk	: stêr
sêz	: qamirgeh, sazlık
sîqet	: mezinê teyran
Sîtîyaqut	: navê gundekî Çaldiranê ye
son dixê	: sond dixê
sual	: pirs
Ş	
şa dibe	: şad dibe
şalpe	: xêlî
şe’r	: laçik
Şemskî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
Şengelî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
şer jê dikirin	: ser jê dikirin
şerpikand	: revand
Şêx Cindî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
Şêx Heyder	: navê gundekî Çaldiranê ye
Şêxkî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
şîk	: cîyê ku di aş de av tê

şimşat	: dûz
şîraz	: dareke zefh mezin û meqbûl
şîrnayê	: dewateke pêşîya sîyarkirinê ye
şîrnayê	: navê şahîya berî sîyarkirina bûkê ye
şîş	: hesin
şixu	: jixwe
T	
ta	: bend
t'ejî	: tazî
t'erikî	: mezin, gir
t'et	: navê kevirekî dûz û şimşat e.
tanmîş nebû	: berxwe da
te ra	:ji te ra
te'mil	: berxwedan
te'nî	: coş
teklif	: pêşnîyar
telîs	: çuwal
tembor	: tûncik
Tendûrek	: navê çîyayekî Çaldiranê ye
tenî	: coş
Tepelî	: navê gundekî Çaldiranê ye
ter	: nû, teze

terazin	: cîyê şil
teseqa te	: sedeqa te
teze	: nû
ti ça dikî	: tu çawa dikî
ti	: tu
tîk bû	: çik bû
Tîkme	: navê gundekî Çaldiranê ye.
tine	: tune
tirşo	: navê gîhayekî tirş e
Tirtopî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
tolik	: bela
top bike	: ber hev bike
Topê Kurgûlî	: navê cihekî Çaldiranê ye
topê şerefnaz	: topê Êris
Torinî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
tovîr	:
Tûcî	: navê gundekî Çaldiranê ye
Tuzederê	: navê gelîkî Çaldiranê ye
Û	
Ûris	: Rus
ûzûlmîş dibe	: xemgîn dibe

V

va	: ve
vendera	: li vendera
vî îşî	: vî karî
vîdon	: bîdon
vir	: derew
vira	: li vir

W

walî	: wî alî
wana	: wan
wun	: hûn

X

Xamûr	: navê navçeyeke Agirîyê ye
Xan	: navê gundekî Çaldiranê ye
xerîb	: beyanî
xast	: xwest
xastik	: derpê jina
xaş dibe	: xweş dibe
xerîm	: Xwedayê xwe
xevat	: xebat
xewnerojk	: xewn
xuda ye	: xwê da ye

xurek	: xwarin
xuva çû	: ji xwe çûn
xûna te	: xwîna te
xûşkê zabê	: xwîşkên zabê
Xûnê	: li Çaldiranê hem navê gundekî û hem jî navê çemekî ye

Y

yalîyê te	: li alîyê te
yanlişî	: xeletî
yanzdeh	: yazdeh
yardim	: alîkarî
yaşê te	: temenê te
yaşlî ye	: kal e
yatax	: nivîn
Yekmale	: navê gundekî Çaldiranê ye
yêr	: cih

yirticî : wehşî

Z

zar	: zarok
zaten	: jixwe
zeyî	: piştî dewatê cara ‘ewil çûyîna bûkê ya mala bavê xwe
Zêrbegî	: navê ‘eşîreke Kurdan e
ziha	: ziwa

zîpik

: dilop

zor ma nêhêrî

: ‘ecêp ma nêhêrî

KURTEJÎYAN

Melik TAŞ, di sala 1984an de li navçeya Çaldiranê ya Wanê hate dinê. Dibistana seratayî û navîn li navçeya Çaldiranê û lîseyê jî li Wanê qedand. Di sala 2007an de ji Zanîngeha Yüzüncü Yıl Fakulteya Fen û Edebîyatê û ji Beşa Ziman û Edebîyata Tirkî mezûn bûye. Di sala 2013an de li Mûşê di Zanîngeha Alparslanê ya Muşê de, di Beşa Ziman û Çanda Kurdî de dest bi mastira bêtez kir û di heman salê de vê beşê xelas kir. Dîsa di heman salê de di Zanîngeha Mûş Alparslanê de, di Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî de dest bi mamostetî kirîye û di vê beşê de dersên Kürt Halk Edebiyatına Giriş I-II, Dil Bilimi I-II, Edebi Sanatlar I-II û Kompozîsyon I-II dide. Hê jî li heman zanîngeh û di heman beşê de mamostetî dike.

ÖZGEÇMİŞ

Melik TAŞ, 1984 yılında Van'ın Çaldıran ilçesinde dünyaya gelmiştir. İlkokulu ve ortaokulu Çaldıran'da liseyi de Van'da bitirmiştir. 2007 yılında Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Fen Edebiyat Fakültesi, Türk Dili ve Edebiyatı Bölümünden mezun olmuştur. 2013 yılında Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı'nda tezsiz yüksek lisanstan mezun olmuştur. Aynı yılın Ekim ayından itibaren de öğretim görevlisi kadrosunda Muş Alparslan Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümünde çalışmakta ve Kürt Halk Edebiyatına Giriş I-II, Dil Bilimi I-II, Edebi Sanatlar I-II ve Kompozisyon I-II derslerini vermektedir.

PÊVEK



Nexşeya Navçeyên Wanê

